# DÎROKA TEVGERA JINA AZAD

**(Vegotin û Nîqaşên Waneya Dîroka Tevgera Jina Azad**
**Dewreya Ş. Reşîd Serdar ya Ocaxa PKK)**

**HEVALA RÛKEN GARZAN**

**WEŞANÊN OCAXA PKK YA SAKÎNE CANSIZ-17**

# DÎROKA TEVGERA JINA AZAD

**Hevala Rûken Garzan**

**Dîroka Weşanê: 2015**

**Cihê Weşanê: Matbaya Azadî**

**WEŞANÊN OCAXA PKK YA SAKÎNE CANSIZ-17**

## NAVEROK

**PÊŞEK**..........................................................................................**5**

**WEKE DESTPÊK; RAST FÊMKIRIN Û NÊRÎNA DÎROKÊ** ......................7

**LI KURDISTANÊ KEVNEŞOPIYA BERXWEDÊR YA JINÊ** ...................13
*Li Hemberî Pergala Fîravûntiyê Berxwedêrek................................13*
*Di Kevneşopiya Eşîrtiyê De Rista Jina Kurd ...................................15*
*Di Sedsala 19'emîn Û 20'emîn De Jinên Kurd Ku Damgaya Xwe Dîrokê Xistine ....17*

**TEVGERA JINA AZAD KU DI NAVA ŞOREŞA PKK'Ê DE ZÎL DIDE.....31**
*Di Tevgera Jina Azad De Rastiya Serokatiyê..................................31*
*Têkoşînek Bi Jina Kevneşop Re; Fatma ..........................................33*
*Di Kongreya Yekemîn Ya PKK'ê De Jin ..........................................35*
*Di Dema Rêxistinbûn Û Qomîteyan De Jin.....................................36*
*Donzdehê Îlon Û Rihê Berxwedanê Ku Jina Kurd Şiyar Dike ...........38*
*Di Pêvajoya Kongreya Duyemîn Ya PKK'ê De Jin ...........................39*
*Di Pêvajoya Kongreya Seyemîn Ya PKK'ê Û Pengava 15'ê Tebaxê De Jin .41*

**RÊXISTINBÛNA TEVGERA JINA AZAD YA XWESER......................45**
*Rêxistinbûnên Xweser Yên Ewil Û YJWK .........................................45*
*Pêşketina Gerîlatî Û Fermandariya Jinê .........................................46*
*Pakrewanên Ku Bi Helwesta Xwe Tevgera Jina Azad Diafrînin ......46*
*Sê Têkoşerên Ku Mirinê Dimirînin.................................................51*
*Di Kongreya Çaremîn Ya PKK'ê De Jin............................................54*
*Piştî Nodî Asta Têkoşînê Û Ferasetên Şaş.......................................55*
*Piştî Nodî Rewşa Qadan Û Jin .......................................................57*
*Kongreya Zelê Û Nêzikatiyên Tasfiyeger .......................................62*
*Biyografiyên Ku Damgaya Xwe Li Dîrokê Didin ..............................65*

**ARTÊŞBÛNA JINÊ.........................................................................75**
*Bingeha Artêşbûnê Û Îlana Artêşê.................................................75*
*Nêzikatiyên Li Hemberî Artêşbûna Jinê .........................................76*
*Encamên Artêşbûyina Jinê.............................................................83*

**KONGREYA YEKEMÎN YA JINÊ Û YAJK ...................................... 89**
*Kongreya Pêncemîn Ya PKK Û Amadekariyên YAJK'ê ................... 89*
*Kongreya Yekemîn Ya Jinê Û Avakirina YAJK'ê ............................. 90*
*Teyisînên YAJK'ê Li Ser Qadan ....................................................... 92*
*Du Xetên Ku Damgaya Xwe 96'an Dixin ......................................... 98*
*Penç Rêgezên YAJK'ê ................................................................... 104*
*Pêvajoya 97'an Û Asta Rêxistinbûna YAJK'ê................................ 105*
*Pêvajoya 98'an Û Bîrdoziya Rizgariya Jinê ................................ 112*
*Konferansa Rojhilata Navîn Ya Jinê Û Penç Tîplemeyên Jinê....... 119*

**PÊVAJOYA QOMPLOYA NAVNETEWÎ ..................................... 125**
*Sedemên Qomployê Yên Derve Û Yên Hûndirîn.......................... 125*
*Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin ................................................... 127*
*Kongreya Şeşemîn Ya PKK Û Partîbûyina Jinê ............................ 130*
*Pênç Rêgezên Partîbûyina Jinê .................................................. 132*
*Avakirina PJKK Û Nêzikatiyên Şaş ............................................... 135*
*Di Kongreya Heftemîn Ya PKK De Jin .......................................... 141*
*Kongreya Seyemîn Ya Jinê Û Avakirina PJA ................................ 143*
*Kongreya Heyştemîn Ya PKK'ê Û Jin ............................................ 145*
*Kongreya Çaremîn Ya Jinê .......................................................... 146*

**JI NÛ VE AVABÛNA PKK Û DI PÊVAJOYA NÛ DE JIN ................ 151**
*Mudaxaleyên Serokatî Û Têkoşîna Li Dijî Xeta Tasfiyeger........... 151*
*Milîtaneke Demê; Şîlan Kobanî.................................................. 152*
*Kongreya Pêncemîn Ya Jinê ........................................................ 153*
*Di Dema Nû De Qad Û Rêxistinên Jinê......................................... 154*
*Pêngava 1'ê Hazîranê Û Têkoşîna Jinê ....................................... 160*
*Di Dema Nêzik De Asta Ku Tevgera Jina Azad Gihêştiyê ............ 164*

**WEKE ENCAM;**
**TÊKOŞEREKE KU XETA AZADIYA JINÊ DI ŞEXSÊ XWE DE GIHANDIYE EVÎNÊ ....** 167

# PÊŞEK

Jinê, weke hemû afirînerên çandî û civakî bi hebûnê xwe hîma civakê daniye û di serboriya jiyanê ya mirovahiyê de xwediyê cihekî taybet e. Rûxmî vê di dîroka ku weke dayika hemû zanistan tê pênasekirin de cih negirtiye. Bi taybetî di dîroka dewletî, ango di dîroka şaristaniyê de tune hatiye hesibandin. Weke Serokatî dibêje, deshilatdaran ji bo ku deshilatdariya xwe teqez bikin di serî de koletî li ser jinê ferz kirine.

Bêguman jin bê dîrok nîne û her koletî jî jiyan nekiriye. Lê ji ber ku timî ji aliyê deshilatdaran ve dîrok hatiye nivîsandin, dîroka koletiya jinê jî rast nehatiye nivîsandin. Ji ber vê yekê sererastkirina vê dîrokê, hewldana Serokatî ya herî mezin e. Her wiha ji bo ku dîroka azadiya jinê were nivîsandin jî, Serokatî ji aliyê fikrî ve pêşnûmeyek daye pêşiya me û di her firsendê de hêviya nivîsandina dîroka azadiya jinê tîne ziman. Ji vî alî ve, ew xebata di destê me de, mirov weke hewldana bersiva hêvî û hewldanên Serokatî jî dikare bi nav bike.

Bi taybetî dema ku erdnîgarî dibe Kurdistan, bindestbûn û koletî kûrtir dibe. Di encamên siyasetên dagirkeran de, kesayeteke ji rastiya xwe dûr ketiye û hatiye tepisandin heye. Lê li hemberî vê, civakeke ku civaka xwezayî bi cewherî jiyan kiriye û ew taybetmendiyên berxwêder hê jî bi awayekî kûr jiyan dike heye. Bi taybetî di jina Kurd de mirov vê yekê şênbertir (somut) dibîne. Her wiha tevgera azadiya Kurd ku di pêşengiya jinê de pêş ketiye, ew rihê têkoşer zindî kiriye û di şexsê vê têkoşînê de angaşta (idia) sererastkirina dîrokê û ji nû ve nivîsandina dîroka jina azad derdikexe holê. Ew yek di şexsê Serokatî û pakrewanên tevgera me de hatiye isbat kirin jî.

Xebata bi navê dîroka tevgera jina azad, di erdnigariya Kurdistanê de lêgerîn û lêpirsîna vê têkoşînê dike. Ew çanda berxwêder a jinê, li Kurdistanê çawa zindî maye û di têkoşîna me de, di şexsê pakrewanên jin de çawa tê temsîlkirin, vedibêje. Dîroka ji agir, di kîjan merheleyan re derbas bûye, kîjan ked û berdel hatine dayin, ji bo jina ku hatiye tepisandin çawa azadî bûye pîvaneke esasî, radixe ber çavan. Bi kurtahî em dikarin bibêjin; di her kêliya wê de berxwedan, têkoşîn û fedakarî heye.

Ji ber vê yekê divê her milîtenekî/e vê tevgerê, ew dîroka ji agirî bizanibe, hewldanê fêmkirinê nîşan bide û li hemberî vê têkoşînê, kesayeta xwe lêpirsîn bike. Danehev û kombûyinên tevgera jina azad; divê

îro têkoşînek çawa bê dayin, bi kesayet û zêhniyeteke çawa bê tevgerîn û peywirên (görev) demê çi ne jî diyar dike. Ji vî alî ve, ji dîroka xwe ders derxistin û li ser vê esasê têkoşîn mezin kirin, berpirsiyariya her milîtanekî/ê ye.

Li ser vê esasê, em bawer dikin ku di şoreşe me ya zîhnî de, dê ew xebat bibe çavkaniyeke bingehîn. Ji bo vê, ew waneya (ders) ku di ocaxa PKK ya Sakîne Cansiz de hatiye dayin, me zivirand xebata pirtûkê û ji ber ku em digihînin ber destê hevalan em kêfxweş in.

**Silav û Rêzên Şoreşgerî**
**Ragihandina PKK**

## WEKE DESTPÊK; RAST FÊMKIRIN Û NÊRÎNA LI DÎROKÊ

**HEVAL RÛKEN:** Em ê niha waneya dîroka tevgera jina azad bibînin; ango li Kurdistan û di PKK'ê de tevgera jin. Berî em derbasî vê waneyê bibin, divê em hinekê behsa giringiya dîrokê bikin.

Mêzekirina me ya dîrokê çi ye? Dibe ku di waneyên din de jî hevalan ew mijar dîtibe. Em ê bi taybetî mijarên weke ji bo jinê wateya dîrokê çi ye û em weke jin çima girîngî didin dîrokê, vekin. Divê em vê bizanibin. Di mijara zayendperestiya civakî de jî derket holê ku jin bê dîrok maye. Bi taybetî dîroka nivîskî ya jinê qet nîne. Bi taybetî berî pênc hezar sal û vir ve, tiştên ku jinê derxistine holê êdî bi dîrok nebûne. Berî wê jî jixwe dîrok nehatiye nivîsandin. Dibe ku li ser tablet ûhwd arkelog îro hinek tiştan derdixin holê, lê weke nivîskî tiştekî pir zêde tune.

Di encamê de ew derdikeve; divê ew dîroka ku nehatiye nivîsandin, em ji nû ve binivisînin. Dibe ku heval bibêjin, ew angaşteke pir mezin e. Lê tevgera me, tevgereke ji nû ve avakirina civakê û pergaleke nû daye pêşiya xwe ye; li ser vê angaştê têkoşîn dike û gav bi gav dimeşe, serkeftinekê derdixe holê. Li ser van serkeftinan jî bûye xwedî vîn û bawerî. Angaşta xwe jî ji vê bawerî û hêzê digire. Wisa bê bingeh û bê çavkanî nagire dest. Ji bo wê jî xwedî angaşteke wisa ye ku dîroka pênc hezar sal ku hatiye nivisîn berovajî bike û rastiya vê dîrokê derxe holê. Ya herî girîng jî, di pêşengtiya tevgera jin û jineolojî de, dê ew dîroka ku berovajî hatiye nivisîn sererast bike û ji nû ve binivsîne. Cewher û rastiya wê çi ye? Dê wî dayne holê. Weke tevger Serokatî ew însiyatîf ji serî ve daye me. Ji destpêka avakirina PKK ve, mêzîkirin û têkoşîni Serokatî li ser vê esasê ye.

Yanî êdî ji bo civakan nêrîna li dîrokê girîng dibe. Li gorî kîjan civak û kîjan mêzekirinê bê nivîsandin, ew dê ji bo pêşerojê bibe eynik ayna. Dibe eynika wê kom û civakê. Ya rast, zêhniyeta zayendperestî jî ew yek baş zaniye ku pênc hezar sal in vê şêwazê bi kar tîne. Hem dîrokê berovajî dike û ji cewhera wê derdixe, hem jî li gorî zêhniyeta xwe dinivisîne. Ji ber vê yekê jî, divê di serî de mirov di vir de nêrîna xwe bide guhertin. Da ku ew zêhniyet jî bê guhertin. Vê zêhniyetê ew dîroka heye û em dixwînin nivîsandiye. Ji bo ku em vê zêhniyetê fêm bikin, divê em bizanibin ku ew tiştên ku di vê dîrokê de hatine nivisîn jî ne rast in.

Di mijara jinê de tiştên ku hatine nivîsandin, bûne wêje û ketine pirtûkên pîroz yên olî jî; hemû li ser kolekirina jinê hatine nivîsandin. Ji bo vê jî dîroka jinê, cewher û rengê jinê, ji avakirina civakê û heya roja me ya îro, girtina dest girîng e. Em vê pir girîng dibînin. Ger em vê dernexin holê û berfireh nekin; dê pêneseya dîrokê jî ji bo me nîvçe bimîne. An jî em ê nikarin xwe ji bandora dîroka nivîskî ya heyî xilas bikin. Weke tevgera giştî û tevgera jinê jî em nikarin li wê dîkoka nivîskî jî xwedî derkevin. Em nikarin bibêjin ew dîrok, dîroka giştî ya mirovahî û gerdûnî ye. Em nikarin wisa pênase bikin û lê xwedî derkevin. Ji aliyê nêrîna li dîrokê ve jî em cudabûna xwe wisa datînin holê. Em dibêjin ew dîrok rast nehatiye nivisîn.

Dîroka şaristaniyê li ser esasê zêhniyeta mêr ya deshilatdar hatiye nivîsandin. Zêhniyeta mêr ya deshilatdariyê jî, di nava ew dîroka şaristaniyê ya giştî de, ji bo berjewendiyên xwe jin çiqes kar aniye, ew qes cih daye jinê. Ger di hinek cihan de xizmetî deshilatdiriyê kiribe û li gorî berjewendiyê mêr tevgeriya be, cih dayê. Em jî vê nikarin weke diroka jin bigirin dest. Her çiqes jinê di hinek merheleyan de cih girtibe û rol lîstibe jî; lê xizmetî kîjan zêhniyetê kiribe, divê em vê jî lêpirsîn bikin. Ger em wisa nekin, dê em ê rasterast li dîrokê binêrin. Em nikarin cuda lê binêrin û em ê bibêjin, em nikarin biguherînin.

Serokatî di vir de cudabûna xwe daniye holê. Dîroka heyî qebûl nekir, nêrîneke cuda danî holê. Weke dîroknas gelek kesan tehlîl kirine û li ser van tehlîlan weke dîroknas derketine holê. Serokatî li gorî tehlîlên van dîroknasan li dîrokê nanêre. Serokatî bi nêrîneke nû dîrokê şîrove dike. Dibêje “**dîrok, şîrove ye.**” Di paraznamayan de jî, dîrokê ji nû ve şîrove dike û rastiya wê datîne holê.

Îcar mêzekirin û şêwazên dîrokê hene. Ya yekê, nêrîna pêşve çûna rastekî (düz ilerlemeci). Wisa bi nêrîn û dahûrandineke cuda mêzekirin tune ye di vê şêwazê de. Şêwaza niha li cîhanê hakîm jî ev e. Şêwazeke din ku derketiye holê jî; şêwaza vegotin (söylence), ango mîtolojî ye. Ew şêwaz di zanista dîrokê de weke nêrîneke rast nehatiye dîtin û nehatiye pejirandin, lê heya roja me her xwe berdewam kiriye jî. Bi şêwaza pêşve çûna rastekî (düz ilerlemeci) li civakê mêzekirin, xwe hakîm kiriye, ew şêwaza duyemîn pir zêde bi wate nebûye. Wisa bi vegotin û devkî ragihandina nifşên nû heya roja me îro hatiye, lê pir giştî nebûye. Di realîteya heyî de ew şêwaz pir realîst nehatiye dîtin. Hin tiştên rast jî derxistine holê. Lê ji aliyê nêrîna pozîtîvîst ve, ew şêwaz bê wate bûye.

Mêzekirina seyemîn ya Serokatî ye. Serokatî nêrîna xwe ya dîrokê cuda digire dest, ew jî nêrîna seyemîn e. Serokatî dîrokê zindî digire dest, nêrîna dîrokê de parçebûnê esas nagire. Nabêje ew şêwaz rast e û bila her tişt li ser vê yekê bimeşe. Ya herî girîng jî Serokatî, dîrokê malî civakê dike. Bi nêrîna civakê dîroka rast derdixe holê. Teqez hevalan jî dîqat kiriye, Serokatî dîroka tevgera me bi avabûnê ve nade despêkirin. Heya destpêkirina civakan, heta heya beriya wê dibe. Bi avabûna gerdûn û cîhanê ve digire dest. Ji vir heya roja me tevgera me xwe li ser kîjan xetê datîne û bingeha xwe digihîne ku, wê diyar dike.

Dema ku mirov nêrîna Serokatî û dîroka heyî ya nivîskî mêze dike, mirov cudabûneke ber bi çav dibîne.  Mesela di dîroka heyî de çi heye? Dîrokê merhele bi merhele digire dest û her merheleyekê jî ya din baştir û pêşketîtir digire dest. Dibêje civaka xwezayî, koletî, feodalîzm, kapîtalîz ûhwd. Heya roja îro ew mêzekirin derdikeve holê. Serokatî xwe ji vê mêzekirinê qut dike. Ji bo vê jî Serokatî, ew nêrîna duyemîn jî, yanî şêwaza vegotinê jî bê wate nabîne. Dibêje jiyan û civak ew qes di nava hev de pêş ketiye ku, rastiya civakê ew e. Vê tîne ziman, vê bi wate dike. Serokatî rastiya tevgera jinê jî, ji vir derdixe.

Me got dîroka tevgera jinê nehatiye nivisîn, lê civakê tiştên ku hatine jiyîn, her di jiyan û mejiyê xwe de zindî hiştin e. Ger wisa nebûya, di civaka xwezayî de, jinê çi jiyan kiriye me nedizanî. Piştî wê jî hemû berhem û serboriyên wê, di nava civakê de zindî mane û her ragihandineke nifşên nû çêbûye. Tê wê maneyê ku wateya dîroka bi peyv jî heye. Di vê mêzekirinê de jî rastî dîtin û cewherê civak û jiyanê dîtin pêş dikeve.

Li ser van esasan, Serokatî dîroka jin ku hatiye veşartin û nehatiye nivîsandin, di van çîrokan de derdixe holê. Di nava van peyvan de Serokatî dîroka ku hatiye berovajîkirin dibîne. Vê derdixe holê û dibêje dîroka heyî rastî û cewhera jinê nenivisandiye û dernexistiye holê. Derketineke herî mîsoger jî Serokatî di vir de datîne holê. Dema ku em dîroka jin vekin, jixwe rista Serokatî dê baştir derkeve holê. Li ser vê esasê jî Serokatî nêrîna li dîroka jin de, nêrîna teorîk û ziha jî pûç dike. Mêzekirina zindewarî derdixe holê. Ew pir girîng e. Lewra Serokatî girêdanbûyina jin, jiyan û civakê bi hevre digire dest û zindî dibîne. Vê weke rêgezeka esasî datîne holê. Li ser vê, têkoşîna xwe pêş dixe. Dîqat bikin di hemû parazname û dahûrandinên Serokatî de, têkiliya jin û

jiyan çiqasa kûr e û çiqasa di nava hev de ye. Bi awayekî balkêş girêdanbûyina wan tehlîl dike û tîne ziman.

Li ser jin û jiyanê civakeke azad derxistina holê û bi pêşengiya tevgera jinê, dîroka civaka azad nivîsandinê, Serokatî weke perspektîfa pêşerojê datîne holê. Ev pîvan û rêgezeke esasî ye. Serokatî dibêje, **“di qirnê bîst û yekemîn de, dê rizgarî û azadiya jinê bi ser bikeve û wê ev qirn bibe qirna azadiya jinê**”. Wisa pênase dike. Weke me li jor jî da diyarkirin, berhemên wê jî pêşketina civakê ya heya roja îro digire dest. Yanî wisa diyar dibe ku PKK ji cihekî qut derneketiye holê. Rast e, ji aliyê fermî ve tevgera PKK û tevgera jin piştî salên heftî pêş ketine. Lê zindewarî û bingeha ku PKK li ser ava bûye û xwe re weke mîras dibîne, ew tiştên ku me gotin in. Ji bo wê em dîroka jinê jî wisa digirin dest.

Ji aliyê kronolojiyê ve, em jî dîroka xwe bi avabûna PKK ve didin destpêkirin, lê aliyê zêhniyet ve em demdirêj digirin dest. Nirxên civaka azad ku derketine holê ji xwe re mîras digirin û xwe berdewamê wê dibînin. Wekî din, bi parçe dibe. Me nêrîna bi parçe jî red kir. Mêzekirina Serokatî ya dîrokê ne parçe ye. Serokatî dîroka modernîteya kapîtalîst jî wisa digire dest. Dibêje rast e, çarsid sale ku derketiye holê, lê bingeha wê heya şaristaniyê û Sûmeran diçe. Di vir de jî nêrîna Serokatî û ya sosyalîstên din cuda dibe, ji nêrîna kapîtalîzmê cuda dibe.

Di nêrîna kapîtalîstan de rasterast mêzekirin heye, vê nêrînê li ser femînîstan jî bandor kiriye. Dema ku dîroka jinê pênase dikin, xwe ji zêhniyeta rasterast mezikirinê qut nakin. Ji bo wê jî gelekên wan, nirxên ku ji civaka xwezayî tên, pir zêde weke mîrasê xwe nagirin dest. Wan nirxan weke mîrasê dîroka şaristaniyê digirin dest. Dîroka xwe ji qirnê heyşdeh û nozdeh şûn ve digirin dest. Rast e, derketina wan wê demê ye, lê xwe ji dîrokê qut digirin dest. Ew nêrîna ku dîrokê paşverû dibîne ye. Dibêjin dîrok paş ve maye, mirov nikare vegere pişta xwe.

Serokatî vê mêzekirinê şaş dibîne. Serokatî got, “**dîrok zindî ye, kes nikare bikûje, her tim tê jiyankirin**”. Ji bo vê yekê jî, niha ji gelekan re ev weke nakokî tê. Serokatî dibêje “em ê nirxên civaka xwezayî zindî bikin”. Lê ew nêrîna pêşve çûna rastekî (düz ilerlemeci) bandora xwe li ser me jî kiriye. Li ser gelek hevalan bandora wê nêrîna şaş heye. Tiştên ku deh hezar sal berê hatine jiyankirin, em îro jî dikarin jiyan bikin. Ger em bi vê nêrînê li dîrokê binêrin, em dikarin civakê jî biguherin. An na em wisa mêze nekin, jixwe gelek kes jê bawer nakin, dibêjin dê çawa çêbibe? Ji bo vê jî mane nadin nêrîna nû ku Serokatî ji bo dîrokê pênase

kiriye. Lewra di ew nêzikbûna mane nedayinê de dîrok şûn ve dîtin heye. Dibêje her pêş ve diçe û nêrîna pêşve çûna rastekî (düz ilerleme-ci)t mêzekirin jî ji vir derdikeve. Ger em wisa binêrin, di dîrokê de qedera ku ji bo jinê hatiye nivisîn êdî nayê guhertin. Xala ku Serokatî datîne holê û dixwaza tê de guhertin çêbike, ev e. Dîrok girtina dest û tê de guhertin çêkirin e.

Mesela di nava civakê de kesên ku bi civakê re mijûl dibin jî, nakokiyan jiyan dikin. Lewra nêrîna xwe naguherînin. Nêrîna ku Serokatî datîne holê fêm nakin, ji bo vê jî nakokiyan jiyan dikin. Em bi xwe jî gelek caran bi nîqaşên wisa re rû bi rû dimînin. Di vir de ferq û cudabûna xwe em datînin holê. Em dîroka xwe tênê bi tevgerên femînîst nagirin dest, an jî em bi vê dawiyê ve nagirin dest. Me nêrîna xwe ya dîrokê guhert, ew nêrîna ku berê di serê me de rûniştibû, hêdî bi hêdî em parçe dikin. Rastiya ku Serokatî datîne holê, nêrîna me ya dîrokê jî diguherîne. Di serê me de nêrîneke dîrokê çêbûbû, me dîroka xwe hin agahiyên kronolojîk digirt û wisa dihatin. Lê Serokatî tam dijberê ve dike. Çiqes jiyankirin û serborî hebin, çi nivîskî çi neniviskî hemûyan digire dest û şîrove dike.

Ji bo dîroka jinê, em ê di pêşerojê de jî bi hinek mijaran re rû bi rû bimînin. Lewra weke tevgera giştî û tevgera jinê, hêza me û têkoşîna me diyar e, dibe ku di pêşerojê de em ji ber ve bi gelek derdoran re bikevin nav nakokiyan jî. Lê em nêrîna xwe ya li dîrokê li ser wêe esasa sererastkirinê didin çêkirin. An na em ê bibêjin,  jixwe dîroka jinê ji wir dest pê dike û heya roja me ya îro tê. Mêzekirina Rojava ya li dîroka jinê wisa ye. Lê em wisa qebûl nakin. Em dibêjin hûn jî parçeyekî dîrokê ne, lewra her tiştê ku tê jiyankirin dibe parçeyekî dîrokê, em qut nagirin dest. Lê têkoşîna azadiya jinê, sekin û hebûna jinê bi we dest pê nekiriye. Bi me re jî dest pê nekiriye.

Me jî berê digot, her tiştî bi me dest pê kiriye, lê Serokatî vê nêzikbûnê qebûl nake. Ew nêrîna dîrokê ya qlasîk e. Ji bo wê em jî êdî her tiştî bi xwe ve nadin destpêkirin; beriya me jî dîrok hebûye, civak hebûye, têkoşîn hebûye, divê em pênaseya vê rast bikin. Di van tiştên ku hatine jiyankirin de, weke kevneşopî em ê çi bigirin dest, divê em nêrîneke wisa derxin holê. Li ser vê esasê jî, em dikarin bibêjin weke tevgera jinê, me hê jî xwe negihandiye pênaseya ku Serokatî tehlîl dike. Li gorî nêrîna nû ya dîrokê; dîrok ji avabûna civakê ve, ji civaka xwezayî ve girtina dest û li ser wê tehlîlkirin, şîrove kirin û li gorî wê rêxistin û

înşakirinê de em jî hê di serî de ne. Peywireke jineolojyê jî ev e. Lê divê dema ku ew tişt got, bingeha wê û kîte kîteyên wê derxe holê. Danehevên (birikim) ku ew sî salin derketine holê de, hem di nêrîna dîroka giştî, hem jî dîroka Kurdistan û PKK'ê de, nerînek derketiye holê û em li ser dimeşin.

Rojeva waneya me jî dê li ser van esasan be. Em vegotineke ku dîroka ji gerdûn û cîhanê dest pê dike û heya roja me ya îro tê nakin. Jixwe di waneya zayendperestiya civakî de, nêrîna zayendperestî li hemberî dîrokê çi ye û di kîjan demê de çawa şêwe digire, tê ziman. Lê vegotina wê ya kronolojîk nayê kirin, çi berxwedanî û lehengî çêbûne nayê ziman.

Her wiha di gelek daneyên (veri) dîrokê de, ji bo jinê tiştek tune. Lewra ji aliyê jinê ve nêrîna dîrokê tune. Em ji nû ve li ser her bûyereke disekinin û lêkolîn dikin. Bi taybetî li ew erdnîgariya ku weke cihê destpêka civakbûnê tê pênasekirin, yanî Kurdistan û Mezepotamyayê, mirov ked û hewldanên jinê pir dibîne. Dema ku em wisa dibêjin, heval dibêjin, hevalên jin hemû dîrokê bi jinê didin destpêkirin; wisa nîne, em dixwazin bal bikişînin ser rastiyeke. Dema mirov bal dîkşîne ser rastiyeke, nê wê maneyê ku mirov rastiyên din ji nedîtî ve tê. Lê em bal dikişînin ser rastiyek ku qet nehatiye dîtin û derneketiye holê.

Divê ew rastî xwe bi nivîs jî bike. Heya niha li ser erdnigariya Kurdistanê berhemên derketine holê de, mirov rist û mohra jinê tê de dibîne. Serokatî di paraznamayan de vê berfireh digire dest. Divê ew jî ji ked û hewldanên jinê qut neyê dest girtin. Divê mirov nebêje aîdî vê civakê ye û xilas. Divê mirov wisa mêze neke. Mirov dikare dîroka jinê weke destpêka avabûna civakê bigire dest.

## LI KURDISTANÊ KEVNEŞOPIYA BERXWEDÊR YA JINÊ

Bi taybetî li Kurdistanê, nêrîneke ku dişibe ya jinê heye. Pir ne dûrî nêrîna jinê ye, civaka Kurdistanê jî wisa hatiye mêzekirin. Hatiye parçekirin, hatiye windakirin, ser hatiye girtin, rûxmî ku berxwedana Kurd ew qes mezin bûye jî, hêzên deshilatdar li hemberî civaka Kurdistanê nêrîneke wisa dane diyarkirin. Hatiye talankirin, navê wê hatiye qedexe kirin û hatiye dagirkirin.

Bi taybetî di nava vê rewşê de, jinên Kurd rewşeke cudatir jiyan kiriye, divê em vê hinekî din jî pênase bikin. Di paraznamayan de Serokatî jî pênaseyeke kûr datîne holê. Mijara ku em esas bigirin û vegotina wê bikin, yek ew e. Wisa bi merhele merhele girtina dest de, hin sekn û berxwedanên mezin hene, mirov li ser van vegotina xwe bide kirin baştir e. Bi taybetî ji bo dîroka jinê jî mirov nêrîneke wisa diyar bike dê baş bibe.

### Li Hemberî Pergala Fîravûntiyê Berxwedêrek

Di nêrîna dîroka heyî de, Serokatî her tim nêrîneke nû datîne pêşiya me. Ji bo ku em nêrîna xwe ya dîrokê rast û xurt bikin, Serokatî pir li ser hinek mijaran disekine. Yek jî wan, sekna Nefertîtî ye. Heya van salên dawî me Nefertîtî nebihîstibû, me Nefertarî bihîstîbû, lê me Nefertîtî nebihîstibû. Di hevdîtinan de jî, Serokatî P… dişibîne Nefertîtî. Piştî wê ket rojeva me, ji bo ku em bizanibin kî ye, lêgerînên me çêbûn. Bi vê yekê Serokatî dixwaze nêrîna me kûr bike, da ku nêrîna me rojane nemîne.

Nefertîtî bi eslê xwe jineke Kurd e, BZ 1300'î de jiyan kiriye. Serokatî bi diyaloga P… vê mijarê pir nîqaş dike, P… jî anî xist rojeve me. Wê jî nedizanî, meraq kiribû û çûbû pirtûkên wê anîbûn. Peykerê wê li Berlînê ye, arkeologên Alman, tên lê digerin û dibin. Ew peyker hê jî xirab nebûye, çawa hatiye çêkirin hê jî wisa ye. Ew qesa girîng û pîroz dîtine ku wisa xweşik çêkirine.

Dibêjin ew jin bi eslê xwe Kurd e, Mîtanî ye. BZ 1379'an de bi qralê Misirê re dizewice. Ew dem hê berî Ramses wan e. Di vê demê de jineke wisa zîrek û zekî ye. Xwedî vîna jinê ye, vîna jinê her diparêze. Li Misirê li gorî pîvanên Fîravûnan, qral û qralîçe tu caran weke hev nayê dîtin. Lê cudabûna ku Nefertîtî datîne holê, di deshilatdariyê de sekneke wekhev dixwaze, şertekê datîne. Divê qral ne li pêşiya qralîçê be,

divê li gel hev bin. Di tabletên ku hatine çêkirin de jî li gel hev disekinin, yek li pêş yek li paş nîne. Di vê demê de jin naçin îbadetên komî, yanî cemeatên olî. Lê Nefertîtî bi qral re diçe, guhertineke wisa jî dide çêkirin. Ya herî girîng jî qral û Nefertîtî her du bi hev re li dijî rahîban disekinin.

Jixwe guhertin piştî wê demê tên çêkirin. Heya wê demê jî pênaseya xwedê, di kesayeta rahîb de tê dîtin. Lê, têkoşîna Nefertîtî vê yekê dide guhertin. Jixwe wê demê, ji cihê ku zêhniyeta rahîban hakîm e derdikevin û diçin bajarekî din ji xwe re çêdikin. Qanûnên ku dixwazin li vî bajarî datînin holê û jiyanî dikin. Ji ber vê yekê jî rahîbên wê demê li hemberî Nefertîtî di nava rikeke mezin de ne. Jixwe Nefertîtî hatiye kuştin, lê mirina wê jî hê nediyar e. Tam derneketiye holê. Hinek dibêjin, rahîban kuştiye. Komployek lê hatiye çêkirin. Lewra di pergala rahîban de parçebûn daye çêkirin. Yanî di sekinandina xwe de jî jineke wisa zîrek û xurt e.

Piştî qral dimire jî, Nefertîtî bîst salan (di navbera salên BZ 1379-62'an de) li ser rêvebiriyê disekine. Li ew bajarê ku daye avakirin pergala xwe dide meşindin û wê herêmê hemûyê bandor dike. Bîst salan li ser vê herêmê hikum dike. Agahiyên di vê derheqê de pir in, lê bi kurtasî mirov dikare van tiştan bibêje.

Li hemberî zêhniyeta zayendperestî ya wê demê têkoşînek daye, guhertinek daye çêkirin. Gelo em niha dikarin hewldanên Nefertîtî yên wê demê ji nedîtî ve werin û em dîrokê ji xwe bidin destpêkirin? Ji ber wê Serokatî naxwaze dîrokê qut bigire dest. Têkoşîna ku jinê daye û berhemên ku derxistine holê, Serokatî nîşanî me dide. Demekê tiştên ku di dîroka nenivîskî de jî gelek daneyan derdixin holê. Lewra tişt dane guhertin û dane avakirin.  Jixwe di pêşengtiya Nefertîtî de em behsa guhertina pergalekê dikin. An jî di vê demê li dijî pergala deshilatdarî têkoşînek heye. Ji bo me jî ew mîrasa têkoşîna azadiyê ye. Her çiqes 3500 sal berê hatibe jiyankirin jî, em weke têkoşîna îro zindî digirin dest. An na di nêzikbûna me ya dîrokê de jî guhertinek nayê çêkirin.

Tabî mijara Nefertîtî hê jî, lêkolîn dixwaze. Hê tiştên nû derdikevin holê. Tiştê ku mirov di şexsê Nefertîtî de di vê demê de fêm bike. Di vir de rista jina Kurd heye. Serokatî bal dikişîne ser vê. Ji bo vê jî dibêje Nefertîtî Kurd e. Di çavkaniyê din de jî gelek lêkolîner li ser Nefertîtî, lêkolîn dikin. bi taybetî li ser peyker û mûmyaya wê lêkolîn dikin û encaman derdixin holê.

Hinek dibêjin jineke pir xirab bûye. Fermane qetlîaman daye, ji bo qewmê xwe çavtarî bûye. Xwîn daye rijandin. Nêrîneke wisa heye. Lê nerîneke din ku Serokatî tevlê dibe jî, dibêje jineke têkoşer û civakparêz bûye. Li ser van her du nêrînan jî nivîs hatine nivîsandin. Ger bê bîra hevalan, dema ku Serokatî P…dişibîne Nefertîtî, P… dibêje Serokê min, ez ne jineke weke Nefertîtî bi hirs im. Serokatî jî dibêje ne wisa ye. Ji vir jî derdikeve ku, divê mirov dîroka nivîskî pir esas negire. Muhtemelen berovajîkirineke wisa li ser vê mijarê jî hatiye çêkirin. Tabî hê tê lêkolînkirin. Lê rista ku di vir de lîstiye girîng e, Serokatî bal dikişîne ser vê ristê. Ji bo ku pergal bê guhertin, têkoşîn dide. Êdî şêwazên wê çi ne, nêrînên cuda di vê derheqê de derdikevin holê. Mirov dikare li ser van jî bisekine. Lê diyare ku karekterek ku ji bo azadiyê têkoşîn dike ye. Divê mirov vê bibîne.

**Di Kevneşopiya Eşîrtiyê De Rista Jina Kurd**

Di dîroka Kurdistanê ya nêz de jî, ji destpêkê heya niha çanda eşîrtî û qewmtiyê heye. Çanda eşirtiyê di Kurdistanê de xwedî dîrokeke dirêj e. Heya roja îro jî tê. Dibe ku weke dîroka fermî, em dibêjin ji feodaltiyê destpê dike, lê em wisa jî bigirin dest ne dîrokeke kevn e. Nêzikatiya me ya eşîrtiyê berê çawa bû? Me dîrekt red dikir. Ji bo vê di vê çandê de, tiştên erênî ku bûne malê dîrokê jî me pir nedidîtin. Me nas nedikir û bi giştî redkirin hebû. Ew bi giştî redkirina dîrokê ye.

Di dema şikestina cinsî ya duyemîn de jî, herî zêde rista mêr derketiye pêş û mêr hatiye naskirin. Wisa bûye dîrok û tiştên nehatine nivîsandin jî, wisa heya roja me hatine. Rista jinê nehatiye dîtin. Ne ku rista jinê tune; di jiyanê de nirxên ku jin diafrîne diyar in, li hemberî van nirxan rêzgirtinek jî heye, lê bêlê ew herî zêde li mêr hatiye barkirin. Ketiye hefizeya mêr ya dîrokê.

Dema ku Serokatî çanda eşîrtiyê jî, ji nû ve pênase kir, li dijî zêhniyeta dewletparêz û deshilatdar weke seknekê girt dest. Ji bo vê xist nav hêmanên (unsur) moderniteya demokratîk. Yanî çanda eşîrtiyê di cewherê xwe de wisa erênî ye. Pişt re dikeve bin bandora axa û şêxan. Lê di cewhera xwe de bi pergala dewletê re nebûye yek. Berê me bi giştî red dikir, lê piştî ku Serokatî wisa got, niha em hemû li pêy eşîrên xwe ketine. Berê nêzikbûna rêl sosyalîzmê û pozîtîvîzmê li ser me hebû, ji ber wê me wisa dinirxand. Aslinada axa, mîr, şêx û began xwestine ew çanda eşîrtiyê ku li hemberî deshilatdariyê berxwedanek e, bi per-

galê re bikin yek. Lê çanda eşîrtiyê li dijberî vê derketiye. Tiştê ku Serokatî rexne dike, ew kiryarên axa û began e. Lê weke çanda eşîran, Serokatî weke nirxeke civakê digire dest.

Bi rastî ger tu axa, mîr û began ji nav derbixî, ya ku çanda eşîrtiyê li ser piyan girtiye jin e. Ew nêrîneke bi nepixandî. Nêzikbûna axa û mîran, di nava çanda eşîrê de xirabiyek e, ger tu vê xirabiyê ji nav derxê, bi rastî jî rista jinan pir e. Mesela niha jî ew çand, dûrî civaka me nîne. Ji ber wê gihêştiye roja me ya îro. Mesela di mal de, di nava eşîrê de risteke jinê heye. Ger di navbera du eşîran de şer çêbe, jin dikeve navberê û rista aşîtî û avakeriyê dilîze. Li Kurdistanê mirov dikare sedan mînakên wisa bide.

Me bav û kalikên xwe guhdar dikirin û ji me re weke çîrok dihat, lewra bandora modernîteyê li ser me hebû. Lê piştî ku dahûrandinên Serokatiyê çêbûn û mirov niha lê mêze dike, yê ku di nava xwe de eşîrtî li ser piyan girtiye jin e. Lewra jin di hûndirê xwe de maye û ew çand her parastiye. Mirov dikare gelek mînakên vê di Kurdistanê de bide, lewra ew çand li Kurdistanê pir bi bandor e. Dema Kurdistan yek parçe bû jî, bi bandor bû. Dema ku Kurdistan çar parçeye jî bi bandor e. Ji bo vê Serokatî di modernîteya demokratîk de, vê red nake. Divê ew çand xwe zindî bihêle. Divê serdestiya axa, beg, mîr, mele û şêxan li ser bê rakirin; lê ew çand xwe li ser piyan bigire. Dîsa xwe li ser piya girtin û pêş xistina vê çandê de pêşengtiyê jin dike.

Mesela em carina dibêjin, di malê de dayika me wisa otorîter e, wisa pêşengtî dike. Ew rast e, ew kevneşopiya vê çandê ye. Li derve her çiqes pergala deshilatdar xwe hakîm kiribe jî, di hundir de jinê ew cewhera xwe parastiye. Di mal de her çiqes biçûk bê dîtin jî, otorîteya wê ya xwezayî heye. Ew sekikandin hê jî di Kurdistanê de heye. Ew ji me re du avantajan derdixe holê. Serokatî ew qes li ser vê disekine; ger em di zêhniyet de guhertinê di xwe de bidin çêkirin, bi rastî jî bingeha çanda me kûr e. Em zû dikarin înşa bikin. Ew jî dikeve mijara zêhniyetê. Di erdnigariya Kurdistanê de di pêşengtiya jinê de civak dayina avakirin, ew qesa zehmet nîne. Lewra jin, li Kurdistanê ew qes nehatiye tunekirin û helandin. Her çiqes rastî tûndî û zehmetiyan hatibe jî, êşa xwe ji xwe re kiriye hêza avakirinê û cewherê xwe her zindî hiştiye.

Niha xaleke ku Serokatî balê dikişîna ser û divê em tê de guhertin bikin jî ew e. Yanî em van tiştan weke bingeh digirin dest, em bê kok nînin. Ew hemû mîrasên me ne. Em vê ji xwe re weke model jî digirin,

nûjen dikin. Weke berê wisa bi awayekî çort em red nakin. Tabî di nava civakê de me çiqes ew yek pêk aniye, ew mijara nîqaşê ye. Em diçin malbatekê, em dayikeke çawa mêze dikin, nêrîna me çi ye? Di vir de kêmasiyên me pir in. Ji vî çandî bawerî anîn û li gorî vê di nêzikbûna civakê de kêmasiyên me pir in. Hem di milê zêhniyet de, hem jî ji milê nêzikbûnê ve kêmasiyên me hene. Weke me daye diyar kirin, ger îro li hemberî ew qes siyasetên bişavtin û helandinê, civaka Kurd xwe parastibe û nehelîbe; sedemeke esasî jî rista jinê ya di nava malbatê de ye. Ew jî bandorkeriya jinê dide nîşandan.

Dewlet û pergal li Kurdistanê bi riya mêr jî, pir êrîşî vê çandê kiriye. Mêr çiqes di zanebûna vê de ne, ew mijareke cuda ye. Mêrê ku ketiye bin bandora modernîteya kapîtalîst, êdî vê jinê ku li cewhera xwe xwedî derdikeve qebûl nake, biçûk dibîne. Red dike, pê re dernekave derve, pê re neaxife. Li Ewropa û Kurdistan jî wisa ye. Bi rastî jî di binê wê de êrîşa pergala dagirker ya ku di şexsê mêr de pêş dikeve heye. Ew derveyî niyetê ye, lê realîteya heye. Jin biçûk dîtin ji vir tê. Jin tenê weke meta bi kar anîn, êrîşên pergala zayendperest in, êrîşên pergala netewperest in. Tabî ew weke sekneke li holê ye. Lê wisa ew sekin zivirandina hêz, civak guhertin û pêşengtî kirinê de, kêm e. Hê ne di wê astê de ye. Tenê xwe parastiye. An jî ji bo ku nemire, ber xwe daye. Tenê ew e. Jixwe ew sekin bi civak bikira, civaka me ne di vî halî de bû. Ji bo vê Serokatî dixwaze vê ji nû ve zindî bike. Wate wê ew e. An na em weke hêzeke mezin pênase bikin, dê bibe nepixandin. Lê ji bo ku nemire ber xwe daye. Ji bo ku ew hebûna xwe û pêşengtiya xwe bi parêze ber xwe daye. Pêwîst e, mirov vê wisa pênase bike û wisa bibîne.

Êrîşên dewletên dagirker li ser Kurdistanê, her çiqes Kurdistanê parçe dikin jî, ew çand xwe diparêze. Weke cih em îro behsa çar parçeyan dikin, lê di cewher de yek e, çanda Kurdînî ye. Divê ew nêzikbûna weke parçe em mêze dikin jî xilas bikin.

**Di Sedsala 19'emîn û 20'emîn De Jinên Kurd Ku Damgaya Xwe Dîrokê Xistine**

Ya rast em hê nû bi nû hebûna Kurdan digerin. Serokatî ji bo me, ji paradîgmaya nû re, ew qes dûr ve hebûna me derdixe holê. Îşte di nava ew dîroka dûr de, em hê nû bi nû jinê derdixin holê. Tenê me Nefertîtî girti dest. Em ê zêdetir di dîroka nêz de hin qarekteran bigirin dest. Wisa be dê baş bibe. Gelek jinên ku mohra xwe ji dîrokê dixin hene.

Hinek ji van jinan; Xanê Zadîne ye, Sultana Xanzade ye, halîme Xanim e, Adîle Xanim e, Qedemxêr e, Zerîfe ye, Leyla Qasim e, Besê ye, Rindexan e, Gulîzar Xanim e, Mîne Xan e. Navê wan hê jî zêde ne, lê van yên sereke ku di dema xwe de û di nava civaka xwe de bandoreke zêde kirine. Bi taybetî di sedsalên derbasbûyî de mirov dikare van navan bigire dest.

Her yek ji cihekî cuda ye, lê nêzikbûnên wan yên hevpar hene, ez di serî de wan bibêjim. Li dijî dagirkeriyê ber xwe didin, berxwedaneke bêhempa ye. Li dijî dagirkeriyên derve û dewletên ku Kurdistan dagirkirine berxwedaneke bêhempa nîşan didin. Xala hevpar ew e. Gelekên wan di van berxwedanan de tên kuştin, an jî xwe dikûjin. Dawiya hemûyan wisa ye. Berdêleke wisa didin. Xaleke din ya hevpar jî, li dijî dagirkeriyê berxwe didin, lê aştîxwez in. Di nava eşîr û civakê de her aştî dixwazin.

Xaleke din ya hevpar jî, deshilatdariya mêr ku li ser jinê, li hemû Kurdistanê hatiye serwerkirin, bi sekna xwe red dikin. Tenê ne di gotinê de, bi têkoşîna xwe jî vê vala derdixin. Wisa vala derdixin ku mêrê herî teng difikire jî, baweriya xwe pê tîne û pîroz dibîne. Bi têkoşîn û hebûna jin, vê nêzikbûna deshilatdar jî vala derdixin. Xalên wan yên hevpar mirov dikare wisa pênase bike. Yanî li dijî deshilatdariya mêr serî radikin. Dibêjin tenê mêr nikare berxwedanê bike, jin jî dikare. Di kesayeta xwe de jî wî pêk tîne. Ji bo wê jî, di vê demê her çiqes wan bi xwe ew wisa pênase nekiribe jî; mirov bi awayekî rehet dikare, sekin û tevgera wan, wisa pênase bike.

Li Kurdistanê di heman demê de li dijî deshilatdariya mêr in jî. Li Kurdistanê dixwazin pêşengtî û rêvebirtî bikin. Yanî cihê wan, demên wan û derketinên wan cudabin jî, xalên wan yên hevbaş jî hene.

Em wisa yek bi yek biçin dibe ku baştir bibe, carina em dikevin kronolojiyê jî, lê ew jî baş e. Divê mirov wê jî bizanibe. Bi taybetî ji bo jinê, mirov çiqes lêkolîn bike û hafizayê dagire baştir e. Ew jî pir kêm in. Em di pêvajoya avakirina pergala jin de û nivisîna dîroka jin de ne, li gorî wê agahiyên me pir kêm in.

**-Xanê Zadîne**

Xana Zadîne, ji Rojhilatê Kurdistanê ye. Li vir Keleha Dimdimê heye, di dema Şah Abas de ye. Ew kêleh di destê Kurdan de ye. Şah êrîşî vê kelehê dike û dagir dike. Di vir de bi dehan jinan dikûje, lê hinek jin jî

ji bo ku nekevin destê dijmin, xwe bi xwe dikûjin. Bi rastî jî dişibe bûyera îro ku, li Şengalê hatiye çêkirin. Dibe ku dîrok ew qes derbas dibe, lê rastiya ku li ser gelê Kurd tê meşandin yek e.

Piştî ku keleh tê dagirkirin, Xanê Zadîne vedigere û şervanên ku şer bikin kom dike, pêşengtiya wan dike. Artêşeke mezin çêdike. Jixwe jî serokeşîr re zewiciye, lê ji ber ku serokeşîr dimire, pêşengtiya eşîrê jî ew dike. Di vê demê de dixwaze tola Keleha Dimdimê bigire. Ji ber vê di nava eşîrê de atmosfera şer û têkoşînê pêş dixe, gelek şervanan kom dike û êrişî kelehê dike. Dema ku êrîş dike, kelehê ji destê Şah digire. Keleh dikeve bin serweriya eşîra wê. Demeke dirêj hem di vê kelehê de pêşengtiyê dike, hem jî tola Keleha Dimdimê distîne.

Xwe jî dibêje, ew tola wan jinên ku di vê kelehê de hatin kuştin û rastî destdirêjiyê hatine ye. Dibêje ez heyfa vê distînim. Di nava civakê de ew jin pîroz tê dîtin. Dibe ku me li ser vê pir lêkolîn nekiribe û di destê me de pir agahî tunebin jî, lê heya niha jî di nava civakê de cihê wê heye, lewra mejiyek daye avakirin. Serokatî dibêje ya, mejiyê civakî. Mejiyekî wisa avakiriye. Em hemû hê nû navê wê dibîzin, lê dema ku di wê demê de, li hemberî dagirkeriyê mirov berxwedan û têkoşîna wê dibîne, weke jineke zanist, têkoşer, şerker û berxwêder derdikeve pêşiya me. Tabî divê mirov hewl bide, taybetmendiyên wan zêdetir derxe holê.

**-Sultana Xanzade**

Sultana Xanzade, di navbera 1623 û 1640'î de rêvebertî û pêşengtî kiriye. Bi xwe Soran e. Bandora wê hem li ser herême Başur, hem jî Rojhilat heye. Bi giranî li dijî pergala dagirkeriyê têkoşîn daye meşandin. Nêzî panzdeh salan hikum kiriye. Pêşengê eşîrê ye. Dema ku li wê herêmê hikum kiriye, li wir welatparêzî û Kurdinî pir pêş ketiye. Bandora pêşengtiya wê li ser wê herêmê hemûyê çêbûye.

**-Halîme Xanim**

Ji bo Halîme Xanim; bi eslê xwe ji Colemergê ye. Derketina wê di 1842'yan de ye. Di wê demê de li Kurdistana Bakur, cihên weke Botan û cihên din serhildanên weke ya Bedîrxaniyan hene. Jixwe dema mîrtiyê ye. Halîme Xanim, ji Elbaxê ye. Niha weke herêma Colemerg û Wanê derbas dibe, lê wê demê hemû di bin navê Elbakê de derbas dibe.

Keleha Başkalê wê demê risteke mezin dîlîze. Di wir de pêşengtiyeke xurt tê kirin. Ji aliyê dagirkerên wê demê Osmaniyan ve êrîşên pir dijwar tên kirin, ji bo ku xwîn neyê rijandin, kelehê radestî wan dike. Lê bi şerta ku eşîra wê di cihê xwe de bimîne. Bi vî şartî îdareya kelehê radestî Osmaniyan dike. Lê rista wê di vir de parastina çand û gelê herême ye.

**-Adîle Xan**

Adîle Xan, bi xwe keça mîrê Baban e. Wê jî di sala 1895'an de jiyan kiriye. Jineke xurt bûye û li herêma Erdelan pêşengtî kiriye. Eşîra Baban niha jî hê heye. Adîle Xan keça vê eşîrê bûye. Lê weke bûk diçe nava eşîra Caf. Serokeşîrê Cafan re dizewice. Agahiyên ku hene wisa didin diyar kirin. Piştî ku diçe nava eşîra Cafan, êdî piştî salên 1900'î ye, mêrê wê dimire. Weke tê zanîn, di nava eşîra Cafan de konfederasyonên eşîran hene. Zêdetirî pêncî eşîr di nav vê eşîrê de hene.

Piştî ku serokeşîr tê kuştin, Adile Xan derbasî ser eşîrê dibe û nêzikî bîst salan ew eşîrê bi rê ve dibe. Hem li Kurdistana Rojhilat, hem jî Kurdistana Başur bandoreke mezin kiriye. Tenê ji milê şer û pêşengtiyê de ne, ji milê çandiniyê ve jî risteke mezin lîstiye û li Kurdistanê mohra xwe dîrokê xistiye. Di dema wê de çand û wêjeya Kurdî de pêşketineke mezin çêbûye. Vê yekê li ser parçeyên din yên Kurdistanê jî bandor kiriye. Di pêşengtiya wê de hesteke aştîxwez pêş ketiye. Rêveberiyeke baş kiriye. Bi taybetî li cihê ku lê rêveberiyê dike bandoreke mezin kiriye.

Navenda rêveberiya wê jî Helepçe ye. Helepçeya ku ji aliyê Sadam ve hatiye bombe baran kirin. Bi rastî cihên ku di dîrokê de risteke lîstine, dagirkeran qatlîamên mezin li ser kirine. Her cihê ku berxwedana Kurdînî lê hatiye kirin, komkûjî hatine çêkirin. wî çandî bi giştî holê rakirin heye. Di vê demê de di pêşengtiya Adîle Xan de, li Helepçe û derdorên wê berxwedaneke mezin hatiye kirin.

**-Qedemxêr**

Qedemxêr jî, ji Rojhilatê Kurdistanê ye. Birayê wê serokeşîr e, lê dema ku birayê wê dimire, ew derbasî cihê birayê xwe dibe. Li dijî Şah têkoşîn dike û dîl dikeve destê dijmin, jixwe birîndar e. Sê salan di zindanê de dimîne û berxwedaneke mezin nîşan dide. Piştî wê dimire, li gorî hin agahiyan dijmin wê dikûje, li gorî hin agahiyan jî xwe bi xwe

dikûje. Di dawiyê de di zindanê de dimire. Dema ku derbasî cihê birayê xwe dibe, li hemberî Farsan risteke mezin dîlîze.

**-Zerîfe**

Zerîfe, di 1882’yan de tê dinê. Jixwe ji herêma Dêrsîm û Sêwazê ye. Wê demê weke herême Qoçgirî derbas dibe. Piştî dewleta Tirkiye tê ava kirin, wisa bajar bi bajar tê bi nav kirin. Wê demê Dêrsîm, Sêwaz û Qoçgirî hemû herêmeke.

Elîşêr, serokeşîrek e û pêşengtiya vê herême jî dike. Zerîfe, bi Elîşêr re dizevice. Lê li gorî tê vegotin û hatiye nivisîn; dibêjin têkiliya wan ne li ser esasê hevsertiyê bûye. Zêdetir hevaltî esas digirtine. Her wiha welatparêzî esas digirtine. Van kesên din ku em behsê dikin, zêdetir di sînorên eşîrên xwe de ne, lê dibêjin perspektîfa netewî ya Elîşêr û Zerîfe hebûye. Nirxên Kurdistanê giştî digirtine dest. Dibêjin di vir de rista Zerîfe pir pêş de bûye. Jineke pir zane bûye. Mêzekirina wan de, li gorî wê demê pîvanên bîrdozî hebûne. Jixwe di gelek axaftinên wan de Kurdistan jî hebûye.

Her çiqes li herêma xwe têkoşîn meşandibin jî, dibêjin armanca têkoşîna wan de azadiya Kurdistanê jî hebûye. Di vê demê de têkiliyên wan, li ser vê esasê; ji bo ku vê netewiyetê derxin pêş, têkiliyên wan yên dîplomatîk bi Rûs û Ermeniyan re jî hebûne. Dibêjin di vir de Zerîfe xwediyê risteke girîng bûye. Di vir de bi Elîşêr re, herdûyan jî risteka pêşengtiyê dilîstine.

Têkoşîna wan di sala 1914’an de, derketiye pêş. Bi rastî jî dema şerê cîhanê yê yekemîn e. Serhildana Qoçgirî di salên 1920’an de digêhêje asta teqînê û di encamê de tê tepisandin. Her wiha di berxwedana Dêrsîmê de jî, Elîşêr û Zerîfê risteke pêşengiyê dilîzin. Êdî têkoşîna wan tê zanîn û bi nav û deng dibe. Di şexsê wan de têkoşîna azadiya Kurdistanê tê meşandin. Serhildana Qoçgirî jî xwediyê taybetmendiyeke bi vî awayî ye. Serokatî jî vê taybetmendiyê cuda digire dest. Herêm berfireh e, lê navend Qoçgirî ye. Hinek berfireh û netewî mêzekirin heye.

Zerîfe di vê demê de, li Qoçgiriyê fermandartiyê jî dike, yanî leşker e. Wêneyên wê jî hene. Wêneyekî wê yê ku şirîta brûno avêtiye milê xwe û brûno kiriye destê xwe heye. Di gelek weşanên me de jî ew wêne heye. Di wê demê de rista fermandariya artêşa serhildêran dilîze. Dibêjin jineke wêrek û pêşketiye, xwediyê taybetmendiyeke wisa ye.

Weke tê zanîn Elîşêr bi îxanetê tê kuştin. Dema ku Elîşêr tê kuştin, Zerîfe jî zilemekî Reyber dikûje.  Piştî wê Reyber bi kêrê Zerîfe jî dikûje. Di tirmêha 1937'an de tê kuştin. Ez bawerim rista îxanetê di dîroka Kurdistanê de hevalan pir girtiye dest. Bi rola îxanetê her du jî tên kuştin. Bi rastî jî ger nehatibana kuştin, dibe ku di pêşengtiya wan de, bi taybetî di pêşengitiya Zerîfê de, dê têkoşîna wan li çar parçeyên Kurdistanê jî bandoreke cuda bida çêkirin. Di qarektêrê têkoşîna wan de mirov vê dibîne. Lê tên şehîd xistin.

Lê niha herêmê û hemû Kurdistanê, ew zîrekî, werektî û pêşengiya Zerîfe tê zanîn. Niha bi sedan navê keçan kirine Zerîfe. Navê zarokên kûr Elîşêr, yên keç jî zerîfe ye. Li hemberî dagirkeriyê têkoşîna wan ew qes xurt dibe û bandora xwe heya roja me ya îro jî tê.

**-Leyla Qasim**

Leyla Qasim jî, di dîrokeke nêzik de ye. Di 1952'yan de derdikeve. Bi xwe li herêma Kerkûkê tê dinê. Lê malbata wê derbasî Baxdayê dibe. Di zanîngehê de xwendekar e. Li wir tevgera xwendekeran heye. Têkoşîna azadiya Kurd didin, Leyla Qasim jî endamê vê tevgerê ye. Jineke ku xwe zane dike ye. Lêgerînên wê yên li ser çanda Kurd û Kurdiniyê heye. Bi hevalên xwe ve dixwaze çalakiyeke bike. Dixwazin bala cîhanê bikişînin ser dagirkeriya Kurdistanê, bi taybetî dixwazin kiryarên Sadam deşîfre bikin. Ew û çar hevalên xwe bi hev re, dixwazin çalakiyeke bikin. Dixwazin balafireke birevînin, lê tam li ser nakevin û tên girtin.

Pîştî ku tên girtin jî Leyla Qasim bi sêdarê tê ciza kirin. Berî ku bê îdam kirin jî, wiha dibêje; "îro hûn Leylayekê dikûjin, lê sibê bi hezaran Leyla li dijberî dagirkerî û zilma we dê rabin." Her wiha sûrûda Ey Reqîp dixwîne. Di temenek biçûk de,  hê xwendekar e, tê îdam kirin. Gelek wêneyên wê hene. Li her çar parçeyên Kurdistanê jî bandora wê heye.

Li Kurdistanê jin pir tên qetilkirin, lê bi destê dewletê, bi awayekî fermî ya ku tê kuştin Leyla ye. Piştî wê jî hevala Şîrîn Elemhûlî ye. Di vir de mirov şêwaz û nêzikbûna qetlîamê ya dagirkeran dibîne. Li vir helwesta wê jî bi serbilindî bûye. Wisa dev ji doza xwe berdan, poşman bûyin û şûn ve gav avêtin tune ye. Ew sekna wê jî mînak e. Dijberî wê berxwedaniya xwe dide diyarkirin û di gava dawî de jî têkoşîna xwa dide. Jineke ciwan e, rista wê ya pêşeng mirov dibîne.

**-Besê**

Besê jî, di dema serhildana Seyîd Riza de ye. Jixwe hevsera wî ye. Besê, bi welatparêziya xwe tê naskirin. Jineke di erdinigarî, ax û welatê xwe hezkirinê de xwediyê hesteke herî bilind bûye. Xwediyê taybetmendiyeke wisa ye. Di serhiladana Dêrsîmê de risteke mezin dîlîze. Li dijî dagirkeriya Tirk serî rakiriye.

Di vê demê de, em Besê weke mînak digirin dest, lê bi hezaran jin, di vê demê bertekeke hişk didin raber kirin. Dîrokeke nêz e jî, lê ji bo ku dijmin li ser wahşeta xwe zû bide girtin, tiştên wisa kirin ku, haya kesî jê tune. Hê jî mirov diçe herêmê bi sedan cesetên mirovan di şikeftan de hene. Li dijî zarok, jin, mêr û hemû civakê wahşetek çawa darxistiye, lê ser girtiye. Lê niha derdikevin holê. Hê jî şahîdên zindî yên vê bûyerê hene.

Mesela dayika heval Fuat, ji van yek e. Wê demê zarok bûye. Behs dikir, bi rastî jî mirov nikare rake. Wahşeta ku dagirker di wê demê de li ser jinê dikin û rista ku jin di wir de dilîze û berxwe dide vedigot. Yanî tanixê (şahid) komkûjiyê ye. Bi xwe tanixê tiştekî bibû. Ji ber ku ber ji dijmin direve, diçin di şikeftan de vedişêrin. Hûndirê şikeftê tijî mirov bûye. Leşker hatine ber devê şikeftê, derdora şikeftê digirin. Zarokek digîre, dayika wî destê xwe dide ser devê zarok û wî difetisîne, da ku cihê her kesî neyê zanîn. Lê xeynî dayika heval Fuat kes vê nabîne. Bi vî awayî dijmin wan nabîne û nakeve şikeftê. Pişt re jinik, wî zarokî dide pişta xwe û dibe cihekî dike axê. Yanî di vê demê gelek lehengitiyên wisa ku jinê kirine hene.

Besê jî di vê demê de, di pêşengtiyê de roleke wisa dilîze. Pişt re jî xwe ji tehtan diavêje û dimire. Ji bo ku bi zindî nekeve destê dijmin, wisa dike. Li gorî ku tê gotin, bi hezaran jinan wisa kiriye. Hinek xwe ji tehtan diavêjin, hinek xwe diavêjin ava Mûnzûrê, hinek jî xwe dişewitînin. Pêşengtiya Besê jî di vir de berbiçav e.

**-Rindêxan**

Hevalan serhildana Sasonê bîstine, Rindêxan jî, di nava vê serhildanê de xwediyê risteke girîng e. Keça Mîr Elî ye, Mîr Elî jî malbata Elî Ûnis e. Ew malbat li herême Sasonê tê zanîn. Di dîrokê de malbateke ku li hemberî dagirkeriyê ber xwe dide ye û malbateke pir mezin e. Herêma Xerzanê tên nas kirin.

Dema ku êrîşên dijmin tên pêş xistin, Rindêxan, dîl dikeve destê dijmin. Dibêjin jineke pir rindik bûye û bi wêrekî û berxwedana xwe derdora xwe pir bi bandor jî kiriye. Her wiha dema ku dîl dikeve destê dijmin pir ciwan e. Dagirker dixwazin pê bîlîzin û destdirêjiyê bikin. Lê ew wiha dibêje, "di nava erdên mala bavê min de tu nikarî dest bidî min, ger tu wêrek bî min ji nava erdê mala bavê min derxe", serleşker jî dibêje, "sînorên mala bavê te kûder e?" Rindêxan dibêje, "sînor Pira Malabadî ye." Ew pir hê jî heye. Leşker jî wê dibin ser pirê û vê carê jî dibêje, "ez dixwazim cara dawî li avê binerim". Dema ku tam tê ser pirê jî xwe diavêje avê û xwe radestî dijmin nake, nahêle ku pê bilîzin. Helwesta (tavır) xwe wisa nîşan dide.

Bi rastî jî hemû jinên ku min dan diyarkirin, di stran û helbestan de pir derbas dibin. Mirov di serî de pir ferq nake, lê dema ku mirov van jinan nas dike, mirov wate dide van stranan jî. Navê Rindêxan jî di gelek kilam û stranên dengbêjan de derbas dibe. Min berê nedizanî, lê derdikeve holê ku, berxwedaneke wisa raber kiriye.

**-Gulîzar Xanim**

Ji van jinan yek jî Gulîzar Xanim e. Bi xwe ji Rojhilatê Kurdistanê ye. Ji 1920'an û vir ve ye. Endama eşîra Şikakî ye. Berî ku Komara Mahabat bê avakirin, di nava hewldanên avakirina komarê de rê dayina jinê heye. Di vê demê de Gulîzar Xanim, pêşengiya rêxistina jin ya xweser dike.

Di pêşengtiya ku Gulîzar dike de diyar dibe ku êdî jin xweser rêxistin dibe. Vîn û risteke jinê hebûye. Dibêjin jineke zane bûye, ji milê çand û huner û zanist ve de jî pêşketiye û pêşengtiyê dike. Li hemberî rejîma Îranê jî jineke têkoşîn dike ye û pêşengtiya têkoşînê dike.

**-Mîna Xan**

Piştî Gulîzar Xanim, Mîna Xan tê. Mîna Xan jî hevsera Qadi Mûhamed e. Piştî avakirina Komarê, bi awayekî fermî dibe serokê rêxistina jinê. Beriya wê Gulîzar Xanim bûye, lê pişt re Mîna Xan pêşengtiya rêxistina jin dike. Heya demekê me digot qey, di serî de Mîna Xan pêşengtî kiriye, lê ne wisa bûye. Berî wê Gulîzar Xanim hebûye. Heya vê demê, di navbera eşîr û malbatan de pêşengtiya jinê heye. Di van sînoran de rista jinê heye. Lê piştî vê mirov rastî rêxistinên jin yên xweser jî tê. Bi taybetî li Rojhilatê Kurdistanê ew yek bi awayekî fermî pêş ketiye.

Di vir de jî mirov nikare ji bandora cîhanê qut bigire dest. Weke tê zanîn piştî sedsala nozdemîn, pela sosyalîzmê bandora xwe li ser cîhanê kiriye. Di pey re jî dîsa pêla tevgerên jin û femînîst dest pê kiriye. Her çiqes van tevgeran li Rojava destpêkiribe jî, bandora wê, li hemû herêman tê dîtin. Ya rast di vê demê de, li Kurdistanê her çiqes berê jî risteke jinê hebe, mirov ji van pêlan jî qut nikare bigire dest. Di Kurdistanê de, di pêşketina tevgerên xweser yên jin de, mirov bandora van rêxistinên femînîst yên cîhanê jî dibîne. Yanî wisa sedî sed bingeha xwe ji wir nagirin, lê mirov nikare ji wê atmosferê qut bigire dest. Bi taybetî di qirnên nozdemîn û bîstemîn de tevgereke bi vî rengî li cîhanê heye. Her çiqes navenda wan Rojava (batı dünyası) be jî, li cihên din jî li hemberî kedxwariyê mirov hewldaneke mezin dikare bibîne.

Niha di Kurdistanê de me hinek nav hejmartin, bê guman tenê ew nebûn yên ku têkoşîna jin dan meşandin. Hê gelek kesên din hene. Mesela li herêma Tolhildan (Güney Batı Eyaleti) behsa Kara Fatma dikin. Dîsa li Rojhilat û Başur gelek jinên ku ji milê çand ve, ziman ve pêşengtiyê dikin hene. Me navê wan hemûyan neanî ziman. Yên ku me anîn ziman, weke remz me anîn ziman, lê bi dehan û sedan jinên berxwedêr hene. Jixwe yên ku me navên wan dan diyar kirin, remzên vê berxwedanê ne. Heya salên 1940'î mirov dikare wisa bîne ziman.

**-Remzên Evîna Bêmirin; Edûle, Xecê û Zîn**

Hinek destanên evînî ku hatine jiyîn jî hene. Mesela em bi piranî destana Derwêşê Evdî û Edûlê digirin dest. Evîna Siyabend û Xecê heye. Her wiha çîroka Mem û zîn jî heye.

Di vir de jî ji milê evîn û hezkirinê ve jinê rista xwe lîstiye. Jinan evîna xwe û hezkirina xwe mezin kiriye. Bi taybetî di kesayeta Edûlê de, mirov dikare vê bibîne. Pîvanên evîna xwe, bi rizgariya welatê xwe ve digire dest. Li ser destana Derwêş û Edûlê gelek destan û stran jî hene. Li ser evîn û eşqeke rast mînakeke baş e, li ser civakê jî bandoreke mezin kiriye. Di vê evînê de, xilasiya welat heye, xilasiya civakê heye, hezkirineke rast heye. Her wiha di destanên din yên evînê de jî, ew rastiya civakî tê dîtin.

Bi pelçiqandin û tepîsînê, îro modernîteya kapîtalîst şêwazê evîn û eşqê qirêj kiriye. Xistiye amûreke mezaxtinê (tûketîm). Lê bi taybetî di dîroka Kurdistanê de, evîneke rast bi xwe re encameke çawa derxistiye holê, ev destan didin diyar kirin. Ger li ser van destanan baş bê seki-

nandin, mirov rastiya Kurd ya demekê jî dikare di nav de bibîne. Serokatî jî dahûrandinên mezin li ser van dike. Derveyî van yên ku heval dizanin jî dikarin bibêjin.

**HEVAL E…:** Tiştekî girîng dibînim. We got Leyla Qasim li çar parçeyên Kurdistanê, xwedî lê derdikevin. Lê Başur ne wisa ye. Hinek derdor dixwazin şopa wê jî holê rakin, lewra li hemberî wan jî helwestek e. Heta dibêjin hinekan xwestiye nameyên wê ji holê rakin, winda bikin.

**H. RÛKEN:** Rast e. Min jî got weke xwendekarên Kurd xwe rêxistin dikin. Tu hêzên Başur ve girêdayî nînin. Weke rêxistina xwendekarên Kurd, xwe pênase dikin. Her wiha cudabûna xwe jî, ji hêzên hevkar û dewletparêz yên Kurd datînin holê. Leyla Qasim jî pêşenga vê rêxistinê ye. Jixwe di 1974'an de rêxistina xwe ava dikin. Tiştê ku heval bal kişand ser rast e.

**HEVAL S…:** Niha gelek çirokên evînî hene, dema ku mirov bi çavê Serokatî mêze bike, welatparêzî û berxwedanî tê ber çavê mirov. Mesela çîrokek heye, li ber çiyayê Cûdî, li gundê Şax e. Ew gund, di heman demê de gundê Bedîrxan e. Niha ew gund di doleke teng de ye. Tenê aliyekî wê vekiriye. Ew dol bi heft dûvaran dorpêç kirine. Di dîrokê de keleheke din jî derbas dibe ku bi heft dûvaran hatiye parastin. Li vir hê jî bermahiyên dûvaran hene. Yek jî sirtekî wisa bilind, kelehek heye. Gundî pê re dibêjin Keleha Keçê.

Li ser vir du çîrok tên gotin; yek evînî ye, yek jî berxwedêrî ye. Ya evînî de, dibêjin ew Keleha Keçê ye, li hemberî wê jî keleheke ku bi kûnkirina tetan çêkirine heye, wê re jî dibêjin Keleha Çeko. Dibêjin dilê Çeko ketiye Keçê, lê Keç nedanê. Çeko jî gotiye, heya ku hûn Keçê nedin min, ez ê di vê kelehê de bim heya ku dimrim. Bi xwe re kelehek çêkiriye û heya ku miriye, li wir maye. Lê dema ku mirov bi mantiqê leşkerî mêze wê kelehê dike, cihekî pir stratejîk e.

Di çîroka din de jî, dibêjin mûsilman êrîşî ser wan dikin, Keç di wê kelehê de ye. Keç li wê kelehê de berxwe dide, lê herî dawî artêşa dijmin xwe digihîne kelehê û Keçê dîl digirin. Li gorî ku gundî dibêjin, Keç pir xweşikbûye û her wiha zîrek bûye. Dema ku esabe wê dîl digirin, li ser şer dikin; hemûyan gotiye ji min re ye. Lê ji ber ku di navbera esabeyan de, bûye sedema şer, gotine "divê em vê bikûjin." Dibêjin ji kelehê avêtine û kuştin e. Lê dema ku diavêjin, dibêjin ku dilopeke xwîna wê diçe ser dara zeytûnê, dilopek çûye ser dara rolê, dilopek jî çûye Çemê Nehrdoş. Ji ber vê yekê pelên van her du daran her şîn e. Ew çem

jî her şîn diherike. Bi erebî jixwe navê keçê doş e, yanî Nehrdoş tê maneya nehrê ku me doş avitê. Dibe ku agahiyên me li ser vê meseleyê kêm bin jî, lê ez dibêjim, ew mesele hêjayî lêkolînê ye.

**HEVAL A…:** Ez ê behsa Hevsexanî Naqîp bikim. Jina ku cara ewil, ji bo xwendina jinan dibistanê vedike ye. Di navbera salên 1920 û 40'î de ye. Jinbiraya Şêx Mahmûd Berzencî ye. Li gorî nêrîna min, di nava vê waneyê de cih bigire û li ser lêkolîn were kirin, dê baş bibe. Mala xwe weke dibistaneke dişûxûlîne. Jinan tîne mala xwe û wan fêrî xwendinê dike.

Halîmeya Balakatî jî heye. Di nava gundiyan de, pir tê zanîn. Li rûxmî ku di nava van gundiyan de feodalîzm ew qes zêde ye, halîme jineke çiqes zane û xurt bûye dibêjin. Pêşengtiya peşmergeyan jî dike. Li ser lêkolîn were kirin, dê baş bibe. Hevalan di TV de bernameyek li ser çêkiribûn.

Li gel vê yekê Margireta heye, ji ber malbata xwe tevlî peşmergeyan dibe, lê ji milê PDK ve tê kuştin, ew jî jineke zîrek e.

Ji milê wêje ve, gelek jinên ku bandoreke xurt dikin hene. Li ser lêkolîn divê were kirin, navê wan nayên bîra min. Mesela di nava wan de Celelexana Lor heye. Zûlalaxanê Şehrîzorî heye. Di salan 1500'î de ye. Dayika Sultan Sarsahak heye. Di sadsala yenzdeh û donzdehan de bûye. Miroveke olî bûye. Weke pêşengeke olî derdikeve pêş. Mesela di helbestên Celelexan de, helbestên xweza pir li pêş in. Hê jî berhemên wê mane.

**H. RÛKEN:** Di dîroka Kurdistanê de feraset nêrîneke (algiyek) wisa çêbûye; tu dibêjî qey tiştek nîne. Ji bo wê em dixwazin van tiştan vekin. Pergala dagirker, hem civaka Kurdistanê hem jî pêşengtiya jinê, tune hesibandiye, êrîş kiriye. Ji bo vê jî civak û nifşên nû yên Kurdistanê, pir jê bandor bûne. Her ku çûye mejiyê civakê zêdetir ketiye bin vê bandorê. Mejiyê nifşên berê, li gorî me zêdetir fireh bûye. Pêşengtî û rista jina Kurd zêdetir hatiye zanîn. Xwediyê hefizeyeke berfirhetir bûye. Moderniteya kapîtalîst li ser mejiyê civakê, bi taybetî li ser nifşên nû êrîşeke pir mezin dike. Ji bo vê em van mijaran girîng dibînin.

Dibe ku em weke çîrok jî bibînin û pergalê ew tişt pir erzan jî kiribin. Lê civak tiştên ku jiyan dike dixe çîrok. Serboriya xwe dibêje. Ew hemû tiştên ku hatine jiyankirin in. Hemû nirxandinên Serokatî jî li ser jiyanê ne. Dibêje pergalê jiyan bê wate kiriye. Dema ku jiyan bê wate bibe, tiştên di nava jiyanê de hene, hema bê wate dibin. Jin bê wate

dibe, mêr bê wate dibe, zindewarî hemû bê wate dibin. Ji bo vê jî Serokatî herî zêde bal dikişîne ser nirxên jiyanê. Ew tiştên ku hatine jiyankirin jî, hemû nirxên jiyanê ne. Berxwedanên hatine jiyankirin in. Li ku û çi hatiye jiyankirin, bûye nirx û pîroziya wê herêmê.

Rista xwedavendî û pîroziya wê herêmê ew e. Xwedavendî tenê di dema civaka xwezayî nehatiye jiyankirin. Civak çi ji xwe re pîroz bibîne, wê dike xweda û xwedawend. Sekna van jinan jî, sekna jina xwedawend e. Pênaseya xwedawendiyê wisa razber (soyut) nîne. Serokatî vê bi berhemên jinê derdixe holê ve digire dest. Ji ber vê digot, em çanda xwedavendiyê zindî bikin. Weke peyvireke dide pêşiya me.

Ya rast bi giştî di nava dîrokê de, tenê Rojhilata Navîn jî na, li hemû cîhanê, yê ku nûnertiya vê çandê kiriye, cihê ku nirxê civakê xwe lê parastiye, pêşengtiya nirxa xwedaventiyê hatiye dîtin û ew yek pîroz jî hatiye dîtin. Van tiştên ku me dane diyarkirin jî, nirxên xwedavendiyê yên vê demê ne. Ew jin jî xwedavandên dema xwe ne. Me got civaka xwezayî civakî ye? Jinê di vir de hêza pêşengtiyê daye nîşan dan, civak jî baweriya xwe bi wê hêza wê tîne. Di van deman de jî, çanda xwedaventiyê heya roja îro aniye. Mirov dikare di dîroka jina Kurdistanê de jî çanda xwedaventiyê bibîne. An jî şopdariya wê heye. Mirov van kesayetan wisa dikare bigire dest.

Di şexsê van kesan de, li hemberî dagirkerî, zilm û tûndiya dijmin; xwe parastin, evîna xwe parastin, welatê xwe parastin, hezkirina xwe parastin, civak bi giştî parastin heye. Ew rista xwedavendiyê lîstin e, li ser şopa xwedavendiyê meşîn e. Lewra çanda xwedaventî, di cewherê xwe de li hemberî pergala mêr ya deshilatdar û pergala dewletperest e. Di van hewldanan de jî mirov wê dibîne. Mesela ji bo ku bi saxî nekeve destê dijmin, xwe ji tehtan diavêje, an jî dema ku zindî dikeve destê dijmin jî xwe ji tehtan diavêje. Ew rûmetek e, tenê weke namûseke teng mirov nikare bigire dest. Jixwe Serokatî, pênaseya namûsê jî guhert. Di her serhildan û berxwedana ku li ser erdnigariya Kurdistanê hatiye kirin de mirov vê pêşengtiyê dibîne. Yek ew e.

Ya duyan jî, binêrin; em çima dibêjin çanda xwedaveniyê? Lewra hemû civak vê xwedavendiyê dipejirînin, tenê jin vê nake. Di civakê de mêr jî heye, ew jî pîroz dibîne. Ew herêma ku lê berxwedanî çêbûye, hemû pêşengtiya wê jinê qebûl dikin, bîrdozî bûne destan. Li rûxmî ew qes bandor û şêwegirtina zayendperestiyê jî, ew bandor ji holê ranebûye. Hê jî weke nirx tê dîtin, ew tê qebûlkirin. Berxwedan û

pêşengtiya van jinan, di mejiyan de jî feraset nêrîneke (algi) wisa daye avakirin. Dibe ku di ser re dused sal jî derbas bibe, lê hene. Tu diçî wê herême, hemû civak van kesan nas dikin, hurmet raber dikin. Girêdaneke kûr ya çanda xwedavendiya vê jî heye.

Her çiqes zêhniyeta zayendperest, xwestiyê civakê parçe bike û bi kar bîne jî; ji bo ku bandora wê pir xurt bûye, vê yekê di nava civakê de jî her tim cihê xwe hiştiye. Bi giştî tune nebûye. Ji ber vê yekê, em jî weke tevgera jinê ya azadiyê, xwe weke şopdarên vê kevneşopiyê dibînin. Em, dîrok, pênase û îfadeya xwe ji vê kevneşopiyê qut nakin. Em vê kevneşopiyê nûjen û jiyanî dikin. Têkoşîna xwe jî, li ser vê kevneşopiyê pêş dixin. Divê em vê weke çand bigirin dest. Divê di derheqê vê berxwedanê de hê lêkolîn bike, dibe ku hinek jinên din yên berxwedêr jî hebin, lê ya esasî ew çand e.

**HEVAL A…:** Hevalan ji bo Leyla Qasim tiştek dan diyar kirin, dixwazim hin tiştan lê zêde bikim. Dema ku di navbera 1970-74'an de di pêşengtiya PDK de rêveberiyeke xwecihî hate avakirin, dawiyê de di navbera Kurdan û Sadam de dîsa şer çêbû. Wê demê Sadam tam ne serok komar bû, weke serok wezîr bû. Wê demê li Silêmaniyê zankoyek heye. Dema ku Silêmaniye dikeve bin serweriya Sadam, wê zankoyê ji wir derdixin û tînin Qeladizê. Li wir bombardimaneke mezin li ser wan tê çêkirin, gelek mamoste şehîd dikevin. Wê demê YXK (Yekitiya Xwenderanên Kurdistan), Leyla Qasim wan, li Baxdayê endamên wê ne. Ew tanzîmeke zanîngehê ye. Tevgerên marksîst û lenînîst jî di nav de cihê xwe digirin.

Esas armanca wan, ji holê rakirina ew cihê balafirên ku bombardimana li ser Kurdistanê kiriye ye. Divê çalakiyeke fedaî bikin. Jixwe di nava pergala PDK de, risteke jin tune. Tevgereke feodal e. Di nava tevgerên din yên Başur de jî, jin hene; lê weke PKK misyonek dayina jinê tune. Ji aliyê wêje û hwd ve hin pêşketin hene.

Di dawiyê de hinek jinên Soran derdikevin. Helbestvanên jin yên ola Yarasanî pir hene. Hem pêşengên ol in, hem jî helbestvan in. Di pirtûka wan de jî pir behsa jin dike. Zaravayê wan jî Hewremî û Kelhorî ne. Niha Kakayiyên ku li Başur jî hene, hinek asîmîle bûne, zimanê Soranî diaxifin. Ger li ser wan lêkolînek were kirin, dê zelaltir bibe. Hem ji aliyê Kurdinî ve, hem jî ji milê tevgerên jin ve hene.

**H. RÛKEN:** Ji bo Leyla Qasim, bandora PDK li ser wê tevgera xwendekaran tune. Ser bi xwe ye. Ji bo çalakiyê jî, dixwaze bal bikişîne ser

zilma ku rejîm li Kurdistanê dike. Lê ne ji bo PDK ye. Lewra xeta PDK, xeta deshilatdarî û dewletparêz e. Pîvanên zayendperestî zêdetir li pêş in. Heval jî da diyarkirin, niha jî wisa ye. Li ser vê pîvanê jinê beşdar dikin. Mesela niha jî li parlementoya wan de jin pir in, me bi van jinan re pir nîqaş jî kiriye. Mesela par hinek hatin Qendîlê, em pir bi pêy ketin. Peywireke me jî, zanekirina wan e. Jinên pir zîrek in jî, pir kar jî dikin. Lê di navbera me û wan de pir cudabûn jî hene. Bi xwe jî hayrantiya xwe ya ji tevgera jinê re jî tînin ziman. Dibêjin, "heya niha me fêm nedikir." Em wan û civakê sûcdar nakin.

Lê seknandina Leyla Qasim di vê mijarê de cuda ye. Pîvanên azadiyê yên wê zêdetir li pêş e. PDK lê xwedî derkeve, an jî derneke ew cuda ye. Lê sekna Leyla cuda ye; ew deshilatdariya mêr, ya di Başur de jî napejirîne. Pêşengtiya ciwanên Kurd dike, pêşengtiya nifşeke nû dike. Li Başur lêgerînên civakê, bi taybetî di jin û ciwanan de lêgêrînên ji zêhniyeta PDK rizgarbûnê hene. Di pêşengtiya Leyla de jî ew derdikeve holê.

Di çanda Yarasan de ew heye, gotinên heval rast in. Zerdeştiyê de wisa ye, ew jî weke berdewama wê ye. Ji Îlamê heya Xaneqînê, ew çand hakîm e. Di vê çandê de nirxa jinê li pêş e. Hebûna jinê mirov di vê çandê de dibîne. Mesela DAIŞ, niha herî zêde êrîşî Xanaqînê dike, dixwaze ji wir ve xwe berde Kirmanşah û Îlamê. Ew ji dîrokê ne qut e. Dîsa êrîşên li ser Şengalê, di bingeha xwe de êrîşî çanda Zerdeştî û Yarasantiyê kirin e. Di nav baweriyên Kurdistanê de çanda Yarasantiyê cuda ye, bi nirx e.

Bi rastî jî Kurd, ji aliyê baweriyê ve digêhêjin Zerdeştiyê. Li rûxmî ku di hinek herêmên teng de mane jî, êrîşên pergalê herî zêde li ser wan çêdibin. Me çawa mînaka Helepçe da; di roja me ya îro de jî, cihên ku çanda kevnar zîndî ye, nirxeke wê ya dîrokî heye, dibin navnîşana êrîşên dagirkeran. Ew êrîş, wisa ne tesadûfî ne. Di van êrîşan de, derbeya mezin jî li jinê dixin; jixwe ew di êrîşên DAIŞ'ê de pir şênber e.

## TEVGERA JINA AZAD KU DI NAVA ŞOREŞA PKK'Ê DE ZÎL DIDE

Em ê niha di nava PKK'ê de tevgera jinê bigirin dest. Jixwe dîroka PKK'ê mijareke cuda ye û hatiye dîtin. Ji bo wê em hewl bidin, nekevin dubareya dîroka PKK'ê û aliyê jinê yê xweser bigirin dest. Em çiqes xweser bigirin dest jî, rastiyek jî heye; piştî demekê di nava partiyê de tevgera jinê, xwe xweser rêxistin dike. Heya wê demê jî, tiştên ku bi hev ve girêdayî ne û di nava hev de werin diyarkirin hene.

**Di Tevgera Jina Azad De Rastiya Serokatiyê**

Ji beriya her tiştî em hinekê rastiya Serokatî bigirin dest. Di nava hemû mijaran de, em nêzikbûnên Serokatî digirin dest, lê di avakirin û dîroka jinê de jî, rista Serokatî di asta herî jor de ye. Bêyî vê dîroka tevgera jinê, dê kêm bimîne. Bi hewldan û lêgerînên Serokatî, li Kurdistanê tevgera jin ya xweser, xwe rêxistin kir û heya roja îro jî berdewam dike.

Di waneyên borî de rastiya Serokatî jî hat bidestgitin. Lê nêzikatiya jin ya Serokatî, di dema zarokatî de diyar dibe. Bandorên zayendperestiyê yên li ser malbatê, Serokatî hê di emrekî biçûk de dibîne. Bi taybetî di malbatê de newekheviya jinê, weke nakokiyeke jiyan dike. Mesela dema ku em di zayendperestiyê de xwe dadihûrînin, em dibêjin me pir nakokî jiyan nekirin. Lewra rista ku dabûn me, me qebûl kiribû. Em bi vî awayî mezin bûn û şêwegirtina me çêbû. Lê Serokatî, di emrekî biçûk de vê qebûl nake û dikeve nava nakokiyan.

Vê yekê bi hinek mînakan tîne ziman. Lêgerînên xwe yên ewil jî di vir de, dide destpêkirin. Dibêje di mal de jî, di nava civakê de jî, fîstanê ku dixwastin li min bikin, min qetand. Dibêje ez di nava vî fîstanî de nedibûm. Dibêje hevaleke min ya biçûk hebû, navê wê Elîf bû. Her vê mînakê dide. Elîf, hevala wî ya zarokatiyê ye, bi hev re dilîzin. Di temeneke biçûk de Elîfê dizewicînin. Serokatî vê pir fêm nake, lê qebûl jî nake, weke nakokî digire dest. Heya roja îro jî ew ji bîr nekiriye. Di emrekî biçûk de keçek dayin zewicandinê, weke newekheviyeke dîbîne.

Heman mêzekirin, di zewaca xûçka wî de jî çêdibe. Xûçka wî jî di temeneke biçûk de tê zewicandin. Hem ji hevala wî qut dikin, hem jî di mal de ji xûçka wî qut dikin. Ji ber vê, bertek raber dike. Heya temeneke mezin jî, van nakokiyan jiyan dike. Her ku mezin dibe, nakokî jî mezin dibin. Diçe dibistana seretayî, ya navîn û zanîngehê. Di dibistan û nava civakê de, nêzikbûna jinê balkêş dibîne.

Dema ku têkoşînê dide destpêkirin jî, vê ji bo xwe weke pîvaneke digire dest. Vê pîvanê, her di nava partiyê de jî pêş dixe û dixwaze li ser vê pîvanê me perwerde bike û kesayeta me ava bike. Sedemeke ku têkoşînê pêş dixe, yek jî mijara jinê ye. Pişt re vê pir bi pêş dixe. Di hemû perspektîf û tehlîlên ku di dîrokê de û ji bo pêşerojê dike de jî, ew heye.

Dîsa di mezinbûyina Serokatî de, bandora dayika Uweyş heye. Serokatî dayika Uweyş, weke model û karektereke jinê digire dest. karektereke ku, li hemberî deshilatdariya mêr serê xwe natewîne ye. Di dîroka Kurdistanê de jineke ku, di her şert û mercê de, hebûn û sekna xwe daye diyarkirin heye. Dayika Uweyş, ew karekter e. Di mal de, bi taybetî li hemberî zêhniyeta zayendperestiya civakî, hezim nekirin û qebûlnekirin heye. Dema ku Serokatî rewşa dayika xwe û bavê xwe tîne ziman; bavê xwe weke mêrekî belengaz dinirxîne. Yanî dibêje hebûn û tunebûna wî nediyar bû. Lê dayika Uweyş, bi taybetî di warê bêmafî û tûndiyê de, rûxmî ku civaka di nav de jiyan dike, çavê xwe tiştên wiha re nagire.

Mesela di zarokiyê de, Serokatî bi Miho û Cimo re, şer dike. Hevalên wî yên zarokatiyê ne, lê her li Serokatî dixin. Di vir de dayik, Serokatî teşfîkî berxwedan û tolgirtinê dike. Dibêje serê xwe netewîne, tu jî bersiv bide. Heta carina kevir xistiye destê wî û dibêje heya ku tu tola xwe negrî neyê mal. Yanî li hemberî neheqiyê, wî teşfiqî serî rakirinê dike. Dibêje, “neheqî, tûndî û lêdan li te hatiye kirin, tu jî heyfa xwe bistîne”. Di keseyetiya dayika Uweyş de, li hemberî civaka zayendperest, hewldanek heye.

Ew her du karekterên jinê, di serê Serokatî de hem dibin lêgerîn, hem jî dibin nakokî. Ketina nava lêgerînê û têkoşîn kirinê de, bandora vê heye. Serokatî zarokatiya xwe wisa dinirxîne, dibêje ew yek bû mijareke ku ez di têkoşîna xwe de her esas bigrim. Ji bo jin, cudabûna Serokatî ya di emrê biçûk de, mirov wisa dikare pênase bike.

Hewldanên Serokatî yên ji bo jinê, di esas de piştî ku partî tê avakirin, şênber (somut) dibin, dibin tez. Dema ku li zanîngehê xwendewan e, di nava koma xwendewanan de, tam rastiya mêr derneketiye holê. Ji milekî ve xwe ji jinê dûrxistin heye. Ji milekî ve jî her dibe mijara lêgerîn û nakokiyan. Bi taybetî dema ku temenê wî hinekê mezin dibe, wisa nêz dibe. Hem naxwaze ku normên civakê ku pê nêzî jinê dibin qebûl bike, hem jî ji ber ku hê xwe tam ava nekiriye, ji vê rastiyê direve. Vê

yekê bi xwe jî tîne ziman. Van hêst û ramanan wê demê jiyan dike û wisa jî tîne ziman.

Di dema komê de, lêhûrbûnên Serokatî yên ser li jinê zêdetir dibin. Em vê komê weke koma bîrdozî pênase dikin. Di serî de di vê komê de şeş-heft kes hene, lê hê jin tune. Di wê demê de tevgerên çep pir bi bandor in. Li Kurdistan û Tirkiye jî çepgirên Tirk bi bandor in. Ew bandora çepgiran, mêzekirinek li jinê derxistiye holê. Di nava wan de jî jin hene. Di wê demê de Serokatî vê jî tehlîl dike. Li ser vê esasê lêgerînên Serokatî jî hene, danûstendinên bi jinê re hene. Lê di destpêkê de di komê de jin tune. Di civîna Çûbûkê de jî jin tune.

Di demeke wisa de Serokatî teza "**Kurdistan metîngeh e**", dike. Encama ku ji bo gelê Kurd têkoşîn bê dayin û rizgariya Kurdistanê pêk were derdikeve. Ew di dema Çûbûkê de ne. Wê demê jin tune, lê piştî wê lêgerînên wisa jî pêş dikevin û berî avakirina partiyê hevalên jin jî di nava komê de cih digirin. Di dîroka PKK'ê de jî derbas dibe, ji bo ku êdî jin jî di nav wê tevgerê de cih bigire, biryar tê girtin. wê demê bandora tevgerên rizgariya netewî jî heye. Di vir de rista jinê weke pêşengtî tê pênasekirin.  Berî ku partî bê avakirinê, Serokatî tespîta, "**qezenckirina jinê, qezenckirina şoreşê ye"** dike. Li ser vê tespîtê, jinê jî digirin nava komê.

**Têkoşînek Bi Jina Kevneşop Re; Fatma**

Jina yekemîn ku tevlî tevgerê bûye Fatma ye, piştî wê jî heval Sara ye. Fatma, keçeke Kurd e û ji Dêrsîmê ye. Ji malbateke arîstokrat û hevkar tê. Malbateke ku xwe ji dewletê qut nekiriye. Fatma di nava vê malbatê de mezin bûye. Bi riya heval Fuat, Fatma dahîlî komê dibe. Nirxandin û şîroveyên Serokatî yên li ser Fatma pir in. Li dîrokê ve girêdayî, em çend xalan bigirin dest.

Ya yekemîn, Serokatî dibêje; "keçeke Kurd bû, ji çanda Elewîtiyê dihat". Dixwaze van her du aliyên wê bigire û di şexsê wê de dahûrandina civakî bike. Ya duyemîn, ji ber ku malbata wê hevkara dewletê bû, qezenckirina keça wan jî Serokatî girîng dibîne. Beşdarbûna Fatma bi vî awayî dibe, pişt re alaqayeke Serokatî li hemberî wê çêdibe. Keçeke zîrek û zane ye. Bavê wê bi taybetî ew daye xwendin û zane kiriye, yanî amade kiriye. Ji bo vê Serokatî her dibêje mûhataba min bi hêz bû. Bi van hincetan Serokatî wê digire nava tevgerê. Dixwaze di nava têkoşîn û şoreşê de pê re hevaltiyê bike.

Jixwe malbat, ji kevneşopiya CHP tê. Piştre alaqaya Serokatî bi Fatma re pêş dikeve. Nêzikbûna Serokatî ya Fatma, tenê li ser esasê sûd jê wergirtinê nîne. Nirx dide wê, dixwaze di şexsê wê de jin pêşengtiyê bike. Ji ber ku malbateke wisa tê, pragmatîst nêz nabe. Dixwaze di şexsê wê de, pêşengtiya jinê derxe holê. Di heman demê de dixwaze, civaka Elewî ji bin bandora dewletê derxe, ji bin bandora derdorên CHP derxe. Bi vî awayî beşdarkirina Fatma ya nava tevgerê ye. Lewra Fatma hêviyeke jî dide.

Mesela heval Fuat, di wê demê de hem pir nêzî Serokatî ye, hem jî Fatmayê pir baş nas dike. Dibêje "Serokatî pir nirx dida Fatmayê, lê Fatma nedihat vê yekê". Hewldan û sekinandina ku Serokatî li hemberî Fatma raber dike, Fatma fêm nake. Lewra dev ji wê kevneşopiya dewletê bernade. Her vê derdixe hemberî Serokatî.  Serokatî dibêje "heya bi dawiyê bi israreke mezin weke marekî reş helwesta xwe ya nokeriya (işbirlikçi) neteweyî domand" (ulusal işbirlikçi yılan tavrını sonuna kadar büyük bir inatla sürdürdü." Xwe ji wê kevneşopiya hevkariyê qut nake. Ji bo vê jî Serokatî dibêje, "muhatabê min pir mezin bû". Dibêje min tenê bi Fatmayê re şer nekir, di şexsê wê de şerê min li hemberî çîna, serdest û hevkaran bû.

Serokatî dibêje "**bi rastî jî ez weke Kurdekî nû hatibûm dinê, min nûnertiya Kurdê nû dikir; lê Fatmayê jî nêzikbûna qlasîk ya mêr ji min dixwest.**" Di şerê wan de jî, esas ew nakokî bû. Dixwaze ku Serokatî bibe mêrekî qlasîk, mêrekî kevneşopiyê û mêrekî dewletê. Di dahûrandinan de Serokatî, têkoşîna xwe ya bi Fatmayê re pir tîne ziman. Lewra demeke dirêj bi Fatmayê re têkoşîn kir. Dibêje, "min dev ji Fatma bernedida û min mêrê qlasîk di Fatmayê de jî kuşt". Dibêje ,"min hem dixweste mêrê qlasîk bikûjim, hem jî di şexsê Fatma de jina kevneşop bikûjim". Ji bo wê jî demeke dirêj, Fatma hem di nava partiyê de ma, hem jî bi Serokatî re têkoşîn kir. Serokatî dibêje, bi wê sekna min Fatma jî eciz dibû û ew jî di cihê xwe de nedisekinî. Digot, çawa mêrek bi vî awayî dibe". Nêzikatiyeke wisa her li hemberî Serokatî raber dikir.

Ji bo vê Serokatî dibêje, "têkoşîna min ya bi Fatmayê re, ne takekesî (bireysel) bû; hem dîrokî bû, hem jî civakî bû. Divê çareseriya wê jî dîrokî bûya". Dibêje, "her çiqes, ez pir ne di zanebûna wê de bim jî, ji bo min êdî têkoşîna jinê dest pê kiribû. Dibêje, "ez pê hesiyam ku di şêwaza min de şaşitî tune. Min her ku ew nêzikbûn û refleksên Fat-

mayê yên qlasîk didîtin, min fêm dikir ku ez rast dikim, ez ji têkoşîna xwe nediketim şikê.

Tabî wê demê kom, ew qes mezin nîne. Ew fikra ku Serokatî derxistiye holê, hêdî bi hêdî li derdoran belav dibe. Her ku belav dibe, beşdarbûna hevalên jin jî çêdibe. Di vê demê de, ango ji 1974’an heya avabûna partiyê, êdî kom rêxistinbûna xwe çêdike, bernameya xwe derdixe, karbeşiya (işbölümü) peywiran dikin, arestebûnên nû dikin û li qadan belav dibin.

Di vê navberê de Fatma êdî bi Serokatî re dizewice. Di 1976’an de li Enqereyê dizewicin. Lê berî ku bizewicin, di nava komê de Fatma her tim nîqaşan çêdike, bi Serokatî re dikeve nîqaşan, bandora vê li ser komê jî çê dibe. Di wê demê de hinek heval dixwazin Fatmayê bikûjin û ji Serokatî dûr bixin. Lê heval Kemal pêşiya wê digire. Yanî ew qes pirsgirêk derxistine. Bi rastî jî Serokatî wê demê jî jê re gotiye,“tu dixwazî di nava komê de bi kê re bizewicê, dikarî tercîh bikî”. Di serî de di nava komê de yekî din tercîh dike, pişt re tercîha xwe diguherîne û bi Serokatî re dizewice. Di vê mijarê de jî Serokatî, ji bo xwe dibêje, her çiqes alaqaya min bi Fatmayê re hebe jî, min şêwaza mêrê qlasîk raber nekir. Dibêje, “min negot, îla ku tu ya min î. Dibêje “dema ku tercîha xwe ya yekî din re kir jî, her çiqes min nexwestibe jî, min normal dît”. Ew kesê ku di serî de Fatma tercîh dike jî, hevalan digot kesekî ku ji çepên Tirk hatiye nava me û pişt re qut bûye. Piştî ku dizewicin derbasî Amedê dibin.

### Di Kongreya Yekemîn Ya PKK’ê De Jin

Di salên 1977-78’an de, êdî amadekariyên konreyê tên kirin. Di wê navberê de heval Heqî şehîd ketiye, Serokatî civînên Kurdistanê çêkirine. Ji ber ku di dîroka partiyê de berfireh tê vekirin, em nakevin navê. Li Amedê, êdî Serokatî amadekariyên avakirina partiyê dike. Her wiha li Amedê kongreya yekemîn a avakirina partiyê tê lidarxistin.

Di vê kongreyê de du jin hene. Yek Fatma ye, yek jî hevala Sara ye. Me ji hevala Sara pirs dikir, me digot çima di vê kongreyê de jin kêm in? Lewra heya wê demê tevger li Kurdistanê belav bûye, mezin bûye, gelek kadro û sempatîzan hene. Heval Sara digot, bi rastî jî nêrîna Serokatî cuda bû, armanc zêdetir tevlêkirina jinan bû, lê li herêman di hilbijartina delegeyan de şaşitî çêbûye. Di encamê de du jin tevlê dibin.

Di kongreyê de sekna Fatma pir bi bandor nebûye. Her bi Serokatî re di nava pevçûnan de bûye. Heval Sara digot, “Fatma li gorî me hê kevn bû. Lê tiştekî ku di kesayeta wê de, em ji xwe re mînak bigirin, me nedidît. Hem ji aliyê têkiliyên xwe yên bi hevalan re, hem ji aliyê têkiliyên xwe yên bi Serokatî re wisa bû”. Dibêje “her sar bû, bêdil bû. Lê dibêje me nedizanî di navbera wê û Serokatî de çi pirsgirêk hene. Lê teyîsîna wê her çê dibe.

Di avakirina partiyê de li ser sê beşan tê sekinandin. Yek, rastiya gelê şerker derxistina holê. Ya duyemîn, vîna azad û rêxistinkirina azad derxistina pêş e. Ya seyemîn jî, li Kurdistanê li hemberî realîteya ku li ser jinê heye, têkoşîn kirin e. Herdu xalên destpêkê zêdetir li pêş in, lê ya jinê jî her çiqes di kongreyê de neyê nîqaşkirin jî, bi nêzikbûnan tê raberkirin. Ew nêzikbûn di dema komê de jî heye, lê di avakirina partiyê de jî derdikeve pêş.

**Di Dema Rêxistinbûyin û Qomîteyan De Jin**

Piştî avakirina partiyê jî, têkoşîna Serokatî bi Fatmayê re berdewam dike. Serokatî dibêje, “Fatmayê dixwest min bikişîne kemîna malbatê”. Helwesteke wisa ferz (dayatma) dike, lê Serokatî bi awayekî teqeztir û mîsogertir têkoşîna xwe berdewam dike. Jixwe di wan deman de, derketina derveyî welêt çêdibe. Êdî sinyalên cuntaya donzdehê îlonê tên dayin. Ji ber ku li Tirkiyê her ku diçe tevgerên çepgir xurt dibin, dixwazin mudaxale bikin. Serokatî bi vê dihese û derbasî derveyî welêt dibe. Tenê agahiya hevalekî heye. Heya ku pişt re Fatmayê jî dikişîne saxaya Rojhilata Navîn, agahiya Fatmayê jî pê nabe.

Berî ku derkeve Rojhilata Navîn, di gera li Kurdistanê ya Serokatî de, gelek heval hene. Di vê gerê de li her aliyê Kurdistanê civîn tên çêkirin, propaganda tê kirin. Bandoreke mezin çêdibe. Gel dibêje, “ew Apoyî ne, dixwazin Kurdistanê azad bikin”. Hemû herêmên ku heval diçin û derdora wê bandora tevegerê çêdibe. Di wê demê de, cihên weke Dêrsîm, Çewlîk û herêma Güney-Batı (eyaleta Tolhildanê), tevlêbûna jinan jî pir e. Êdî li herêman jî qomîteyên partiyê tên avakirin. Mesela ew hevalên ku di wan komîteyan de cih digirin hê jî hene.

Di wan komîteyan de hevalên jin jî cih digirin. Mesela hem heval Sara, hem jî heval Sakîne Karakoçan di van komîteyan de cih digirin. Di van komîteyan de rola ku dikeve ser milê jinê jî, rêxistinkirina jin û civakê ye. Dibe ku niha em rola qomîteyan biçûk dibînin, lê bandoreke

mezin ya van komîteyan heye. Mesela piştî ew qes sal ez û heval Sakîne Karakoçan bi hev re çûn Ewropa. Li Îsvîçre hinek hevalên ku di wê demê de, di heman komîteyan de cih girtine hebûn, em çûn mala wan. Di kîjan komîteyan de cih girtine, jin çawa rêxistin kirine, kîjan şêwaz bi kar anîne, hemû digotin. Tabî heval Sakîne rexne dikirin. Piştî donzdehê îlonê, ew qomîte hemû belav dibin, ew heval jî bê tekîlî û bê xwedî dimînin. Ji hevala Sakîne re digotin, we pişta xwe da me û hûn çûn. Hê jî hinek hevalên ku di wê demê de di qomîteyan de cih girtine dirdikevin holê jî. Lê piraniya hevalên jin yên wê demê, dema ku qomîte belav dibin û bê tekilî dimînin, ji tevgerê qut dibin.

Bi taybetî li wan herêmên ku min bi nav kir, rista jinê derdikeve pêş. Giringiya jinê zêdetir tê fêmkirin. Li çend cihan hem Serokatî, hem jî hevalên din civînên jinan yên xweser çêdikin. Ew civînên xweser, di malan de çêdibin. Em dikarin bibêjin, ew civînên xweser yên ewil in. Di vê demê de, êdî li Kurdistanê bi birdoziyeke nêzikbûna jin û ew girtina dest, piştî demeke dirêj cara ewil çêdibe. Berê di nava eşîr û serhildanan de çawa cih digirin, me dabû diyarkirin; lê bi têkoşîn û nêzikbûneke bîrdozî tevlêbûneke nû heye.

Mirov dikare bibêje, li Kurdistanê, bi vî awayî nêzikûbana jinê cara ewil di pêşengtiya Rêber Apo de pêş dikeve. Jin, bi nasnameya wê rêxistinkirin, bi xweseriya wê ew girtina dest, ji avakirina PKK’ê dest pê dike heya roja îro. Weke me got, nakokiyên Serokatî di dema zarokatiyê de dest pê dikin, lê jin weke nasnameyeke rêxistinkirî girtina dest, di vê demê de dest pê dike û heya roja me ya îro tê.

Berî derketina Serokatî ya derveyî welêt, salên 1977-78-79, pêvajoya qomîteyan e. Civîn çêkirin û qomîte avakirin heye. Ji her aliyî ve seferberbûyinek heye. Li ser vê esasê jî bandora tevgerê ku di nava gel de çêkiriye, êdî bi xwe re moral, meraq û kelecaneke cuda derdixe. Tevgere Apoyî li her derê tê bihîstin.

Wê demê şerê Hîlvan û Sîverekê heye; di nava dîroka partiyê de, armanc û cihekî wê yê cuda heye. Li van qadan jî qomîte tên çêkirin, beşdarbûna jinên sempatîzan ya nava van qomîteyan û hamleyê jî heye. Ew kî ne, ez tam nizanim; lê bi giştî heval behs dikin. Piranî sempatîzan û alîgir in, di hemû xebatên li wê herêmê de cih girtine. Hinek di asta pêşengtiyê de jî rol dilîzin. Weke me da diyarkirin, di civînên jinan de behsa rizgariya jinê tê kirin, beşdarkirina wan ya nava şoreşê tê kirin. Hevalên jin ku di wê demê de tevlî wan civînan bûne, vegotina

wê pir cuda dikirin, pir zêde bandorbûn heye. Li ser esasê kişandina jinê ya nava şoreşê ye.

Di vê demê de yên ku tevlê dibin, bi giranî derdorên xwendevan in. Xwendevanên lîse û zanîngehê ne. Beşdarbûnên ewil yên jin jî, keçên xwendekar in. Bandora tevgerên sosyalîst û tevgera Apoyî, lêgerînên van jinan xurt dike. Jinên ku dixwazin li hemberî dagirkerî û faşîzmê têkoşîn bikin e. Ew lêgerînên wan, wan bi PKK' ê ve digihîne hev. Mesela hinek hevalên jin ku wê demê tevlê bûne, digotin "lêgerînên me yên azadiya jinê hebûn, lê sergirtîbûn". Yanî di destpêkê de wisa zanebûna cins û azadiya jinê ne pir vekirî ye; zêdetir nakokiya netewî li pêş e. Ji bo netew têkoşîn kirin esas e. Lê di nava vê de, pir neyê pênasekirin jî, li hemberî pergalê lêgerîn û serî rakirina jin jî heye. Jin dixwaze ji wê rewşa di nav de ye, xilas bibe. Li ser van hest û lêgerînan başdarbûnek jî tê çêkirin.

Di wê demê de hevalên ku tevlî têkoşînê dibin ew in; jixwe hinekên wan pişt re şehîd dikevin, hinek jî qut dibin, îxanet dikin. Piranî tevlêbûna wan di dema Kurdistanê rêxistinabûna komê de ye. Lê kêm be jî, hinek jî berî wê ne. Bi van ve girêdayî, beşdarbûnên ku di navbera 1975 û 1980'î de çêbûne; Hevala Hanim Yaverkaya ye, hevala Besê Anûş e, hevala Rahîme Kahraman e, hevala Sultan Yavûz e, hevala Binevş Agal e, hevala Gurbet Aydin (Mizgîn) e, hevala Saîme Aşkin e, hevala Saîme Turgut e, hevala Adîfe Sakik e, Azîme Varto ye, hevala Çîçek Selcan e, Nafiye Öz e, hevala Güler Aygül e, Ayşe Karasu ye.

Ew bi giranî hevalên ku di pêvajoya têkoşînê de şehîd dikevin in. Jixwe di nava waneya xwe de em ê şehadeta wan jî bibêjin. Heya 82 û 83'yan hevalên ku tevlê dibin, ew in. Tabî pişt re bi saden heval tevlê dibin.

### Donzdeh Îlon Û Rihê Berxwedanê Ku Jina Kurd Şiyar Dike

Di dema cuntayê de Serokatî jixwe derketiye derve, ji bo perwerdê û vegera welêt hin amadekariyan dike, dixwaze gelek hevalan bikişîne derveyî welat. Di 1979'an de girtinan jî dest pê kiriye. Hevalên jin jî di nav de, gelek hevalên ku di wan qomîte û rêxistinbûnan de cih girtine tên girtin. Yek ji wan jî, hevala Sara ye. Ez bawer im hemû hevalan pirtûka heval Sara xwendine, ew pêvajo nivîsandiye. Piştî vê di zîndanan de jî, têkoşîna tevgera me dest pê dike. Di zindanê de hevalên jin jî zehf in, hevala Sara pêşengtiyê dike. Tabî berxwedana heval Mezlûm,

çalakiya Çaran û têkoşînên din, li hemberî zêhniyeta dagirker berxwedaneke cuda derdixe holê.

Di dîroka Kurdistanê de, bi taybetî di dîroka têkoşîna me de, di nava civakê de dîrokeke nûjen daye avakirin. Lewra rihê berxwedanê, bi komkûjiyên dawiyê, li Kurdistanê hatibû tunekirin. Bi taybetî li Bakur, di nava civakê de rihê berxwedanê nemabû. Lê bi berxwedana zindanê ya van hevalan, ew rih careke din zindî bû.

Tabî berxwedana hevala Sara ya di zindanê de jî, bi nav û deng e. Berî ku heval şehîd bikeve jî, hevalên ku di wê demê de li zindanê de mane, her behsa berxwedana wê dikirin, li hemberî dijmin serî natewîne. Weke jina Kurd, bi berxwedana xwe, êrîşên dijmin yên di zindanê de vala derdixe. Rika dijmin ya li hemberî hevala Sara û hevalên din yên jin ew e. Lewra serî natewîne û dijmin vala derdikeve, adeta dijmin di vir de dişkê. Dema ku li Kurdistanê, leşker, artêş û dewlet tê gotin; hêz û qewet tê bîra mirovan. Lê berxwedana hevalên zindanê, ew nepixandin weke baloneke teqandin. Ji vir pê ve, pêvajoyeke berxwedanê destpê dike. Di seknandina heval Mezlûm û heval Sara wan de, helwestek tê raberkirin, rihek tê afirandin. Ji bo jina Kurd ku nikare derkeve derevayî çar dûvaran, di malê de fetisiye; rihekî berxwedanê derdikeve holê. Hem jî di nava çar dûvaran de. Ew berxwedan, êdî wan sînor û dûvaran bê mane dike. Li rûxmî ku heval di zindanê de bûn, ev berxwedan di zindanê de xwe civak dike.

Serokatî ji bo berxwedana zindanê ya vê demê, tehlîl û dahûrandinên pir berfireh dike. Her wiha di dîroka Kurdistanê de jî pir berfireh derbas dibe. Di warê jinê de jî, teyisîna vê berxwedanê li Kurdistanê atmosfereke cuda derdixe holê. Ji bo jin tevlî têkoşînê bibin, bikarin tevlî kar bibin, bikarin di nava civakê de rehet tevbigerin, êdî ji dijmin netirsin, xofa heyî esas negrin dibe atmosfereke cuda. Bi rastî jî mejî û fikrandineke nû derdixe holê. Bandoreke wisa dike. Nifşên nû jî, bi ev rihê hevala Sara û berxwedêrên din yên zindanê mezin dibin. Ji wê demê, heya roja îro li ser civakê rihekî wisa yê berxwedanê daye avakirin. Ew girîng e.

### Di Pêvajoya Kongreya Duyemîn Ya PKK De Jin

Di vê demê de, li derveyî welat jî Serokatî xebatên xwe dide meşandin, gelek têkilî tên danîn. Her wiha li çiyan jî hêzen leşkerî bi civîn dibin. Di nava van komên ku li çiya cih dibin de jî hevalên jin hene. Hem

di nava gel de,  hem jî di çiyan de, yekîneyên propagandayê yên çekdarî hene. Jinên ku di nava van yekîneyan da cih digirin, li Kurdistanê bandoreke zêde dikin. Bi xwe re beşdarbûneke pir xurt tîne û feraset û nêrîna (algı) ku li Kurdistanê ji bo jinê çêbûye jî, dide şikênandin. Ew nêrîna ku jin nikare çek hilgire, nikare şer bike tê şikênandin.

Dîsa piştî 1980'î Serokatî qampa Lûbnanê vedike û hêdî hêdî hevalên jin jî dikişîne vê qampê û perwerde dike. Serokatî bi taybetî li ser perwerdeya hevalên jin disekine. Heya kongreya duyemîn, hem di nava civakê de, hem di nava yekîneyên çekdarî de, hem jî di zindanê de, sekna hevalên jin êdî pir balkêş dibe. Êdî têne ne du-sê heval in, hejmar jî zêde ye. Serokatî jî perspektîfa ku wê demê rola ku jin bilîze, dide. Heya kongreya duyemîn pêşketin ew in, lê li saxaya Serokatî, derdora wî, ferasetên şaş jî êdî dest pê dikin. Di şexsê Fatma, Pîlot û Semîr de; xeteke ku êdî li hemberî Serokatî û bîrdoziya partiyê derdikeve pêş heye. Wisa bi eşkere nikaribe xwe rêxistin bike jî, ew xeta tasfiyeyê êdî xwe dide diyarkirin.

Dîtin û nêrînên wan, di rêxistina çekdarî de, di nêzikbûna civakê de, di karê dîplomasiyê de derdikeve holê. Di van mijaran de xeteke cuda ku, bi xeta Serokatî re nabe yek derdikeve holê. Serokatî vê weke xeteke digire dest. Dibe ku Pîlot hinekê din cuda be, di paraznamaya pêncemîn de jî, Serokatî dibêje divê lêkolînek were kirin. Di mijara evîn û têkiliyan de jî cudabûn derdikeve holê. Ew zêdetir malbata qlasîk dayatma dikin, ev mêzekirinek e. Êdî xeta bîrdozî de jî, hinek kes cudabûna xwe derdixin holê. Ew sapmayek e, ger pêşiya wê bihata vekirin, dê mezintir jî bibûya. Hewldanên wisa jî hene. Lê Serokatî bi tewdîr î û pîsporî nêzikî vê xetê dibe. Heya kongreya seyemîn jî ew berdewam dike. Lê têkoşîna Serokatî jî berdewam dike. Ew xeta tasfiyeger, bandora xwe li ser avahiya partiyê jî çêdike.

Di kongreya duyemîn de jî, şeş-heft hevalên jin cih digirin.  Beşdarbûna hevalên jin, di hemû pêvajoyên vê kongreyê de heye. Kongre di 1982'yan de, li derveyî welat çêdibe. Lê mijara sereke vegera welat e. Di kongreya seyemîn de jî, ew ferasetên şaş ku têne pêşxistin, tên mahkûmkirin. Di navbera kongreya duyemîn û seyemîn de pratîkek tê meşandin. Pratîka welat hêrî zêde derdikeve pêş. Êdî di vê demê de, pirsgirêk di Serokatiya textîkî de derdikeve.

Navenda pratîkê weke Lolan tê pênasekirin, lê hemû cihên xebatên me lê hene jî bandor dibin. Serokatî vê pir berfireh dadihûrîne,

bi nav dike. Di 1983'yan de Fatma jî tê Lolanê, di navbera xwe de karbeşiyê dikin, hinek di karê çapemeniyê de cih digirin, hinek di karên din de cih digirin. Heval Abas, heval Fuat jî li wir in. Weke biryargeha navendî, divê ew der perspektîfên Serokatî pêk bîne, li hemû welat belav bike. Lê ew nayê pêkanîn. Bandora pratîka Dawût û Fatma, li ser vir çêdibe. Ew, teyîsîna xwe li ser jiyan û têkiliyan jî dike. Serokatî vê weke xeta rastgir (sağcı) pênase dike. Bi taybetî di têkiliyên di navbera hevalên xort û jin de ew yek tê dîtin. Xwe ji ew têkiliyên kevneşop û malbatî xilas nakin, cih bi cih xwe derdixe pêş. Dîsa di sekinandina kadrobûyin û milîtanbûyinê de jî, kêmasî tên jiyankirin. Serokatî dibêje sapmaya rastgir li ser wir jî bandor kiriye. Serokatî van têkilî û tarzê jiyanê ku pêş ketiye, weke têkiliyên qlasîk yên jintî û mêrtiyê pênase dike.

Di vê demê de jî hevalên jin zêde ne. Di asta yekemîn de, berspiryar Fatma ye. Nêzikbûna wê, ya serdestan e; ditepisîne, hevalên jin biçûk dibîne, rêxistina jin esas nagire. Heval Sara digot, me çend caran mijara jinê xistiye rojevê jî, Fatmayê gotiye ne dema wê ye. Lewra ji bo vê Serokatî çend caran heval Sara peywirdar dike. Lê Fatma dibêje ne dema wê ye. Dibêje hûn jê fêm nakin. Yanî nêrîna tebaqaya jor, li ser hevalan pêş xistin derdikeve. Li ser gelek hevalan jî agahiyên şaş dide Serokatî. Ji ber ku erkdar e, derbarê gelek hevalên jin de agahdariyên şaş dike, biryarên şaş dide. Mesela yek jî van, bûyera Saîme Aşkin e. Tê kuştin, lê Serokatî pişt re dibêje, ew ne ajan bû.

**Di Pêvajoya Kongreya Seyemîn Ya PKK'ê û Pengava 15'ê Tebaxê de Jin**

Ew pratîkên şaş hemû dibin mijara kongreya seyemîn. Bi kongreya seyemîn, Serokatî mudaxaleyî van tiştan dike. Me bal kişand ser sê tiştan; yek di tarzê jiyanê de derketina ji xetê (sapma) heye; du, di tarzê şer de şaşitî heye; sisê, di serokatiya textîkî de pirsgirêk heye. Di van her sê tarzan de pratîk û sapmayên ku li welat hatine jiyankirin, Serokatî mudaxale dike. Ji bo vê jî di vê kongreyê de, Serokatî dibêje, **"ya ku tê dahûrandin; ne kes e, civak e; ne kêlî ye, dîrok e.**" Di bin vê tespîtê de hemû pratîkê ji nû ve digire dest. Gelek mijar cara ewil di vê kongreyê de tên mahkûmkirin.

Kongreya yekemîn û duyemîn, di dîroka PKK'ê de kongreyên vekirin û xwe rêxistinkirinê ne. Kongreya seyemîn, perspektîfa vekirin û rêxistinkirinê jî digire nava xwe, lê peywira xwe ya yekemîn, rêxistin

mudaxaleyî avahiya xwe dike. Mudaxaleyî feraset û nêzikbûnên şaş yên di nava partiyê de dike. Her kongreyeke me, bi xwe re pêşketinan derdixe, lê hinek kongre xwediyê taybetmendiyên cuda ne. Yek ji wan, kongreya seyemîn e. Lewra Serokatî, têkoşîna bîrdozî êdî di hundir de dide meşandin. Xeta partiyê ku tê lewazkirin û xitimîn û tengaviyên ku tên jiyankirin, di kongreya seyemîn de rastî mudaxaleyê tên.

Kongreya seyemîn, di 1986'an de tê darxistin. Lê di vê navberê de pengaya 15'ê Tebaxê heye. Di vê demê de, li her cihê ku yekîneyên me lê hene, hevalên jin jî di nava van yekîneyan de cih digirin. Heya wê demê gelek hevalan ji milê fermandariyê de peywir jî girtine. Lê belê beşdarbûna pengava 15'ê Tebaxê de; hinek heval dibêjin, hevalên jin jî hebûne, lê hinek jî dibêjin tunebûne. Lê diyare ku di amadekariyê de hebûne. Mesela hevala Rahîme di vê demê de, li Erûhê ye. Lê tam di çalakiyê de cih girtiye, an na nayê zanîn. Hin heval dibêjin, di planlamayê de hebûye, an jî cih girtiye. Heval Cuma wan jî dibêjin, di dema amadekariyê de hebûne, muhtemelen wisa ye.

Tabî berî kongreya seyemîn, weke berxwedana zindanê, pengava 15'ê Tebaxê jî, di merheleyeke cuda de berxwedanê bilind dike. Asta berxwedana zindanê, derdixe lûtkeyê. Li hemberî dijmin teqandina guleya ewil; hêz, moral û baweriyeke cuda di nava civakê de dide avakirin. Ew hêz û bawerî bi xwe re rêxistinkirineke mezin dirdixe holê. Bandoreke mezin li ser jina Kurd jî dide çêkirin. Jixwe piştî vê pengavê, ji aliyê jinê ve beşdarbûneke zêde çêdibe. Êdî xeteke nû ya tevlêbûnê derdikeve. Me berê gotibû, tevlêbûna jinê, li ser xeta Dêrsîm, Çewlîk û Güney-Batiyê çêdibe. Lê piştî vê pengavê, di xeta Botan, Serhad, Xerzanê de jî tevlêbûna jin xurt dibe.

Serokatî di kongreya seyemîn de, xeta heval Mezlûm û xeta heval Egîd weke bîrdoziya partiyê digire dest. Lewra yekî di zindanê de, yekî jî li çiya, ew xet gihandine lûtkeyê. Di vê demê de, heval Egîd jî divê were kongreyê, Serokatî bang kiriye, lê di rê de şehîd dikeve. Di têkoşîna rizgariya gelê Kurdistanê de, Serokatî van xetan weke xeta berxwedanê ya bîrdoziya me digire dest. Xeta Semîr û Fatma jî, weke xeta tasfiyeger digire dest. Ji bo vê jî, rola kongreya seyemîn di dîroka Kurdistanê de cihekî cuda digire.

Dîsa di kongreya seyemîn de, cara ewil têkiliyên malbata qlasîk, tên mahkûmkirin. Jixwe piştî wê danûrandina jin û malbatê, tê kirin. Di 1987'an de ye. Ew jî di civaka Kurdistanê de guhertineke mezin dike.

Serokatî êdî meseleya jin, weke şerê takekesî nagire dest, bi giştî û civakî digire dest. Serokatî êdî pirsgirêka malbatê, weke pirsgirêkeke zêhniyeta koletiyê digire dest. Divê pêwîst e, çareseriya wê jî di malbatê de derkeve holê.

Gelek biryarên kongreya seyemîn hene; mesela biryara avakirina arteşê tê girtin; karê ênî, artêş û partiyê cuda bibe. Biryareke herî girîng jî, di vê kongreyê de YJWK (Yekitiya Jinên Welatparêzên Kurdistan), were avakirin digire. Piştî wan dahûrandinên li ser jinê, pêwîstiya ku jin êdî xwe, xweser rêxistin bike derdikeve. Êdî jin jî xwe xweser rêxistin dike. Yanî beşdarkirina hemû karan heye, lê weke yekîneyên xweser xwe rêxistin kirin jî pêwîst dike.

Di kongreya seyemîn de, endamtiya Semîr û Fatma tê girtin. Helwesta kongreya seyemîn li hemberî sekna wan ku di nava têkoşînê de derketiye zelal dibe. Piştî kongreya seyemîn, Serokatî wan rêdike Ewropa, lê êdî ne endamên partiyê ne.

## RÊXISTINBÛNA TEVGERA JINA AZAD YA XWESER

### Rêxistinbûnên Xweser Yên Ewil Û YJWK

Piştî kongreya seyemîn ya PKK'ê, bingeha rêxistina xweser ya jinê tê avakirin. Ew yek li Ewropa dibe. Serokatî ji bo vê rêxistinê hin hevalan erkdar dike. Yek ji van hevalan jî, hevala Mizgîn e. Hevala Mizgîn hem ji bo xebatên çandê tê erkdar kirin, hem jî ji bo xebatên jinê yên xweser tê erkdarkirin.

Pîştî wê di 1987'an de kongreya yekemîn ya jinê tê darxistin. Ew jî li saxaya Ewropa tê darxistin. Ji ber vê hemû beşên xebatê û ji welat tevlêbûna vê kongreyê çênabe. Tenê hevalên ku li saxaya Ewropa kar dikin, beşdar dibin. Jixwe li wir gelek hevalên ku weke kadro tevlê kar dibin hene. Mesela ji wan hevalan yek jî hevala Sozdar e. Wê demê ew jî beşdarî partiyê bûye, di kongreya yekemîn ya YJWK (Yekitiya Jinên Welatparêz yên Kurd) de cih digire. Dîsa hevala Xanê ye, Ayten e. Ew heval wê demê li Ewropa beşdarî partiyê dibin û tevlî kongreyê jî dibin. Kongre li wir tê sazkirin û îlankirin.

Biryareke ku ji kongreyê derdikeve jî; li hemû welat rêxistinbûna jin çêkirin e, bi taybetî di nava civakê de, li her derî qomîteyên jin dayina avakirin e. Her wiha li hemû herêman biryara avakirina meclisan derdikeve. Binêrin! biryara meclisan hê wê demê derdikeve, ev hê jî pirsgirêkeke me ye. Ya rast, Serokatî perspektîfa xwe bi xwe rêvebirinê wê demê daye me. Wê demê hem ji bo tevgera giştî, hem jî ji bo tevgera jin perspektîfeke wisa heye. Ya rast wê demê meclisên herêm û qadan jî tên avakirin. Niha belgeyên wan karan, di destê me de hene. Her wiha li gelek herêmên din yên Ewropa konferansên xweser yên jinê tên lidarxistin.

Perspektîfa ku Serokatî wê demê dide tevgera jinê; têkoşîna azadiya jinê di nava civakê de pêşxistin e. Bi taybetî weke navend Ewropa girtiye, da ku kîtleya me ya li wir welatparêziya xwe pêş bixe û tevlê xebatan bibe. Bi taybetî ji bo jinan vê perspektîfê dide. Piştî kongreya seyemîn gelek perspektîfên Serokatiyê yên bi vî rengî ji bo Ewropa hene. Ya rast bi vî modelî dixwaze rêxistinê li Ewropa jî bide avakirin. Êdî ji avabûna YJWK û vir ve xebata xweser ya jinê li Ewropa tê pêşxistin. Gelek hevalên jin wê demê li Ewropa tevlî kar dibin. Hinekên wan di karê çand û huner de cih digirin,  hinekên wan tên welat, hinekên wan diçin saxaya Serokatî. Yanî di vê demê de ji Ewropa tevlêbûna hevalên jin jî pir e. Tabî ew bandora xwe li ser giştî têkoşînê dike. Bi taybetî piştî avakirina yekîtiya jinê bandoreke erênî dibe.

**Pêşketina Gerîlatî û Fermandariya Jinê**

Li welat jî ji 84'an heya 88'an li her cihî hêza me ya çekdarî xwe bi rêxistin dike. Li hemû cihên Kurdistanê belav dibe. Êdî Dêrsîm, Xerzan, Serhed, Botan, Saxaya Navîn, Mêrdîn; yanî li hemû herêman rêxistinbûna gerîla pêş dikeve. Jixwe ew biryara kongreya seyemîn e. Biryareke kongreya seyemîn jî qanûna leşkerî ye, piştî wê gelek kes bi qanûna leşkerî tevlî têkoşîna çekdarî dibin. Bi taybetî li Botanê, ew qanûn pir tê pratîzekirin. Bi taybetî di 86 û 87'an de, gelek heval bi vê qanûnê beşdarî partiyê dibin. Di nava van hevalan de gelek hevalên jin jî hene, ji wan hevalan hê hinekên jiyan dikin jî hene, gelek jî şehîd ketine. Qanûna leşkerî li her cihî nayê pêkanîn, piranî li Botan, Xerzan û Dêrsîmê pêk tê, lê navend Botan e. Mesela hevala Saadet heye, li Dêrsîmê heval bi qanûna leşkerî tevlê dikin, hê jî behs dike.

Di van deman de di nava têkoşîna gerîla de beşdarbûna hevalên jin jî êdî aktîf dibe. Hê rêxistinbûna xweser ya jinê di nava gerîla de çênebûye; yanî taxim û yekîneyên wan tunene. Di tîman de çend hevalên jin hene. Lê piştî 87'an êdî di yekîneyan de hevalên jin berpirsiyartî û fermandariyê dikin. Mesela dibin fermandara mangayê, lê di mangaya wê de hevalên xort jî hene. An jî di nava rêveberiya herêmê de cih digirin. Yanî di vê demê de tenê beşdarbûyina têkoşîna leşkerî tune, her wiha di vir de berpirsiyartî girtin jî heye. Jixwe Serokatî ji pêşengtî û berpirsiyartiya di nava artêşê de, weke perspektîf dide pêşiya hevalên jin. Roleke cuda dide wan.

**Pakrevanên Ku Bi Helwesta Xwe Tevgera Jina Azad Diafrînin**

Heya vê demê, bi taybetî ji destpêka têkoşîna û heya nodî hevalên ku şehîd ketine hene. Hevalên jin ku destpêkê şehîd ketine hene, em dikarin navê wan diyar bikin. Her wiha em dikarin vegotina encamên van şehadetan ku li Kurdistanê derdikeve holê bikin.

Şehadeta yekemîn ya hevalên jin, heval Besê Anûş e. Bi xwe ji Pazrcixê ye, berî heyştî tevlî têkoşînê dibe. Di 17'ê adarê 1981'an de li herêma Pazarcixê di pêvçûneke de şehîd dikeve. Li herêma Gûney-Bati ye. Ji van hevalan yek jî, hevala Azîme Demîrtaş e. Ew jî heval duyemîn e. Bi xwe ji herêma Dêrsîme ye. Xwe amade dike ku derbasî saxaya Serokatî bibe. Di rê de îxbar tê kirin û dikevin pêvçûnê. Di rê de, di qanûna 1981'an de şehîd dikeve. Jixwe gelek hevalên ku piştî wê tevlê têkoşînê dibin jî navê wê digirin.

Hevala Rahîme Kahraman heye, koda wê Saadet e. Bi xwe ji Depê (Karakoçan) ye. Di 83'yan de ji saxaya Serokatî vedigere welat, demeke kin li Lolanê dimîne û piştre re derbasî Botanê dibe. Demeke kurt li Besta dimîne, lê di dawiya 83'yan de li wir dikeve kêmînê û di pêvçûnê de şehîd dikeve. Hevala Tûrkan Derîn heye. Dîroka beşdarbûnê tam nizanim, lê di 85'an de li Bakur şehîd dikeve.

Hevala Saîme Aşkin heye, koda wê Ayten e. Bi xwe ji Rihayê ye. Li saxa Serokatî dimîne û pişt re derbasî Lolanê dibe. Serokatî jî behsa wê dike, hevaleke zîrek e, jîr e. Li hemberî gelek hewldanên Fatmê jî têkoşîn dide. Di asta zanebûnê de, kîjan tevger yên partiyê ne, kîjan ne yên partiyê ne ji nava hev derdixe. Bi taybetî li hemberî, ew rêveberiya wir derdikeve, rexne dike. Li hemberî wê jî nêzikatiyek tê raberkirin; dibêjin nayê dîsîplîna leşkerî û dîsîplîna partiyê. Dibêjin nayê qeyd û qûralên partiyê û di bin vî navî de tê cizakirin. Dibêjin ajan e û jiyanê xirab dike. Serokatî dibêje ne miroveke wisa bû, lê di bin vî navî de hat înfazkirin, jixwe pişt re Serokatî wê weke şehîd jî îlan dike.

Hevala Sultan Yavuz heye. Di navbera eşîra heval û eşîreke din de pevçûn hene. Dixwazin di navbera xwe de hev bikin û aştî pêk bînin; ji bo vê dixwazin heval Sultan bidin wê eşîrê. Li gorî kevneşopiyên eşîrê wisa ye. Lê heval Sultan vê red dike û tevlî partiyê dibe. Kiryara wê, bi rastî jî li hemberî wan kevneşopiyên paşverû serî rakirin e. Yanî ew pergala heyî napejirîne. Pişt re di navbera malbatan de pirsgirêk derdikevin, lê partî bi awayekî hal dike. Li çend cihên din jî bûyerên wisa tevgerîne, lê partî bi awayekî çareser dike. Piştî ku heval sûltan tevlî partiyê dibe, di nava yekîneyên gerîla de cih digire. Di gulana 1986'an de li Şemzînan, di pevçûna Bênevok de şehîd dikeve. Bi giştî heyşt heval di vê pevçûnê de şehîd dikevin.

Hevala Xanim Yawerkaya heye. Koda wê Hawa ye. Bi xwe ji Rihayê ye. Di malbateke zane de mezin bûye. Dayika wê endama şaredariya meclisa Hîlvanê ye. Wê demê ji doza me tê girtin. Hevala Xanim, li hemberî wan nêzikbûnên dijmin tevlî partiyê dibe. Di koma yekemîn ya ku derbasî welat dibin de jî cih digire. Wê demê derbasî Botanê dibe. Li Erûhê, hêrêma Garisa berpirsiyariya mangayê dike. Hinek heval ji bo wê dibêjin, tevlî pengava 15'ê Tebaxê jî bûye. Di wir de roleke pêşeng dîlîze. Ji gelek aliyan ve dibe mînak. Di heman demê de hem qomûtantiya gerîla dike, hem jî fermandariya hevalên xort ku nû tevlê dibin dike. Her wiha di textîk û şêwazên şer de xwediyê taybetmendiyên

xulukar e. Hevaleke zaneye jî. Hem di têkoşîna li hemberî dijmin de, hem jî li hemberî ferasetên şaş ku di nava me de derdikevin de, risteke xwe ya bi bandor heye. Di artêşbûyina jin de jî, em ji xwe re mînak digirin. Dema ku derbasî Botanê dibe, li herêma Garisa şehîd dikeve. Wê pevçûnê çend rojan berdewam kiriye, berxwedaneke xurt nîşan daye û şehîd ketiye.

Hevala Adîfe Sakik heye. Ji herêma Mûşê ye. Di 83-84’an de tevlî partiyê dibe.  Di 85’an de li Sasone pevçûneke mezin rû dide. Ew pevçûn di dîroka partiyê de jî pir derbas dibe. Li wir heyşt heval şehîd dikevin. Di wê berxwedanê de heval Adîfe jî şehîd dikeve. Şehadeta wê li hemû herêma Sason û Mûşê bandor dike. Li ser hemû tevgerê jî bandoreke dike.

Hevala Çîçek Selcan jî, ji Dêrsîmê ye. Koda wê Rûken e. Derbasî saxaya Serokatî dibe û piştî perwerdê derbasî saxaya Botanê dibe. Di 85’an de di pevçûneke de şehîd dikeve. Sekna wê jî, di fermandariya jin de risteke mezin dîlîze û mînak tê girtin.

Hevalal Saîme Turgut heye, koda wê Delal e. Bi xwe ji Dêrsîmê ye. Berî ku tevlî partiyê bibe, mamostetî kiriye. Ew jî derbasî saxaya Lolanê dibe. Bi komeke heval re derbasî Bakur dibe. Li ser sînor, herêma Haftanîn dimîne. Li wir şehîd dikeve. Ew jî hevaleke kevn û xwedî risteke girîng e.

Hevala Sakîne Kırmızıtaş, hevala sêyemîn e. Bi xwe ji Mazgîrta Dêrsîmê ye. Li Xerpetê dibistanê dixwîne. Dema ku xwendekare, di donzdehê îlonê de tê girtin. Piştî ku tê berdan tevlî parityê dibe. Derbasî saxaya Lolanê dibe. Li wir ji aliyê Dawût ve tê cizakirin. Weke ku di pevçûnê de şehîd ketiye tê zanîn, lê pişt re di lêkolîna ku tê kirin de, tê dîtin ku weke hevala Selcan ew jî hatiye înfazkirin. Li gorî ku tê zanîn, Dawût dixwaza pê re tekiliyeke taybet çêke, lê ji ber ku wî red dike, Dawût wê înfaz dike. Jixwe dema ku Serokatî vê bûyerê dîbîze, tarzê Dawût di nava partiyê de tê mehkûm kirin. Pişt re merteba şehadetê dîsa dide heval.

Hevala Laîme heye, xûçka Mahmût Baksî ye. Ew jî ji hevalên ku ji destpêkê tevlê partiyê bûne ye. Bi xwe ji Batmanê ye. Hevala Laîme jî, di pratîka Güney-Batıyê de rol dîlîze. Ew jî bi angaşta ajan e, tê înfazkirin. Lê piştre Serokatî mudaxaleyê vir jî dike. Jixwe li ser vê bûyerê, li hemberî me her helwesteke Mahmût Baksî hebû, pişt re Serokatî gazî

kir û pêre axifî. Ew şêwazê cizakirinê, li hemû herêman bandoreke neyînî kiribû, bi zanebûn hatibû belavkirin jî.

Hevala Zaîde, ji herêma Botanê ye. Ji Şirnaxê, Xirbikê Bestê ye. Bi qanûna leşkerî tevlî partiyê dibe. Di demeke kin de, di şerê gerîla de xurt dibe û pêşengtiyê dike. Di 88'an de li ew herêma ku tevlêbûye de pevçûn derdikeve, di wê pevçûnê de şehîd dikeve.

Hevala Cahîde heye. Ew jî hevaleke kevn e. Bi xwe ji Elihê ye. Hevaleke zane ye. Li Botanê karê kowar derxistinê dike, mesela wê demê kowara "Peşmerge" derdikeve, di vê kowarê de rol dîlîze. Bi giştî di têkoşîna bîrdozî de risteke xwe heye. Hevaleke ku li hemberî kiryarên Fatmayê derdikeve jî hevala Cahîde ye. Li hemberî feraset û nêzikbûnên wê yên şaş derdikeve. Heval Sakîne Karakoçan, pir behsa wê dikir. Behsa taybetmendiyên wê yên şerker, têkoşer dikir. Li hemberî nêzikbûn û kiryarên şaş yên mêr jî, dibe xwedî helwest. Serî natewîne. Demeke dirêj li Botanê dimîne. Ji aliyê teorî û bîrdozî ve pêş ketiye. Di encama êrîşên hawayî de, li Botanê şehîd dikeve.

Bi giştî di navbera salên 80'î û 90'î de, hevalên ku di asta pêşengtiyê de rol lîstine, hemûyan jî di nava qadên gerîla de cih girtine. Ji Dêrsîmê heya Xerzan û Botanê, di nava têkoşîna me de bûne xwedî risteke girîng. Bêguman hevalên ku me navên wan nedane diyarkirin û bûne xwediyê risteke girîng jî hene. Lê ya girîng, di nava têkoşînê de van hevalan pêşengtiyeke çawa kiriye, mirov vê bibîne.

Ji bo têkoşîna giştî û bi taybetî jî di qada artêşbûyina jinê de bi şehadetên xwe, van hevalan di nava gel de jî bandorek da avakirin. Kîjan li kîjan herêmê bûye, beşdarbûna wê ji bo wê herêmê û ji bo herêma ku lê şehîd ketine girêdanbûneke gel daye çêkirin. Bi giştî Kurdistanê bandoreke wisa daye çêkirin. Mesela niha gelek jin tevlê partiyê bûne û navê van hevalên şehîd girtine. Şehadeta van hevalan ji milê zanebûn û ronekbiriyê de jî, li Kurdistanê guhertinek daye çêkirin. Bawerî bi jinê anîn çêbûye. Ew zêhniyeta zayendperestî, bi beşdarbûna jinê ya nava têkoşînê û şer hatiye şikênandin. Civaka ku jinê weke namûs didîtin, bi tevlêbûna wan ya nava refên partiyê êdî qebûl kirin. Her kesî êdî pê bawerî anî. Dibe ku pir bi bîrdozî jî nebe, lê ew rih û psîkolojiya ku tê avakirin, di nava civakê de bingeheke birdoziyê jî dide avakirin.

Êdî beşdarbûnên piştî van şehadetan, malbatên ku keçên wan tevlî partiyê bûne, bi tirs û bêbawerî nêzikî partiyê nebûne. Nêzikbûna û tevlêbûna PKK'ê; ne li ser esasê manfaatê ye. Civak êdî di nava hesteke

wisa de şiyar dibe. Her çiqes zanebûneke pir xurt tune be jî, êdî tiştekî wisa hîs dike. PKK ne partiyeke xirab e, PKK ne partiyeke ku li ser civakê şêwazên xirab pêktîne ye; PKK partiyeke pêşeng e, PKK partiyeke ku azadiya civakê dixwaze ye. Jin jî ji bo vê tevlê partiyê dibin û di nava PKK'ê de tên parastin. Jin di nava PKK'ê de dibin aîdî xwe, di nava PKK'ê de têkoşîn dikin, dibin zane û dibin pêşeng. Şehadetên ku destpêkê tên jiyankirin, bandoreke wisa didin avakirin.

Ew şehadet dibin bingeheke mezin ya beşdarbûyinê. Piştî van şehadetan tevlêbûna jinan pir çêdibe. Bi taybetî piştî nodî, tevlêbûnên pir mezin çêdibin. Her şehadetek li ser gel, bi xwe re bandoreke cuda jî derdixe holê.

Serokatî dema ku van şehadetan digire dest, her hevalekê bi taybetmendiyên wê digire dest. Gelekên wan nas jî dike. Hemû ji di saxaya Serokatî re derbas bûne, perwerdeya Serokatî dîtine. Bi van nirxandinan re, Serokatî xwedî lê derketineke jî dike, perspektîfeke wisa dide. Wan weke nirxên manewî yên têkoşînê digire dest, pênase dike. Wan naxe mijara bê moralî û xemgîniyê; dijberî vê wan dike mijara moral, hêz û têkoşînê û rêxistinê li ser manewiyeta wan xurt dike. Nêzikatiya ku di şehadeta heval Heqî de daye raberkirin, di van şehadetan hemûyan de jî dide raberkirin. Her şehadetek bi xwe re moral ava dike, jiyan û têkoşînê xurt dike. Ew di nava têkoşîna me de bûye taybetmendiyeke ku, em pê şehadetê digirin dest. Jixwe gelek derdor vê fêm nakin.

Dema ku hevalek şehîd dikeve û em wê bîr tînin; em pê morala xwe xurt dikin, di têkoşînê de bi biryartir dibin. Bi van nêzikatiyan, Serokatî mijara mirinê û şehadetê jî zivirand çavkaniya hêzê. Bi taybetî li Kurdistanê, ew tiştekî pir girîng e. Ew bû hêza baweriyê. Lewra li Kurdistanê, mirinê tirs dianî, çilmisîn dianî, tepisandin dianî, bê vînî dianî. Pergala dagirker li Kurdistanê atmosfer û zêhniyeteke wisa dabû avakirin. Di têkoşînê de Serokatî, ew zêhniyet jî şikênand. Bi şehadetên hevalên jin, ew zêdetir mezin bû.

**Sê Têkoşerên Ku Mirinê Dimirînin**

**-Pakrevaneke Ku Dibe Remza Serhildanan; Bêrîvan**

Em derbasî salên nodî bibin. Rêxistinbûna me ya xweser bi taybetî ji nodî û vir ve derdikeve holê. Hem rêxistinbûn, hem jî şêwazê têkoşîn û rêveberiyê, di pêşengtiya rêxistina xweser de piştî nodî derdikeve holê. Berî wê perspektîfa jin bi hêzkirin û kirina xwedî vîn û rengê jinê derxistina holê heye; lê di nava giştî de ye. Her çiqes di 87'an de li Ewropa, kongreya xweser hatibe darxistin jî, hê nasnameya xwe di nava rêxistina giştî de nade diyarkirin. Lê perspektîfa wê ya xweser jî, di her gava ku tê avêtin de, tê dayin. Bi taybetî di her şehadeta ku çêdibe de, di her gotinekê de, di her çûyina herêmekê de, ew perspektîfa xweseriyê derdikeve holê. An na ew perspektîf, bi serê xwe û careke re dernekave holê.

Pêvajoya ku me da diyarkirin, binesaziya rêxistinbûna xweser dide avakirin. Hem di zêhniyet û ferasetê de vê dide rûnişkandin, hem jî di xebat û rêxistinê de bingeheke wisa dide rûnişkandin. Ya herî girîng jî di mêjiyê civakê de guhertin çêdibe. Piştî nodî, Serokatî hêdî bi hêdî; di nava civakê de, di artêşê de û bi giştî di partiyê de perspektîfa wê jî derdixe holê.

Berî nodî, me bi giranî di qada zindanê de û qada leşkerî de têkoşîn da diyarkirin, lê piştî nodî di nava civakê de pêla serhildanê jî destpê dike. Serokatî ji bo vê demê dibêje, firsendeke mezin bû, me rivand. Di vê demê de, bi giştî Kurdistanê têkoşîna gel; an jî şerê gel yê rizgariyê destpê dike.

Serhildana gel ya ku herî mezin û girseyî ye, bi şehadeta hevala Bêrîvan (Binevş Agal) re destpê dike. Heval Bêrîvan, bi xwe Êzîdî ye, ji Beşîriya Elihê ye. Malbata wê derveyî welat e, ew jî ji wir tevlê dibe. Piştî tevlî partiyê dibe, diçe saxaya Serokatî û Serokatî li qada Rojava di nava gel de wê berpirsiyar dike. Bi beşdarbûna xwe ya nava têkoşînê sekna xwe dide diyarkirin. Li gelek herêmên li Rojava, cihên ku wê lê kar kiriye, hê jî ew qomîteyên ku avakirine, di nava kar de ne. Malbatên ku heval Bêrîvan çûye mala wan; hê jî di bin bandora sekna wê, nêzikbûnên wê yên li hemberî gel û welatparêziya wê de ne. Wê demê gelek heval, bi naskirina heval Bêrîvan tevlê partiyê dibin. Serokatî dibêje, **"hevaleke ku taybatmendiyên wê yên gelperwerî pir xurt bûn û pêşengeke gel bû"**.

Piştî ku demekê li Rojava dimîne, Serokatî wê dişîne herêma Botanê. Li wir di nava gel de xebatan dike; qomîteyên jin û yên giştî ava dike. Niha hê jî gelek milîsên heval Bêrîvan, di nava xebatan de ne. Wê demê navend Cizîra Botan e, lê wê herêmê hemûyê kar dike. Hevalên ku wisa aliyên xwe yên gelperwer hene, di nava civakê de nayên ji bîrkirin. Mesela heval Egîd jî wisa ye. Bi kê re diaxife, teqez li ser wî/ê bandorekê çêdike. Kesekî ku tenê careker heval Egîd dîtiye jî, ew sekna heval Egîd her mînak digire. Gelek ji van hevalên ku wisa pêşengtiyê dikin, wisa şopa xwe di nava civakê de dihêlin. Heval Bêrîvan jî wisa ye.

Di 89'an de li Cizîrê hûcre û qomîte tên rêxistin kirin; amedekariyên serhildanê pêş dikevin, bi giştî jî li herêma Botanê atmosfereke cuda derdikeve pêş. Jixwe bingehek heye, lê piştî pratîka Hogir, bandorek neyînî çêbibû. Feraset û nêzikbûnên wan di nava gel de, li hemberî partiyê tirs û nêzikatiyeke cuda pêş xistibû. Lê nêzikatiyên hevala Bêrîvan, ew atmosfera ku li hemberî partiyê dihat rêxistinkirin, ji holê radike. Pêşiya texrîbatên mezin digire. Nehêlişt ku gel, li hemberî partiyê bikeve nava hewldaneke cuda. Lewra hezkirina gel, di şexsê heval Bêrîvan de, ji PKK re derdikeve holê.

Hevala Bêrîvan di 89'an de şehîd dikeve. Li ser şehadeta wê, di serî de li Cizîrê, gelê herêmê radibe serhildanê. Bi hezaran kes, xwedî li hevala Bêrîvan derdikevin û cinazeyê wê radikin. Ew di dîroka tevgerê de, bi taybetî di dîroka tevgera xweser de, têkoşînê êdî bi rêxistin dike. Şehadeta heval Bêrîvan, rê li pêşiya serhildan û têkoşîneke bi vî rengî vedike.

Piştî vê serhildanê, êdî di salên nodî de, tevgerên civakî û serhildan destpê dikin. Cihên weke Amed, Mêrdîn û Botanê her ku diçe ew serhildan mezin dibin. Ew jî di dîroka Kurdistanê de, di nava gel de, qadeke cuda ya têkoşînê vedike. Her wiha di van salan de, di qada gerîla de jî pêşketinên mezin derdikevin.

**-Di Dilê Kurdistanê De, Şopdareke Kawayê Hemdem; Zekiye Alkan**

Piştî kongreya çaremîn, ji bo hemû qadên çiya û gerîla jî êdî pêvajoyeke nû destpê dike. Serokatî êdî amedekariyên artêşa jine dike. Berî ku em derbasî vê mijarê bibin; divê em çend mijarên ku bandora xwe li ser civakê dikin vekin.

Di vê demê de, di sala nodî de heval Zekiye şehîd dikeve. Hevala Zekiye Alkan, li Amedê di newrozê de xwe dişewitîne. Bi xwe xwendaker e. Di helwesta xwe de jî daye diyar kirin, herî zêde li çalakiya heval Mezlûm bandor dibe. Lewra heval Mezlûm, di zindanê de li hemberî taritiyê xwe dişewitîne. Heval Zekiye jî, di vê demê de bi vê şewazê xwe dişewitîne.

Çalakiya heval Zekiye, bandoreke mezin li ser herêma Amedê dike. Jixwe berxwedana zindana Amedê, li ser hemû herêma Amedê bandoreke mezin kiribû. Weke jinekê çalakiyeke bi vî rengî pêkanîna heval Zekiye jî, bandoreke cuda dike. Hem li hemû Kurdistanê bandoreke cuda li ser gel û tevgerê dike, hem jî bi taybetî li ser gelê herêma Amedê bandoreke cuda dike. Bi taybetî li Bakur û Rojava gel pir jê bandor dibe. Di nava gelê Başur de jî, bandoreke taybet dike. Mesela peykerê heval Zekiyê hê jî li Silêmaniyê heye. Lewra li hemberî dagirkeriya Tirkiye, bi çalakiya xwe bersiveke dide. Ew di Kurdistanê de dibe remzek. Çawa di Cizîrê de, hevala Bêrîvan dibe remz û gel wê helwestê pîroz dibîne û ji xwe re weke pêşeng û mînak digire; heval Zekiye jî li Amed û hemû Kurdistanê remzeke wisa derdixe holê.

Bi xwe ji Erzînganê ye, lê li Amedê dixwîne û li wir jî çalakiya xwe dike. Lewra di wê demê de êrîşên dijmin pir zêde ne, bê sînor in. Çiqes qada têkoşînê mezin dibe, dijmin ew qesa ditirse. Ji bo vê êrîşên xwe dijwar dike. Hevala Zekiye, li ser şopa heval Mezlûm, li dijî wê zilmê çalakî dike.

**-Di Keleha Dagirkeran De, Dengek Ji Têkoşîna Azadiyê Re; Rehşan**

Heval Rehşan jî, bi eslê xwe ji Mêrdînê ye. Lê koçî Îzmîrê kirine, di Newroza 92’yan de li Qedîfe Qeleyê çalakiyeke pêk tîne. Di emrekî ew qesa ciwan de, li metrepolên Tirkan û navenda pergalê, vê çalakiyê dike. Lewra Îzmîr ji avabûna komarê û vir ve keleheke girîng ya pergalê ye. Di emrekî ciwan de, cihekî wisa çalakî li darxistin, pir girîg e. Jixwe di nameya xwe de jî dibêje, “**li bajarekî weke Îzmîrê, li dijî êrîşên ku dijmin li ser gelê min dide meşandin, ez çalakiya xwe dikim.”**

Girêdana xwe ya bi Serokatî û têkoşînê re bi hevokên pir sade û zelal tîne ziman. Dibêje, “**li cihekî weke Îzmîrê, ez dixwazim bibim dengê têkoşîna azadiyê.**” Bi vê şiyarê çalakiya xwe dike. Piştî vê êdî li metrepolên weke Îzmîr û Stenbolê jî gelê me radibe serhildanan, di heman demê de xwedî derketineke mezin jî di van qadan de derdixe holê. Gelê

me yê metrepolan jî, êdî li Serokatî, nirxên partiyê û şehîdan xwedî derdikeve.

Bi giştî di vê demê de; di 89, 90 û 91'an de; çalakiya hevala Bêrîvan, hevala Zekiye û hevala Rehşan her yek li herêmeke tê kirin. Lê di şexsê van hersê hevalan de; Serokatî dibêje, **"êdî jin li ku dibe, bila bibe asta girêdana xwe; bi têkoşîna xwe dide diyarkirin. Bi vê astê de jî, xwesteka xwe ya pêşengiyê diyar dikin"**. Bi rastî jî ew hewldanên hevalan, pêşengiya jinê derdixe holê. Lewra bi şehadete hevalan bi sedan jin tevlê têkoşînê dibin. Li hemû herêman, beşdarbûna jinê ya herî zêde, di vê demê de ye. Li derveyî welêt jî wisa ye. Bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê, teqîneke tevlêbûnê çêdibe.

Serokatî van hevalan li hemû cihan belav dike. Hem tevlî şerê gerîla dibin; heya Dêrsîm û Botanê diçin, hem jî diçin metrepol û bajaran. Li hemû gund û bajarên Kurdistanê, pêleke tevlêbûnê destpê dike. Kom bi kom tevlî nava refên gerîla dibin. Bi awayekî xwezayî, artêşeke jinê tê avakirin.

### Di Kongreya Çaremîn Ya PKK'ê De Jin

Di sala nodî de, kongreya çaremîn ya partiyê çêdibe. Di vê kongreyê de deh hevalên jin hene. Di vê kongre de, dîsa Serokatî perspektîfên ku di kongreya seyemîn de dane, kûr dike. Herî zêde pratîka çar çeteyan (dörtlü çete), tê mahkûm kirin. Tahrîbat û pratîkên ku bandora neyînî li ser gel çêkirine û teyisîna wê ya li ser giştî tevgerê çêbûye digirin dest. Darbeyên mezin li xeta paritiyê xistine, ew xet û nêzikbûn tê mahkûmkirin. Pê ve girêdayî, biryara mezinkirina ARGK û kûrbûna di textîkê gerîla de tê stendin.

Weke me got, deh hevalên jin jî di vê kongreyê de hene. Her wiha di vê kongreyê de cara ewil hevalên jin jî, ji bo qomîteya navendî ya partiyê tên hilbijartin. Yek ji van hevalan, hevala Sozdar e. Du heval jî weke yedek tên hilbijartin. Lewra wê demê hem endamên asil hebûn, hem jî yedek hebûn. Di qomîteya navendî de, hevalek jin weke endama asil, du hevalên jin jî weke endamên yedek tên hilbijartin. Serokatî êdî rista pêşengtiyê jî dide hevalên jin. Lewra di asta herî jor de tên hilbijartin. Bi rastî jî di kongreyên berê de jî, rola hevalên jin heye, Serokatî cih dide wan. Lê di kongreya çaremîn de fermî dibe. Perspektîfa kongreyê, bi taybetî ji milê hevalên jin ve, Serokatî dide. Heya niha jî berdewam dike. Herî zêde di vê mijarê de, Serokatî bi pêşdîtin nêzî mijara jinê dibe.

**Piştî Nodî Asta Têkoşînê Û Ferasetên Şaş**

Ji nodî û vir ve, hem ji bo giştî tevgerê, hem jî ji bo tevgera jinê pêşketinên mezin derdikevin. Ji aliyê tevgera jinê ve, hem ji aliyên rêxistinbûyin û tevlêbûnê ve, hem jî ji aliyê çawaniyê (nitelik) ve xurtbûneke mezin çêdibe. Li her eyaletê tevlêbûna hevalên jin heye. Heya wê demê li hinek herêman û ji hinek derdor tevlî partiyê dibûn. Wisa hilbijêr nêzikbûnek hebû, di tevlêbûnê de. Lê êdî piştî nodî, hemû derdorên jin yên civakê tevlî partiyê dibin; jinên xwendekar, jinên xwedan mal, yên karker ûhwd tevlêbûneke xurt dikin.

Ew bi xwe re du encaman derdixe holê. Ya yekemîn hevalên jin ku heya niha tevlê dibûn, bi piranî hevalên bi zane bûn û tevlêbûneke bi bîrdozî hebû. Lê ji ber ku piştî nodî, hevalên ku tevlê dibin bi piranî ji bandorbûna serhildanan û bi awayekî girseyî tevlê dibin, pirsgirêka çawaniyê (nitelik) derdikeve holê. Ya duyemîn jî şexsiyeteke ne avakiriye û kesayet rûneniştiye; di nava pergalê de mezin bûye û beşdarbûneke hestiyarî çêdike. Ew jî bi xwe re, di nava partiyê de; hem di nêrîna şer de, hem jî di jiyanê de tiştên şaş derdixe. Mesela têkiliyên şaş derdikevin, weke pengaveke şoreşgerî şer mêzekirin çênabe, bi bîrdozî girtina dest lewaz e. Bi taybetî di nêzikbûnên hevalên jin de ew yek derdikeve holê.

Heman nêzikbûn ji aliyekî din ve di hevalên xort de jî heye. Di nava civak û pergalê de nêzikbûna xwe çi be, teyisîna xwe li ser tevlêbûna partiyê jî dike. Baweriya xwe zêde ji hevalan jin neanîn, biçûk dîtin, weke ku ew nikarin kar bikin girtina dest, ji aliyê hevalên xort ve derdikevin holê. Ji aliyê jiyanê ve jî, cih bi cih bi kevneşopiyan nêz bûn, weke xûçka xwe dîtin, dixwaze bike bin venêrîna xwe û biparêze. Ew hemû ji ferasetên ku ji civakê girtine derdikevin. Ew bi xwe re problemên mezin derdixe holê. Ew ji bo şer û têkoşînê astengiyan derdixe. Li pêşiya jiyana azad ku em dixwazin ava bikin dibe asteng.

Weke feraset ew tişt, piştî nodî, li hemû herêman derdikeve holê. Lê ger baş bihata karanîn, di vê demê de pêşketinên ku hene, bingeha şoreşê derdixin holê. Serokatî jî dibêje, “firsenda mezin herî zêde di vê demê de derket holê, lê hûn ji şoreşê re ne amade bûn”. Ji nodî heya nod û sisêyan berdewam dike.

Ew yek di nêzikbûnên hevalên xurt de jî, feraseta deshilatdariyê, fermandariya erzan, yetkîperestiyê dirdixe holê. Lê dema ku ew fersenda ku derketiye holê, baş nehat bi karanîn ew feraset derketin, Se-

rokatî nirxandinên berfireh kirin. Hem dahûrandinên şexsiyetê kirin, hem jî di saxaya Serokatî de, bi hezaran heval perwerde dikirin û dişandin welat ku van ferasetan ji holê rake. Serokatî ji bo vê pêvajoyê dibêje; “**we ne rast şer kir, ne jî rast jiyan kir.**” Dibêje, “**pêvajoya şerê asî û aware ye, şêwaza we ya asî û aware, têkiliyên we yên jiyanê; bi awayekî ku ji koletiyê hûn xilas nebûne derket holê”**.

Piştî vê pêvajoyê, di nava civakê de perspektîfa Serokatî ya ji bo jinê jî berfirhtir dibe. Lewra gav bi gav dahûrandin û perspektîfên xwe mezin dike. Di navenda van perspektîfan de jina Kurd heye, lê ji bo hemû jinan perspektîfekê pêş dixe. Ji bo giştiyê azadiya jinê mêzekirinek derdikeve, di encama vê de ji gel û netewên din jî jin tevlî partiyê dibin. Yanî pirsgirêka azadiyê, Serokatî êdî tenê di şexsê Kurd û Kurdistanê de nagire dest. Bi rastî jî dagirkerî li ser mêjiyê hemû cîhanê heye. Jixwe ji derketina PKK ve ew perspektîf heye; mînaka herî ber bi çav jî hebûna heval Kemal, heqî wan e. Yanî gelên din jî digire nava xwe, têkoşîn ji bo wan jî pêş dikeve.

Ew feraset û nêrîn (algı), perspektîf û bîrdozî êdî bandora xwe li ser gelên din jî dike. Berî wê jî ji netewên din hevalên jin hene, lê piştî nodî zêdetir dibin. Hejmara wan digêhêjî dehan hevalan, gelekên wan şehîd jî dikevin. Dîsa ji gelên Tirk, Ermenî, Ereb, Alman tevlêbûna şoreşê çêdibe. Ew beşbarbûn ji bo şoreşa jinê, hem barê şoreşê dide diyarkirin, hem jî pirsgirêkên tên jiyankirin; tenê ne pirsgirêkên jinên Kurd e, pirsgirêkên hevpar in. Çareseriyê jî di nava têkoşîna me de dibînin. Yanî di vê astê de jî têkoşîna me baweriyeke dide avakirin. Yên ku bîrdozî û stratejiya wê nas dike, baweriya xwe ji vê paradîgmayê tîne ku dê civakê û jinê azad bike.

Li her çar parçeyên Kurdistanê jî, êdî tevlêbûn zêde dibe. Li Rojava berî wê jî hinek tevlêbûn hebûn, lê her çar parçayan tevlêbûna girseyî, piştî nodî ye. Mesela hinek hevalên jin yên Rojhilat, tevlêbûna xwe di nodî de çêkirine. Başur jî tevlêbûnek heye. Bi vê re jî tiştê ku derdikeve holê; dagirkeran Kurdistan parçe kirine, sînor kirine navbera wan. Lê bi derketina têkoşîna PKK re, bi taybetî bi derketina tevgera jin re, li her çar parçeyên Kurdistanê netewiyet û rihekî hevpar derdikeve. Ji aliyê jina ve jî baweriyeke yekgirtî dide. Êdî li her çar parçayan têvlêbûneke xurt çêdibe. Yanî piştî vê demê hem di qada navnetewî de têkoşîneke jinê û yekgirtiyeke jinê dirdixe holê, hem jî di qada netewî de. Jixwe xebatên me yên ku bi van tevgerên din re çêbûne jî, li ser wê bingehê ne. Berhemên xwe îro jî dide. Ew gav avêtinên destpêkê girîng in.

**Piştî Nodî Rewşa Qadan Û Jin**

**-Qada Civakî**

Di vê demê de li qada civakê de, eksena têkoşînê Bakur e. Li Bakur, di nava civakê de, gelek kar tên kirin. Ew xebat rasterast, ji aliyê Serokatî ve tên arestekirin. Serokatî di serî de hinek hevalan dişîne metrepolan, lê pişt re gelek hevalên jin dişîne bajaran ku qomîte û rêxistinbûnê çêbikin. Lê di pratîka Bakur de, xwesteka Serokatî tam bi cih nayê. Mesela gelek heval hema tên girtin. Şêwazê wan yê jiyan û têkoşînê ji dijmin re vekiriye. Şêwazeke wisa bêyî ku deşîfre bibin, rêxistinkirina civakê pêş nakeve. Zû deşîfre dibin; an tên giritin, an jî ji bo ku zindî nekevin destê dijmin, xwe şehîd dixin. Ew yek tarzekê derdixe holê, hinek hevalên xort jî hene, lê bi taybetî di hevalên jin de ew şêwaz derdikeve holê.

Serokatî vê şêwazê rexne dike, dibêje min ew qes sal perwerde da we, hûn gihandin; lê hûn diçin bi erzanî xwe dikûjin. Jixwe dijmin jî wê dixwaze. Dibêje ew şêwaza têkoşînê dernaxe holê, xwe ji psîkolojiya mirinê rizgar nekirin e. Wê demê ew li Wan, Tatwan, Îzmîr û gelek cihên din tê pêş xistin. Serokatî, pir eciz dibe li hemberî vê, heta çekhilgritinê qedexe dike. Lewra wê demê hevalên ku di nava civakê de kar dikin jî, çek hildigirin. Serokatî helwestekê datîne, dibêje yek hûnê xwe biparêzin û nekevin destê dijmin; ya duyan jî hûnê xwe nekûjin. Her du şêwaz jî di rastiya Serokatî û partiyê de tune. Serokatî dibêje, “armanca min jin û civak dayina jiyankirin e. Dibêje divê hûn li hemberî dijmin vê isbat bikin. Bi rastî jî Serokatî, mudaxaleyî ew rihê me ku zû pes dike, dike.

Ew feresat niha jî di me de heye. Em zû pes dikin, zû dev ji tiştan berdidin. Rûmetek jî heye,  naxwaze bikeve destê dijmin û xwe şehîd dixe. Serokatî di hahûrandinan de pir li ser van nêzikbûnan disekine; dibêje, “hûn min fêm nakin. Hûn nikarin bi textîk nêz bibin”. Kêmasî û şaşitiyên ku di pratîkên me de derdikeve, Serokatî rexene dike, dahûrandina wê dike û mahkûm dike. Varna jî rasterast helwest datîne. Mesela çek nedayina hevalên qada civakî, helwesteke wisa ye.

**-Qada Zindanan Û ZDK’ya Yekemîn**

Dîsa di vê demê de pêvajoya zindanan heye. Me berê jî da diyarkirin ku di berxwedana zinadanan ya ewil de rihekî çawa derketiye û

bandora xwe çawa li ser civakê kiriye. Êdî b+i demeke şûn ve, êrîşên dijmin û siyaseta wan li ser zindanan cuda dibe. Ya rast êdî dewleta Tirk, siyaseta dewletên Rojava ku li ser zindanan dide meşandin, ji xwe re mînak digire û êrîşeke cuda dike. Vê siyasetê dişopîne. Serokatî vê pêvajoyê pir berfireh dide diyarkirin, bi taybetî dahûrandina mijara ku siyaseta dewleta Tirk, di zindanan de çima hat guhertin dike. Armanca dewlata Tirk, şikendina rihê berxwedanê yê ku di zindanê de hatiye afirandin e. Serokatî jixwe wisa pênase dike. Ji bo vê jî siyaseta xwe ya zindanê guhert. Herêm bi herêm, Heta heval bi heval siyaseteke dide diyarkirin.

Di vê demê de, di berxwedana zindanê de jî sistbûnek çêdibe. Bêguman dîsa berxwedaneke giştî heye, lê li gorî rihê pêvajoyê û li gorî rihê berxwedana zindanê di tevgerînê de sistbûnek tê jiyankirin. Jixwe di konferansa zindanan ya yekemîn (ZDK ya yekemîn) de, Serokatî pir berfireh van rewşan dinirxîne. Serokatî rewşa zindanan wê demê ji nû ve girt dest û ew ferasetên şaş mahkûm kirin. Konferans li derveyî welat, bi tevlêbûna gelek hevalên ku ji zindanan derketine hat li darxistin. Heval Sara wan jî di wê demê de derketibûn û beşdarî vê konferansê bûn.

Serokatî tehlîla, “**ji siyaseta dijmin re bingeh hatiye afirandin û bi kesên weke Şener, dijmin xwesteka xwe di zindanan de pêkaniye**” dike. Di konferansê de biryarên nû derdikevin. Bi taybetî ji aliyê ji nû ve girtina dest û ji nû ve rêxistinkirina zindanan ve biryarên nû tên girtin. Lewra ji aliyê berxwedan û jiyanê ve pir ferasetên şaş derketine. Di warê têkiliyên jinê de jî wisa ye. Lewra gelek hevalên jin jî di zindanê de hene û gelekên wan kadro ne. Bi kurtahî pratîkeke weke zindan nexistina xizmetê pêvajoyê, Serokatî weke pratîka tasfiyeyê dinirxîne.

Ji warê jin ve jî, sekinandin û helwest derdikeve holê, lê pişt re sistbûyinek çêdibe. Serokatî vê jî mahkûm dike. Me di serî de dabû diyarkirin, rihê heval Sara ku li hemberî dewleta Tirk daye diyarkirin, heya dawiyê berdewam nake. Lewra dijmin textîkên xwe diguherîne. Serokatî bi taybetî di mijara jin de jî dahûrandinên pir kûr dike. Lewra bi taybetî di zindanê de li ser jinê şêrê herba xas heye. Êrîş bi temamî xizmetî, zêhniyet û çanda tecavûzê dike. Di vê derbarê de nêzikbûnên me yên hevalên jin, ne bi bîrdozî û zane ye. Serokatî dibêje, li hemberî van siyasetan, “hûnê xwe bi bîrdozî û zane bikin”. Mirov dikare zindan bi zindan jî bigire dest; lewra her zindanekê siyaseteke wê ya cuda he-

ye. Lê bi giştî mirov dikare wisa binirxîne. Her wiha dahûrandin û tehlîleke Serokatî, bi vî rengî jî, di vê demê de heye.

### -Qada Leşkerî Û Gerîla

Di vê demê de, li qadên çiya jî; ji 91, 92 û heya 93'yan nêzikbûnên tasfiyeger derdikevin holê. Bi taybetî di mijara jin de, nêzikatiyên bi vî rengî derdikevin. Sedemeke vê ew e, ji ber ku tevlêbûn pir çêdibin û îmkanên perwerdê pir tune ne, nêzikatiyên bi vî rengî derdikevin holê. Lê hemû tişt ne ew e. Sedema herî girîng, di nêrîna mijara jinê de, weke Serokatî girtina dest tune. Perspektîfa ku Serokatî datîne, li herêm û eyaletan pêk nayê. Ji milekî ve moral û kelecanekê dide avakirin. Guhertineke dide çêkirin û baweriyekê ava dike. Lewra tevlêbûn pir in, her jin bi hêviya rizgariyê berê xwe dide partiyê. Lê ji milê din ve jî, di nêrîna herêman de, li gorî perspektîfa şer ya Serokatiyê gav nayên avêtin.

Serokatî difikire ku civak amade ye, lewra serhildan çêbûne. Êdî yê ku vê pengavê temam bike, gerîla ye. Mesela Serokatî, wê demê perspektîfa qadên rizgarkirî da; qadên sor hebûn. Ew ne pengaveke demdirêj bû, an jî ne xeyalek bû. Asta şoreşê gihêştibû wê encamê. Di vê demê de textîkên şerê gerîla pir bi sînor dimînin. Ji aliyê serokatiya textîkî ve fêmnekirina vê demê heye. Nikare vê perspektîfê tam bixwîne. Mesela li Bakur, xeynî çend cihan ew perspektîfa qadên rizgarkirî nakeve pratîkê. Mesela Amedê, hejmara hevalên jin û xort, gihêştibû sê hezaran. Botan û Dêrsîm jî Wisa bû. Eyaleteke ku hejmara wan ji bin hezarî re ye, tune bû. Yanî hêza hemû eyalatan hebû. Hevalên jin jî, li her eyaletê bi sedan hebûn. Serokatiya textîkî ew perwerde nedikirin.

Di wê demê de pratîka Amedê hat mahkûmkirin. Partiyê weke bi dijmin re hevkirinê nirxand; ne tu dest min bide, ne jî ez dest te bidim. Ji milê jiyanê ve jî, tehlîla têkiliyên şaş û sosyalleşmeya şaş hat tehlîlkirin. Pratîka ku ji eyaletê dida windakirin jî, şêwaza jiyana şaş bû. Serokatî digot, **"hûn di jiyanê de winda dikin, ji bo wê hûn di şer de jî winda dikin."** Digot ger serkeftin di jiyanê de were çêkirin, dê di şer de jî were çêkirin. Tabî teyisînên vê li ser eyaletên din jî hebû, lê navend Amed bû.

Mesela gelek hevalên jin şandina malê, di vê demê de çêdibe. Pişt re derket holê ku niyeta Şemo çi bû. Lê bi hinceta nikarin şer bikin,

qewet pir bû, me nedikarî perwerde bikin û barê me giran dibû; ji ber vê jî me hevalên jin rêkirine derdixistin pêş. Lê di bin vê de hevalên jin weke hêz nedîtin, şer karê jinê nedîtin e. Jinê biyolojîk digire dest, dibêjin biyolojiya jinê ji bo şer ne mûsaît e, nikare şer bike. Di bin vê mêzekirinê de jî, zêhniyeta jinê biçûk dîtin heye. Jin kêrî şer nayê, nikare gerîlatiyê bike, tênê dikare karê malê bike. Di nava civakê de û mal de dikare kar bike.

Di vê demê de gelek hevalên jin ku ji her derdorê tevlê dibin, ji aliyê rêveberiyê ve rêdikin malê. Dibêjin bila karê civakê jî bikin, wê jî dikin hincet. Lê ew texrîbatên mezin dike. Gelekên wan hatin girtin. Hê di zindanê de ne, hinek jî derketin û hatin qadan. Hinek jî hatin şandin, lê çûn eyaletên din tevlê partiyê bûn.

Di vir de xwesteka jinê, ya ji civaka kole xilasbûyin, rizgarbûyin heye. Vê rizgariyê jî di riya partiyê de, di tevgera azadiyê de dibîne. Ji bo vê tevlî têkoşînê û partiyê dibe. Lê milê din, ew zihniyet kar û têkoşîna jinê li gorî mêr dide diyarkirin. Bi rastî jî bandorên wê hê jî hene. Dibe ku ne weke pratîka Amedê be; lê jin biçûk dîtin û hinek kar weke karê jinê nedîtin hene. Ew mantiq û nêrîneke dide diyarkirin. Di eyaleta Amedê de ew mêzekirin, xwe pratîk dike, jiyanî dike. Serokatî tiştekî cuda dibêje, perspektîfa wî cuda ye; lê li qadan nêzikatiya mêrê serdest û deshilatdar derdikeve holê. Hin hincet û sedaman diafrînin; lê di rastiya xwe de pirsgirêka zêhniyetê ye, pirsgirêka azadî rast negirtina dest e. Bi taybetî piştî nodî ew pratîk derdikeve holê.

Mesela di aramanca partiyê de ew hebû; divê Amed jî bibûya qadeke rizgarkirî. Hem qada civakê, hem jî qadê gerîla ew potansiyel hebû. Rûxmî ku di serokatiya textîkî de ew xitîmîn hebû, lê realîteya heyî, gel amade bû. Îmkanên gel ku dida vê eyaletê bê sînor bûn. Hemû derfetên xwe ji partiyê re vedike ku azad bibe. Ji bo vê Serokatî dibêje, “we şoreş nekir û firsendeke mezin revand”.

Di vê demê de bi taybetî ji bo Amedê û hemû qadên din; gerîla kişandina nava pevçûnan heye. Di çiyan de pevçûn kirin, gihêştina hev ya gel û gerîla asteng kirin heye. Ew textîkeke dijmin bû, lê serokatiya textîkî jî tê vê lîstikê. Jixwe hêzên me jî pir û li her derê ne, dijmin derdikeve operasyonan û pevçûn derdikevin. Şêwaza gerîla jî pir nayê pêkanîn û windahiyên komî tên dayin. Di vê demê de windahiyên komî herî zêde li Xerzanê hene. Ji 91’an heya 97’an wisa berdewam dike. Dijmin ji bo her eyaletekê textîkeke cuda dide meşandin. Xerzan jî di

navbera hemû eyaletan de ye. Di navbera herêman de weke cihê çûn û hatinê tê bikaranîn, dijmin jî li gorî wê textîkekê dide meşandin û dixwaze îmha bike. Li hemû herêmên Xerzanê, êrîşên bi vî rengî hene.

Serokatî vê şêwazê jî, weke şêwaza asî û aware dinirxîne. Yanî gelbûyin û girseyîbûn tune. Dikevin hinek pêvçûnên biçûk, lê di her pevçûneke de gelek heval şehîd dikevin. Bi xwe re şêwaza serkeftinê jî nayne. Di vê demê de hevalên jin jî, pir şehîd dikevin.

Dîsa di vê demê, li Dêrsîmê jî pirsgirêkên rêveberiyê hene. Pirsgirekên ku derdikevin de, çareseriyeke hevpar dernakeve holê. Di rêveberiyê de problem hene. Di wê demê de, Ekrem wan jî li wir in. Yanî kesan zêdetir, em bi ferasetan digirin dest. Pratîka Dêrsîmê jî, li hevkirina bi dijmin re ye. Jixwe li wir beşdarbûna hevalên jin jî pir e. Bi sedan hevalên jin beşdar dibin. Hevalên ku têdikoşin û xwedî angaşt (îdîa) in. Çawaniyeke wan jî heye. Lê pirsgirêka pêşengiya jin ku di hemû herêman de derdikeve holê, li Dêrsîmê jî derdikeve holê. Li vir jî herî zêde têkiliyên teng û malbatwarî derdikevin. Têkilyên xwendekariyê hene. Xwe bes dîtin heye. Ji pêşketinê re xwe digirin.

Şaş nêzikbûna azadiyê, herî zêde di vê eyaletê de derdikeve holê. Bi taybetî xwendekar, li vê eyaletê tevlê dibin. Di şexsê wan de nêzikbûna bûrjûvaziya biçûk, derdikeve holê. Tabî di wê demê de hê rêxistinbûnên xweser tune. Nêzikbûna rêveberiyê çi be, bandora xwe li ser hemû avahiyê dike. Di nava rêveberiyê de jî weke şexs, temsilî hinek hevalên jin hene. Weke vîneke rêxistinî û xweser hêza jinê tune. Hê pêş neketiye. Li hemû eyaletan nêzikbûna jinê di însafa rêveberiyê de ye. Li gorî eyaletan jî nêrîna jinê cuda ye. Li her eyaletê, nêrîna li jinê li gorî feraseta revêberiyê ye. Li Dêrsîm, Amed, Xerzanê wisa ye. Herî zêde jî ew nêzikbûn li Botan û Zagrosê derdikeve holê.

Bi taybetî di pratîka Zagrosê de, pîvanên ku ji bo jinê datînin holê, li ser esasê qrîterên ku mêr datîne holê ye. Mesela fîzîkî xurtbûn esas girtin; ger jinek, ji aliyê fîzîkî ve ne xurt be, dibêjin nikare şer bike. Ew bi demê re tîplemeyekê derdixe holê. Nêrînekê derdixe holê.

Heman tişt li Botanê jî heye. Ji bo tevgera giştî jî, ji bo tevgera jinê jî, Botan navenda şerê çekdarî ye. Hevalên ku destpêkê şehîd dikevin, hemû li Botanê ne. Serokatî Botanê ji bo jinê jî weke cihekî taybetî digire dest. Li Botanê ji aliyê jinê û fermandariyê ve danehevek heye. Lê rûxmî vê Botan tîplemeyeke jin derdixe holê. Ew pir ne dûrî ya Zagrosê ye. Di ya Zagrosê de, hilbijêr nêzbûn heye. Dibêje bikare, an na. Dikare,

an na. Di ya Botanê de jî, dibêjin ger bike dê wiha bike. Şibandina mêr heye. Di şer de jî, di jiyanê de jî; şibandin heye. Dike, lewra danehevek derketiye holê, lê divê weke mêr bike, weke mêr bigire dest. Jixwe dema ku rêxistinên xweser çêdibin, teyisînên vê tîplemeyê li her eyaletê cuda cuda derdikevin holê. Li Botanê jî, nêzikbûnêke wisa derdikeve holê.

Dema mirov giştî bigire dest; xala hevpar ya van pratîkan çi ye? Neketina perspektîfa Serokatî ku ji bo jinê datîne ye. Her yekî xweserbûnên xwe hene, lê bi giştî mirov dikare wisa binirxîne.

**Kongreya Zelê Û Nêzikatiyên Tasfiyeger**

Di vê demê de, bi taybetî me pratîka qadên Bakur yên civakî û qadên din da diyarkirin. Li Başur jî, bi taybetî li xeta Qendîl û Zelê wê demê hevalên jin pir hene. Bi sedan heval di qampan de ne. Beşbarbûn pir hene. Bi taybetî li Heftenîn, Xakûrkê û Qendîlê gelek hevalên jin hene. Êdî hevalên jin qampên xwe xweser rêxistin dikin. Di vê demê de, Serokatî hem amadekariyên rêxistinbûna xweser dike, hem pêrspektîfa demên pêş derdixe, hem jî pratîkên şaş yên qadan dinirxîne. Êdî danehevên ku hevalên jin di pratîkê de derxistina holê, Serokatî dixwaze, bike perspektîfa demên pêş. Encamên vê jî, bi welat re parve dike. Bi navendên herêman re parve dike, nîqaş dike, nêrînên hevalan digire.

Li ser vê esasê Serokatî, dixwaze potansiyela derketiye holê bizivirîne konferasekê û bi encam bike. Da ku jin bikaribe, rewşa xwe nîqaş bike û di derbarê xwe de biryar bigire. Divê jin êdî asta xwe bibîne û bi vîna xwe pêşeroja xwe diyar bike. Dixwaze vê li hemû pêkpateyê belav bike. Lewra ferasetên şaş ku li herêman pêş dikevin, êdî li pêşiya têkoşînê û pêşketinê dibin asteng. Bandora xwe li ser hemû tevgerê dike. Ger pêşiya van ferasetên weke li gorî mêzekirin û li gorî xwe nêz bûnê neyê girtin; dê xeta Serokatî bê guhertin. Bi giştî derketina derveyî xeta Serokatî çêbibe. Bi vê Serokatî perspektîfeke wisa ku pêşiya xetereyan jî bigire pêş dixe.

Jixwe xeta Serokatî jî, pêşxistina azadiya jinê ye. Mirov tenê weke pêşiya xetereyan girtin jî mêze bike, nabe. Em carina wisa mêze dikin, ew nêrîna Serokatî teng kirine. Serokatî xwedî nêrîneke berfireh û demdirêj e. Mijarên ku digire dest, tenê li ser esasê pirsgirêkên heyî nagire dest; Serokatî dixwaze guhertinên bingehîn bide çêkirin. Ew ji bo Serokatî rêgezek e. Dixwaze şêwaza jiyanê bide guhertin, dixwaze zêh-

niyetê bide guhertin. Em bi xwe, di wê demê ji vê armancê dûr in. Serokatiya textîkî û avahiya partiyê ji vê dûr e.

Çareseriyên ku Serokatî datîne jî, bi pirsgirêkên rojanê ve girê didin. Bi taybetî di dema artêşbûnê de ferasetên wisa şaş pir derketin. Wê demê ew mêzekirin dibe nêrîneke textîkî. Tu dibêjî qey di cewherê xwe de nêrîneke wisa tune be. Ew ji li azadiyê û têkoşînê teng mezikîrin e. Bi taybetî jî di mijara jin de kêm mêzekirin e. Serokatî pirsgirêkên ku derdikevin jî, bi ferasetan ve digire dest û bi rastî jî bi ferasetan re têkoşîn dike. Dizane ku ger pêşiya wan negire, ew feraset dê bi xwe re encamên cuda derxin holê. Heya demeke dirêj jî wan ferasetên xwe dispêrin partiyê û Serokatî. Mesela Şemo ji wan yek e. Feraset û modela xwe ya jinê jî li ser partiyê ferz dike. Nêzikatiya xwe dixwaze li hemû herêman ferz bike.

Bi giranî li xeta Xakûrkê û Zelê, ew nêzikatî heye. Ew yek hinek di şexsê rêveberiyê de derdikeve. Wê demê berpirsiyariya wir jî Ferhat dike. Nêzikatiya wî jî; di mijara şer û jinê de, ji nêzikatiyên Serokatî qut dibe. Berovajîkirin derdikeve, tasfiyekirin çêdibe. Li ser navê sosyalbûyinê, jiyana berovajî pêş dikeve. Piştî tasfiyegeriya 2004'an derket jî, Serokatî got, ew nêzikbûn di şexsê Ferhat de hê wê demê derkatibû holê. Feraset û şêwazê têkiliyên civakbûyina şaş, wê demê, li vê xetê pêş dikeve. Bandora vê jî, li ser xebat û têkoşîna jinê çêdibe. Em pir nakevin kîte kîteyan, em zêdetir bi ferasetan vedikin.

Di vê demê de, weke mekan Serokatî dixwaze li vê qadê konferansa jinê li dar bixe. Lewra li vê qadê hevalên jin gelek in. Her wiha hevalên jin yên xwedî ezmûn jî, li vê qadê ne; Hevalên ku di destpêkê de tevlêbûne û kevn in. Ya seyemîn jî, îmkan heye ku Serokatî bi riya teknîkê, xwe bigihîne vê qadê û danûstendinan bike. Serokatî van şert û mercan hemûyan di ber çavan re derbas dike û li Zelê perspektîfa kongreya jin ya yekemîn dide.

Kongraya yekemîn ya jinê, di 1993'yan de li Zelê tê çêkirin. nêzî sêsid hevalên jin delege ne. Lê bi giştî ji çarsidî zêdetir hevalên jin tevlê dibin. Pirsgirek û perspektîfên jinê, yên hemû qadan divê bigirin dest û nîqaş bikin. Mesela qada zindanê, qada civakî, derveyî welat û ya herî girîng jî di nava gerîla de; asta ku tevgera jinê gihêştiyê çi ye û divê çi were kirin? Serokatî vê perspektîfê dide pêşiya kongreyê. Lê wê demê Ferhat li wê qadê ye. Rûxmî ku perspektîfa Serokatî heye, Ferhat mudaxilî kongreyê dibe. Dibêje "ez rêveberiya partiyê me, berpirsiyarê

herêmê ez im, hevalên jin jî di bin berpirsiyariyên min de ne". Hevalên jin jî tu bertekan nîşan nadin, xwezayî dibînin. Jixwe birayê Serokatiyê jî. Lêpirsîn nakin. Serokatî vê nêzikatiyê rexne dike.

Heval nikarin nêzikatiya Serokatî jî bi awayekî zelal bixwînin. Lewra Serokatî sekneke bi temamî xweser dixwaze. Bingeha xwebûyinê, hê di wê demê de dide. Lê asta xwendina me û zanebûna me jî ew qes tune. Di pratîkên herêman ku me da diyarkirin de jî, fêmkirineke rast ya hevalên jin tune. Ew jî dibe sedem ku têkoşîna bîrdozî û cinsî jî baş neyê rêxistinkirin. Sedemek nêzikatiyên hevalên xort be jî, sedama din baş xwe zane nekirin û fêm nekirina hevalên jin e.

Ew her du nêzikbûn di kongreyê de hev û din temam dikin. Dema ku wisa be, kongre li ser van her du ferasetan rûdine û wisa jî berdewam dike. Nêzî deh rojan nîqaş tên kirin, Serokatî jî ji derve dişopîne. Herî zêde jî nêzikatiya Ferhat ya şer, jiyan û rêxistinê bandora xwe li kongreyê dike. Di kongre de biryara TAJK (Tevgera Azadiya Jinên Kurdistan) derdikeve. Tevgera jin êdî wisa xwe bi nav dike. YJWK ji holê radibe. Weke hemû tevgera jin ya welat û derveyî welat TAJK tê avakirin. Yanî nav diguhere.

Dibêjin "hevalên jin yên nexweş û birîndar dikarin bizewicin". Di şer de ji bo wan qrîter tê danîn. Divê jin di hemû herêman şer de, di pêş de nebin, çekên giran ranekin. Ew hemû dibin biryar. Bi rastî jî ew jî nêrîna biyolojîk e. Yanî bi awayekî xwezayî biyolojiya jin kêm e, ji bo wê çareserî jî di biyolojiyê de tê dîtin. Dibêjin "nikare van bike". Yanî ji mantiqa "nikare bike" derdikeve. Mesele baş nayê tehlîlkirin. Lê Serokatî dibêje "pirsgirêka jin ya şerkirinê nema, ji holê rabû". Lewra li her derê tevlî têkoşînê bûn û xwe isbat kirin. Biryarên bi vî rengî pir in. Lê feraset ew e; xwe ji feraseta kevneşop xilas nekirin heye.

Dema ku tekmîla vê kongreyê didin Serokatî, Serokatî vê kongreyê red dike. Dibêje, "ew kongre di bin siya mêr de hatiye çêkirin". Feraseta mêr mohra xwe li vê kongreyê xistiye. Ger bi vî awayî ez vê kongreyê qebûl bikim, ez ê ji feraseta xwe ya azadiyê tawîz bidim. Lê ez tawîz nadim". Yanî têna ne biryarên kongreyê, hemû kongreyê red dike. Li ser vê jî, di nava giştî tevgerê de Serokatî pêvajoyeke nû dide destpêkirin.

Mesela berî kongreyê, Serokatî ji her kesî nêrînan dixwaze, li ser vê Şemo raporeke dirêj ji vê kongreyê re dişîne û rapora wî di kongreyê de jî tê xwendin. Di vê raporê de tiştên ku Serokatî mahkûm kirine hemû

hene, ew nêrînên Şemo bi piranî dibin biryar. Nêzikatiyên Ferhat jî wê raporê temam dikin. Ji bo vê jî Serokatî weke feraseta mêr digire dest. Çewt nêzikbûnek heye. Dibe ku di şexsê Ferhat û Şemo de ew tişt şênber dibin, lê bi giştî jî nêzikatiyeke şaş li azadiya jin heye. Ji bin bandora mêr dernexistin heye.

Jixwe êdî nikarin bibêjin bila şer neke; lewra ne Serokatî, ne jî jin êdî wê qebûl dike. Lê dibêjin "bila şer bike, lê di bin venêrîna me de be". Dîsa di vir de vîna jinê nedîtin heye. Li gorî pênaseya Serokatî nêz nabe. Li gorî nêrîna xwe pênase dikin.

Li ser vê kongreyê Serokatî, di mijara dê jina azad çawa be û çawa jiyan bike de, dahûrandin dan destpêkirin. Hê jî em van dahûrandinan temaşe dikin. Wê demê ew dahûrandin hatin welat jî, di van dahûrandinan de Serokatî bi awayekî berfireh dahûrandina kesayeta mêr û jinê dike. Her wiha Serokatî ji bo salên borî lêkolîn dide destpêkirin. Piştî vê kongreyê Serokatî 48 pirs derxistin û ji hemû hevalên welat re rêkir. Di nava van pirsan de, nêrîna şer, nêrîna jiyanê, nêrîna textîkê ûhwd hebû.

Serokatî bi van pirsan hemû avahiya hevalan û rêveberî xist nava lêgerînan. Êdî hemû avahî mêrekî çawa dixwaze, jineke çawa dixwaze, jiyaneke çawa dixwaze, azadiyeke çawa dixwaze lêpirsîn dikir. Serokatî digot "hûn çi dixwazin bibêjin, em jî bizanibin ku, li gorî wê tevbigerin û bimeşin. Di vê demê de, Serokatî bi van pirsan di asta feraset û zêhniyetê de lêpirsîn da çêkirin. Bi giştî di vê demê de asta têkoşîna azadiya jinê mirov dike wisa pênase bike.

**Biyografiyên Ku Damgaya Xwe Li Dîrokê Dixin**

Di vê demê de hevalên ku şehîd dikevin hene. Bi taybetî li qadên şer bi dehan hevalên jin şehîd dikevin. Hevalên ku di asta lehengtiyê de têkoşîn dikin û li hemberî dijmin berxwedaneke bêhempa nîşan didin hene. Hevalên xort jî hene, yên jin jî hene. Ew bi xwe re atmosfereke berxwedanê jî derdixe holê. Lê li gelek herêman windahiyên ne di cih de jî tên dayin. Mesela bi dehan heval bi hev re şehîd dikevin. Di kemînan de şehîd dikevin. Ji bo vê Serokatî ew şêwaza şer pir rexne dike. Bê tewdîr çûyina gundan, demdirêj şerê êniyê dayina meşandin, li hemberî komplo û kemînên dijmin şiyar tevnegerîn derdikeve holê. Bi şêwaz, textîk û şêr ve girêdayî gelek heval şehîd ketin.

Lê di wê demê de bi textîk û şêwazeke rast tevgerîn çêbûbûya, ew qesa windahiyên mezin çênedibûn. Weke me got van şehadetên hevalan pir bandor li ser gel çêkir û têkoşîn xurt kir. Lê windahiyên ku ne di cih de hatine dayin û Serokatî rexne dike jî hene.

Em dikarin hinek navê hevalan bibêjin. Lê ne gengaz e ku em hemûyan li vir bibêjin. Em ê zêdetir hevalên ku wisa li gorî rihê pêvojoyê tevgerîne û bûne bersiv û şehadet pir bi wate kirine, hewl bidin bibêjin. An jî qesî ku me karî em ê navê van hevalan bibêjin.

Yek ji van hevalan Zînet Kara Aslan e. Koda wê Bêrîvan e. Bi xwe ji Vartoya Mûşê ye. Hevaleke kevn e. Di wê demê de di nava gel de kar dike. Karê qada civakî dike. Di 92'yan de li Wanê kar dike. Weke hevala Binevş Agal, xwediyê taybetmendiyên gelêrî ye. Li herêma Serhedê hezkirin û baweriyek li hemberî wê heye. Di şexsê wê de li hemberî tevgera jin jî rêzgirtinek derdikeve. Jixwe heval zewiciye û di malbata wê de jî tevlêbûn heye. Di xeta azadiya jin de, li hemberî pîvanên paşverû yên malbatê jî derdikeve. Hevaleke zane ye. Ji bo azadiyê hevaleke xwedî lêgerînê ye. Di vî warî de xwe zane jî kiriye.

Li herêma Serhedê, li Wanê kar dike. Îxbarek li ser wê tê kirin. Lewra dijmin jî kadroyên wisa digere, lewra kadroyên wisa li ser civakê pir bandor dikin. Cihê ku lê hatiye îxbar kirin, derdora wê tê girtin. Ji bo ku bi zindî nekeve destê dijmin, xwe şehîd dixe. Di 92'yan de ye. Şehadeta wê, di Wanê de bandoreke cuda kir. Radestî dijmin nabe û xwe şehîd dixe, ber xwe dide, helwesteke dide diyarkirin. Ew sekinandin bi serê xwe xwedî wateyekê ye. Serokatî vê rexne dike, dibêje bila nebe şêwazeke. Cihekî weke Wanê ku wê demê Pîvanên feodalîzmê lê serwerin de, berxwedaneke wisa nîşan dayin, deng vedide.

Di şexsê heval Bêrîvan de, Serokatî dibêje hevaleke ku xwe ava kiribû. Dibêje dikarî zêdetir têkoşîn bida, çima xwe zû şehîd xist. Lewra hevaleke kevn e û rista wê ya pêşengiyê heye. Serokatî dizane ku ew heval çawa digêhêjinê û rista wan çi ye. Lewra Serokatî yek bi yek bi wan hevalan re mijûl dibe, wan perwerde dike, digihînê. Sekinandina heval di nava gel de û di nava giştî tevgerê de, pîroz tê dîtin, nirx tê dayin. Bi vî rengî derbasî dîrokê dibe.

Yek jî ji van hevalan, hevala Rûken Çiya ye. Bi eslê xwe Tirk e, ji Çorumê ye. Di nodî de tevlê dibe, di serî de karê xwendekaran dimeşîne û pişt re tevlî gerîla dibe. Perwerdeya Serokatî jî dibîne. Weke me diyar kiribû, di vê demê de ji netew û gelên din jî tevlêbûna partiyê çêdibe. Ji

van yek jî hevala Rûken e. Derbasî herêma Serhedê dibe, Serokatî rista pêşengtî û rêvebertiyê dide ser milên heval. Hevaleke ku di şexsê gelê Kurd de, gelên bindest fêm dike ye. Jixwe dahûrandinên wê bi Serokatî re hene, bi giranî di mijara jin û gelên bindest de ne. Di van mijaran de hevaleke ku xwe zane kiriye û ava kiriye. Li hemberî dewleta dagirker pêwistiya azadiyê çi ye, di vê mijarê de lêgerîn û evîneke wê heye. Bi van pîvanan tevlê jiyan û têkoşînê dibe. Dahûrandinên Serokatî jî di vê derheqê de hene. Di 94'an de li herêma Serhedê şehîd dikeve.

Ji van hevalan yek jî hevala Mizgîn e. Di nava hevalên ku destpêkê tevlê dibin de ye. Di 83-84'an de tevlê dibe. Du caran derbasî saxaya Serokatî dibe û perwerdeya Serokatî dibîne. Bi xwe ji Elihê ye. Di mijara pêşengtî û têkoşînê de, Serokatî bi taybetî amade dike. Xwediyê taybetmendiyên wisa ye. Serokatî demekê ji bo karên derve jî wê erkdar dike. Hem karê çand û hunerê, hem jî karê jinê dimeşîne. Li derveyî welêt her du karan de jî aktîf dixebite. Di her du karan de jî pir berheman derdixe holê, xulukar e.

Bi taybetî di warê hunerê de, nirxên şoreşê û nirxên civaka Kurdistanê derdixe holê. Hê niha jî ew nirxên ku Huner Komê derxistine holê, di nava civakê de zindî ne. Hem pêşengtiya rêxistin û têkoşînê dike, hem jî karên çandî pêş dixe. Di kar û xebatên jinê de jî, di kongreya ewil de cih girtiye û avakerê rêxistina ewil e.

Pişt re dîsa derbasî saxaya Serokatî dibe. Vê dorê Serokatî, heval Mizgîn ji qada gerîla erkdar dike. Weke berpirsiyarê herêma Mêrdînê dişîne qadên gerîla. Cara ewil di şexsê heval Mizgîn de, berpirsiyariya herêman jî jin digirin. Di qada têkoşîna gerîla de, cara ewil pêşengtiya di vê astê de jin digire. Di pratîka eyaleta Mêrdînê de, di berpirsiyariya hevala Mizgîn de zehmetiyek tê jiyankirin. Şêwaza mêr ya ku di eyaletên din de derdikeve, li wir jî derdikeve. Piştî wê Serokatî heval Mizgîn dikişîne û dike pêvajoya lêhûrbûnê. Jixwe du salan li Mêrdînê dimîne.

Heval Mizgîn di kongreya çaremîn de, derdikeve platformê û derheqê wê de biryar tên girtin. Lewra weke berpirsiyarê pratîka Mêrdînê tê dîtin. Lê Serokatî li gorî van encaman nagire dest û dîsa wê li eyaleta Xerzanê erkdar dike.

Dema ku tê eyaleta Xerzanê jî, di rêveberiya wir de cih digire û berpirsiyarê karê civakî ye. Dema ku tê Xerzanê mudaxaleyeke Serokatî li ser Xerzanê çêdibe. Bi heval Mizgîn re, Serokatî komeke mezin û xurt

bi rê dike Xerzanê. Di demeke kin de, dema ku di rêveberiya Xerzanê de, heval Xeyrî û heval Merwan şehîd dikevin; Serokatî rasterast hevala Mizgîn di asta yekemîn de berpirsiyar dike. Di wê demê de Serokatî, her bi hevala Mizgîn re diaxife û perspektîf dide. Lê dema ku ew şehadet tên jiyankirin, bar û berpisyariyeke mezin li ser milên wê dimînin. Hem karê civakî dike, hem jî karê gerîla dike. Wê demê Serokatî dibêje, dîsa di nava civakê de bimîne, lê karê gerîla jî bimeşîne.

Hevala Mizgîn di 92'yan de, dema ku dixwaze bi awayekî sivîl derbasî Bêdlîsê bibe, li Tatwanê dimîne. Di mala ku lê dimîne, ji aliyê dijmin ve tê dorpêçkirin. Îxbar li ser tê kirin. Dijmin dixwaze ku hevala Mizgîn bi zindî bigire, bi hezaran leşker tînin û di nava bajêr de dora wê digirin. Gazî wê dikin û dixwazin ku radest bibe, dixwazin wê bi saxî bigirin; lewra hevaleke kevn e, li Ewropa maye, li saxaya Serokatî maye, li herêma Mêrdînê maye. Ew bûyer di bajêr de jî bandoreke mezin çêdike. Gel li dora leşkêrên ku mal dorpêç kiriye kom dibe. Hevala Mizgîn xwediyên malê derdixe derve. Dibêje, hûn derkevin, ez ê belgeyên li ser xwe bişewitînim. Dibêje, dibe ku malê bombe bikin, bila tiştek li we nebe, lê agahî bidin partiyê. Xwediyê malê naxwazin derkevin, lê bi vî awayî wan qaneh dike. Piştî ku wan derdixe û belgeyên li ser xwe dişewitîne; li gorî ku xwediyê malê gotiye, şibakê vedike û ji dijmin re dibêje, "hûn nikarin min bi saxî bigirin". Derî li ser xwe digire û bi dabancaya xwe, xwe şehîd dixe.

Bandoreke mezin li ser gelê herêmê kir, vê şehadetê. Mesela li bajêr serhildanên gel, piştî şehadeta hevala Mizgîn dest pê kirin. Bi hezaran mirov li Xerzanê, çûn nexweşxanê û cenazeyê hevala Mizgîn girtin û birin goristanê.

Şehadeta hevala Mizgîn, hem ji bo tevgera giştî, hem jî ji bo tevgera jinê windahiyeke mezin bû. Bi ked û hewldaneke mezin Serokatî, ew gihand û kir xwedî danehev. Lê ew qes zû şehîd ket. Serokatî jî, vê şehadetê her bi vî rengî tîne ziman.

Di heman salê de hevala Roza jî şehîd dikeve. Hevala Roza, bi eslê xwe Ereb e, ji Erebên Lûbnanê ye. Hevaleke kevn e. Li saxa Serokatî pir maye. Di çend hevdîtinên xwe de, Serokatî jî behsa wê dike. Ew jî li Norşînê karê civakî dike. Îxbarek tê kirin û di malê de tê dorpêçkirin. Ew jî şêwaza ku hevala Mizgîn karaniye, pêk tîne û şehîd dikeve.

Ew şehadet hemû nêzî hev in, hem di heman dêmê de tên kirin, hem jî li heman erdnigariyê çêdibin. Şehadeta hevala Bêrîvan li Wanê

çêdibe, ya hevala Mizgîn li Tatwanê çêdibe, ya hevala Roza jî li Norşînê çêdibe. Li vê herêmê çanda gel jî nêzî hev e. Her sê heval jî, di perwerdeyên Serokatî re derbas bûne. Serokatî hem van şehadetan rexne dike, hem jî dike hêza têkoşîna gel û jinê. Tabî şehadeta van hevalan, li vê herêmê bandor û baweriyek bi taybetî di mijara jinê de da çêkirin. Hevalên ku piştî wan tevlêbûne jî, ji wan bandor dibin. Gelek hevalên nû navê wan digirin. Her wiha zarokên nû çêdibin jî, hemûyan navê wan Bêrîvan, Mizgîn û Roza ye. Heta navê zarokên kur jî kirina Mizgîn. Niha ew hemû mezin bûne û tevlî partiyê bûne.

Şehadeta heval Azîme (Mîhrîban Sari) heye, di vê demê de. Ew jî hevaleke kevn e, ji Vartoya Mûşê ye. Li qadên gerîla pir maye û fermandarî pir kiriye. Di qada leşkerî de, di fermandari kirinê de, di pêşeng bûyinê de, hevala Azîme ji bo me mînak e. Bi taybetî li hemberî dijmin, xwe bawerkirin û zîrekbûna wê belkêş e. Hevaleke ku di van milan de xwe çêkiriye ye. Ji ber vê Serokatî her peywir dane pêşiya wê.

Hevala Azîme, herî zêde li Botanê maye. Çend caran diçe saxaya Serokatî jî. Jixwe di 81’an de tevlê bûye. Dema ku di 91’an de cara duyemîn diçe saxaya Serokatî, Serokatî wê ji bo Botanê rê dike. Di 94’an de li Besta ye. Şer kordîne dike, textîkên şer û pevçûnan diyar dike. Pişt re derbasî Herekolê dibe, dema ku li wir pevçûnekê kordîne dike, hawanek lê dikeve û şehîd dikeve.

Şehadeta hevala Azîme, li hemû Kurdistanê û bi taybetî jî li Botanê bandoreke mezin dike. Lewra li Botanê pir maye û gel nas dike. Di şexsê wê de fermandarî û pêşengtiya jinê bi awayekî ber bi çav derdikeve holê û tê isbat kirin.

Her wiha şehadeta heval Zelîha Toros heye. Bi xwe ji Pazarcixê ye. Ew jî hevaleke kevn e. Piştî 84’an tevlê dibe. Di 89’an de derbasî saxaya Serokatî dibe û demekê li wir perwerde dibîne. Di vê pêvajoyê de, Serokatî vê hevalê ji bo herêma Güney-Batı’yê amade dike.

Taybetmendiyeke Serokatî heye, bi her hevalekê/î re mijûl dibe û wê/î hevalê/î demdirêj amade dike. Kîjan hevalê/î taybetmendiyên wê/î çibin, li gorî wê arestebûna wê/î çêdikir. Carina arastekirina lijneya dibistanê li bin guhê hev dixist. Pêwistiya hevalan jî û ya qadan jî dida ber çavên xwe. Ew nêzikatî hê jî di me de rûneniştiye. Em carina pêwistiya hevalan esas digirin, ya qadan nabînin. Carina jî em pêwistiyên qadan esas digirin, yên hevalan nabînin. Serokatî hevala Zelîha jî bi vî awayî amede dike.

Piştî perwerdê Serokatî, hevala Zelîha dişîne herêma Güney-Batı. Demeke kin li wir dimîne. Li derdora Elbîstan û Pazarcixê, di pevçûneke de şehîd dikeve.

Hevala Xalîse Yildirim (Rojîn), bi xwe ji Nûsebînê ye. Hevaleke kevn e, di 88'an de tevlî partiyê bûye. Di 89'an de jî derbasî saxaya Serokatî dibe. Pişt re Serokatî wê dişîne herêma Mêrdînê, lê di 92'yan de şehîd dikeve.

Hevala Xetîce Keser (Xelat), ji Çewlîkê ye. Di karê civakê de dixebite. Lê deşîfre dibe û demeke girtî dimîne. Piştî ji zindanê derdikeve, derbasî saxaya Serokatî dibe. Piştî perwerdê jî, Serokatî wê dişîne Botanê. Li Botanê şehîd dikeve. Hevaleke ku xwedî danehev e û bikaribe pêşengtiyê bike ye. Hevaleke zanist û îdeolojîk e.

Hevala (Çîçek), bi xwe ji Dêrsîmê ye. Di 88'an de tevlê partiyê dibe. Di şerê Başur de, weke fermandara taximê peywirdar e. Hevaleke ku tê hezkirin e. Di ava Basya de şehîd dikeve. Li ser wê herêmê jî bandoreke mezin dike.

Hevala Saniye Ürün (Zozan), bi xwe ji Elihê ye. Di 88'an de tevlî partiyê dibe. Ew jî gelek qadên şer yên weke Haftanînê dimîne. Piştî nodî derbasî Botanê dibe û şehîd dikeve.

Hevala Gûlnaz Karataş (Bêrîtan), divê em hinek bi taybetî li ser bisekinin; lewra di têkoşîna me de asteke nû dide destpêkirin. Me kongreya ku li Zelê hatibû darxistin û şêwazên ku di şer de hatibûn derketin, dan diyarkirin. Em gelek caran di salvegera şehadeta hevala Bêrîtan de, wê bîr tînin. Hevalek pêşeng e, di artêşbûna jinê de. Sekna hevala Bêrîtan, Serokatî di arkeşbûna jinê de weke hêzeke pêşeng girt dest. Hevaleke nû ye, xwendekar e. Piştî ku demeke di nava xebatên xwendekaran de cih digire, di 92'yan de tevlî partiyê dibe. Di demeke kin de, li herêma ku lê pêşketineke mezin derdixe holê. Di demeke pir kin de dibe fermandarê taximê.

Ferhat, wê demê wê digire karên ragihandinê. Lê ew nêzikatiya Ferhat naecibîne, Serokatî baş dixwîne. Rûxmî ku ew qes nû ye jî, Serokatî pir baş fêm dike. Wisa be, pîvanên fêmkirinê, ne nûbûn û kevnbûyin e. Di şexsê hevala Bêrîtan de mirov wê derdixe. Pîvan kevnbûyin nîne; pîvan fêmkirina rast, li hemberî xwe têkoşîn kirin û pêkanîn e. Hevala Bêrîtan, di demeke kurt de, di xwe de guhertin û veguhertinan dide çêkirin. Her wiha hem li hemberî nêzikatiyên şaş yên Ferhat, hem jî yên derdorê derdikeve.

Di 92'yan de, li Xakûrkê ye. Wê demê şerê Başur derdikeve. Di şer de nêzikbûna Ferhat, radestbûn e. Serokatî jî wisa pênase kir. Vê jî weke textîk digire dest. Ew nêzikbûna radestbûnê, dixwaze biteyisîne li ser hemû hêz û avahiya hevalan. Ew nêzikbûn, hêza şer dide şikênandin. Wê demê bi hezaran heval hene.

Textîkeke baş bê meşandin, dê êrîşên qirêj yên Tirkiyê û hevkarên wan yên Başurî, bên şikênandin û serkeftineke pir mezin derkeve. Lê wê demê, li Başur radestbûn li ser hevalan tê ferzkirin, li Bakur jî li hevkirinek derdikeve. Serokatî pratîka 92'yan wisa şîrove kir. Ger li Bakur êrîşeke mezin, bihata kirin; dê rewşa Başur jî bihata guhertin. Li Başur dijmin, hin herêmên weke Haftanîn û Xakûrkê dike hedef. Li xeta Heftanînê tenê berxwedanek heye. Lê ji aliyê din ve radestbûn û li hevkirin heye. Serokatî wê berxwedanê jî teng digire dest. Li ser textîk û şêwazên şer Serokatî pir nirxandinan dike. Piştî 92'yan jî Serokatî hemû serokatiya textîkî dixe lêpirsînê. Lêpirsîn di şexsê Ferhat de dest pê dike.

Hevala Bêrîtan di demeke ku rengê şer, ber bi xitimandineke ve diçe, li ber xwe dide. Li hemberî hêzên dagirker yên Tirkiye û hevkarên wan PDK û YNK, heya guleya xwe ya dawiyê şer dike. Dema ku guleyên wê jî xilas dibin, hemû tiştên li ser xwe dişkîne û xwe ji tehtan diavêje. Sekna ku li wir derdikeve; şewaza berxwedan û radestnebûnê ye. Serokatî dibêje, "li vir du xet derdikevin holê; di şexsê Ferhat de xeta radestbûnê, di şexsê hevala Bêrîtan de jî xeta berxwedanê û li hemberî dijman serî rakirinê derdikeve holê". Ji bo wê şêwaza hevala Bêrîtan ya şehadetê cuda ye. Bi şehadeta xwe, di şer de textîk da guhertin. Rihê radestbûnê ku hatiye afirandin dişkîne, rihê berxwedanê derdixe holê.

Piştî ku hevala Bêrîtan çalakiyê li dar dixe û şehîd dikeve, pir nayê fêmkirin; ji rêze tê dîtin. Lê piştî ku Serokatî textîkê şer ji nû ve dinirxîne û rexne dike û rapora hevala Bêrîtan ku ji Serokatî re nivîsandiye jî dikeve destê Serokatî, rewş cuda tê nirxandin. Di rapora xwe de dibêje, "ez dixwazim dîroka Serokatî û ya PKK binivisînim". Êdî hezkirina xwe ya Serokatî û partiyê nîşan dide. Dema ku Serokatî vê nameyê dixwîne, dibêje "bila ew heval were, dibêje hevaleke zane ye, xwedî angaşt e, diyare ku xwestekên wê yên azadiyê hene". Lê pişt re heval, ji Serokatî re dibêjin ku şehîd ketiye.

Piştî vê Serokatî çalakî û helwesta hevala Bêrîtan pênase dike. Ji bo artêşbûna jinê tê çi maneyê vedike. Em jî seknandina hevala Bêrîtan, ji

aliyê pêşengtiyê ve digirin dest û mînak digirin.  Giştî tevgerê de jî, ji bo tevgera jinê jî risteke xwe ya pêşengtiyê heye. Bi taybetî ji aliyê fermandariya jinê ve asteke nû derdixe holê.

Hevala Sûna Çîçek (Besê) heye. Bi xwe ji Dêrsîmê ye, di 91'an de tevlî partiyê dibe. Di 92'yan de diçe saxaya Serokatî û di 94'an de derbasî welat dibe. Serokatî wê dişîne Dêrsîmê, weke rêvebêr jî dişîne. Lê di demeke kin de, di çalakiyekê de şehîd dikeve. Şehadeta wê ji bo giştî û ji bo herêmê jî windahiyek e. Rûxmî ku demeke kin dimîne jî, bandoreke mezin li ser hevalan dike. Li hemberî ferasetên heyî têkoşînek xurt dide meşandin.  Piştî wê hevalên ku tevlê dibin, navê wê digirin. Serokatî ji bo şehadeta wê dibêje "pir zû çêbû" û eyaletê jî rexne dike.

Hevala Azîme Efrîn, ji Rojavayê Kurdistanê ye. Di 91'an de tevlê dibe û di 93'yan de derbasî welat dibe. Li gel Serokatî pir dimîne. Li welat di demeke kin de, heya fermandariya bolikê jî peywir digire. Di 94'an de şehîd dikeve.

Hevala Yıldız Durmuş (Jiyan), hevaleke kevn e. Berî donzdehê îlonê tevlî partiyê dibe. Di dema donzdehê îlonê de jî tê girtin. Sê salan di zindanê de dimîne. Du caran derbasî saxaya Serokatî dibe. Heya 87'an hem li gel Serokatî dimîne, hem jî li Rojava karê civakî dike. Di nava gel de baweriyekê dide avakirin. Di asta pêşengtiyê de risteke xurt jî dîlîze. Pişt re derbasî saxaya Ewropa dibe û di wir re jî derbasî Tirkiyê dibe. Li metropolên Tirkiye tê girtin.

Dema ku tê berdan, dîsa tê saxaya Serokatî û Serokatî wê dişîne eyaleta Erzeromê û wir re jî derbasî eyaleta Dêrsîmê dibe. Di 94'an de li wir şehîd dikeve. Ji milê wêrekî, azîm û hewldanan ve hevaleke xurt û zîrek bûye. Hê jî hevalên ku perwerdeya hevala Jiyan dîtine, behsa wê dikin. Hem perwerdeya leşkerî, hem jî perwerdeya bîrdozî dide. Hevaleke zane û xwe avakirî ye. Pir bi israr e.

Hevala Sülbüs digot; em li eyaletên hundir bûn, hevala Jiyan fermandara taxima me bû; di wê zivistanê de bê gore û cih em di nava berfê de dimeşandin ku em fêr bibin. Li hemberî şert û mercan amadekirina hevalan hebûye. Bi taybetî li ser perwerdê disekinî. Yên ku perwerde nedikirin jî, hevala Jiyan yaptirim çêdikiriye. Bi xwe bawer bûye û tirsa dijmin holê rakiribûye. Dîsa hevalên ku di zindanê de û li herêma Rojava pê re mane jî behsa wê dikin. Li hemû qadên têkoşînê maye û xwediyê gelek danehev e. Ji milê pêşengtiyê ve jî, di her mijarê

de pêşeng e. Xûçka hevalê Xeyrî Durmuş e. Şehadeta wê jî, Serokatî di cih de nabîne.

Hevala Dilpak ji Sêrtê ye. Di 91'an de tevlî partiyê bûye. Di nava şer û têkoşîna gerîla de tevlê dibe û dipije. Perwerdaya xwe û kesayeta xwe, di nava şer de ava dike û piştî demekê jî dibe fermandar. Li Botanê û Xeta Şikefta Birîndaran, li Zagrosê maye. Di pratîkê de gelek tiştên ku heval nikarin pêk bînin, hevala Dilpak pêk tîne. Hem di çalakiyan de, hem di şer de xwe isbat dike. Cihê ku ew lê ye, hemû heval baweriya xwe pê tînin. Di demeke kin de berpirsiyariyan digire ser milên xwe û xwe di nava şer de pêş dixe. Heya fermandariya bolikê jî peywir digire. Di 94'an de li Şikefta Birîndaran bi suîkastê şehîd dikeve. Jixwe ew der xeta sînor e, li ser sînor dijmin bi suîkastê wê şehîd dixe.

Hevala Dîcle Kobanî, ji Rojavayê Kurdistanê ye. Hevala Dîcle jî berî 90'î tevlî partiyê dibe. Di malbatê de jî welatparêzî heye û lêgerînên heval jî hene. Cihekî weke Kobanê, di têkoşîna giştî û ya jinê de risteke xwe heye. Ew realîteya ku di civakê de heye, qebûl nake. Şeva ku tê zewicandin, direve û tevlî partiyê dibe. Lêgerînên wê yên azadiyê xurt in.

Bi piranî hinceta tevlêbûna hevalên jin, rizgariya netewî ye; lê ji aliyê rizgariya jinê ve jî lêgerîn hene. Ew jî sedemeke mezin ya têkoşînê ye. Ew neheqî û zilma ku li ser jinê tê pêş xistin dibînîn û dixwazin derkevin derveyî wê realîteyê. Hevala Dîcle jî, ji wan hevalan e. Lêgerîneke wê ya bi vî rengî heye. Piştî perwerdeyê derbasî Bakur dibe. Lê di 90'î de şehîd dikeve.

Hevala Rûken Efrîn jî, ji Rojava ye. Weke hevala Dîcle ew jî, di 90'î de derbasî Bakur dibe. Li ser van her du hevalan jî gelek stran hatine gotin. Lewra her du jî di têkoşînê de xwedî biryar in. Hem di têkoşîna hundir de, hem jî têkoşîna li hemberî dijmin de, bi israr in. Kadroyên zane ku bikaribin pêşengtiyê bikin e. Hevala Rûken jî li welat, demeke kin dimîne û şehîd dikeve.

Ji bo hevalên ku vê demê şehîd dikevin, hinekên wan me vegotin. Weke me di serî de jî got, em nikarin hemû şehîdên ku wê demê de gihêştine şehadetê vebêjin. Lewra bi sedan hevalên xort û jin şehîd dikevin. Me hinek hevalên ku di asta pêşengtiyê de tevgerîne û li ser tevgerê û gel pir bandor kirine vegotin.

Piştî van şehadetan û ew qesa perspektîf Serokatî, ji bo jinê êdî perspektîfa nû derdixe holê. Serokatî êdî perspektîfa artêşbûna jinê

derdixe holê. Di vê demê de, li hemberî pratîkên şaş ku di herêman de pêş dikevin,  qomîteyên azadî û wekhevîbûnê derdixe holê. Hem navenda wê ava dike, hem jî qomîteyên herêman ava dike. Hevalên ku berpirsiyar kirine jî, hevalên navendî ne. Yek jî ji van hevalan, hevala Sakîne ye. Bi vê hem rêxistinbûneke nû derdixe holê, hem jî şêwazê dadgeriya PKK derdixe holê. Rast e, şerê gerîla ye, têkoşîn dide; lê divê di vir de jî pîvanên hiqûqî hebin. Ew jî li ser rêgezên azadî û wekheviyê ye.

Tabî mêzekirinên pir şaş li hemberî van qomîteyan derketin pêş. Bi rastî jî di pratîkê de ew qomîta vala derxistin. Ew nêzikatiyên me yên kevn ku em dibêjin, ew çi ye, ji ku derket, ew qomîte vala derxistin. Mane nedayin çêbû. Bi awayekî objektîf vala derxistine. Jixwe piştî demekê ji holê rabû. Serokatî pir girîngî dida van qomîteyan, li hemberî şaşitiyan rêgez datanîn holê. Serokatî însiyatîf dabû vê komîteyê ku li cihên şaşitî çêdibe, mudaxale bike. Bi vê re Serokatî perspektîfa artêşbûyina jinê jî derxist holê.

## ARTÊŞBÛNA JINÊ

### Bingeha Artêşbûnê û Îlana Artêşê

Di pêvajoya 93-94’an de, li dewreyên ku li saxaya Serokatî tên li darxistin de, dahûrandinên kûr hene. Bingeha artêşbûna jinê, Serokatî di van dewreyan de datîne. Wê demê, Serokatî pênc pirtûk ji bo artêşbûna jinê derxistin. Ew amade kirin û rêkir nava avahiya hevalan. Li ser vê prensîbê Serokatî bingeh ava dike; dibêje, “ezenin ordusu varsa, ezilenin de ordusu olmalıdır.” Yani dibêje, “**ger artêşa serdestan hebe, divê artêşa bindestan jî hebe.”** Dibêje, ew artêşa jin ava bibe, dê jiyana azad pêş bixe. Dibêje ew artêşa ku were avakirin, divê dînamîk û zindî be. Lewra artêşên pergalê ne dînamîk in, statîk in, guhertin tune. Serokatî weke model jî, dijberî wan artêşên pergalê, artêşeke ku bibe hêza guhertinê diyar dike.

Wisa dibêje, “önce kendimi bileyim, kendimi anlayayım, bunun olabilmesi için de kadın ordulaşması gerekir.” Dibêje, “**ji bo ku ez xwe bizanibim û ez xwe fêm bikim; artêşbûna jinê pêwîst dike**.” Dîsa dibêje,”**dê bi hêz û artêşa jinê, deshilatdarî û tahakûma mêr were hilweşandin. Avakirina artêşa jinê, xwe gihandina jina azad, mêrê azad û jiyana azad e. Di cewher de pergala deshilatdar ya mêr diguherîne**”. Dibêje ji bo ku di nava partiyê de, pîvanên sosyalîzmê bên pêkanîn, divê artêşbûna jinê bê ferzkirin. Dibêje derveyî van pîvanan şer kirin, sapmayan, ji rê derketinan tîne. Dibêje, divê artêş û şer nebe karekî mêr. Bi vê yekê, Serokatî artêşê ji serweriya mêr derdixe û qarekterê şer jî dide guhertin. Nêrîneke wisa stratejîk datîne holê.

Navaroka her pênc pirtûkan de, vê yekê vedike. Yanî wisa tenê biryareke nagire û nabêje artêşa jinê ava bikin. Dahûrandinên wê yên berfireh û stratejîk dike.

Li ser vê esasê, di qanûna 93’yan de, Serokatî îlana artêşa jinê dike. Piştî îlana artêşê jî, dibêje “ew hewldaneke mezin û mîsoger e”. Dibe ku wê demê me pir fêm nedikir, lê pergala modernîteya kapîtalîst bi milîtarîzmê mêjiyê civakê tarûmar kiribû. Xweza û gerdûn tarûmar kiriye. Artêşbûna jinê, li hemberî vê zêhniyetê hewldana herî teqez e. Lewra xwe parastin e, civak parastin e, gerdûn parastin e.

Li ser vê esasê, Serokatîpîvanên red-qebûl dide avakirin. Piştî vê îlanê, di nava avahiya hevalên jin de, her çiqes şaşqintiyek çêkiribe jî, moraleke mezin çêkir. Rûxmî ku ew qesa zanebûn tune bû, baweriyeke

mezin da avakirin. Piştî wê li her herêmê, yekîneyên xweser yên hevalên jin çêbûn; manga, taxim, bolûk hatin avakirin.

Di zivistanê de îlan hat kirin, di biharê de yekîneyên xweser yên herêma Cûdî, çalakiyek kirin. Konvoyek di rê re derbas dibe, hevalên jin çalakî li ser dikin, cîpekê îmha dikin û bi serkeftî şûnve vedigerin. Serokatî ew çalakî pîroz kir. Çalakiya ewil ku hevalên jin bi awayekî xweser li dar xistin e. Dibe ku niha bi me hêsan were, lê wê demê zehmet bû. Serokatî ew çalakî weke pengava artêşbûna jinê ya yekemîn girt dest. Di heman demê de çalakiyeke wisa li Amedê jî tê kirin. Ew jî diavêjin ser mala subayekî. Tabî bi van çalakiyan jî, Serokatî dahûrandinên pir xurt kirin. Got "d**iyar e jin dikare her tiştî bike, bes bila xwe rast bigire dest û bila yên derdorê jî jinê rast fêm bikin"**.

Piştî 93'yan li Bakur, hevalên jin bi giranî weke taxim xwe rêxistin kirin; li Başur jî weke bolik û tabûr, xwe rêxistin kirin. Vê bi xwe re, ji milê fermandariyê ve jî danehevek da çêkirin. Di artêşa jinê de jî pergalek hat rûnişkandin. Ew pergal hê jî berdewam dike. Daneheveke xurt derket holê.

**Nêzikatiyên Li Hemberî Artêşbûna Jinê**

Di vê demê de nêzikatiyên çawa li hemberî artêşbûna jinê derdikevin; çend heval dikarin nêrînên xwe diyar bikin.

**HEVAL H…:** piştî ku ez tevlê bûm, min hin tişt baştir fêm kirin. Şer bûyereke kuştinê ye, di rastiya wê de ew heye. Lê artêşbûyinê, em zêdetir bi parastinê digirin dest. Yanî em ê şer çawa bigirin dest? Nakokiyek di serê min de hebû. Lê pişt re me hinek tişt fêm kirin, bi taybetî piştî ku paraznameyên Serokatî derketin, hê berfirehtir vedike. Artêşbûyina me li hemberî rewşa me ya miriye. Mantiqê parastin û şer di Kurdan de nemabû, ew hest nemabûn; artêşbûyin di şexsê jinê de ew hest ji nû ve avakirin e. Di şexsê zilam de, ew şêwaza berê ya şer nedihat guhertin, ji ber wê di şexsê jinê de nêzikbûn hat guhertin. Bingeha civaka exleqî û polîtîk jî wisa hat danîn.

Ew şêwaza berê ya artêşê ku di mêjiyan de rûniştibû, hilweşiya. Ew yek bi tevlêbûna jinê ya şer û têkoşînê de hat hilweşandin, me exlaqeke cuda da şer. Ez ji vî milî ve girîng dibînim û wisa fêm jî dikim.

**H RÛKEN:** mijara heval jî da diyarkirin girîng e. Lê bi taybetî di mijara artêşbûyinê de nêzikatiyên şaş çibûn? Mesela hevalên jin

artêşbûyin çawa fêm kirin? Pratîkên ku derketin holê çibûn? Nêzikatiyên hevalên xort çawa bû, her kesî weke Serokatî girt dest, an na?

**HEVAL Y…:** tevgera artêşbûyinê çawa ber bi artêşbûyinê ve çû, we da diyarkirin. Dema ku ez tevlê bûm, ew salek bibû ku artêş hatibû avakirin. Ez wê demê hatim saxaya Zagrosê. Wê demê di saxayan de jî hev û din qebûl nekirin hebû. Hem mirov pê bandor dibû, hem jî moral çêdikir. Hevalên ku wê demê ji saxaya Serokatî hatibûn jî hebûn. Bi pranî nêzikatiyeke bêbawerî derdiket, an jî bawerî bi hêza xwe neanîn hebû. Berî nodî her eyaletekê çend taximên jinê hebûn. Lê piştî nodî êdî bolikên jin çêdibûn.

Dema ku artêş hatibû îlankirin, hevalên jin bi xwe bertek nîşan dabûn; gotibûn “em ê çawa bi tenê serê xwe bimînin, çawa li ser piyan bisekinin”. Bi taybetî hinek hevalên jin ku bi xwe jî bertek nîşan dabûn, vedigotin. Dema ku biryargeha navendî hat avakirin û bolikên xweser jî dihatin rêxistin kirin, hevalên xort jî bertek nîşan dabûn. Dema ku em hatin, pergala xweser hê nû dihat rûnişkandin. Me pir fêm nedikir. Taxim û bolik hebûn. Heya ku hinek çalakî pêş neketin û rêxistin rûnenişt, ew pergal jî tam nehat fêmkirin.

**HEVAL E…:** Piştî 93-94’an min hinekê tevger dişopand. Li Ewropa wê demê, her kesî PKK jî weke tevgerên din yên netewî digirt dest. Digotin Marksîst-Lenînîst e. Lê ew artêşbûna jinê pir cuda bû. Bala her kesî kişand. Propagandayeke xurt jî hat çêkirin. Li hemberî wê jî propaganda çêbû. Digotin dixwazin jinê jî li hêza xwe zêde bikin. Lê yên ku xwestin rast fêm bikin, digotin li Kurdistanê tevgereke cuda derdikeve. Tiştên cuda çêdikin û tiştên cuda nîqaş dikin.

**HEVAL X…:** Ez wê demê li Rojava bûm.  Ez dixwazim bi xevna hevala Bêrîtan dest pê bikim. Berî wê pêvajoyê hevala Bêrîtan xevnek dîtibû, dema ku ji xewê radibe, ji hevalan re dibêje, “min xevn dîtiye ku bolikên jinan tên avakirin.” Her wiha baweriya xwe ya avabûna artêşa jinê dide diyarkirin. Ez di wê pêvajoyê de, ne li çiya bûm, lê me hevalên ku ji pratîkê dihatin û diçûn pratîkê didîtin.

Di wê pêvajoyê de hinek mijarên ku Serokatî nîqaş dikirin hebûn. Em hê nû tevlê bibûn, me pir maneya artêşbûna jin û tevlêbûna jin ya xweser nedizanî. Te bîra min, em çûn Helebê, civîneke Serokatî hebû. Hevalên ku ji pratîkê jî hatibûn li wir hebûn. Piştî ku Serokatî axaftinên xwe bi dawî kirin, got “pirsên we hebin bibêjin”. Ew nakokiyên xwe, me dan diyar kirin; me got di nava artêşekê de çawa artêşeke din dibe? Di

nava partiyê de çawa partiyeke din dibe? Di nava şoreşekê de çawa şoreşekê din dibe? Serokatî wê demê berfireh vekir. Da nîqaşkirin jî. Dibe ku em tam fêm nekin, lê bi awayekî serasera me hin tişt girtin. Di naveroka wê de kûrbûn tune bû.

Piştî ku artêşbûna wê hat avakirin û rasterast heval ji bo wê hatin arestekirin hinek tişt hatin fêmkirin û moraleke mezin jî da çêkirin. Tabî wê demê ferasetên cuda jî hebûn. Yên ku nedixwestin ji nava hevalên xort derkevin hebûn. Ji aliyê hevalên xort ve bi awayekî çort redkirin hebû. Ji aliyê hevalên jin ve, mezinkirina artêşbûyina jin û derxistina vîna jinê de kêmasî hebûn; lê bi demê re guhertin û veguhertin hatin çêkirin. Ji aliyê hinek kesan ve, pêşiya wê her dihat girtin. Serokatî jî her digot, "ji bo ku jin xwe nas bike, vîna xwe derxe holê û bi hêza xwe bihese min ew îlan kiriye".

Li milê Rojava, piştî îlana artêşa jinê, tevlêbûna jinan pirtir bû. Bi demê re xurtbûn jî çêbû. Îro jî danehev zêde bûne û kes nikare vê astê bixe nîqaşê, ne jî kes dikare vir de wir de bikişîne. Mirov tenê dikare lê xwedî derkeve. Ked û nirxên ku derketine, mirov dikare biparêze.

**HEVAL Û…:** Ez li herêma Amedê tevlêbûm. Wê demê cara yekemîn bolikên xweser dihatin avakirin, berpirsiyar Sakîne Batman bû. Feqet dema ku ez niha difikirim, rih û coş hebû. Yên ku ew rih jiyan nekirin jî hemû reviyan. Lê hevalên dîtir bi rih û coşeke mezin tevlê bûn. Pir lê bawer bûn. Min qet hîs nekir ku hevalên jin ji xwe bêbawer in. Rih û yekitiyeke cuda hebû.

Mesela tê bîra min, hevalê Mahmût hat hevalên jin re civînek çêkir; hevalan helwestekê teqez nîşan nedan, lê hevalek jî ranebû û neaxifî. Piştî wê, me di civînên xweser de seknên mîsoger danîn. Digotin çima hevalên xort tên û ji me re civîn çêdikin. Hevalên ku perwerde dîtibûn hebûn, ew ji rêveberiyan re jî dibûn alîkar. Lê belê jinên ku qebûl nedikirin û seknên paşverû diyar dikirin jî hebûn, lê hejmara wan pir kêm bû.

Ji milê hevalên xort ve jî, digotin hevalên jin heya niha xwe baş tevlê nedikirin. Lê piştî xweserbûnê xwe tevlê dikin. An jî dema operesyonan de dixwestin werin û tepeyên hevalên jin bigirin, Sakîne Batman ew planlama çêkiribû. Lê hevalên jin qiyamet rakirin, gotin qey em nikarin. Di perwerdê de jî dihat nirxandin, çima em nikarin, an jî em çi encaman derdixin? Ew dihatin nîqaşkirin û bi xwe re bertek jî derdixistin. Xwe bawerbûnek hebû, lewra hevalên hem zane hebûn, hem jî

hevalên ku di pratîkê de pijiyabûn hebûn. Lê ji aliyê hevalên xort ve jî her tiştê hevalên jin dihat nîqaşkirin.

**HEVAL R…:** Parti tarihine baktığımızda, kadın başından beri var. Silahlı propaganda döneminde var, geri çekilme de var. Ordu içerisinde de var. Ama kadının ordulaşması farklı bir durumdur. Neden Önderlik böyle bir ihtiyaç duydu? Sadece sayının artmasından kaynaklı değil. Okuduğum ve anladığım kadarıyla doksanlardan sonra kadın arkadaşlar kendilerini ispatlamışlar. Bu konuda bir sorun yok. Sorun silahlı mücadelenin tıkanması ve yozlaşmaya doğru gitmesidir. Önderlik, Hogırların yaklaşımını, zorunlu askerliğin nasıl boşa çıkarıldığını, köylülere yaklaşımın nasıl olduğunu çözümlüyordu.  Yani bir yozlaşma vardı ve bu yozlaşmanın önüne geçmeye çalışıyordu.

Kadının mücadeledeki duruşu daha disiplinli ve yaratıcıydı. Önderlik, onların savaş çizgisini de doğrultuya çekeceğine inanıyordu. Fakat bu durum, ne kadın arkadaşlar tarafından, ne de erkek arakadaşlar tarafından anlaşıldı. Her iki tarafta yanlış anlaşıldı. Bu Önderliğin hayata geçirmeye çalıştığı çizgiyi boşa çıkardı. Sorun sadece kadınların, özgün bir eylem yapmaları değildi. Sadece bir isim koymak da değildi. Önderlik bütün savaş gücüne örnek olabilecek bir güç ortaya çıkarmak istiyordu.

**HEVAL X…:** ji bo hevala Bêrîvan ku li Wanê şehîd ketibû, tiştên ku we gotin rast in. Lê hevala Bêrîvan danekî sax li ber xwe dide, dikeve pevçûnê. Bi sedan leşker, derdora wê digirin û dixwazin radest bigirin. Ez jî di wê pêvajoyê de li wir bûm. Rojekê hemû leşkêrên li Wanê bi xwe re mijûl kirin. Pişt re jî bandoreke mezin li ser gel û ciwanan kir, ji her malbateke sê- çar însan tevlî partiyê bûn.

Ji bo artêşbûna jinê, we behsa pênc cîldên ku Serokatî ji bo artêşbûnê nivîsandine kir. Di van pirtûkan de, ji malbatê heya nava civakê dahûrandina şexs pir kûr dihat kirin. Li ser van esasan, rastiya me ya jinê çawa ji hemû tiştan dûr ketiye, diyar dikir. Tevlêbûna jinan jî pir zêde bû. Ez jî di 93’yan de tevlê bûm, wê demê astek hatibû girtin. Her çiqes di pirtûkan de hatibe nivisîn jî, jiyankirina wan cuda bû. Bi rastî xwe isbat kirinek hebû. Hevalên jin doçka radikirin, tepe digirtin, karên pir giran dikirin. Ji aliyê iştên ku werinkirin xwe gihandibûn sînor.

Di wê pêvajoyê de hevala Denîz şehîd ket. Li gel heft hevalên jin tepeya di destê xwe de qet bernedan. Dîsa li Zelê, dema ku teyareyan êrîş kir, bi doçkayên xwe li ber xwe dan, heta tayere derb kirin. Ketibû

asteke wisa ku, hevalên jin li ber xwe didan, yekitiyek jî di nava hevalên jin de çêbibû. Lê li cihekî sê tepe hebûn; du tepe di destê hevalên xort de bûn, tepeyek jî di destê hevalên jin de bû. Hevalên xort israr dikirin, digotin "divê hevalên jin tepeyê radestî me bikin, lewra nikarin biparêzin". Lê hevalên jin berneda, kêm mabû di navbera hevalên jin û xort de pevçûn derkeve. Pişt re bi komployan û zextan ew heft hevalên jin ji tepeyê daxistin.

Dîsa rakirina torbayên ard û her karê giran de hevalên jin dixebitîn. Doçkayên herî giran radikirin û dibirin tepeyan, bi eşqekê dihat kirin. Pişt re ew yek, wek texlîta zilam hat nirxandin, lê ne wisa bû. Bi dilxweşî dihat kirin, hevalan di karê giran de dor nedida hev. Yanî pêvajoya ku jin xwe isbat bike ye. Di şexsê her hevaleke jin de, tiştek dihat isbat kirin. Ji aliyê din ve nêzikbûnên çort yên hevalên xort û rêveberiyê derdiketin. Mînakên van jî pir in.

**H RÛKEN:** Hevalan jî da diyarkirin. Di artêşbûna jinê de hem ji derve, hem jî di hundir de weke hevalên jin û xort, mêzekirin derketin holê. Artêşa jinê, rêxistina nû bû. Berê jî di nava artêşan de jinan cih girtiye, lê cara ewil jin bi serê xwe, bi vîna xwe artêşa xwe ava dike. Di pêşengtiya tevgera me de, cara yekemîn tiştekî wisa pêş ket. Ji derve digotin; "ew textîkeke Apo ye, dixwazê jinê bi kar bîne", nizanim "hêza zilam ya şer bike nemaye, ji bo wê wisa dike". Di çapemenî û raya giştî teyisîneke wisa çêbû. Di hundir de jî ne hevalên jin, ne jî yên xort, em vê rêxistinbûnê re ne amade bûn. Her cihî şer û têkoşîn pêşketiye, bi hezaran heval hene. Lê ne zêhniyeta me, ne jî şert û mercên ku heyî me amade kiribûn, ji bo artêşbûna jinê.

Tam di vê demê de Serokatî pêdiviya artêşê destnîşan kir. Li ser vê armancê Serokatî îlana artêşê kir. Lê nêzikatiyên pir şaş li hemberî vê seknê hatin kirin. Berê hinek nêzikbûn hebûn, cih bi cih xwe didan nîşandan, lê piştî artêşbûnê tam ketin meriyetê. Berê nêzikatiyek bû, lê pişt re zivirî şêwazeke şaş. Bêbawerbûneke mezin hebû; jin çawa bi serê xwe artêşekê ava bike, fermandaran derxe û êniyan bigire? Ew karên mêr in, jinê tiştekî wisa gotibe jî, jin nikare bike. Biyolojî û sekna mêr ji bo vê amadeye, lê jin ne amade ye.

Bi vî awayî projeya Serokatî redkirin çênedibû, lê di pratîkê de digotin "nabe". Ne gengaz e ku jin bibe artêş. Yanî di hundir de jî, weke textîk dihat dest girtin. Digotin pirsgirêk hene, hejmar zêde bûye, ji bo ku ew têkiliyên şaş neyên jiyankirin, Serokatî tiştekî wisa derxistiye

holê. Yanî wisa stratejîk girtina dest û li ser kûrbûn tune bû. bandora vê li ser hevalên jin jî dibû. Bi giştî şaş fêmkirinek hebû, Lê weke ku hevalên xort baş fêm kiriye, ew li ser hevalên jin jî ferz dikirin.

Di bin vê nêzikbûnê de feraseta zayendperestî hebû, bê bawer nêzikbûna hevalên jin hebû. Ger mirov îdeolojîk bigire dest, wisa ye. Dîsa bertekên hevalan çêdibûn. Hevalên jin jî ne xwedî danehev bûn, dibû ceribandineke yekemîn. Serokatî giştî feraseta artêşê diguherand, lê jin bibe fermandareke çawa, artêşeke çawa rêxistin bike û şerekî çawa pêş bixe, nedihat zanîn. Pir bê tecrûbe bû. Berê jî di nava me de, yekîneyên xweser çêbibûn û di nava hêzên din de jin hebûn, lê ew girêdayî feraseta artêşa heyî bû, ji vê derbas nedikir. Serokatî perspektîfa vê jî danî, li hemberî vê ferasetê ceribandinek artêşa jinê li cîhanê jî tune bû.

Ji ber vê nêzikatiyên şaş, di hevalên jin de jî derket; danehevên ku li cem hevalên xort çêbûne, mînak digirtin. Hevalên xort çawa şer kiribe, artêş ava kiribe, hevalên jin jî wisa tevdigeriyan. Jixwe hevalên xort jî, weke isbat ji hevalên jin ew dixwestin. Li hemberî wê, hevalên jin jî gotin, madem wisa ye em ê xwe isbat bikin. Yanî dîsa pîvan ji aliyê hevalên xort ve dihat danîn. Bi dehan hevalên jin, wisa çûne şer û karê giran kirine. Vê bi xwe re gelek berdelên giran jî dianîn.

Serokatî ew isbat nedixwest, dema ku jin ji malê derket, ew yek isbat kiribû. Jixwe biryar girtiye ku vî karî bike. Di encamê de vê nêzikbûnê, bi xwe re reqabeteke çort jî derxist holê. Bê guman ji aliyê jinê ve ew hewldan jî ne bê mane ye, dixwaze xwe isbat bike. Vê yekê ew pêşdarazîbûnên hevalên xort û yên hevalên jin jî şikênand. Lewra jin jî ji xwe ne bawer bû. Dibe ku îro em wisa çort dinirxînin, lê israr û hewldanên wê demê jî bi xwe re tiştek derxist holê. Lê aliyê kêm, bizanebûn û îdeolojîk nebû. Li hinek cihan, li ser vê esasê nakokî jî derdiketin, cihên ku hêza hevalê xort heye, bi hevalên jin pir zehmetî didan kişandin.

Mesela li hinek cihan, erzaqên hevalên jin qut dikirin. Lewra êdî hevalên jin bi gotinên wan nedikirin. Li hin cihan digotin, “madem artêşa we cuda ye, biçin her tiştî xwe bikin, em qet dest nadin tiştekî we” Tabî agahiya gelek tiştan Serokatî jî digirt.

Di hevalên jin de jî, bêbawerbûn hebû. Digotin em tenê nikarin bikin û carina di nava yekîneyên xweser de cih nedigirtin. Digotin hevalên xort dê bi me re bibin alîkar. Di hundirê xwe de, ew têkoşîn hê jî weke

karê hevalên xort dîtin hebû. Vê jî di nava hevalên jin de, nîqaşeke cuda dianî. Dibû sedama ku bi dilxweşî û bi eşq xwe tevlê nekin.

Ez mînakeke bidim, wê demê em li Xerzanê bûn. Ez fermandara mangayê bûm, hevalê Elî Kiçî jî fermandarê bolika me bû. Her li hemberî hevalên jin rêz nîşan dida. Hevalekî wisa bû. Wê demê cîhazê mezin li cem me hebû. Biryargaha navendî jî tune bû, Serokatî bi riya cîhaza mezin hin tişt radigihandin. Rêxistinbûna jin û rola wê jî, Serokatî her li ser cîhazê araste dikir. Dema ku Serokatî, artêşbûna jinê îlan kir jî, bi riya cîhazê kir. Hemû hevalên jin li ber cîhazan kom bibûn û guhdar dikirin. Wê demê zanebûneke me tune bû, me digot em tevlî şoreşê bûne, em ê şer bikin. Heya wê demê hevalên jin bi serê xwe kar nedikirin, nediçûn çalakiyan.

Wê demê heya şeş mehan jî, me di her tekmîlê de pêşniyar kir ku mangaya me bi serê xwe biçe tepeyê. Dema bû zivistan me qampa xwe çêkir; çar mangayên hevalên xort bûn, mangayek jî hevalên jin bûn, lê hejmara mangaya zêde bû. Cihê ku qamp lê ye, daristan bû. Lê cihê tepeyê ku me her roj digirt jî, seateke dûrî qampê bû. Cihê tepeyê jî zozan bû, ji ber wê me heya cihekî tunel çêkiribû. Me hemû erzakên xwe ji qampê dibirin tepeyê û me êvaran agir pêdixist. Her carê jî mangayek diçe tepeyê. Me jî her pêşniyar dikir ku, mangaya me bi serê xwe biçe tepeyê.

Rojeke pir berf dibariya, ba rabûbû; mirov nedikarî li tepeyê bisekine. Jixwe me biryar girtibû ku heval li tepeyê nemînin. Heval Elî, wê demê dibêje “ez çi bikim ku, hevalên jin ji biryara wan vegerînim”. Ew roja firtone bû got, “derkevin karê we heye”. Got “mangaya xwe amade bikin, hûn ê biçin tepeyê”. Hevalên jin hemû kêfxweş bûn, da ku biçin tepeyê. Kesî negot, “di vê firtonayê de em ê çawa biçin?”. Me erzaqên xwe amade kirin û derketin. Lê hevalê Elî vê dorê poşman bûye, gotiye “dibe ku bibêjin em di vê firtonayê de naçin”. Lê em çûn, em heya cihekî çûn, kêm mabû em bigêhêjin tepe, lê em nikarin biçin, me bi destê hev girtiye, bi zorê dimeşin. Em naxwazin vegerin jî, lewra dê di qampê de em ê bibin mijareke cuda. Pişt re me mêze kir, pênc şeş hevalên xort pêy me tên. Dibêjin hevalê Elî gotiye, neçin di vê firtonayê de mirov nikare biçe. Lê me got em ê biçin. Dawiyê de em çûn û çend rojan li tepeyê man. Piştî wê me her tişt bi serê xwe dikir. Em diçûn tepe, diçûn dewriye. Êdî nedikarîn bibêjin, neçin jî. Ew ji bo me bibû serkeftinekê.

Ew ne weke zilm û zordariyekê bû jî, lê li her cihî ji hevalên jin re digotin hûn nikarin. Mêzekirin cuda bû, digotin “lewaz e”. Pêşiya çalakbûna hevalên jin digirtin. Wê salê li hemû cihên Kurdistanê bi sedan mînakên wê derketine holê. Rûxmî ku hevalên jin bê danehev bûn jî, israra wan zêhniyetek da şikênandin. Ew nêzikatiyên şaş, hatin şikênandin. Digotin, “em hevalên hev in, werin em bi hev re bikin”. Nêzikatiya herî baş ew bû. Tabî bi artêşbûna jinê re ew nêzikatî û zêhniyet şikest.

Îro jî bandora wê zêhniyetê heye, lê giştî tiştek rûniştiye. Ew jî mijareke girîng e. Van nêzikatiyên şaş hişt ku Serokatî jî, di demê de mudaxale bike. Tam di dema ku digotin, em jinê ji nava artêşê biavêjin de, Serokatî artêşa jin ava kir. Hêza têkoşînê jî mezin kir. Ew nêzikbûna ku dibêje, di nava artêşekê de du hêz nabin jî şikênandin, encamên wî jî, mirov dikarî îro bibîne.

**Encamên Artêşbûna Jinê**

Di 94’an de weke encama artêşbûna jinê, li rûxmî hemû nefêmkirinan, li hemû herêman astek derdikeve holê. Bi gelek nêzikbûn û ferasetên şaş, ew mijar dikeve rojeva hemû herêman û li gorî wê rêxistinbûnek tê çêkirin. Ew jî li hemberî sekna paşverû û koletiyê helwesteke derdixe holê. Di warê pratîk û seknandinê de jî encameke mezin derdixe holê. Li ser vê Serokatî rêxistinbûna jinê zêdetir pêş dixe. Di pêy ve re partîbûyina jinê û YAJK pêş dikeve. Pişt re jî pergala konfederal ya jinê pêş dikeve. Yek ji ya din re dibe bingeh, dibe hêz û morala têkoşînê.

Artêşbûna jinê, di vê demê pêwistiyeke lezgîn û di cih de ye. Lewra pêwîst e êdî jin xwe bi xwe rêxistin bikin û bi serê xwe bibin hêz û mêr jî neçar e ku vê vîn û biryarê nas bike. Di vir de, nêzikatiyên pir şaş derketin; Serokatî ew hemû bi nêzikatiyên me yên kevneşop ve girêda û dahûrandina wê kûr kir. Got “ew mijareke girîng e, ne textîkî ye. Bi azadiyê ve girêdayî ye. Li ser vê jî dîsa vegera cewhera xwe çêbû û artêşbûn pêş ket. Serkeftin û encamên artêşbûna jinê, êdî demdirêj derketin holê. Êdî rêbazên wê, li gorî şert û mercan diguherin.

Parastin, ji bo her zindiyekî tiştekî jê veneger e. Hêza me ya gerîla bi awayekî giştî parastina civakê dike; jin jî ji bo parastina jinê û civakê dikeve nava hewldaneke bi vî rengî. Ji ber vê, ew nêzikatiyên şaş êdî bê mane ne. Dibe ku îro jî teyîsîna wan nêzikbûnan hebe, yên ku feraseta

xwe li ser jinê ferz dikin hene, lê li hemberî perspektîfên ku Serokatî danîne û tewdîr ên girtine bê mane ne. Zehmetiyan dîsa dide kişandin, astengiyan derdixe, lê cihê xwe nagire. Lewra jinê êdî bi rêxistinbûna xwe, ew sînor derbas kirin.

Di 94'an de, di qada civakî de jî, rêxistinbûna jinê digihêje astekê. Perspektîfên ku Serokatî dide, bi taybetî li Bakur û Ewropa, li paralelê artêşbûna jinê de rêxistinbûna jinê pêş dixin. Mesela di vê demê de jî, di nava civakê de yekîneyên jin xwe bi awayekî xweser rêxistin dikin. Heya wê demê di nava rêveberiyan de cih girtine, lê piştî wê bi awayekî xweser rêxistinbûn çêdibe. Di vê qadê de jî kêmasî derdikevin, lê li ser esasê rêxistinbûnê, Serokatî dixwaze azadiyê pêş bixe.

Serokatî weke model, li ser qada Ewropa jî pir disekine. Li saxayê jî gelek hevalan perwerde dike û di asta rêvebertiyê de wan dişîne Ewropa. Li derveyî welat jî, girse û derdoreke welatparêz her amade dibe. Di vê demê de mêzekirinên şaş û têkiliyên şaş di pratîka Ewropa de jî derdikevin holê. Serokatî gelekên van dikişîne saxayê û hesap dipirse, di cih de mudaxale dike. Dîsa bi bandora serhildanên welat, li Ewropa jî di pêşengiya ciwanan de, şiyarbûnekê çêdibe û têkoşîn xurt dibe.

Jixwe bi çalakiya ku heval Ronahî û Bêrîvan di newroza 94'an de kiriye, ew têkoşîn zêdetir diyar dibe. Di 94'an de, hevala Ronahî (Bedriye Taş) û hevala Bêrîvan (Nilgün yıldırım), wisa hevalên kevn jî nînin. Lê partiyê nas dikin, rastiya Serokatî dizanin, nêzikatiyên Serokatî yên azadiya jinê dizanin. Nêzikatiyên pergala kapîtalîst, yên li ser gelan hîs dikin, her du jî biryar distînin ku li qada Ewropa, di navenda pergalê de, ji têkoşînê re bibin bersiv. Jixwe nameyên xwe jî dinivisînin. Yanî çalakiyeke bi biryar û zanist e. Asta zanebûna wan û girêdana wan, di nameya wan de diyar dibe.

Wisa xwe amade dikin, di newroza 94'an de li welatê Almanya, bajarê Manheîmê çalakiya xwe şewitandinê dikin. Dixwazin gel jî wisa şiyar bikin. Ew qesa bi biryarin ku, ji bo ku kes nikare mudaxaleyê çalakiya wan bike, diçin cihekî ku kes wan nebîne çalakiya xwe dikin. Yanî wisa pir bi tewdîr çalakiya xwe dikin ku, tu mudaxale li ser çalakiya wan nebe. Bi vî rengî agir berdidin giyana xwe. Heval xwe weke şopdarên hevalê Mezlûm, Zekiye û Rehşan dibînin. Di saxaya Ewropa de, pêşengtiya vê xetê dikin. Di nameya ku ji Serokatî re nivîsandine de, van tiştan diyar dikin. Pergala Ewropa red dikin û bi çalakiya xwe pro-

testo dikin. Dîsa êrîşên dijmin li ser têkoşîna me hene vê demê de, heval bi çalakiya xwe bersiv didin êrîşên dijmin jî.

Serokatî çalakiya her du hevalan pênase kir. Serokatî hêza ku ji nameyên wan derketiye dahûrand û kir rojeva hevalan. Serokatî wisa pênase kir; **"çalakiya jiyana azad û xweşikbûnê ye. Yanî lêgerîn, hewldan û çalakiya wan; ji bo ku jiyaneke azad çêbibe ye. Di armanca çalakiya heval Mezlûm de jî ew tişt hebûn."** Dîsa Serokatî bi çalakiya van hevalan, azadî jî ji nû ve pênase kir. Got, "**ger azadî tiştekê hêsan bûya, heval Bêrîvan û Ronahî xwe nedişewitandin**."

Azadî tiştekî wisa ye ku, li hemberî pergala qirêj û kevneşopiya paşverû, xwe paqij kirinê û xwe di nava agir de şewitandinê dixwaze. Berdêleke bi vî rengî dixwaze. Li hemberî nêzikatiyên hêsan li azadiyê mêze dikin, Serokatî her mînaka hevala Bêrîvan û Ronahî dide. Nêzikbûna azadiyê de, şaşiyên me niha jî hene. Hinek yetkî û derfet dikevin destê me, tu dibêjî qey êdî pirsgirêka me ya azadiyê nemaye em tevdigerin. An jî hinek kes, her xwe azad dibînin. Dibêjin "em tevlî têkoşînê bûn û azad bûn". Ji bo vê Serokatî dibêje, "azadî xwe şewitandinê dixwaze. Azadî wisa hêsan girtina dest, bi pîvanên azadiyê lîstin e. Ew seknandin jî, li dijî xeta azadiyê ye. Ji ber vê jî, Serokatî bi çalakiya hevalan wateya azadiyê kûrtir kir. Bi taybetî di qadên pratîkî de, weke pîvan danîn holê.

Piştî çalakiya hevala Bêrîvan û Ronahî, li qada Ewropa êdî berpirsiyariyek û çalakbûnek jî derket holê. Bi taybetî di karên hevalên jin de xurtbûnek çêbû. Di nava gelê me yê Ewropa de jî şiyarbûnek çêbû. Li hemberî pergala modernîteya kapîtalîst, ku dikişîne nava xwe, şiyarbûnek tê çêkirin. Lewra ew her du heval, cihên ku dixebitin tên hezkirin jî, hevalên di her qadê de mînak in. Ji ber vê li ser gel, pir bandor dikin. Serokatî jî di şexsê van hevalan de, li ser Ewropa gelek dahûrandin kirin û perspektîfên berfireh dan.

Di vê demê de, li Bakur jî xebat berdewam dikin. Bi taybetî di 94'an de li Bakur pir heval tên girtin. Ji xeta Gûney-Bati bigire heya metrepolan, Serokatî pir hevalan rê dike. Di vê xetê de gelek heval tên girtin. Serokatî vê dinirxîne, lewra tên girtin û qad vala dimînin.

Dîsa di 94'an de cara ewil, weşana jinê ya xweser derdikeve. Ew bi taybetî ji bo jina Kurdistanê girîng e. Di nava tevgerên sosyalîst û yên jin de, weşan derxistin heye. Lê Kurdistanê cara ewil tiştekî wisa derdikeve. Lewra jina Kurdistanê devê wê, çavên wê hatine girtin; bi vê

weşanê dixwaze devê xwe û çavê xwe veke û bi vî awayî derdora xwe mêze bike. Weşana jin vê dide diyarkirin. Niha bi dehan kowar û rojnameyên me hene, ji ber vê ji me re hêsan tê, lê cihekî ku tiştek tune, cara ewil tiştek derdikeve. Ji ber vê girîng e.

Di vê demê de Serokatî, ji hevalên jin û xort jî dipirse; dibêje "ger em kowareke jinê derxin dê çawa bibe?" Hin heval dibêjin, hê zû ye. Bila hinek têkoşîn û artêşbûna jinê pêş bikeve, pişt re bila kovar derkeve. Hin heval jî dibêjin, mînakên wê jî hene, em dikarin derxin. Serokatî jî dibêje, "tam dema wê ye. Heya wê demê û niha jî, tu heval tiştekî nakin rojeva Serokatiyê, Serokatî her dibêje em wisa bikin dê çawa bibe. Mînaka artêşbûnê jî wisa ye. Piranî heval jî dibêjin, "nabe". Lê Serokatî dibêje "tam dema wê ye".

Ew têkiliya Serokatî, bi jinê re çiqes kûr e, çiqes li derveyî şaristaniyê ye; wê dide diyarkirin. Çiqes bi xweza û cewhera jin ve girêdayî ye, wê diyar dike. An na li Kurdistanê mijara jinê, ne di rojeva tu kesî de ye. Mesefeya di navbera xwe û jinê de rakiriye. Jinê hîs dike, mêjiyê wê û rengê wê dizane û derdixe holê. Wê demê jî nêzikatiyên serasera û hêsan dikin jî hene; dibêjin ma kowarek derketiye çiye? Lê pir bi mane ye; lewra êdî jin tiştên ku dibînin, jiyan dikin û hîs dikin, bi civakê re parve dikin. nêrîna xwe, rengê xwe didin diyar kirin.

Yanî heya wê demê, hevalan jin di çapemeniyê de pir hebûne, heta hevalên ku heya wê demê di nava xebatên çapemeniyê de cih digirin, herî zêde hevalên jin in. Her di qomîteya weşanê de jî cih digirin û aktîf in jî. Lê pirsgirêk ne ew e. Serokatî bi vê cudabûna xwe ya ji pergalê dide diyarkirin.  Lewra pergal jî di gelek cihan de, jinan aktîf dike, lê bi reng û nêrîna jinê nîne. Tabî me ew firsend çiqes bi kar anî, pêş xist û li gorî misyona wê tevgerîn; ew mijareke cuda ye. Di vir de, heya niha jî kêmasî zêde ne. Bi hebûn û beşdarbûna xweser, me xeta waşanê çiqes da guhertin, ew mijara nîqaşê ye. Lê weke çapemeniya xweser her hebûn û li gorî vê tevgerîn jî, ne tiştekî hêsan e. Misyona me ya di vir de, xet û nêzikbûna çapemeniyê jî guhertin e. Qada ku herî zêde xizmetî pergala kapîtalîst dike, ew qad e. Serokatî xwest bi vê pengavê, vê nêzikbûnê belav bike. Tabî ew nêzikbûneke bi bîrdozî ye.

Navê wê kowarê jî, "jina serbilind" e. Niha jî tê weşandin. Bîst salin weşana xwe berdewam dike. Li qada Ewropa derdikeve û îro bûye kowara kadro. Lê niha heval her pêşniyar dikin, dibêjin em vê kowarê neweşînin. Dibêjin rojname heye, tv hene, pêwîstî tune. Lê em jî, israr

dikin. Lewra kowara yekemîn e. Ji bo naveroka wê xurt bibe, me jî pêşniyar kir. Lewra di naverokê de kêmasî hene. Herî dawî, biryar hat girtin ku weke kowareke bîrdozî û teorîk derkeve. Naverokê wê dê wisa bê guhertin. Lê kowara Jina Serbilind, dê her hebe.

Dibe ku niha girîngiya wê ya berê tune be, lê maneya wê heye. Jixwe navê kowarê jî Serokatî lê kiribû. Hê jî bi vî navî berdewam dike.

Di 94'an de, li gelek qadên din jî pêşketin hene. Bi taybetî li Rojava, bandora têkoşîna jinê heye. Êdî di dawiya 94'an û destpêka 95'an de, Serokatî ji bo jinê amadekariya pengavên nû dike. Bi rastî jî Serokatî, weke ku tevnekê neqiş bike, nêzikî tevgera jinê dibe. Yek bi yek neqşên wê dike û tevn derdikeve holê. Yekîneyên xweser ava dike, bolikan ava dike, rêxistana xweser çêdike, artêşbûnê pêş dixe, çapemeniya wê, parastina wê; her tişt re yek bi yek xwe mijûl dibe. Her çiqes nêzikatiyên şaş derkevin jî, di encamê de bingeheke xurt derdikeve holê. Yanî tabloyê neqşê derdikeve holê. Serokatî dixwaze vî tabloyî, êdî ji milê rêxistinî, rêveberî û xwesertiyê ve, baldartir bigire dest û bigihîne encameke din.

## KONGREYA YEKEMÎN YA JINÊ Û YAJK

### Kongreya pêncemîn Ya PKK'ê Û Amadekariyên YAJK'ê

Di vê demê de Serokatî perspektîfa YAJK'ê dide. Di 95'an de, berhemên ku derketine holê, Serokatî dixwaze bi YAJK'ê encam bike. Serokatî li saxayê komeke heval, ji bo kongreyê amade dike. Me berê jî da diyarkirin, di 93'yan de kongreyek li welat hatibû darxistin û Serokatî red kiribû. Lê Serokatî pêwîstî pê dibîne ku, bi bingeha ku çêbûye, jin di hemû qadan de, ji jêr de heya jor xwe bi rêxistin bike. Pêwistî bi rêxistinbûneke wisa dibîne û li ser vê esasê jî, li saxaya Serokatî komeke hevalên jin perwerde dike. Di dewreyan de hevalan ji bo kongreyê amade dike.

Di vê demê de amadekariyên kongreya pêncemîn ya PKK jî hene. Di ropara polîtîk ya kongreya pêncemîn de, Serokatî êdî mijarên guhertinê zelal dike. Di kongreya çaremîn de jî heye, lê di kongraya pêncemîn de tam zelal dibe. Dibêje weke tevger, di warê rêxistinbûn û têkoşînê de, divê em şêwaza berê berdin. Ew berî pêvajoyê Îmraliyê ye. Piştî pêvajoyê Îmraliyê, dema ku ji bo guhertina paradîgmayê, me careke din rapora polîtîk ya kongreya pêncemîn xwend, me baştir fêm kir. Wê demê bala me nedikşand. Ji bo Marksîzmê û sosyalîzma real, Serokatî wê demê dest bi rexneyan dike. Dibêje "êdî pêwîst e, paradîgma were guhertin".

Hem di kongreya çaremîn, hem jî di ya pêncemîn de, bi giştî di avahî û rêxistinbûna partiyê de dixwaze guhertineke giştî bide çêkirin. Vê perspektîfê jî dike rojeve avahiya hevalan, lê serokatiya textîkî û hemû heval, di vê demê de vê fêm nakin û pêk naynin. Dîsa nêzikbûna ku mohra xwe li pratîkê dixe, şêwazên berê yên qlasîk in û xwe her dubare dikin.

Di kongreya pêncemîn de, Serokatî bi taybetî mijara jin, jiyan, têkoşîn û textîkê digire dest. Di rapora polîtîk de hene. Berî ku kongreya jinê were avakirin, perspektîfa YAJK'ê di kongreya pêncemîn ya PKK de tê dayin. Ew pir girîng e, lewra dixwaze hemû avahiya partiyê amade bike. Jixwe ew hevalên ku perwerde dibînin û tên, tevlî kongreya pêncemîn jî dibin. Amadekariyên mezin tên kirin. Da ku weke kongreya Zelê nebe, hevalên jin bikaribin, bi vîna xwe, bêyî ku bikevin bin siya mêr, biryarên xwe bigirin û xwe bi rêxistin bikin. Yanî bibin xwediyê

axaftina xwe. Ji bo vê Serokatî hem di pêvajoya artêşbûnê de, hem jî di pêvajoya YAJK'ê de perspektîfên pir xurt dide.

Pêvajoya 95'an tê zanîn. Êrîşên dijmin û operesyonên dewletê pir tên kirin. Li xeta Botan û Başur, dijmin jî biryar girtiye ku bi giştî darbe li tevgerê bixe û li ser vê esasê li hemberî Serokatî kompleyê pêş bixe. Li hemberî vê, Serokatî jî hêza artêş û partiyê amade dike. Hem perspektîfa kongreya pêncemîn, hem jî perspektîfa kongreya jinê ya yekemîn, li gorî vê dide.

**Kongreya Yekemîn Ya Jinê û Avakrina YAJK'ê**

Kongreya yekemîn, di navbera 8-18'ê adara 1995'an de tê li darxistin. 350'î delege, ji hemû herêman tevlê dibin. Di kongreyê de, Serokatî perspektîfa "jina azad, jiyana azad" dide. Jixwe berê jî em ê çawa jiyan bikin, xistibû rojeva me. Dike rojeva kongreyê jî. Dîsa di rapora polîtîk de, tiştên ku di sê deman de; dema nêzik, dema dirêj û kêliyê de bên kirin diyar dike. Navê TAJK'ê ku di kongreya Zelê de tê danîn, tê guhertin û dibe YAJK. Jixwe navê TAJK'ê pir nedihat karanîn, lê di fermiyetê de wisa mabû. Navê YAJK'ê (Yekîneyên Azadiya Jinên Kurdistan), ji aliyê Serokatî ve tê pêşniyarkirin.

Kongreya ku li Zelê hatiye kirin, di vê kongreyê de tê redkirin û biryar tê girtin ku kongreya YAJK'ê bibe kongreya yekemîn ya jinê. Kongreya yekemîn ya YAJK' ê bi vê kongreyê tê pênase kirin. Biryar tê girtin ku bi hejmareke cuda navenda YAJK'ê bê hilbijartin. Ji hemû qadan nûner hene, di nava navendê de. Biryar tê girtin ku rêveberiya YAJK'ê jî di kongreyê de bê hilbijartin. Cara ewil di kongreyê de rêveberiya jinê tê hilbijartin. Divê li hemû qadan, xebatên jinê xwe bi navê YAJK'ê rêxistin bike. Biryar tê girtin ku, li hemû qadên artêşê, rêxistinên xweser bên rêxistinkirin û yên heyî jî bên xurt kirin. Biryar tê stendin ku, biryargeha YAJK'ê çêbe. Pê ve girêdayî, li hemû qadan rêvebirên jin, bi biryargeha jinê ve girêdayî be. Her wiha gelek biryarên din tên girtin, da ku weke me li jor jî got; li ser sê deman xwe bi jiyanî bikin.

Heval pirs dikin, dibêjin kongreya ku li Ewropa hatiye darxistin gelo ne kongreya yekemîn e? Rast e, konge nehatiye red kirin, lê ew kongre di saxaya Ewropa de teng maye. Lê ya ku me vegotina wê kir, hemû xebat û qadên jinê digire nava xwe. Yek jî YAJK tê avakirin. Ya duyan jî, berpirsiyartiya hemû hêraman di vê kongreyê de tê danîn. Dikare derheqê hemû qadan de biryar bistîne. Însiyatîf û berpirsiyariya hemû

herêman girtiye. Ji bo vê jî weke kongreya YAJK'ê ya yekemîn derbas dibe.

Piştî îlankirina kongreyê, civînên rêveriyê û meclisê çêdibin. Biryargeha YAJK'ê çêdibe, cara ewil çêdibe. 3-4 heval di biryargehê de cih digirin. Serokatî jî erê dike. Hevalên ku di vir de cih girtine; hevala Sozdar e, şehîd Şervîn e. Şehîd Şervîn, ji Botanê ye, demeke dirêj li saxaya Serokatî maye, li qadên welat jî maye. Şehîd Meryem, di navendê de cih digire; ew jî ji Ewropa tevlî kongreyê dibe. Weke temsiliyeta parlementer, carekê derbasî welat dibe, pişt re diçe saxaya Serokatî. İsrara li welat mayinê nîşan dide, Serokatî jî wê dişîne welat. Di asta pêşeng de kar dike. Danehevên wê jî hene.

Biryargeh cihê xwe jî cuda dike cara ewil. Biryar tê girtin ku encamên kongre, pir xurt belavî hemû qadan bikin. Lewra li ser belavkirina kongreyê, dê rêxistina YAJK'ê were kirin. Hemû hevalên ku di kongreyê de cih digirin û weke rêvebir tên hilbijartin, weke peyvira yekemîn; belavkirina kongre û danasîna YAJK'ê digirin dest.

Pratîkên şaş ku wê demê, bi taybetî di biryargehan de derdikevin, heya qadên herî jêr li ser pratîkê bi bandor dibin. Heya wê demê di rojevê de ye. Xwe çawa rêxistin dike û pratîze dike, hem ji aliyê baş ve, hem jî ji aliyê neyînî ve, di qadan de derdikeve holê. Di pêşengtiya biryargehê de jî derdikeve, li herêman jî derdikeve. Şaşitiya ewil ku di şexsê biryargehê de derdikeve; ji ber ku cara ewil biryargeheke xweser tê avakirin, danehevek tune. Jin bi awayekî şexsî tevlî karî rêveberiyê bûye, lê bi awayekî xweser rêvêberî nehatiye kirin. Ew di pratîka YAJK'ê de amatoriyekê derdixe holê. Di heman demê de, biryargeha navendî ya giştî çawa be wisa digirin dest. Xwe şibandin heye. şêwazê jinê jî wisa dibe. Ew yek di asta rêveberiyê de, cudabûna jinê dernaxe û şibandinek dirdikeve holê. Şêwazê mêr dîsa derdikeve holê.

Jixwe Serokatî mudaxaleyê vî şêwazî dike. Navê vê şêwazê jî Serokatî weke şibandina şêwaza mêr, pênase dike. Dibêje "**divê biryargeh û rêveberiya jinê, vîn, reng û cudabûna jinê derxe holê**". Pêşiya vî şêwazî dide girtin. Çend hevalên pêşeng jî dikişîne saxayê û perwerde dike. Di giştî dewrê de jî dahûrandinên YAJK'ê dike û hemû avahiya partiyê bi zanist dike. Lewra weke artêşbûna jinê, YAJK jî ji aliyê hevalên xort ve pir nayê fêmkirin. An jî şaş tê fêmkirin. Li gorî xwe YAJK girtina dest heye, di qadan de şêwazên xwe li ser YAJK'ê ferz dikin. Şêwazekî teng û serasera ye. Şêwazê navenda YAJK'ê wisa tê pênasekirin. Di wê demê de hê nû navend hatiye avakirin.

**Teyisînên YAJK'ê Yên Li Ser Qadan**

**-Qada leşkerî**

Teyisîna vê li ser herêman jî dibe. Delegeyên ku tevlî kongreyê bûne, li qadan belav dibin. Hevalên rêvebir jî diçin qadan. Jixwe perwerde dîtine, lêhûrbûna kongreyê jiyan kirine. Ew komên ku diçin qadan, bi misyona mudaxaleyê û ragihandina encamên kongreyê diçin.

**1-Başur**

Di vê demê de, di Başur de, du eyalet hebûn; ya Soran û ya Behdînan. Ji bo eyaleta Soran, kongreyê biryar girtibû ku, di nava civakê de rêxistina YAJK'ê bikin. Komeke mezin ya hevalan derbasî vê herêmê dibe, hinekên wan li herêmê ne, weke gerîla dimînin, lê piraniya wan derbasî nava xebatên gel dibin. Di nava gel de, karê çand û huner, çapamenî û rêxistinê dikin, di van saziyan de rol dilîzin. Pêşketinek jî derdikeve holê. Perspektîfa vê herêmê jî, Serokatî bi xwe dide. Serokatî dixwaze li Başur jî, rêxistinbûna jina azad ava bike. Di 95'an de, di nava gel de rêxistinbûneke xurt tê çêkirin. Heval hê jî behs dikin.

**2-Zagros**

Eyaleta Zagrosê; komeke mezin ya hevalên jin jî diçin vê eyaletê. Di nava wan de, endamên meclisa YAJK'ê jî hene. Biryar tê stendin ku, li eyaletê rêveberiya xweser were avakirin. Jixwe ji bo çend eyaletan ew biryar di kongreyê de derdikeve; biryargehên xweser yên jinê li eyaletan dê bên avakirin. Wê girêdayî biryargeha navendî bin. Serokatî her li ser Zagrosê pir disekine. Her cihê Kurdistanê, ji bo têkoşîna me girîng in. Lê bi taybetî ji bo jinê, Serokatî perspektîfa Zagrosê, cuda dide. Di van salên dawî jî, digot li derdora çiyayê Zagrosê bajarên Star ava bikin. Dixwaze rêxistina jinê li wir bide rûnişkandin. Li ser vê esasê, delegeyên xort diçin vê herêmê. Lê reaksiyon jî derdikevin.

Li Zagrosê weke reaksiyoneke, neqebûlkirina YAJK'ê derdikeve holê. Di nêzikbûnên hevalên xort ku rêvebirin de nêzikatiyeke wisa heye. Dibêjin pêwistiya me bi YAJK'ê nîne, jixwe hevalên jin li vir di nava şer de ne. Sivik dikin. Dibêjin karê me pê tune, bila neyê eyaleta me. Ew ferasetek e. Serokatî bi avakirina YAJK'ê jinê, ji zilam qut dike. Bi rastî jî reaksiyona ku li hemberî YAJK'ê tê dayin ew e. Naxwaze ku jin ji serweriya wî derkeve. Lewra jin êdî hemû arestebûn û biryarên xwe, bi xwe digire. Ji ber vê, li hemberî YAJK'ê bertekek derdikeve, lê bi şêwaza şexsan ve girê didin. Dibe ku di şêwaza hinek jinan de, şaşitî jî

hebe. Lê berteka esasî li hemberî rêxistinbûna jin e. Ji milekî din ve jî, jin di bin serweriya xwe de hiştin e.

Di vê demê de, di hevalên jin de jî nêzikatiyên wisa derdikevin holê. YAJK'ê weke vîn nabîne, mûhatab nagire. Serokatî ew yek wisa pênase kir; jina kole û mêrê serdest ku naxwaze ji hev qut bibe. Di ferasetê de ew dihat ferzkirin. Li hemberî YAJK û xeta Serokatiyê berxwedanek paşverû hebû. Jixwe wê demê, biryara ku di kongreyê de derdikeve pêk nayê. Perspektîfa Serokatî nakeve pratîkê. Biryargeha jinê jî, li wir nayê avakirin. Jina ku YAJK'ê qebûl neke jî, ji derve tê hiştin. Yanî di navbera jinê de jî parçekirinê çêdikin. Ew nêzikbûn, ji aliyê rêveberiya YAJK'ê ve jî baş nayê dahûrandin û nikarin bi awayekî rast çareser bikin. Mesela gelek hevalên jin, ji ber vê xwe ji YAJK'ê dûr xistin. Jin di şexsê kesan de dîtin. Ew nêzikbûnên çort û giştî red dikin, bi xwe re texrîbatên mezin derxistin. Jixwe di salên pêş de wê zêdetir bibin. Ew jî hinekê ji nêzikatiyên hevalên mêr, bingeha xwe digire.

Bi vî awayî, li Zagrosê YAJK bê mane bû. Serokatî ew nêzikatiyên şaş yên mêr, dahûrand û di xeta YAJK'ê de israr kir. Nêzikatiyên amator jî, ew nêzikbûn bi awayekî objektîf xwedî kir. Ji bo hinek eyaletan jî biryar hatibû girtin ku, yekîneyên xweser bên avakirin. Dîsa eyaletek Zagros bû. Li hemberî van yekîneyan jî, ferasetên şaş derketin. Perspektîfa ku Serokatî daye çewt hate xwendin.

**3-Botan**

Ji bo eyaleta Botanê; piştî kongreyê taqwiyeyeke xurt diçe vê eyaletê jî. Weke me berê jî da diyarkirin; li vê eyaletê daneheveke jinê çêbûye, lê milê di karkirinê de xwe şibandina mêr jî heye. Şêwaza xort esas girtin heye. Serokatî herî zêde perspektîfa naskirin û xurtkirina cins, ji bo eyaleta Botanê dide. Li vir, weke Zagrosê nakokiyên mezin dernakevin. Lewra biryara biryargeha jinê, ji bo vê eyaletê tune. Biryara hin yekîneyên xweser heye. Ji ber vê bi awayekî mîsoger biryarên YAJK'ê nakevin Botanê. Şert û mercên wê demê jî, pêşiya gelek tiştan digire. Lewra jin têkoşîn dike li wê derê, kar dike. Vê pêşiya nakokiyan jî girtiye. Lê piştî 98'an Serokatî mudaxaleyî vê şêwe girtinê dike.

Di vê demê de hevalên ku li Botanê şehîd dikevin hene. Heval Bêrîvan, di 92'yan de tevlî partiyê dibe. Di asta fermandariya taximê de peywir giritye. Li Botanê şehîd dikeve. Hevala Rewşan Mêrdîn heye, ew jî fermandara taxime ye. Li Botanê şehîd dikeve. Hêvî Dêrîk heye, ew jî berpirsiyar e û li Botanê şehîd dikeve. Hevala Bêrîtan heye, li Perwariyê

şehîd dikeve. Hevala Şervîn Mêrdîn heye, ew jî di asta fermandariya bolikê de berpirsiyar e. Li Garisa şehîd dikeve.

Di vê demê de, li derdora biryargehê Zap û Metîna wan deran jî heval şehîd dikevin. Hevala Aryen heye, di 95’an de ji saxaya Serokatî tê û li Zapê şehîd dikeve. Berpirsyarê fermandariya taxima hevalên jin e. Hevala Mizgîn (Hüsnüye Akgül) heye, bi xwe Tirk e. Ew heval jî di asta pêşengtiyê de şer dike û şehîd dikeve. Hevala Warşîn Afşîn û hevala Dilsoz heye, ew jî li wan derdoran şehîd dikevin. Hevala Dîlan heye, bi xwe ji Mêrdînê ye, ji saxaya Serokatî tê û li Metîna şehîd dikeve. Ew jî fermandara taximê bû. Hevala Ronahî Tirk, hevala Diljîn, hevala Koçerîn, heval Selcan, hevala Binevş jî di asta pêşengtî û fermandariyê de ne, li van saxayan şehîd dikevin. Di operasyona 95’an (operasyona Çelîk) de şehîd dikevin.

**4-Amed**

Pratîka Amedê; piştî 95’an takwiye ji Amedê re diçe. Ew ferasetên şaş ku berê hebûn, bi giştî ji holê ranebûne. Pirsgirekên ku li Amede hene, pirsgirêkên giran in. Serokatî bi giştî mudaxaleyî qadê dike. Pirsgirekên heyî, pirsgirêkên têkilî û jiyanê ne; bi giştî pirsgirêkên azadiyê ne. Di vê demê de, feraseta ku di rêveberiya jin de heye; di wê demê de Sakîne diçe, di meclisa jinê de jî cih digire.

Li wê derê feraseta ku di şexsê rêveberiyê de tê jiyankirin û teyisîna xwe li ser avahiya hevalan jî dike, bûrjûwazîtiya biçûk e. Pişt re Serokatî vê weke tîplemeyekê digire dest. Bi vê nêrînê li azadiyê mêzekirin, di pratîka rêveberiya jin de derdikeve. Mudaxaleyên eyaletên Bakur dereng diçin. Xwe azad dibînin, biryarên ku di kongreyê de hatine girtin jî, biçûk dibînin. Pêwîstî bi tiştekî wisa nabînin. Nêzikbûnên kongre, derveyî pîvanên modernîteyê dibînin. Mane nedayina rêxistina xweser heye. Piştî pêvajoya YAJK’ê jî, di rêveberiya giştî de lûmpenîzm heye. Wê demê Silêman wan, li wir rêveberiya eyaletê ne. Serokatî, pişt re vê weke, feraseta bûrjûwaziya biçûk û lûmpenîzmê hev û din temam kiriye, dinirxîne.

Rêxistinbûna YAJK’ê li vir jiyanî nabe. Serokatî şêwazê eyaletê dinirxîne û weke xeta hevkariyê pênase dike. Di warê feraset û jiyanê de jî weke lûmpenîzm dinirxîne. Di vê qadê de jî, nêzikatiya mêr de, jin dîsa di tekela xwe de hiştin heye. Hinek hevalên jin jî hene, dixwazin YAJK’ê rêxistin bikin, pîvanên wê pêş bixin. Lê ew nêzikatiya zilamtiyê, wan di tekela xwe de dihêle. Nexweşiya deshilatdariyê, bandora xwe li

ser şêwazê eyaletê dike. Di encamê de rêxistinbûna YAJK'ê li eyaletê nayê rûnişkandin.

**5-Xerzan**

Wê demê li Xerzanê, operasyonên mezin çêdibin. Xeta Şîrvan, Mûtkî, wan deran operasyonên mezin çêdibin. Gelek heval şehîd dikevin. Di nava şehadetên komî de, hevalên jin jî pir şehîd dikevin. Piştî kongreyê bolikek hevalên ku xwedî danehev in, diçin Xerzanê. Di asta navendî de jî hevala Dîlan diçe. Hevala Dîlan Derîk jî, wê demê endama navenda YAJK'ê ye. Di heman salê de li eyaletê şehîd dikeve. Di hevalên ku pê re diçin de, hevala Warşîn wan jî şehîd dikevin. Bi vî awayî teyisîna YAJK'ê qet li eyaletê nabe. Qet nabe li eyaletên din, teyisînek çêdibe, nakokî pêş dikevin. Pratîka berê, li Xerzanê berdewam dike. Pêşketineke cuda lê nîne. Şehadetên çêdibin jî, atmosfereke giran çêdike.

**6-Dêrsîm**

Li eyaleta Dêrsîmê, me dabû diyar kirin, jixwe hevala Besê li wir şehîd dikeve. Di wê demê de, Zekî li Dêrsîmê ye, şêwaza Zekî tê zanîn. Ew jî dixwaze li Dêrsîm û Erzeromê şêwazeke li gorî xwe li ser hevalên jin bide rûnişkandin. Wê demê potansiyel û daneheveke hevalên jin, li her du êniyên Dêrsîmê jî heye. Rêxistinbûna jinê xurt e. Lê Zekî ew danehevên heyî, vala derdixe. Zekî her naxwaze ku jin jê qut bibe, heya ku çû jî ew nêzikbûna wî hebû. Jiyana wî jî, mirov bigire dest, mirov dikare nêzikbûna wî fêm bike. Çûye kuderê xwestiye ew nêzikbûna xwe li ser jinê ferz bike. Di wê demê de, li eyaletê nêzikbûnên deshilatdar yên mêr, li ser hevalên jin tên ferz kirin.

Di kongreya yekemîn de, ji bo eyaleta Dêrsîmê jî komek hevalên jin diçin, lê heya ku diçin pir dem derbas dibe. Şert û merc pir giran in wê demê. Hevalên ku derbasî Dêrsîmê dibin jî, guhertineke mezin çênakin. Mudaxîlî pratîka heyî dibin. Biryar hatibû girtin ku, biryargeha jinê li wir jî were avakirin; lê nayê avakirin. Di destpêkê de, li hemberî van hevalên diçin jî, bertek derdikavin holê. YAJK tê red kirin, qebûl nakin, pêwistiyeke wisa nabînin. Ketine bin bandora Şemo. Bi rastî jî Serokatî zû ve pratîka Şemo hesiyaye. Dixwaze her mudaxale bike. Koma ku çûye re jî, perspektîfeke wisa dide. Hemû hevalên jin re jî, li ser cîhazê diaxife. Lê Şemo, têkoşînê, xetê, jiyanê li gorî xwe rêxistin dike. Di encamê de perspektîfên Serokatî vala tên derxistin û refleksên cuda tên nîşandan.

**7-Serhed**

Li eyaleta Serhedê jî, wê demê Korsan Suat li wir e. Di wê demê de eyalet bi giştî tasfiye dibe. Pratîka wir pir bi êş e jî. Rêxistinê jî wisa pênase kir. Nêzikatiyên berovajî li hemberî jinê hene. Di warê jiyanî de jin bikaranîn heye. Di asta exleqî û jiyanî de jî ketinek heye. Pratîka wir pir hatiye dahûrandin. Bi giştî xwe ji partiyê qut girtina dest û jin xistina bin serweriya xwe heye. Nêzikatiya ku bandora xwe li pratîka eyaleta Serhedê dike ew e. Her kes bi awayekî bûye parçeyekî vê pratîkê.

Piştî kongreyê heval diçin vê eyaletê jî, taximek hevalên jin diçe. Reaksiyon û neqebûlkirina herî tûj, li vê eyaletê tê raberkirin. Korsan Suat, dibêje “hûn nikarin bikevin eyaletê”. Ji bo ku wan hevalan vala derxe, haqaretên bi her awayî nîşan didin. Rêvebiriya jinê jî, pir ji qewetê tê xistin. Bê bandor tê hiştin.

Di vê salê de, hevalên ku li eyaleta Serhedê şehîd dikevin hene. Hevala Özgür heye, bi eslê xwe Tirk e. Hevala Dozdar heye, di 95’an de li eyaletê şehîd dikeve. Hevala Fîdan heye, ew jî li Dîgorê şehîd dikeve.

**8-Erzerom**

Eyaleta Erzeromê jî, hevalên ku diçin di asta teknîkî de dimîne. Wisa guhertineke mezin kirin û şêwaza berê derbas kirin, dernakeve holê. Şêwazê kevn, hem di sekna hevalên jin hem jî di sekna hevalên xort de derdikeve. Biryarên YAJK’ê bi awayekî coş girtina dest û lê xwedî derketin tune ye. Nêzikbûna wir jî şêwaza malbatperest e, li ser esasê hevaltiya ehbab çawûştiyê ye. Bi giştî qada gerîla, teyisîna kongre û biryarên YAJK’ê wisa ye.

**-Qada Civakî**

Di vê demê de, li qada civakî; bi taybetî li qampa Ertûşê, saxaya Rojava û li Ewropa, di rêxistinbûna YAJK’ê de guherinên bingehîn tên çêkirin. Wê demê Serokatî bi xwe jî li saxaya Rojava ye; li vir bajar bi bajar, herêm bi herêm û gund bi gund, meclis û qomîteyên YAJK’ê çêdibin. Berê jî rêxistinbûna jinê heye, lê bi taybetî li ser navê YAJK’ê rêxistinbûneke xurt çêdibe. Serokatî bi xwe jî bi perspektîf û vesazkirinên hevalan yên vê herêmê re mijûl dibe. Ew bi giştî jî bandora xwe li ser civakê dike. Jin di vir de risteke mezin dilîzin. Rêxistinbûna jinê di nava jinê de coş û kelecaniyeke çêdike. Her kes dizane ku, rêxistinbûna YAJK’ê ji bo azadiya wê û pêşeroja wê ye. Zanebûnek derdikeve holê.

Di şexsê vê qadê de Serokatî dibîne ku YAJK di nava civakê de çawa bi bandor dibe, li ser vê esasê di qada civakî de perspektîfa rêxistinbûna jinê berfireh dike. Bi taybetî piştî vê demê, giraniyê dide ser qada civakî.

Weke tê zanîn, gelê me yê qampa Ertûşê, hemû ji Bakur çûne. Li hemberî zextên dijmin bi giştî koçî Başur dikin. Wê demê di qampê de hevala Jiyan (Zeynep Erdem) heye, Serokatî wê peywirdar dike ku rêxistinbûna YAJK'ê li wir bide rûnişkandin. Jixwe di demeke kin de vê yekê pêk tîne. Xweseriya vir heye, milet koçber bûye, psîkolojiyeke cuda jiyan dike; lê dîsa jî di demeke kin de hevala Jiyan YAJK'ê rêxistin dike. Jixwe piştî demekê, di encama êrîşên li ser kampê de hevala Jiyan şehîd dikeve. Lewra di hemû karan de di êniya pêş de ye, pêşengiyê ji gel re dike. Ji ber vê, pir tê hezkirin.

Piştî ku hevala Jiyan şehîd dikeve, rêxistinbûna YAJK'ê weke mîraseke hevala Jiyan, ji aliyê gel ve tê parastin û xurtkirin. Xwedî lê derketinek heye. Heya niha jî, li qampê sekn û têkoşîna hevala Jiyan weke mînak tê girtin. Weke şehîda kampê jî hê tê bibîranîn.

Li saxaya Ewropa jî, Serokatî bi xwe perspektîfa wê dide. Piştî îlankirina YAJK'ê, li saxaya Ewropa jî bi navê YAJK'ê rêxistinbûn çêdibe. Konferansên jinê yên eyalet û herêman çêdibin. Cara yekemîn rewşeke seferbertiyê çêdibe. Di vê demê de jî, bi rêxistinkirina YAJK'ê re Serokatî amadekariya nasnamaya jinê ya giştî dike. Dixwaze xeta jinê, di nava gelên din de jî belav bike. Di vê demê de, kongreya jinê ya cîhanê, li Çînê tê lidarxistin. Serokatî komeke hevalên jin, li Ewropa amade dike û li ser navê YAJK'ê dişîne vê kongreyê. Bi vî awayî kongreyê dixe rojeva hevalên jin. Komeke hevalên jin jî, diçin Çînê û tevlî kongreya jinê dibin. Ji van hevalan yek jî hevala Roza Pazarcix e.

Weke me da diyarkirin, Serokatî gav bi gav bingeh û saxayên rêxistinbûna jinê vedike; di vê demê de saxaya dîplomasiya jinê jî tê pêş xistin. Bi taybetî bi jinên biyanî û jinên gelên cuda re, kar kirin û rêxistineke hevbeş derxistina holê, dibe perspektîfek.

Bi giştî di qada civakî de, rêxistina YAJK'ê bi coş û kelecanî çêdibe. Rûxmî ku zêde fêmkirin û nayê kûrkirin jî, redkirin tune. Nabêjin ew nabe, lewra têkoşîna me di nava gel de bandor û pêşketinek ji milê azadiyê ve pêş xistiye. Ji ber vê jî, her pengava ku ji aliyê tevgerê ve tê avêtin de jî, gel bi coş nêz dibe û hembêz dike. Feodalîzm li ser jinê, koletiyekê jî ferz dike. Bandora vê jî li ser gel heye. Lê rûxmî vê jî, xeta

azadiya jinê tê qebûlkirin. Gelê Rojava, Mexmûr û Ewropa hemû wisa nêz dibin. Dibe ku di nava malê de hê nakokî û kêmasî derkevin, lê bi giştî nêzikbûn wisa ye. Hinek kes dixwazin ku jin tevlî xebatan nebe, şaş nêzikî hevalên kadro jî dibin; lê giştî hembêzkirinek heye.

Mirov di vir de aqlê civakê dibîne. Serokatî her dibêje; “**aqlê civakê esnek e, bi forman qalip hatiye dayin”.** Di pêşengtiya şoreşa me de, di têkoşîna jinê de mirov vê dibîne. Van kesan baweriya xwe bi têkoşînê aniye û li pengavên ku tên avêtin xwedî derdikevin. Pêvajoya YAJK’ê bi giştî ji milê civakê ve wisa tê hembêzkirin. Her wiha ji milê têkoşînê ve serkeftineke mezin dest xist.

Tabî di van deman de, Serokatî pir mijûl dibe. Yek bi yek vesaziya hevalan çêdike, perspektîfan dide, mudaxale dike. Ew hemû di encama keda Serokatî de derdikevin. Ev yek di qada civakî de encam jî dide. Lê di saxaya gerîla de, heman encam dernakeve. Heya ku Serokatî mudaxale neke û bi ferasetên me re têkoşîn neke jî nabe, pişt re qebûlkirinek derdikeve holê. Heya wê demê li kêm cihan qebûlkirin çêdibe. Ew jî dide diyarkirin ku, me fikrên Serokatiyê çiqes fêm kirine û mêjiyê xwe ji vê re çiqes vekiriye. Di vir de jî, neketina paradîgmaya Serokatî, bi taybetî di mijara jinê de derdikeve holê. Ger mirov yek bi yek qadan bigire dest û binirxîne, mirov van ferasetên şaş jî bi awayekî vekirî dibîne.

Li qada civakî rûxmî ku me îro ew qes rêxistin ava kirine, nav guhertine, hê jî bandora YAJK’ê heye. Herî dawî KJB hatiye avakirin û rêxistina me pir xurt bûye, lê hinek cihan hê jî qesî YAJK’ê bi bandor nebûye. Îro ji cihê ku hevalên jin li Mexmûrê bi kar tînin re, hê jî dibêjin mala YAJK’ê. Yanî YAJK’ê di azadiya jinê de guhertin û nêrînên (algı) nû dan avakirin. Ji bo têkoşîna azadiya jinê, bingehek da avakirin. Serokatî li ser vê bingehê, bîrdoziya azadiya rizgariya jinê (kadın kurtuluş ideolajisi) dixe rojevê.

Me piranî ev sê qad vekirin. Lê li Bakur û Başur jî, cihên dîtir jî alaqayek li hemberî rêxistinbûna jinê heye.

### Du Xetên Ku Mohra Xwe Sala 96’an Dixin

Di dîroka têkoşîna me de her salek xwedî maneyekê ye. Lê hinek sal jî qedera têkoşîna me diyar dikin. Çawa ku hinek bûyer, an jî şehadet qedera têkoşînê diguherînin, hinek sal jî wisa ne. Sala 96’an jî xwedî taybetmendiyeke bi vî awayî ye. Di 96’an de, Serokatî dibêje xeta du Z’yan heye; xeta Zîlan û xeta Zekî. Her du xet jî, li ser têkoşîna tevgerê

bandora xwe dikin. Tabî bingeha xeta Zekî heye. Heya direve jî xeta xwe dide berdewam kirin. Dibe ku îro jî, ji aliyê nêzikbûn û ferasetê ve tayisînên vê xetê hebin. Lê di asta herî jor de, di 96'an de ew xet derdikeve holê.

Di wê demê de jî, perspektîfên Serokatî ji bo hemû qadan hene. Wê demê Şemo tê biryargeha navendî, li welat êdî ew berpirsiyar e. Rêveberiyek heye, lê di asta yekemîn de ew fermandar û berpirsiyar e. Şêwaza ku di şexsê Şemo de derdikeve, li ser hevalên jin jî bandor dike. Ew ji bo me pir girîng e. Heya wê demê, weke me gotibû biryargeha navendî ya jinê jî hatibû avakirin. Di wê demê de, Serokatî hin hevalên jin ji bo vê peywirdar dike. Hevala Zeynep (Gurbetelî Ersoz), Şervîn Derîk û Newal Serhed dişîne.

Di vesaziya (düzenleme) Newal de, Serokatî însiyatîfê ji biryargeha navendî ya jinê re dihêle, dibêje "biçe biryargehê bila heval te peywirdar bikin". Çima ez vê dibêjim? Lewra dema ku lêpirsîn dest pê dike, Serokatî dibêje "min tu bi vî awayî peywirdar nekiribûyî. Tu çawa ketê nava van tiştan?" Wê jî gotibû "hevala Şervîn (şehîd Şervîn) ez peywirdar kirim". Yanî Serokatî Şervînê di biryargehê de peywirdar nake, lewra ne şexsiyeteke ku bibe berpirsiyarê hemû rêxistina YAJK'ê ye. Ji ber ku valatî heye; gelek heval li eyaletan belav bûne û hin heval jî çûne saxaya Serokatî û ew jî ji saxaya Serokatî hatiye, wê peywirdar dikin. Lewra wê demê di asta fermandariya taximê de ye, lê ji pêşketinê re vekiriye, zîrek e.

Wê demê hevala Zeynep û şehîd Şervîn berpirsiyar in, lê ji ber ku Newal jî wisa aktîf e, dikeve nava her karî. Şemo jî hevalên din, ditepisîne; lewra ew xwestek di Newal de dibîne. Jixwe tu kes sekn û armanca Şemo fêm nake. Kesekî qurnaz e. Her kes li hemberî wî bi bertek e, lê kes nikare bi awayekî giştî fêm bike. Hevalê Fuat jî digot, "min fêm nekiriye". Zilamekî wisa qurnaz e, dixwaze hakîmiyeta xwe li ser hemû biryargehê bike. Serokatî digot, "armanca wî ketina cihê min bû, hemû cih bi dest xwe xistin, tenê saxaya min ma".

Di 96'an de, biryargeh dev ji karê xwe berdide, lê bi hev re mijûl dibin. Nakokiyên di nava xwe re mijûl dibin. Dev ji amadekariya şer û bi eyaletan re mijûl bûnê berdidin. Heta Şemo li gorî xwe şêwazeke şer dide meşandin. Dibêje "pêwîst e, em bi sûîkastan tenê şer bikin. Di cewherê xwe de jî bi dijmin re ketina nava hevkirinekê heye. Di tarzê jiyanê de jî, bi taybetî di têkiliyên jin û mêr de, şêwazeke lûmpen û

laçqa, civakbûneke berovajî dixwaze pêş bixe. Navend jî Zap e, lewra di wê demê de biryargeh jî li Zapê ye. Li eyaletên Bakur jî, hinekan de atmosfera xwe avakiriye. Bi vê yekê dixwaze şêwaza xwe li ser her cihê hakîm bike.

Ew kiryarên ku Şemo dike, Serokatî kîte bi kîte dişopîne. Bi perspektîfên ku dide, dixwaze pêşiya texrîbatên Şemo bigire. Di wê şêwaza ku li biryargehê û derdora biryargehê tê kirin de, kiryarên pir şaş pêş dikevin. Di bin navê terbiyekirinê de, hevalan birçî dihêlin, bi sedan hevalan li dolekê kom dikin. Van tiştan dikin pîvan û li ser hevalan ferz dikin. Yên ku li hemberî van kiryaran derdikevin, di nava hevalan de teşîr dikin, diavêjin zindanê. Bi taybetî gelek hevalên jin ku li dijberî Şemo radibin, tên teşîr kirin, tên biçûk xistin. Bê îrade dike.

Mesela dema ku ji Dêrsîmê tê Botanê; heval pê re dikevin îçtimayê. Hevalên jin jî hene, hemû hevalên jin yek bi yek maç dike. Lê hin hevalên jin naxwazin wî maç bikin, piştî wê heya ku tê biryargehê, hevalên jin yên Botanê teşîr dike. Dibêje "kole ne, nayên pîvanên azadiyê, nizanin xatir bixwazin".

Şemo hinekan dinepixîne û derdixe pêş, hinekan jî ditepisîne. Ew şêwaza parçekirinê ya herî mezin e. Di van mijaran de xwedî huner bû. Di biryargehê de jî wisa dike; Newalê derdixe pêş, lê hevala Zeynep û Şerwîn bê bandor dike. Wê demê em li saxaya Serokatî bûn. Me dît ku hat û pir kêfxweş bûye. Got, "Şemo xwestiye hevalên jin yên Botanê maç bike, lê hevalên jin qebûl nekirine, ji ber vê Şemo ew teşîr kirine". Hevalên jin ew di nameya xwe de nivîsandine. Serokatî got, "ez wan jinan pîroz dikim, lêgerînên azadiyê di wan jinan de hene". Silav ji wan hevalên jin re rêkir.

Şêwazê teşîrkirinê yê Şemo, pir li pêş bû. Ferhat jî çêdikir, lê weke Şemo ne hosta bû. Nedikarî rêxistina jin parçe bike û bike bin serweriya xwe. Şemo ew dikir, li hemberî xeta jinê ya Serokatî, xeteke cuda pêş dixist. Biryargeha navendî jî tam cihê wê bû. Di şexsê rêveberiya YAJK'ê ya wê demê, bi taybetî di şexsê Newal de gihêştibû armanca xwe jî. Hevalên ku li hemberî wî derdiketin, dabûn aliyekî; lê yên ku ji zanebûna cins dûr in derdixistin pêş.

Serokatî di şexsê Newal de, jina bi hirs û bi qarekterê mêr re dibe yek dahûrand. Weke nexweşiya deshilatdariyê ya jin û weke hevkarê mêr pênase kir. Pênaseya hevkariya mêr, ji bo jinê cara ewil di şexsê Newal de hat pênase kirin. Lewra şêwaz û nêzikatiyên ku derdikevin

holê, vê nîşan didin. Hinek tiştan jî bizanebûn dike. Tabî peyva hevkariyê, pişt re di gelek cihan de di cihê xwe de nehat bikaranîn û texrîbat çêkirin. Lê hevkariya Newal, li ser berjewendî û bingeheke hat kirin. Ji ber ku di vir de berjewendiya xwe dibîne, vî karî dike. An na bi awayekî xwezayî neketiye nava van karan. Bi plan û tercîh e.

Serokatî şêwaza rêveberiya vê demê jî, weke koalîsyona deshilatdariya mêr nirxand. Vê şêwazê li ser hemû eyaletê, texrîbat jî çêkirin. Rêveberiya jinê û ya giştî jî di vê demê de, Şemo re hinek bingeh jî ava dikin. Mesela hinek di wê demê de Zapê ne, hinek li saxayên din in. Ger têkoşînek li hemberî vî şêwazî bihata kirin, Şemo şexsiyeteke ew qes xurt jî nîne. Wisa bi zanist û deha nîne. Wê demê de çapemeniya dijmin, pir pesna Şemo didan, lê armanca wan Şemo derxistina pêş bû. Serokatî jî ew didît, lê Şemo ew li ser avahiya hevalan ji xwe re dikir tasarûf.

Nêzikatiyên dijmin yên bi vî rengî hê jî hene. Keseyetan derdixe pêş, dinepixîne. Dixwaze bi vê nêzikbûnê partiyê parçe bike, pêşiya Serokatî bigire. Serokatî ew şêwaz didît û dixwest pêşiya wê bigire, lê di wê dêmê de tenê ma. Di nava avahiya hevalan de, hinek bêdeng man, hinek di nav de cihê xwe girtin û propagandaya Şemo kirin. Jixwe piştî ku lêpirsîn hat destpêkirin, hemû hevalan rexnedayina xwe da.

Di nêzikatiyên Şemo de, armanca belavkirina YAJK'ê jî heye. Di vê demê de dibêje "jin bar e", ew têza xwe her dixe rojevê. Di nava hevalên xort de, yên ku vê nêzikbûnê temam dikin jî zêde ne. Bi awayekî vekirî û objektîf perspektîfên jinê yên Serokatî vala dihatin derxistin. Di rêveberî û avahiya jinê de jî, zanebûn û tehlîlkirineke xurt tune bû. An serî ditewand, an jî bi awayekî çort red dikir. Serokatî bi berfirehî ew pratîk nirxand.

Di vê demê de, biharê li Zapê di her du biryargehan de lihevkirinek çêbûye û şêwaza xwe didomînin. Lê dijmin jî vê pêvajoyê baş dixwîne, ji ber vê di 6'ê gulanê 1996'an de êrîş li ser Serokatî hat çêkirin. Bombeyeke mezin ku bi teqemenî dagirtiye li Şamê, li ber dibistanê tê teqandin. Têliya hêzên navnetewî jî têde heye. Êdî êrîşek berfireh li ser Serokatî tê lidarxistin. Jixwe pratîka welat li holê ye, ger Serokatî jî îmha bibe, dê dijmin bigêhêje armanca xwe. Jixwe şêwaza Şemo li her derê hakîm dibe, nêrînên Serokatî nakevin pratîkê; ji ber vê jî ew qomplo çêdibe, êrîşeke wisa li ser saxayê pêk tê.

Serokatî wê demê ne li dibistanê bû, dema ku teqîn çêbû ji hevalên welat re diaxife; dema ku dengê teqînê dibîze, Serokatî hîs dike ku teqîn li dibistanê çêbûye. Hema hevalên gel xwe dişîne dibistanê ku bûyerê fêm bike. Ji ber ku telefon vekirî bû, ew gotin derbasî kaydên telefon jî bibûn. Serokatî bi êrîşan hesiyabû, lewra dixwastin êdî bi giştî Serokatî ji holê rakin. Bi awayekî tesadûfî Serokatî di wê kêliyê de ne li dibistanê bû, ji ber ku li dibistanê jî konferans hebû, dijmin texmîn dike ku Serokatî li wir e. Dibe ku agahî jî ji dijmin re çûbin.

Konferansa giştî ya çaremîn a partiyê bû. Her du dibistan jî kom bibûn, hemû kadroyên pêşeng li wir bûn, berpirsiyarên eyaletan li wir bûn. Di nava konferansê de jî, êdî mijara jinê dihat nîqaş kirin; ji ber ku dem kin bû, êdî em êvaran jî rûdiniştin. Jixwe teqîn êvar çêbû. Serokatî carina dihat konferansê, perspektîf didan û diçû. Tê fêmkirin ku Serokatî bi êrîşan jî hesiyabû. Ji bo wê dixwest konferansê lêztir bimeşîne. Di dahûrandinên xwe de her behsa komplo û êrîşan jî dikir, lê me fêm nedikir.

Dema ku me navber da konferansê teqîn çêbû, teqîneke ew qes mezin bû ku sîwana dibistanê hat xwarê, şibake hemû şikestin. Bi şaşitî bombe danîbûn pêşiya çewlika li gel dibistanê, lewra dişibîn hev. Ger danîbana pêşiya dibistanê gelek heval dê şehîd biketana. Rûxmî ku şaş danîbûn jî, dibistanê zêde texrîbat dîtin. Ji milê madî ve texrîbat çêbû. Serokatî hat û hema got, hedef ez bûm.

Piştî vê dewleta Suriye jî zext li ser Serokatî çêkirin, da ku Serokatî ji Suriyeyê derkeve. Ji ber vê Serokatî her di nava hewldanan de bû; digot em çawa şer bidin meşandin, çawa mudaxaleyî pratîka welêt bikin. Jixwe li rûxmî zextên dewletê, Serokatî du salan li Suriyeyê ma. Piştî ku bombe hat teqandin jî, Serokatî dîsa perspektîfa xurtkirina şer da. Lê hê jî li welat biryargeha navendî di ferqa van êrîşan de nîne.

Tam di vê demê de, li Dêrsîmê hevala Zîlan pêvajoyê dixwîne, textîk û şêwazên ku hatine xitimîn dibîne, di xeta azadiya jinê de berovajî kirinên hatine kirin dibîne. Lewra ew mijar hemû di nameya xwe de nivîsandine. Herî zêde jî êrîşên li ser Serokatî dibîne, li bersiva pirsa ‘em ê ji êrîşên li ser Serokatî re çawa bibin bersiv’ digere. Dibêje ‘rewşa heyî, mirov bi çi şêwazê dikare biguherîne? Çalakiya fedaî, weke şêwaz û textîka nû digire dest û pênase dike. jixwe wisa pêk tîne jî. Li ser vê esasê biryara çalakiyê dide. Dibêje “ez tênê dikarim bi vî awayî bibim bersiv”. Di dawiyê de pêşniyara xwe dike û dikeve nava amadekariyan.

Hevala Zîlan, ne hevaleke pir kevn e jî. Gerîlaya salekê ye. Berê di nava xwendekar û ciwanan de kar kiriye, lê ev saleke tevlî nava refên gerîla bûye. Êrîşên li ser tevgerê, bi pêşdîtineke xurt tehlîl dike û dixwaze xitimîna di textîk de heye rake û pêşiya pêvajoyê veke. Li ser vê lêhûrbûn û nêrînê, xwe amade dike. Nameya hevala Zîlan hemû hevalan xwendiye; ji bo Serokatî, ji bo gel, ji bo jinê nêrînên xwe tîne ser ziman. Bi rastî jî pêvajoyê digire dest û ji bo pêşerojê dibe bersiv.

Ev çalakiya xwe kuştinê nîne, çalakiya azadiyê ye. Girêdana wê ya têkoşîn û Serokatî di asteke ew qes bilind de ye ku bi vê çalakiyê bersiv dide. Di nameyê xwe de van mijaran hemûyan dide diyarkirin, dibêje "**xwezî ji canê min zêdetir tiştekî min hebûya ku min feda bikira**." Bi vê çalakiyê hezkirina xwe ya têkoşînê, ji milê fikir, hest û zêhniyetê ve, di asta eşq û azweriyê (tutku) de dide diyarkirin. Çalakiya hevala Zîlan tê wê maneyê. Serokatî pişt re wisa dinirxîne. Di sihê (30) hazîrana 1996'an de li Dêrsîmê çalakiya xwe pêk tîne. Vê çalakiyê di nava partiyê de hêjandinek da çêkirin; hem di xeta textîk de guhertin da çêkirin, hem di pêvajoya xitimiye de guhertinek da çêkirin, hem ji êrîşên li ser Serokatî re bû bersiv. Di dema xwe de guhertinên mezin, di nava partiyê de da çêkirin, ji ber vê ew çalakî xwediyê wateyeke mezin e.

Çalakiya wê di 96'an de derket holê, lê mohra xwe li hemû pêvajoyan xist. Serokatî jî çalakiya hevala Zîlan bi berfirehî girt dest û nirxand. Li ser vê esasê Serokatî dahûrandina jinê kûr kir. Ew çalakî hem ji dijmin re, hem jî ji partiyê re bû bersiv.

Di 96'an de komeke heval ji saxaya Serokatî tên û li Zapê konferansa jin ya yekemîn çêdibe. Serokatî komeke heval rê dike û perspektîfa biryargehê jî dide. Ew heval tên û ji hevalên jin yên li welat re konferansê li dar dixin. Di konferansê de pratîkên biryargehên navendî yên Zapê jî tên nirxandin. Lê bi giştî pratîka Şemo û Newal dernakeve holê. Piştî ku ew derbasî saxaya Serokatî dibin, tam tên dahûrandin. Lê bi vê konferansê di biryargeha jinê de guhertin tê çêkirin, hêz ji biryargehê re tê şandin, li ser vê esasê di şêwazê biryargehê de guhertin çêdibin.

Di vê demê li Dêrsîmê çalakiya hevala Zîlan hebû. Li Erzerom û Xerzanê windahiyên mezin hene. Di eyaletên hundir de, rêxistinbûna YAJK'ê pir bi pêş nakeve. Dîsa Serokatî, ji bo saxaya Serhedê dibêje, "bila hevalên jin li wir nemînin. Lewra jinê qebûl nakin. Karên YAJK'ê li wir disekinin. Serokatî li hemberî eyaletê tawireke wisa datîne û tewdîr eke bi vî rengî digire.

Hevalên ku di 96’an de şehîd dikevin hene. Hevala Newroz Artêş, li Garisa şehîd dikeve. fermandara bolikê ye. Hevala Doza, bi xwe ji Mêrdînê ye, li Mawa şehîd dikeve. Hevala Bêrîvan Gap, wê demê fermandara taximê ye, li Gabarê şehîd dikeve. Hevala Rewşan (Leyla Kaplan), piştî çalakiya hevala Zîlan, di 25’ê cotmehê de, li Edenê çalakiya fedaî dike. Hevaleke ciwan e û xwe weke şopdara hevala Zîlan pênase dike. Serokatî çalakiya hevala Rewşen jî dadihûrîne û wateyeke girîng didê. Hem li cihekî weke Edene ku li ser gelê me zilm tê kirin, çalakiya bersiv dayina vê ye; hem jî li hemberî êrîşên li ser Serokatî û têkoşînê bersiv e. Hevala Bermal (Güler Otaç) heye, ew jî di 29’ê cotmehê de, li Sêwazê çalakiya fedaî dike. Di 96’an de hevala Zîlan, hevala Bermal û hevala Rewşen li herêmên cuda çalakiya fedaî li dar dixin, lê hevala Bermal û Rewşen xwe weke şopdarên hevala Zîlan pênase dikin. Li hemberî pêvajoyê û êrîşan bi vî rengî bersiv didin.

Hevala Dîcle (Yıldız Alagöz) heye, li saxaya Serokatî perwerde dibîne û derbasî Amedê dibe. Li wir şehîd dikeve. Hevala Dilovan heye, wê demê Qoçgirî girêdayî eyaleta Dêrsîmê ye. 33 heval li Qoçgiriyê bi komî tên şehîd xistin. Hevala Dilovan jî di nava van hevalan de ye. Hem hevaleke rêvebir e, hem jî hevaleke jin e.

Di van deman de, li gelek cihan hêjmara şehîdên me jî zêde bûye. Em nikarin hemûyan yek bi yek bigirin dest, lê em hewl didin ku hin hevalên ku mohra xwe pêvajoyê dane vekin.

**Penç Rêgezên YAJK’ê**

Di vê demê de, di biryargeha navendî ya jinê de, hin pîvan tên danîn, lê Serokatî êdî pêwîst dibîne ku rêgezên esasî dayne holê. Me girtibû dest, nêzikbûnên mêr yên jin girtina tekela xwe heye; bandorên vê êdî li eyaletan jî çêdibin. Bi taybetî li Zagros, Amed, Botan û eyaletên hundir bandora van ferasetan çêdibe û şemitîna pîvanan çêdibe. Serokatî dibîne ku ger pêşî lê neyê girtin, pîvan neyên danîn, dê her kes li gorî xwe pênase û nêzikbûneke diyar bike. Jixwe pratîka Zapê vê bi awayekî berbiçav derdixe holê. Lê Serokatî rêxistinbûna YAJK’ê, zêdetir mayinde û mezin digire dest. Ji bo vê jî rêgezan datîne holê. Pênc rêgezan ji bo YAJK’ê datîne holê.

Di vê demê de, di perwerdeyan de jî Serokatî dahûrandinên pênc rêgezan dike. Dixwaze hevalan li ser van perwerde bike û fikrên xwe li

qadan belav bike. Bi van rêgezan dixwaze xeta YAJK'ê diyar bike. Jixwe YAJK, bi vê yekê dikeve xeta xwe.

Rêgeza yekemîn; YAJK, li hemberî hemû paşverûtiyan û ketinan, bi taybetî li hemberî paşverûtiyên zilam yên bi xetere amûreke tolhildanê ye. Yanî ji van taybetmendî û nêzikbûnan tol girtin heye. Rêxistin li ser vê esasê pêş xistin, weke rêgezeke YAJK'ê tê diyar kirin.

Rêgeza duyemîn; YAJK, li hemberî hemû qirêjiyan û nexweşikbûnan, li hemberî hemû nirx ketinan; amûra xweşikirin û xweşikbûyinê ye, amûra bi wate kirinê ye. Mirov weke rêgeza xweşikbûyinê jî dikare pênase bike.

Rêgeza seyemîn; YAJK, amûra welatparêzî, girêdana bi axê û gel e. Li ser vê esasê amûra têkoşîn û şer e.

Rêgeza çaremîn; YAJK, amûreke hezkirinê ku xulukar û afirîner e. Li ser esasê civakbûyinê hunera hezkirinê ye. Li ser hêza civakbûyinê pîvana hezkirinê ye. Yanî pîvana hezkirinê û hedefên wê datîne holê. Li ser esasê afirinerî û pêşxistina civakê datîne holê.

Rêgeza pêncemîn; YAJK, di rastiya şer de, hêza ku qet dev jê neyê berdan e û qeweta partiyê ye. Yanî YAJK, hêza ku mirov dev jê berde nîne. Serokatî li YAJK'ê bi textîk û demî nanêre. Dibêje jê veneger e.

Li ser van rêgezan, ji nû ve avakirin û xurtkirina YAJK'ê dide destpêkirin. Hem ew pratîka tasfiyê mahkûm dike û tiştên ku bên kirin jî di asta rêgezan de datîne holê. Di warê xweşikbûn, welatparêzî, hezkirinê de rêgezan datîne holê û bi vî awayî Serokatî hêza têkoşînê jî datîne holê. Bi vî awayî pêvajoyên 95 û 96'an jî dadihûrîne û li hemberî wê rêgezan datîne û dest bi pêvajoya 97'an dike.

**Pêvajoya 97'an Û Asta Rêxistinbûna YAJK'ê**

Pêvajoya 97'an, rêxistinê weke sala fînalê girt dest. Serokatî ew qes mudaxale kir; rêveberiya biryargeha jinê û ya giştî, rêveberiya gelek herêman hate nûkirin. Serokatî mudaxaleyek wisa li welat kir. Di 97'an de civîna giştî navendê hat kirin û pratîkên ku derketine hatin nirxandin. Di bihara 97'an de, di gulanê de dijmin operasyonek da destpêkirin. Navenda êrîşan Zap bû, lewra navê Zapê pir derketibû pêş. Hedefa dijmin îşqalkirina Zapê bû. Lewra weke qadeke rizgarkirî bû. Piştî demekê dijmin paşve vekişiya, lê bi PDK'ê re demekê berdewam kir. Jixwe gelek herêm ketin destê gerîla. Cihên ku di destê PDK de bûn, ketin destê me.

Di wê demê de, hevalan Zap berda û Serokatî ew rexne kir. Wê demê hevalê Cuma li ser biryargehê bû. Lê yên derdorê, di karê pratîk de pir bi însiyatîf bûn. Jixwe hevalê Cuma ji qadê derdixin. Jixwe jî li qadê pir nikarin bisekinin. Merwanê Tirk bû, Dursun Elî bû, Ekrem bû, Korsan Suat bû. Ev rêveberiyêkê ava dikin, jixwe vê rêveberiyê pişt re bi xwe re karasatek (facia-felaket) anî. Yanî weke firsendekê ji xwe re dîtin. Di bin navê ewlehî û nexweşiyê de hevalê Cuma derxistin û şêwazên xwe pêk anîn.

Serokatî di vir de, hêrî zêde qomîteya navendî û hevalê Cuma rexne kir. Got “we çawa qad terk kir û firsand da tiştekî wisa”. Pişt re bersiv hate dayin, lê di du rojên ewil de dijmin ket biryargeha navendî. Xwe re kirin propagandayekê. Pişt re bi mudaxaleya Serokatî, êrîş li ser dijmin hatin kirin û dijmin li ber xwe neda. Ew kobra wê demê ketin û 5-6 heb fermandarên wan hatin kuştin. Dijmin deh panzdeh rojan ma û pişt re xwe vekişand. Lê şerê me bi PDK re heya payizê berdewam kir. Di vî şerî de jî gelek heval şehîd ketin. Lê şerekî ku bi berxwedana hevalan ser ketibû. Hêzeke me ya pir xurt hebû. PDK wê demê hinek cih girtibûn, lê heya payizê hem cihên ku PDK girtine, hem jî gelek cihên di destê PDK’ê de hevalan hemû girtin. Heya Tepê Aslan çûn, ew der li Garê ye, lê pişta wî li deşta Mûsûlê ye.

Dijmin dixwest me ji van qadan derxe û van qadan bixe destê hêzên Başur. Lê me zêdetir qad girtin. Mesela li Garê hevalên me pir kêm bûn, lê me gelek cihên din jî girtin. Weke şerê Qendîlê bû. Me cihê xwe firehtir kir û mewziyên xwe xurt kirin. Lê herî dawî PDK li ber xwe neda û agirbest xwest. Lewra Serokatî perspektîfa girtina bajaran dida. Dema ku hêza gerîla dîtin û dîtin rewş ji bo wan xetere dibe, agirbest îlan kirin. Rêxistina me jî erênî bersiv da. Bi vî awayî armancên dewleta Tirk û kompoloya navnetewî jî di şerê gerîla de vala derket. Lê pratîkeke pir serkeftî jî nebû, lewra armanca me cuda bû. Me weke sala fînalê dabû diyarkirin, divê me li Bakur pengavên mezin biavêtina.

Di vê demê de, ji bo YAJK’ê perspektîfên Serokatî yên berfireh hene. Ji van perspektîfan yek, projeya guhertina mêr e. Yek jî têoriya qutbûnê ye. Dîsa li hemberî deshilatdariya mêr û paşverûtiyên jinê, Serokatî têkoşîna bîrdozî weke peywireke datîne pêşiya tevgera jin. Bi taybetî van piştî çalakiya hevala Zîlan pênase dike û hevala Zîlan jî weke xetekê digire dest. Serokatî dibêje ew gav Zîlanê bi min da avêtin. Ji

ber vê jî dibêje, “ez şervan im, Zîlan jî fermandara min e.” Dibêje tiştê hişt ku ez di bîrdoziya jinê de kûr bibim, çalakî û sekna hevala Zîlan e”.

Di 97’an de şehadetên hevalan hene. Bi taybetî di şêrê Başur de gelek heval şehîd dikevin. Hevala Zeynep şehîd dikeve, hevala Meryem şehîd dikeve, hevala Canda Tirk û Azîme şehîd dikevin. Ew hevalên rêvebir in, li qadê ne. Hevala Zeynep, li Zapê şehîd dikeve. Hevala Meryem li Haftanînê şehîd dikeve. Hevala Canda li Zapê, Kurê Jehro şehîd dikeve. Hevala Azîme li Garê şehîd dikeve. Ev heval rêvebir bûn û hemû ji saxaya Serokatî hatibûn. Ji ber ku pêşengên jin bûn, ji bo tevgera jinê windahî û valahiyên mezin jî çêbûn. Her hevalekê di cihê xwe de valahiyek dihilişt. Li ser hemû avahiya hevalan bandora wan çêdibû. Dihêlişt ku li hemberî dijmin jî helwest tund bibin.

Di 97’an de ferasetên ku li biryargeha YAJK’ê derdikevin hene. Jixwe biryargeh dikeve sala sisêyan. Yek ji van ferasetan, piştî ku pratîka Newal derdikeve holê, têkiliyên xwe bi giştî re kêm kirin û di hundirê xwe de tengav bûyin çêdibe. Ji ber ku Newal dikeve bin bandora mêr, li ser navê neketina bin bandora mêr hevalên jin, di mijarên ku pêwîst dikin ku bi hevalên xort re hevpar bikin de jî, qut disekinin. Di hundirê xwe de teng mayinekê jiyan dikin. Di bin vê mantiqê de êdî kar nayê kirin, misyona ku dikeve ser pêk nayne. Derveyî şer, textîk û kar dimînin. Ew jî ji aliyê dijber ve xwe tunekirin e. Dîsa di vê demê de, di rêveberiya YAJK’ê de rastiya şer nasnekirin û li gorî şer xwe bi rêxistin nekirin heye.

Di cihên din de jî, di bin navê xwe kirina navend de, xwe bi mêr re qiyas kirin derdikeve holê. Di asta têkoşînê de jî qiyas kirin çêdibe. Têkoşîn û zanista cins, di vê demê de pir dikeve rojevê. Ew ji jiyankirinê zêdetir, di gotinê de dimîne. Li hemû herêman, weke hawa û hewldaneke jinê têkoşîna cins derdikeve holê. Ew serkeftinek e. Jin êdî wisa ne bêdeng e, ew sînor tê şikênandin. Di 97’an de, li hemû biryargehan li hemberî nêzikatiyên şaş, di pêşengtiya YAJK’ê de, hewldanek derdikeve holê. Di vê mijarê de, pir giliya rêvebir û pêşengên YAJK’ê li cem Serokatî tên kirin. Dibêjin “nayên kar, nayên pratîkê, pir nakokiyan derdixin, ev li pêşiya şer dibe astengî”. Yanî hewldanên hevalên jin, ji aliyê hevalên xort ve weke zorlama tê nirxandin û şikayeta wê ji Serokatî re tê kirin.

Serokatî jî vê şikayetê digire dest, dadihûrîne û ji hemû avahiya hevalan re dişîne. Yanî piştgiriyê dide têkoşîna jinê. Yanî asteke mîsoger

hatibû girtin, di vê têkoşînê de niha texrîbat (aşınma) çêbûne. Lê wê demê Serokatî bi xwe li ser disekinî û pê re mijûl dibû. Ji bo vî şerî her amadekarî jî dikir. Yanî di vê demê de her çiqes di biryargeha navendî de, nêzikatiyek şaş hebe jî, di avahiya hevalan de asteke zanebûnê derdikeve holê. Tabî em li gorî wê demê digirin dest.

Em nabêjin serkeftinên pir mezin derketin, lewra gelek cihan tasfiye derket. Lê giştî hawayek çêbû. Dîsa di şexsê rêveberiya jinê de, avahiya xwe jor de mêzekirin, biçûk dîtin, taybetmendiyên çînî derdikevin. Di vê demê de, pênaseya hevkariya mêr jî, pir di cih de nayê karanîn. Ew yek di nava avahiya jinê de bertekekê derdixe holê. Dema ku Serokatî ew pênase kir, bingeha wê, mantiqa wê danî holê. Lê di vê demê de, bêyî ku bingeha wê were danîn, ew pênase tê karanîn. Hevkartî bi çîn û ferasetan girtina dest zêdetir, bi awayekî takekesî tê karanîn. Ew bi xwe re xetere û texrîbatan tîne.

Di vê demê de, di şexsê rêveberiya mêr de jî, parçekirina jinê pêş dikeve. Ew hevalên jin ku li hemberî nêzikatiyên şaş yên rêveberiya jin bûne xwedî bertek, xistina bin tekela xwe heye. Ew nêzikatiyên jin yên şaş, bi xwe re weke firsendekê dibînin. Bi taybetî ew ekîba ku li Zapê çêbûye, me jor navê wan jî da, vê yekê dike.  Dibêjin rêveberiya jinê şer nake, kar nake, hemû bûrjûwûya biçûk in. Bi rastî jî di şexsê rêveberiya jinê de, dixwazin hawayê ku Serokatî afirandiye bişkînin. Lewra yekitiya jinê çêbûye û hevalên xort ji vê yekitiyê ditirsin. Bi van şewazan pêşiya van digirin. Şaşitiyên ku hene, cihê ku bi rêbazên rêxistinî holê rake, cihê wê YAJK’ê bê bandor dike. Henekên xwe pê dikin, cidî nagirin. Hevalên navenda jin, li gelek cihan diqewitînin. Ew di cewherê xwe de, nasnekirina yekitiya jina rêxistinkirî ye. Teyisîna vê pratîkê li qadan zêdetir kûr dibe. Tabî Serokatî jî her mudaxale dike û perspektîfên rast digihîne qadan.

Di vê demê de, di hemû eyaletan de kêm zêde rêxistinbûna YAJK’ê êdî pêş dikeve. Di eyaleta Zagrosê de, piştî ew pratîka redkirinê, biryargeha YAJK’ê hate avakirin, hevalên nû çûn vê eyaletê. Di rêveberiya giştî de jî guhertin hat çêkirin. Di vê demê hevalên jin zêde ne, heya Çemço dikeve nava vê eyaletê. Giştî heval zêdene, lê hevalên jin jî zêdene. Li gorî nêrîna rêveberiyê, hevalên weke pirsgirêk dibînin û nikarin şer bikin, li Çemço kom dikin. Di nava wan hevalan de jî, taxima hevalên jin jî cuda dikin. Van hevalan di bin navê rehabîlîtasyonê de, perwerde dikin. Jixwe navê taximê jî datînin, taximê rehabîlîte. Bê çek,

li wan deran di karê pez û hwd de didin xebitandin. Dibêjin ew hevalên jin nikarin bikin, bar in. Di bin vî navî de, mafê wan yê rêxistinî, mafê wan yê şer û axaftinê dest digirin.

Ew rêbaz, tam li dijberî şêwazê Serokatî yê perwerdekirinê ye. Şêwaz û rêbazên Serokatî diyar in, lê li vir tam dijberî vê şêwazê nêz dibin. Wan ji hevalan qut dikin û derveyî hevalan dihêlin. Piştî operasyonan destpêkir jî, gelek ji van hevalan jî bêçek şehîd ketin. Hinek ji van hevalan jî, hê di nava têkoşînê de ne, lê bandora wê pêvajoyê li ser hevalan heye. Tabî ew şêwaz ji aliyê Serokatî ve hate mahkûm kirin. Ew şêwaz di şexsê rêveberiya YAJK'ê ya eyaletê de hate dahûrandin. Jixwe vê şêwazê hevalên jin pêktînin, lê erêkirina hevalên xort jî heye. Tekmîla vê weke taximekî perwerdê didin Serokatî. Bi vî rengî weke Serokatî jî erêkiriye, didin nîşandan. Lê di pêkanînê de dijberî şêwazê Serokatî ye.

Vê yekê di şêwazê YAJK'ê de jî nirxandinek xurt da çêkirin. Ew xwe ji zêhniyeta kevneşop ne qutkirin e. Bi şêwazên wê zihniyetê nêzikbûna hevalan e. Dema konferans tê kirin jî, ew şêwaz ji aliyê Serokatî ve tê mahkûm kirin.

Wê demê, Peyman li Zagrosê ye. Hevala Fatma ye, Pelşîn e, Dîcle ye. Yanî rêveberiyeke wisa xurt li Zagrosê ye. Hevala Fatma, wê demê tenê ne rêveberiya jin e, rêveberiya giştî ye. Heval dibêjin armanca me ne ew bû, lê di encamê de pratîkek wisa derket. Kiryarên derveyî nêzikbûnên partiyê derdikevin holê.

Di rêvebertiya jin de, ji rastiya şer dûrbûyin, ji avahiya hevalan jor de mêzekirin û ji hevalan qut bûyin derdikeve holê. Şêwaz û kadroyên li gorî xwe derdixin holê. Li ser vê şêwazê jî li vir gelek heval şehîd dikevin. Rûxmî vê jî, Serokatî têkoşîna cins li vê eyaletê zindî hişt. Her kadroyên nû şandin, perspektîf didan û rêxistinbûna YAJK'ê her zindî hişt. Li vir hevalên jin pir zû pes dikin, hevalên xort jî dibêjin ger ew pratîk derkeve, rêxistinbûna jinê jî şaş e. Encam nagire. Heya ku ew zêhniyet naguhere, azadî pêş nakeve. Li gorî hin tasfiye û nêzikbûnên şaş yên derdikevin holê, dibêjin ew kar nabe, ew têkoşîn nabe. Di nêrîna wan de û zihniyeta wan de jî ew heye, ji ber vê hema dibêjin nabe. Niha jî ew nêzikbûn, di gelek qadên me de heye.

Mesela dibêjin bila hevalên jin ji qada Amedê derkevin, bi wan re nabe. Berdevkên me dibêjin. Cihê ku pirsgirêkan çareser bike, wisa dibêje. Bi rastî jî di zêhniyet de xwe îkna nekiriye. Yanî ew nêzikbûn

şêwaz, hê jî di gelek cihan de heye. Hema dibêjin nabe. Ew nêzikbûn parçe dike, ne nêzikbûneke azadiyê ye, di têkoşîna cins de israr nekirin e. Ji pêvajoya rêxistinbûna YAJK'ê heya niha em bigirin dest; ger tevgerê li gorî van nêzikbûn û dayatmayan bigirta dest, niha tevgera me deh caran xilas bibû. Lê bi rûxmî nêzikatî û fêrasetên me Serokatî ew rêxistinbûn pêş xist.

Li Zagrosê jî, di civîna dawiya salê de pênaseyeke wisa di derhepê jin de tê kirin ku nêzikatiyeke wisa nehatiye dîtin. Ew zêhniyetek e. Dibêjin YAJK bûye dîktator, di YAJK'ê de faşîzm pêş ketiye, ji ber vê jî em YAJK'ê ji YAJK xilas bikin. Ew dibe malî hemû avahiya hevalan. Lê Serokatî vê qebûl nake, dibêje di qarektêrê jinê de faşîzm tune. Di qarekterê jin de dîktatortî tune. Got ew her du tişt jî mêr pêş xistine. Got we di şer de ser nexist, niha jî hûn kêmasiyên xwe diavêjin hûstiyê jinê. Got, hûn dibêjin bila YAJK di bin hakimiyeta me de be. Bi giştî di hemû herêman de nêzikatiyeke wisa hebû. Kêmasî û şaşitiyên hevalên jin jî, ji vê re bingehek çêdikir. Di nêzikatiyên hevalên jin de jî şaşitî derketin. Lê Serokatî ew nêzikbûn red kir û perspektîfa vê berfireh da.

Di wê demê de, Şemo ji biryargehê derketibû û derbasî Botanê bibû. Di pratîka Botanê de jî, tiştên wisa derdikevin holê. Bandora Şemo jî çêdibe. Lê Serokatî hema mudaxale dike. Heya wê demê li Botanê radestbûn tune bû. Lê wê demê taximek heval, mangayek ya hevalên jin, mangayek jî ya hevalên xort radest dibin. Dijmin tê dora wan digire, cihê ku têkoşîn bikin, radest dibin. Serokatî ew rihê radestbûnê re got di Botanê de helandin û rizîn heye. Jixwe dema ku radest dibin, dijmin rasterast dide televizyon. Hinek wan diaxifin jî. Serokatî jî vê di televizyonê de dibîne û hema mudaxaleyê Botanê dike. Got, şêwazê jiyanê yê hevalên jin û mêr yên Botanê, li ser esasê şêwazên YAJK'ê nîne. Pêwîst e, ew şêwaz bê guhertin û têkoşîna cins pêş bikeve. jixwe berpirsiyarên hevalên jin jî, yên mêr jî dikevin lêpirsînê. Serokatî komek heval dişîne û mudaxaleyî şêwazê Botanê dike. Jixwe hê ew şêwaza texlîtkirina mêr, di eyaletê de berdewam dike.

Di 98'an de, li eyaleta Soranê cara ewil komaleya jinê, bi navê YAJK'ê vedibe. Jixwe xebatên vê herêmê bi piranî xebatên civakî ne. Biryargaha YAJK'ê jî li vir pêş dikeve. Êrîşên dijmin jî hene. Operasyonên 97'an hê berdewam dikin. Li vir bi zaravaya Soranî kowara jinê derdikeve. Navê wê "jiyana azad" e.

Di 16'ê gulana 98'an de, qatlîama Hewlêrê heye. Di nexweşxaneyê de nêzî şest heval hene. PDK êrîş dike û hemû hevalan qetil dike. Di nav de gelek hevalên jin jî hene. Hevala Helîn Serhed jî heye, hevala Berbang heye. Hevala Roza heye, hevala Roza xûçka hevala Zaxo ye. Hevala Ronahî heye. Navê gelek hevalan jî tam nayê zanîn. Jixwe qatlîam jî tam zelal nebûye. Hevalê Mahmut wan li wir in. Hemû tên qetilkirin. Ez bawer im, hê jî ew nexweşxane heye. Heval dixwazin di demên pêş de weke mûze çêkin. Çend caran PDK xwest, mudaxale bike, lê hevalan nehilişt. Ez bawerim, ji bo wê peymanek hatiye kirin.

Wê demê Botan, li eyaleta Soran e. Li wir pêş ketin jî çêbûne. Gelek hevalên jin li vir kar dikin. Botan dixwaze, di wê demê de biryargeha YAJK'ê bixe yedeka xwe. Di şexsê kordîneyê de wê pêk tîne jî. Serokatî got, me xwest em li wir biryargeha YAJK'ê pêş bixin lê ji bin serweriya mêr derneket. Wê demê berpirsiyarê YAJK'ê li wir Mîlan bû. Di bin siya Botan de ma. Serokatî mudaxale kir, got rengê jin dernaxe holê û ew şêwaz mahkûm kir.

Li Amedê, piştî pratîka tasfiyeyê; di avahiya hevalên Amedê de lewazbûnek û ji qewet ketin derdikeve pêş. Bi taybetî di hevalan jin de zorlanma çêdibe. Cihê ku vî şêwazî tehlîl bikin û pêşiyê bigirin, bê însiyatîf dimînin û yipranma dibe. Rêxistinbûna jinê, êdî di însafa rêveberiya eyaletê de dimîne. Di kongreyê de mudaxaleyî vê şêwazê jî hate kirin.

Di eyaleta Erzeromê de, operasyon çêdibin. Hevala Dîlan berpirsiyarê eyaletê ye, li vir şehîd dikeve. Piştî hevala Dîlan şehîd dikeve, valatî çêdibe. Wê demê hevaleke ku ji rêvebertiyê re ne amadeye, cihê hevala Dîlan hildibijêrin. Di şêwazên wê hevalê de jî, malbatperestî û ji mêr re lihevkirin derdikeve. Jixwe pişt re ew kes direve. Piştî 97'an Serokatî mudaxaleyî vê qadê jî dike.

Di vê demê de, li eyaleta Xerzanê tasfiyeya Ednan wan heye. Ew tasfiye di giştî eyaletê û di nava hevalên jin de texrîbatan çêdike. Hevalên jin dikevin nava bendewariyekê ku, mudaxale bê kirin û taqviye were. Bandora tasfiyeyê li ser xebatên YAJK'ê jî tê kirin.

Li Ewropa û Rojhilata Navîn, di van deman de xebat û civînên salene tên kirin. Xebatên YAJK'ê êdî li van qadan tên rûnişkandin. Serokatî dibêje, rêxistinbûna YAJK'ê bi xwesertiya xwe, êdî xwe civakî dike. Ew hênaseyekê jî dide têkoşîna giştî. Tabî ew serkeftin, di encama keda Serokatî û xebatên şehîdan de derdikeve holê.

Di vê demê de, Serokatî mudaxaleyî rêveberiya Ewropa jî dike û rêveberiya wir dide guhertin. Wê demê kesek heye li Ewropa, niha ne di nava me de ye. Serokatî dibêje xebat di bin bandora wî kesî de mane û mudaxale dike.

**Pêvajoya 98'an Û Bîrdoziya Rizgariya Jinê**

Pêvajoyên 96-97'an mirov bi awayekî giştî dikare wisa binirxîne. Lê 98 êdî ji bo YAJK'ê pêvajoyeke cuda ye. Ew pratîkên erênî û neyînî ku derketine holê, êdî danehevek derxistiye holê. Rûxmî ew pratîkên neyînî, di nava avahiya jinê de baweriyek pêş ketiye. Rihê yekîtiyê û rihê zanebûna cins û rêxistina xweser pêş dikeve. Di nava hevalên xort de jî zanebûnek derdikeve holê. Redkirinê zêdetir, dahûrandinên têkoşîna cins hene. Di hevalên xort û jin de astek derdikeve holê.

Ji ber vê Serokatî dixwaze, rêxistinbûna jinê bigihîne astekê din. Lewra xwestek û hewldanên Serokatî yên azadiya jinê qet kêm nabin, her ku ew hewldan xurt dibin, rêxistinbûna jinê jî mezin dibe, zanebûn pêş ve diçe. Yanî fikir û hewldanên Serokatiyê fêkiyên xwe didin. Ji ber vê Serokatî, di pîvanên azadiya jinê de, her sal pengaveke nû diavêje.

Sala 98'an jî saleke wisa ye. Saleke pir têr û tijî derbas dibe ye. Di destpêka salê de çalakiya hevala Sema heye. Di zindanê de ye, hevaleke kevn e. Di 90'î de tevlî partiyê bûye. Li saxaya Serokatî maye û Serokatî wê rê dike, nava karên civakê û li wir tê girtin. Di zindanê de lêgerîn, hewldan û lêhûrbûnên wê pir kûr in. Di zindanê de, hem bi xwe re, hem jî li hemberî nêzikbûnên mêr yên paşverû di nava têkoşînekê de ye.

Hevala Sema di Newroza 98'an de çalakiya xwe dike, xwe dişewitîne. Hema şehîd nakeve, 88 rojan sax dimîne. Di vê navberê de gelek nivîs û nameyan dinivisîne, hinek ji wan nivîsan di arşîva partiyê de hene. Hevala Sema, çalakiya xwe bi armanca, li dij derketina feraset û nêzikbûnên deshilatdar yên di zindanê de; li dijî êrîşên dijmin, li dijî şêwaz û textîkên ku dijmin di zinadanê de daye rûnişkandin pêk tîne. Her wiha li ser perspektîfên Serokatî yên li ser textîk û azadiya jinê dike pir kûr dibe. Li ser çalakiya hevala Zîlan jî pir difikire, lêhûrbûn dike. Li hemberî van nêzikbûnan hemûyan, çalakiya xwe pêk tîne.

Çalakiyeke li ser pîvanên îdeolojîk pêk hatiye ye. Di ortameke bi vî awayî ku êrîşên îdeolojîk tên kirin de, bi çalakiya xwe bersiveke îdeolojîk dide. Berî çalakiyê bike, nameya xwe dinivisîne. Di nameyê de xîtabî

Serokatî, gel û jinê dike. Nameya wê hê niha jî, ji bo tevgera jinê weke manîfestoyekê ye. jixwe Serokatî ew name weke manîfesto nirxand.

Têkoşînekê hevala Sema, li dijî Can Yûce heye. Heya demekê wî fêm nake û di bin bandora wî de dimîne, lê piştî ku nêzikbûnên wî fêm kirin, bi awayekî mîsoger qutbûnekê jiyan dike. Jixwe çalakiya herî mîsoger li dijî ferasetên şaş dide diyarkirin. Serokatî dibêje çalakiyeke îdeolojîk û bi awayekî mîsoger xwe ji ferasetên şaş qutkirin e. Hevala Sema dibêje, "**li ezmanekî du roj nabin.**" Li ser esasê girêdanbûna Serokatî û bîrdoziya tevgerê derketina xwe dike. Bi çalakiya xwe jî helwesta xwe raber dike.

Di vê demê de, Serokatî pir kûr çalakiya hevala Sema dadihûrîne. Çalakiya hevala Sema û pêşketina rêxistinbûna YAJK'ê weke hev digire dest û weke qûtbûyina mîsoger dinirxîne. Ji bo vê jî bi xeta îdeolojîk ve digire dest.  Bi vî awayî Serokatî amadekarî dike ku pengaveke nû bide destpêkirin. Li ser vê esasê di 8'ê adarê 1998'an de, bi riya weşana med tv, Serokatî "bîrdoziya rizgariya jinê" îlan dike. Dibêje pêwîst e, êdî jin di bin paradîgmayekê û birdoziyekê de têkoşîn bikin. Tenê bi hin pîvanan têkoşînê lewaz dibîne. Dibêje hem ji milê paradîgmayê, hem jî ji milê zanist û felsefeyê ve, divê êdî jin xwe zanist bike.

Bîrdoziya rizgariya jinê, li ser van esasan pêş dikeve. Perspektîfeke wisa jî, li cîhanê nû ye. Di tevgerên femînîst de akim derketine, têz û teorî hene; lê weke birdoziyeke nû xwe pênase nekirine, xwe negihandine wê astê. Hêrî zêde, di asta têgeh û kûraman de xwe rêxistin kirin. Serokatî li ser vê esasê jî dahûrandinên berfireh dike. Hevalên jin dike lêhûrbûnê, hem di malan de, hem di dibistanan de wan perwerde dike. Di vê demê, Serokatî çanda xwedavendan û civakên xwezayî dadihûrîne û dike rojeva hevalên jin. Lêhûrbûna hevalên jin li ser çanda xwedawendiyê dide kûrkirin. Bi vî awayî bîrdoziya rizgariya jinê jî, digihîne bingeh û kokekî.

Êdî tenê tevgerên sosyalîst ji bo me nabin mînak. Berê me mêze dikir, me digot ka tevgerên jin li sovyetan xwe çawa rêxistin kirine, ka welatên din yên sosyalîst çawa pêş ketine. Me nêzikbûnên tevgerên femînîst jî ji xwe re esas nedigirtin. Lê Serokatî ew nêzikbûn kêm dît, bi ew bîrdoziya nû bingeha azadî û rizgariya jinê, gihand çanda xwedawandiyê. Ew feraset, li ser kîjan hîman xwe rêxistin dike, pîvanên wê çi ne, lêpirsîna wê me kir. Yanî Serokatî êdî tevgera jinê, bi

nêzikbûna tevgerên jin yên sosyalîst nagire dest. Di vir de nêzikbûna Serokatî, ji ya Marksîzmê tê cudakirin.

Di vê demê de, me pir fêm nekir. Lê Serokatî guhertineke bingehîn dida çêkirin. Bi awayekî şênber rêxistinbûna jinê jî li ser van ferasetan da rûnişkandin. Êdî ew nêzikbûnên di nava me û derveyî me pêş diketin, diyar bû ku vala ne. Em weke ne fêmkirina Serokatî dikarin bigirin dest. Jixwe ji derve ve êrîşek heye, lê di hundir de jî ne fêmkirina Serokatî heye. Ji ber vê yekê jî, ecizbûna Serokatî herî zêde di vê mijarê de li hemberî me heye.

Me got, Serokatî bi şehadeta hevala Zîlan û Sema bîrdoziya rizgariya jinê pêş dixe. Ji bo were fêm kirin; îlankirina bîrdoziya rizgariya jinê, berî çalakiya hevala Sema ye, lê bi çalakiya hevala Sema û hevala Zîlan, Serokatî bîrdoziya rizgariya jinê kûr dike, mezin dike. Wî rihî esas digire. Bi taybetî bi çalakiya hevala Sema, Serokatî êdî têkoşîna jinê bi bîrdozî digire dest.

Pênasekirina bîrdoziya rizgariya jinê, bi giştî di nava gel û avahiya hevalan de, bi taybetî jî di nava hevalên jin de moral û coşeke mezin dide avakirin. Nêzikbûnên şaş yên hevalên xort jî, Serokatî mahkûm dike. Têoriya qutbûnê, di 98'an de jî Serokatî pir dixe rojevê. Hêrî zêde sekn û çalakiya hevala Sema mînak dide. Di vê mijarê de jî ne fêmkirinek derdikeve holê. Nêzikbûnên wisa lewaz û biçûk dîtin derdikevin holê. Têoriya qutbûnê, fîzîkî û şêweyî tê dest girtin. Hem di nêzikbûnên hevalên xort de, hem jî di nêzbûnên hevalên jin de, şaşitî hene.

Mesela Serokatî behsa qutbûna zêhniyetê dike. Behsa zêhniyeta ku jinê weke berdewamî û bermahiya mêr dibîne dike. Dibêje xwe ji vê zêhniyetê qut bikin. Le di gelek cihan de şêweyî qutbûn derdikeve holê. Serokatî di şexsê hinek kesan de, ew mijar dahûrand. Got, jinek ger di hundirê xwe de, zêhniyeta mêr qut nebe; deh salan jî dûrî mêr be jî di hundirê xwe de mêr jiyan dike. Yanî di vir de behsa jin û mêrê ku hatiye avakirin dike. Di encamê de bi şêweyî (şekîlsel) nêzikbûn derdiket; vê jî bi xwe re feraset, nêzikbûn û têkiliyên şaş derdixistin holê.

Hê niha jî qutbûna mîsoger me pêk neaniye. Hê jî di sekna me de bêhna koletiyê heye, di nêrîna me de zêhniyeta deshilatdariyê pir heye. Di nêzikbûnên me de, hê jî qutbûneke li ser esasên birdoziyê çêbûye tuneye. Em dibêjin, ew tiştan li pişt me man. Lê paradîgma li ser vê qutbûnê pêş dikeve, guhertina kes jî li ser vê yekê ye. Hê niha jî li gelek qadên me yên pratîkî de, em vê yekê weke pîvan nagirin dest. Pir

hewce jî nayê dîtin. Lê di encamê de têkiliyên şaş tên jiyankirin. Sedema vê qutbûna mîsoger jiyan nekirin e. Ji ber vê şexsiyetên mezin pir zêde dernakevin holê. Rûxmî ew qesa derfetên têkoşînê zêde bûne û zanebûna me xurt bûye, di vê mijarê de kêmasiyên me tên jiyankirin. Têoriya rizgarbûnê ew e. Rast fêmkirina vê, girêdanbûyineke teqez jî derdixe holê.

Jiyana azad jî li ser vî cewherî derdikeve holê. Têkoşîna rast jî li ser vî cewherî derdikeve holê. Lewra em lêgerîna qutbûna teqez nakin. Nêzikbûna me ya têkoşîna cinsî jî, li ser pratîka teng tê kirin. Ew bi xwe re deshilatdariyê, reqabetê tîne. Bi xwe re feraseta hêzbûyinê derdixe holê. Navê vê ne têkoşîna cins e, dîdîşme ye. Ji ber ku qutbûna mîsoger tune, têkoşîna cînsî jî, li ser pratîkên rojanê xitimandin derdikeve û encameke tam dijber derdikeve holê. Niyet çi dibe bila bibe, di qadan de gelek pirsgirêkên wisa derdikevin holê.

Ji ber vê hem di hevalên jin de, hem jî di hevalên xort de têkoşîna cinsî pêş nakeve. Em bingeha wê jî nagerin. Serokatî bi qutbûna mîsoger ve digire dest. Di vir de sekna me de problem heye. Gelekên me, vê pir pêwîst jî nabînin. Em dibêjin, êdî pirsgirêka me ya azadiyê nema. Jixwe hevalên xort qet xwe nêzikî vê nakin. Cihê ku jin têkoşînê hinek mîsoger dike jî, jinê dikişînin nava pratîka teng. Hinek heval jî, xwe dûr digirin. Dibêjin bila navê me dernekeve. Em nekevin dîdîşmeyan. Ew jî dibe seknandina baş, lê ew seknandin lîberalîzmê, hevkirinê tîne. Serokatî û têkoşîna me çi dibêje, êdî ew ji aliyekî dimîne.

Yanî têkoşîna qutbûnê di berê de nemaye. Xwe ji modernîteya kapîtalîst qutkirin, seknandineke mîsoger dixwaze; xwe ji deshilatdariya mêr qutkirin, seknandineke mîsoger dixwaze. Xwe ji nêzikatiyên koletiya jinê qut kirin, seknandineke mîsoger dixwaze. Têkoşîna îdeolojîk navê ve ye. Lê di pratîka me de ew dernakevin holê. Her em xwe dizivirin û em dibêjin têkoşîna cinsî lewaz bûye. Em pêwistiya vê têkoşînê jî hîs dikin. Lewra ger ew têkoşîn nebe, ferqa me û pergalê dernakeve holê. Em bi ew ferq û cudabûna xwe, li hemberî pergalê ne. Lewra em pê hesiyane ku, pergal çiqesa êrîşî me dike û dixwaze me bikişîne nava xwe. Dixwazin bi vî awayî me bihelînin û bikişînin nava pergalê. Em vê pêwistiyê jî tînin ziman, lê em bi xwe re jî têkoşîna mîsoger nadin meşandin.

Ji ber vê yekê, Serokatî têkoşîna hevala Ronahî, Bêrîvan, Sema, Zîlan dide diyarkirin. Ne ku em xwe biçin bişewitînin. Jixwe ew şêwaz

her dubare nabin. Ji ber ku wan di xwe de guhertin da çêkirin ku ew çalakiyên mezin dar xistin. Ger em di kesayeta xwe de guhertinan bidin çêkirin, em çi çalakiyê bikin jî, dê bi xwe re guhertinên wisa derxe holê. Problem li hemberî zihniyeta xwe têkoşîn nekirine.

Nêzikbûna me ya teoriya qutbûnê, ji destpêkê heya niha şaş e. Mane dayin çênabe. Tu dibêjî qey qûtbûyin, bi ji hev dûr sekinandinê çêdibe. Em weke qûtbûyin, dê hebûn û xwebûyina me derxe holê nagirin dest. Dibêjin jixwe qûtbûyina jin û mêr ji aliyê biyolojîk ve nabe, ji ber vê jî ew teorî ne rast e. Ji ber ku qutbûnê wisa fêm dikin. Ew jî şêwazeke, ji ber ku xwe nas bikî rêbazek e; lê em wê esas nagirin. Vê dawiyê Serokatî, berdana bê dawî (boşanma) xist rojeva me. Ew jî, ji teoriya qutbûnê ne cuda ye. Zêhniyeta pergalê berdan, nêzikatiyên deshilatdar berdan, feraseta mêr berdan, hemû nêzikbûnên ku mirov ji cewhera wî derdixe berdan. Berdan jî teoriya qûtbûyinê ye. Bi awayekî objektîf, me ew teorî di pratîkên xwe de kuştiye. Heta refleks û bertekên pir cuda jî, li hemberî vê teoriyê derdikevin. Ji bo ku em azadiya jinê pêk bînin, divê qûtbiyineke xurt çêbibe. Da ku em vê birdoziyê jiyan bikin.

Nêzikbûna projeya guhertina mêr de jî, ferasetên pir çewt derketin holê. Serokatî, ew jî weke peywir da pêşiya YAJK'ê. Hevalên xort, digotin em di cihê xwe dane. Bila hevalên jin werin me biguherînin, ka çawa biguherînin e. Yanî ew qesa serasera nêz bûn hebû. Ew jixwe bêwate kirin e. Lê Serokatî behsa pêşengtiya jin dike. Çend ceribandinên tevgera jin jî çêbûn, dewreyên perwerde jî vebûn. Lê ji ber nêzikbûnên hevalên xort, yên ku vala derdixin, hemû hevalan pes kir. Niha tenê hevalek israr dike. Hat vê rewşê. Serokatî ew nêrîn vala neavit holê, heya ku mêr neguhere civak azad nabe. Di her kongreyê de, hevala Elîf pêşniyar dike, dibêje em perwerdeyên hevalên xort vekin; lê hemû hevalên jin dibêjin ne gengaz e.

Em jî di pratîka xwe de projeya Serokatî vala derdixin. Lewra pratîkên şaş derdikevin holê û em dibêjin Serokê min te ew tişt da pêşiya me, lê nabe. Çend dewreyên hevalên xort çêbûn, nêzikatiyên şaş derketin. Me hema got nabe, me israr nekir. Me teng li vê projeyê mêze kir. Hê jî ew hevalên ku tevlî van perwerdeyan bûne, tevzên xwe pê dikin. Hevalên ku tevlî van perwerdeyan bûne û şehîd ketine jî hene. Mesela hevalê Kerîm tevlê bû, hevalê Bawer hebû. Nêzikbûnên şaş yên li hemberî vê projeyê, ne biçûk in, ji birdoziyê ne qut in. Niha jî di vê

mijarê de pirsgirêkên me hene. Me guhertinên bingehîn nedane çêkirin. Em rewşa xwe weke di nava nebaşiyê de başî, dinirxînin û derbas dibin.

Li gorî bê exleqiyên ketina nava pergalê, bêguman di nava PKK'ê de xwedî li nirxên xwe derketin û sekneke bi rûmet heye. Lê qistasên me tenê ne ew in. Bê guman di vê mijarê de, kadroyên PKK xwe isbat kirine, lê me xwe bi vê sînordar kiriye. Seknandina me jî ji bo vê wasat e û em nikarin pêşengtiyê bikin. Divê em jiyankirinên xwe wane derxin û encamên rastir bigirin, wisa be dê têkoşîna me jî rastir bibe.

Di encamê de nêzikbûna li hemberî van her du projeyan jî wisa derdikeve holê. Me di vê demê de pir kêmasî jiyankirin, ji ber vê min pêwîst dît ku hinek li ser bisekinim. Lewra ew xalên girîng in.

Di vê demê de, em pratîkên eyaletan jî kin bi kin vekin. Li Botanê, dijmin êrîşên pir berfireh dike. Dixwaze eyaleta Botanê tasfiye bike û di şexsê Botanê de eyaletên din jî çav tirsandî bike. Operasyonên mezin li Botanê tên darxistin. Pir windahî tên dayin, hevalên jin jî pir şehîd dikevin. Hevala Zelal, Cîhan, Agirî, Delal, Dilşa, Şervîn, Nûjîn, Zinarîn, Ronahî Alman li vir şehîd dikevin. Her wiha gelek hevalên din yên jin jî şehîd dikevin. Van heval bi taybetî, perwerdeya Serokatî dîtine, pêşeng in.

Mesela hevala Nûjîn, hevalek pir ciwan bû. Ji Mêrdînê ye. Lê rihekî wisa pê re bû ku di pevçûnan de, di jiyanê de pir xurt bû. Ne peywirdar bû, lê tevlî kîjan karî dibû coş û hêz dida avakirin. Hêza moralê bû. Di herî cihê zehmet de xwedî taybetmendiyên wisa bû.

Hevala Zelal, berpirsiyarê eyaletê yê YAJK'ê bû. Rûxmî ku pir ciwan bû jî, berpirsiyariyeke wisa girtibû. Ji saxaya Serokatî hatibû, bi taybetî Serokatî ew ji bo Botanê amade kiribû û ji bo avakirina biryargeha Botanê ew peywirdar kiribû. Di nava şer û pratîkê de pijiya bû. Li saxaya Serokatî jî, moral û coşa xwe hebû. Di vê astê de li her cihî seknek da diya kirin.

Di 98'an de, Serokatî dibêje dê Botan bibe bihara jinan. Li ser Botanê di mijara jinê de perspektîfên kûr dide. Ew perspektîf hê jî heye, em carina li ser perwerde dibînin. Dixwaze di şexsê Botanê de têkoşîna jinê pêş bixe. Gelek kadroyên ku li saxayê perwerde kirine jî, bi vê armancê derbasî Botanê dike. Di pêşengtiya jinê de, Serokatî dixwaze li Botanê hem di şer de, hem jî giştî têkoşînê de şêwazek nû biafrîne. Hevala Zelal bi wê perspektîfê diçe Botanê. Jixwe di biharê de, konfe-

ransa Botanê li Heftanînê çêdikin û biryar didin ku biryargehê derbasî Botanê bikin, lê operasyona Mûrat destpê dike.

Di vê operasyonê de gelek heval şehîd dikevin. Cara yekemîn, ji Bakur dijmin hemû generalên xwe yên şer tîne ser vê operasyonê. Armanc dikin ku, hemû rêvebir û avahiya hevalan îmha bikin. Li Botanê berxwedaneke mezin tê dayin û dijmin vala dertê. Dijmin bin dikeve, lê windahiyên me jî pir cêdibin. Gelek hevalên pêşeng şehîd dikevin, herî zêde jî hevalên jin şehîd dikevin. Piranî hevalên ku me navê wan da jî, di vê operasyonê de şehîd dikevin.

Rûxmî ew berxwedana destanî, Serokatî şêwaza jinê ya di vî şerî de rexne dike. Dibêje şêwaza mêr derbas nekirine. Weke xwe ji vê şêwazê qut nekirin pênase kir. Ew fedekariyên ku li wir hatine kirin jî nirxand, lê ew şêwaz jî rexne kir. Şehadeta gelek hevalan zû dît. Mesela hevala Zelal, yek ji van bû. Taybetmendiyên serkeftinê tê de hebûn. Biçûya ku ew der rêxistin dikir. Di textîk û şêwazê şer de jî, xwe xurt kiribû. Armanca ku daye pêşiya xwe teqez pêk dianî. Serokatî van taybetmendî di hevala Zelal de dîtibûn. Hevaleke pêşeng bû. Şehadeta wê ya bi vî rengî, Serokatî rexne kir. Dîsa hevala Agirî, Cîhan wan jî wisa bûn.

Vê salê dijmin, qet Botan vala nehilişt. Operasyon li ser operasyonê kir. Hevalan jî her bersiv da û şehadet hatin jiyan kirin. Vê yekê bandor li ser, pratîka YAJK'ê ya wê salê jî kir. Serokatî neçar ma ku, di nava salê de careke din taqwiye hevalan bişîne.

Di sala 98'an de, hem li ser Serokatî hem jî li ser tevgerê giştî asta êrîşan bilind bûye. Li hemberî wê berxwedan jî gihêştiye lûtkeya xwe. Di vê demê de, Serokatî mudaxaleyî eyaletê kiriye, berpirsiyariya YAJK'ê jî tê guhertin. Wê demê hevala Hêvîdar ji biryargeha YAJK'ê diçe Amedê. Hevala Hêvîdar, hevaleke kevn e û li saxaya Serokatiyê jî maye. Xwedî danehev û ezmûn e. Di derbarê pratîkên ku li Amadê hatine jiyankirin de jî, xwedî helwestekê ye. Di 98'an de li Amedê, di rêxistinbûna jin û têkoşîna jinê de pêşketinek çêdibe, rêxistinbûnek rûdine.

Di vê demê de, êrîşên ku li ser Serokatî pêş dikevin, ji aliyê hinek hevalan ve rast tê xwendin. Yek ji van hevalan jî hevala Binevş (Hüsniye Oruç) e. Bi xwe ji Amedê ye, ji navçeya Çinarê ye. Hem li hemberî êrîşên li ser Serokatî, hem jî li hemberî tasfiyegeriya ku li Amedê hatiye jiyankirin, li Lîcê çalakiya fedaî dike. Armanca çalakiya wê; hem li dijî ferasetên li Amedê, Sileyman wan bi pêş dixin, hem jî li dijî êrîşên ji derve ve tên ser Serokatî bûyin bersiv e.

Di vê demê de, Serokatî hem çalakiya hevala Binevş, hem jî hewldanên hevalên jin yên Amedê, weke derketineke nû dinirxîne. Perspektîfên vê demê, ji bo avahiya hevalên Amedê wisa dide biryargeha navendî ya YAJK'ê.

Eyaleta Erzeromê, xwe ji bandora tasfiyecitiyê xilas nake û ew dibe sedem ku di şêwaz û textîkê şer de jî pêşketinek çênebe. Di vê demê de li eyaletê windahî pir çêdibin. Hevala Sara û hevala Gulistan her du jî berpirsiyar in, lê bi wan re taximeke hevalên jin şehîd dikeve. Serokatî vê şêwazê, weke xwe ji şêwaza malbatperestî ya Şemo qutnekirinê ve girê dide. Dibêje "eyalet hê jî di bin bandora wî şêwazî de dernekiteye". Ew dibe sedema texrîbat û windahiyên mezin. Eyalet ber bi tasfiyeyê diçe. Bandora tasfiyeyê, êdî li ser jiyan, têkoşîn û têkiliyan dike. Serokatî weke tewdîr, hevalên jin ji eyaletê dikişîne. Di van mijaran de Serokatî helwesteke wisa dide nîşan dan. Dema ku sererastkirinek li eyaletê çêdibe, careke din hevalên jin dişîne wir.

Hevalên xort jî gelek tên guhertin. Bi taybetî pratîkên tasfiyeperest ku li eyaletên weke Erzerom, Xerzan û Dêrsîmê derketine bandora xwe li ser giştî xebatên partiyê dikir; ji ber vê Serokatî her bi tewdîr nêzî van eyaletan dibû. Carina dema didît ku guhertin çênabe, bi giştî rêveberî û avahiya hevalan diguhert. Ew tarzê zilamtiyê ku jin dixist bin venêrîna xwe, wisa xwe di van eyaletan de bi cih dikir ku mudaxaleyên Serokatiyê cihê xwe nedigirt.

Di sala 98'an de, ji bo tevgera jinê gelek gavên nû tên avêtin. Îlankirina bîrdoziya rizgariya jinê, çalakiya hevala Sema ûhwd potansiyeleke mezin derdixin holê. Li cihê ku ew potansiyel bibe bingeha jiyana azad û rêxistinbûna jinê; ew ferasetên şaş ku di jin û mêr de derdikevin, pêşiya wê potansiyelê bendav û astengiyan çêdikin. Êdî di şêwaza kesayeta jinê de jî, ew yek xwe dide der.

## Konferansa Rojhilata Navîn Ya Jinê Û Penç Kesayetiyên (tipleme) Jinê

Serokatî ji bo ku bîrdoziya rizgariya jinê, bi jiyanî bike konferansa jinê ya Rojhilata Navîn li dar dixe. Ji bo tevgera jinê dibe konferansa duyemîn. Çima konferansa jinên Rojhilata Navîn? Lewra Serokatî dixwaze di şexsê hemû jinan de vê birdoziyê jiyanî bike. Di vê demê de li wir hevalên jin yên xwedî danehev (birikim) hene. Di nava gel de pêşengtî kirine, fermandarî kirine. Ji Bakur û Ewropa hatine. Yanî

nûnertiya hemû qadan di konferansê de heye. Ji biryargeha YAJK'ê jî tevlêbûn heye. Berpirsyarên eyaletan hene. Mesela berpirsiyara eyaleta Amedê Sakîne Batman heye, hevala Sara li wir e. Ji Botanê hevalên berpirsiyar li wir in. Jixwe di dewreyan de jî hevalan lêhûrbûn kiriye û amade ne.

Di vê konferansê de, Serokatî êdî pêwîstî bi dahûrandina jinê ya takekesî jî tîne. Perspektîfa pêşerojê, perspektîfa qirna 21'emîn ji bo jinê dide. Ya rast ji warê pêşerojê ve, ew konferans ji asta kongreyekê zêdetir xwedî rol e. Li ser vê konferansê hem pratîk û kesayet tên mahkûmkirin, hem jî pêrspektîfa pêşerojê dide. Kesayetên ku herî zêde Serokatî dadihûrîne, tîplemeyên jinê pênase dike. Di dîroka jinê de cara yekemîn jin tîplemeya xwe pênase dike. Ji bo me êdî dibe pêvajoyeke nû.

Serokatî heya vê demê, li hemberî zêhniyeta deshilatdar, têkoşîna jinê çi derxistiye holê ew pênase dikir. Lê piştî vê demê, di kesayet de ferasetên ku derdikevin holê jî dadihûrîne. Bi taybetî perspektîfa vê konferansê ew e. Tabî sedemên wê hene; pratîka Zapê encamek derxistiye holê, pratîka Amedê encamek derxistiye holê. Êdî jin jî dibe hêz, xwe xurt dike, peywiran digire. Lê di xetê de kûr nebe, dê bi ew hêza xwe, bi nêzikatî û ferasetên şaş re rû bi rû bimîne. Serokatî li vê encamê jî mêze dike û keseyatiyan digire dest.

Di vê demê de Serokatî pênc tîplemeyan digire dest. Pênc tîplemeyan digire dest û tehlîl dike. Yek ji van tîplemeyan; tîplemeya ku ji bîrdoziya rizgariya jinê dûr jiyan dike ye. Vê dahûrandinê di şexsê hinek hevalan de dike. Di vê tîplemeyê de di paşverûtiyê de israr kirin heye. Di mantiq û mantelîteya ku tê de mezin bûye de, di koletiyê de israr kirin heye. Di lêgerîna azadiyê de xwe cihekî de nedaye rûnişkandin. Di nava xapandin û gafletekê de ye. Ji bawerî û hêza cewherî dûr e. Ji baweriya îdeolojîk dûr e. Di xwe xapandinê de israr dike. Ne xwediyê ûtopyaya azadiyê ye. Naskirina xwe û cinsê xwe de, lewaz e. Serokatî di vê tîplemeyê de taybetmendiyên wisa dibîne. Bandora van karekter û tîplemeyan hê jî di şexsiyetên me de jî hene. Dibe ku di 98'an de hatibin dahûrandin, lê îro van taybetmendî çawa tên jiyankirin û li hemberî vê têkoşîna me çi ye? Divê dahûrandina wê kûr were kirin. Tîplemeya yekemîn hê jî di sekna me de tê jiyankirin. Ew taybetmendî cih cih derdikevin holê. Ew bi feraseta pergalê derdikeve holê û li hemberî xeta azadiyê di vê ferasetê de israr kirin heye.

Kesayeta (tipleme) duyemîn; şexsiyeta ku dibe biyaniya cinsê xwe û qarîqatorîze dibe ye. Yanî li hemberî cinsê xwe biyanîbûnekê jiyan dike û dişibe cinsê din. Serokatî vê kesayetê jî dadihûrîne. Me di nava waneya xwe de, encamên ku ew şexsiyet bi xwe re derdixe hinekê pênase kir in. Jixwe ew hemû encamên zayendperestiya civakî ne. Pergala dagirker ew tîpleme ava kiriye. Ji milê rêxistinî ve, ne zane ye. Xwedî fikreke kûr û dîrokî nîne. Di lêgerîna azadiyê de serasera ye û zanisteke wê ya kûr nîne. Sekna wê her ezez e. Pîvanên wê yên ecibandinê û hatina ecibandinê jî, li gorî mêr e. Vê pîvanê ji xwe re esas digire. Li cihê ku li gorî têkoşînê û azadiyê pîvanên xwe diyar bike, dema ku mêr wê diecibîne, ji bo wê dibe pîvanek. Li gorî wê qebûlkirina mêr, wê dike jina rast. Serokatî vê weke cemidandina pîvanên azadiyê digire dest. Lewra li cihê ku xwe bawer bike û hêza xwe qaneh bibe, li gorî nêrîna mêr xwe digire dest.

Me di şexsê pratîka Botanê de jî, ew nêzikbûn girt dest. Ew kesayet di şer de, şêwazên çort ji xwe re esas digire; di jiyanê de jî bi kevneşopî tevdigere. Pîvanên ku jê re hatine danîn derbas nake. Di şer de jî, li cihê ku ziravî û pêwistiyên şer fêm bike, pratîkî û çort mêze kirin heye. Di pêşketina fikir û mejî de xwe digire. Ji ber vê jî, ji pêşketina xwe re sînor datîne û xwe têr dibîne. Nêzikatiyên wisa niha jî di pratîka me de derdikeve holê. Em hinek tiştan fêr dibin, hema em dibêjin her tişt temam e. Di şêwazê şer de, xulukar nîne, şêwazên qlasîk ji xwe re esas digire. Di hundir de bi xwe û ji cinsê xwe bêbawer nêz dibe.

Sînorên pîvana azadiyê jî, li gorî gihêştina sînorên pîvanên mêr digire dest. Ew seknandin, bandora xwe li ser qarekter, feraset û bedena wê jî dike. Serokatî di şexsê hinek hevalan de van tiştan dadihûrîne. Lê dahûrandineke giştî ye. Di lêgerînên azadiyê de jî, xwe ji nêzikbûnên deshilatdariyê rizgar nake.

Kesayeta seyemîn; şexsiyeta apolîtîk û hestiyar e. Carina di nîqaşan de, heval dibêjin ew taybetmendî û bandora vê tîplemeyê li ser min heye. Yanî Serokatî di wê demê de pênase kiriye, lê hê jî me derbas nekiriye. Di van kesayetiyan de xwe dîtin û xwe dahûrandin pir girîng e. Mêzekirina vê şexsiyetê ya şer û têkoşînê hestiyarî ye, ne polîtîk e. Ji nûbûyinê re vekirî nîne. Di wê sekna xwe de jî bi israr e û li ser vê seknandinê dimeşe. Di vê şexsiyetê de, taybetmendiya herî diyarker, ji gihêştina armancê dûr e. Pîvanên wê yên redkirin û qebûlkirinê, li gorî hêstên wê ne. Hem di jiyanê de, hem jî di têkoşînê de li gorî hêstên

xwe tevdigere. Ji cinsê xwe dûr e. Ew kesayet di guhertinan de ji teriqîn (savrulma) û binketinê re vekiriye. Ji ber ku kesayeta xwe tam ava nekiriye, bûyerek an jî pêşketinek dikare li ser sekn û biryara wê bandor bike. Sekna wê li bin guhê hev dixe, her bi şêwazekê nezî têkoşînê dibe, ew jî dibe sedem ku bi bin keve. Di encamê de ji benketinê re vekiriye.

şexsiyeta çaremîn; tîplemeya ku azadiya takekesî esas digire ye. Serokatî, vê tîplemeyê bi taybetî di pratîka Amedê ya YAJK'ê de, di şexsê Sakîne Batman de digire dest û dadihûrîne. Tabî ew weke seknandinekê, di qadên din de jî tê jiyankirin. Di vê tîplemeyê de, xwe ji cinsê xwe cuda dayina diyarkirin heye. Vê yekê tercîh dike. Lewra di navenda nêrîna wê de kesayeta xwe heye, xwe esas digire. Di nava cinsê xwe de her di nava rekabatê de ye. Di pêşengtî û rêvebertiyê de asta ku giştî derketiye holê, dikişîne asta xwe. Şaşitiyeke weke pirsgirêka wê ya azadiyê tune jî jiyan dike. Asta azadiyê derketiye holê jî, bi xwe ve îzah dike, weke berhema xwe dibîne. Di nava xwe xapandineke wisa de ye jî. Her dixwaze mêr jî, sekna wê bi nirx bibîne û pesna wê bide. Di lêgerînên wê de jî, nêrîna azadiya sexte derdikeve pêş. Di nêzikbûnên wê yên çînî de jî, qarektera bûrjûvaziya biçûk derdikevin holê. Feraseta ezezitiyê li pêş e. Di bin navê giştîbûnê de ji cinsê xwe qut dibe. Her pişta xwe dide derve û hêza xwe ji wir digire. Di sekn û pratîka xwe de jî xeta azadiya jinê red dike.

Tîplemeya pêncemîn; tîplemeya ku feraseta azadiya çort û redkirinê esas digire ye. Yanî retekê çort esas digire û li ser vê redkirinê jî tîplemeyekê azadiyê ji xwe re derdixe holê. Di feresatê wê de pîvanên wê yên red û qebûlê çort in. Wisa bi bîrdozî nêzikbûn û fêm kirin tune ye. Ew jî bingeha xwe bi giranî çîna bûrjûvaziya biçûk digire. Di milê bîrdozî û civakî de kûr nîne. Xwe zane nekiriye. Li hemberî pîvanên azadiya jinê, serasera ye.

Alternetîfa van kesayetiyan jî; Serokatî, weke kesayeta hevala Zîlan li pêy azadiyê meşîn û bûyina şopdara hevala Zîlan digire dest. Xwe gihandina kesayeta hevala Zîlan e. Di takekesiya hevala Zîlan de, pîvanên têkoşînê, jiyanê, redkirin û qebûlkirinê; hezkirina welat, hezkirina gel, hezkirina cins datîne holê. Pîvanên vê pir zelal in. Di asta azwerî (tutku) û evînê de ye. Li hemberî hemû curên dagirkerî û deshilatdariyê xwe qutkirin e. Her wiha di şexsê Hevala Zîlan de, Serokatî gelek taybetmendiyan pênase dike. Bi rastî jî xwe ji hemû fikir û

nêzikbûnên heyî qutkirin e. Li dijî vê, îfadeya xwebûyin û hebûnê derxistina holê ye. Serokatî vê, di sekna jinê de weke nû digire dest.

Ev her pênc tîpleme (kesayet), hem di nava kar de hem jî di nava têkoşînê de; ger neyê guhertin û di xwe de pêşketin nede çêkirin, potansiyela tevgera jinê çiqes xurt dibe bila bibe, pêşketin kûr nabe û her tim ew potansiyel ji jirêderketin û binketinan re vekiriye. Bi taybetî di seknandina jinê de, ew hem dibe bingeha deshilatdariya mêr, hem jî di jinê de hêza xwebûyinê dernakeve holê. Îrade, hêz, nêrîn û kûrbûn dernakeve holê. Ew jî bi serê xwe, li pêşiya xeta azadiyê dibe astengiyeke mezin.

Em sazî, kar û xebatên xwe çiqes mezin bikin jî, ger em di bîrdozî û xeta azadiyê de xwe kûr û zane nekin; sekinandin û mezîkirana me dê serasera be. Wê bêbingeh be, kûr nebe. Ew jî her ji binketinê re vekirî be. Jixwe pratîkên ku piştî komplo derketin holê, encam û bandorên van kesayetiyan e. Ji ber vê tevgera jinê, teriqînê (savrulma) jiyan dike, nikare xwe bigihîne perspektîfên Serokatiyê, sedemên vê avanekirina kesayet e. Ew pir girîng e. Kesayetê xwe ji van pîvan û taybetmendiyan qut nekiriye. Ji ber vê di têkoşînê de serkeftî nabe. Li hemberî deshilatdariya mêr, serkeftineke dernaxe holê. Kesayet û têkoşîneke serkeftî dernaxe holê. Lewra xwediyê têkoşînek îdeolojîk nîne, xwe têr dibîne, bi hêleşaşî xwe mêze dike. Xwe ji wan taybetmendiyan qut nake. Ji ber vê jî ew kesayet derdikeve holê. Ji bo vê yekê, Serokatî kesayeta hevala Zîlan weke mînak dide pêşiya me.

Bi vê konferansê re Serokatî, di nava tevgerê de, pêlekê nû da destpêkirin. An wê bi vê têkoşînê di hemû qadan de guhertin bên çêkirin; an jî bi pîvanên koletiyê û zihniyeta serdestan tasfiye û tunekirin bê çêkirin. Serokatî vê tehlîlê jî dike. Dibêje êdî hûn hatine, pêvajoya ku li hemberî deshilatdariyê derketinekê raber bikin. Dê hûnê li hemberî hemû paşverûtiyan helwest bidin diyar kirin. Ger hûn vê nekin, hûnê di pratîka xwe de bibin aîdî hinekan. Hûnê bibin aîdî xeta mêr û endamên pergalê. Dê hûnê nebin endamên xeta azadiyê. Ger hûn di nava têkoşînê de bimînin jî, di rih û mejî de hûnê bibin aîdî pergalê. Serokatî di vê demê de, dahûrandineke wisa giştî dide diyarkirin.

Sala 98’an ji bo tevgera jinê, ji her alî ve saleke nû ye. Ji havîna 98’an û pê ve Serokatî mudaxaleyî biryargeha navendî dike. Biryargeha navendî bi giştî belav dike û peywira biryargeha navendî, dide biryargeha navendî ya YAJK’ê. Wê demê Ebûbekîr ew li biryargeha navendî

ne. Piştî ew konferans çêbû û encamên konferansê belav bûn, di nava avahiya jinê de li welat û li dervayê welat, asteke xurt tê girtin. Ew bandora xwe li ser xebat û pratîkê jî dike. Ji ber vê yekê Serokatî, peywira biryargeha navendî da YAJK'ê û perspektîfên ku didan welat, di ser YAJK'ê re dide.

Di vê demê de Serokatî, dixwest ku asta di jinê de hatiye girtin, giştî bike. Dixwest li hemû Rojhilata Navîn belav bike û ji bo jinê jî armanceke wisa datîne holê.

## PÊVAJOYA QOMPLOYA NAVNETEVÎ

### Sedemên Qomployê Yên Derve û Yên Hûndirîn

Tabî di demeke wisa de êrîşên hêzên komploger li ser Serokatî zêde dibin. Ji payiza 98'an pê de hewldanên komploya hêzên weke Amerîqa, Îngîltere û Îsraîl zêde dibin. Hewldan û têkoşîna Serokatî ku li Rojhilata Navîn dide meşandin, êdî ji bo xwe weke tehdît dibînin. Lewra Serokatî di jiyanê de guhertin dide çêkirin. Di pêşengtiya îdeolojîk de nêrîneke nû datîne holê. Di mijara jin û jiyanê ku pergala pênc hezar salan, li Rojhilata Navîn bi pergal kiriye û rêxistin kiriye, dide guhertin. Di navenda vê guhertinê de jî mijara jinê heye. Tenê teoriya wê jî danayne holê, vê jiyanî dike. Atmosfera têkoşîna me ku di nava gel de hatiye avakirin, weke serkeftinê xwe dispêre pêvajoyê. Pergal jî wê teyisîn û atmosferê dibîne.

Yanî zêhniyeta bi hezaran sal pêşketiye û ji bo pergalê jî bingeheke berfireh çêdike, tê guhertin. Jiyana ku bi hezaran sal hatiye rûnişkandin, tê guhertin. Jin tê guhertin û mêr tên guhertin; Serokatî di şexsiyeta xwe de mirovê nû li Rojhilata Navîn pêk aniyê û vê dide avakirin jî. Di kesayeta mirovê nû de, civaka nû dide avakirin. Li dijberî vê, hemû hêzên paşverû yên herêmê û yên navnetewî dibin yek û hebûna Serokatî ji bo xwe weke xetereyekê dibînin. Ji destpêkê heya dawiyê li hemberî Serokatî di navbera hewldanan de ne, lê di 98'an de ew digêhêje lûtkeyê. Ew hêza Serokatî dide diyarkirin.

Ya duyemîn jî, di hundir de xitimîn çêbûne, serokatiya textîkî rista xwe nelîstiye. Ji vî alî ve valatiyek heye. Di salên 97-98'an de di navbera Serokatî û avahiya rêxistinê de mesafeyek çêbûye. Pergal jî vê dibîne; dibêjin ger em Serokatî ji holê rakin, yên din em bi hêsanî dikarin ji holê rakin û tasfiye bikin. Bi rastî jî di vê mijarê de, hêzên komploger pêvajo rast xwendine û hewldanên Serokatiyê jî baş dîtine. Di vê mijarê de, di valatiya ku me hiştiye û mesafeya ku me kiriye navbera xwe û Serokatî baş dîtine. Serokatî di vê demê de, amadekariya guhertina giştî ya zêhniyetê dike, vê jî di pêşengtiya jinê de dike. Amadekariyên gavên paradîgmaya nû dike. Li ser vê esasê amadekariyên kongreya şeşemîn dike. Dixwaze bi kongreya şeşemîn re, guhertinên bingehîn bike.

Sala 98'an êdî pêvajoya komployê ye. Dawiya 98'an û destpêka 99'an Serokatî dîl dikeve destê dijmin. Dijmin dixwaze Serokatî tune bike, da ku tevgerê jî tasfiye bike. Komploya navnetewî li ser vê esasê

pêş dikeve. Di şexsê Serokatî de, hêzên navnetewî komployê li ser Rojhilata Navîn pêk tînin. Li ser kesayeta azad û civaka nû ya demokratîk tê pêkanîn. Ji ber vê jî Serokatî dibêje kompoyekê dîrokî ye. Encamên vê komployê jî nû bi nû derdikevin holê. Bi kîjan plan û tevgerînan hatiye darxistin, îro baştir derdikeve holê. Tehlîlên ku Serokatî, ji bo van hêzên komploger kirine, nû bi nû zelal jî dibin. Êrîşên li ser proje û fikrên Serokatî hatine kirin, nû bi nû derdikevin holê.

Bi komploya navnetewî re, di nava partiyê de, êdî ji bo me pêvajoyeke nû destpê dike. Di girtina Serokatî de, weke rêvebir û giştî tevgerê em di nava gafletekê de bûn. Serokatî bal dikşand ser êrîşan, lê me digot Serokatî nayê girtin, dê Serokatî ji hemû tiştan re bibe çareserî. Dema ku Serokatî derdikeve derveyî Rojhilata Navîn jî, dixwaze di vê mijarê de me şiyar bike; lê em gafletekê jiyan dikin. Pratîka xwe em dikarin wisa pênase bikin. Piştî ku bi komployê Serokatî hat dîlgirtin, em ji vê gafletê şiyar bûn. Dijmin jî dostan jî û me jî şoqek jiyan kir. Bi taybetî dijmin got, êdî PKK xilas bû. Jixwe armanca dîlgirtina Serokatî ew bû. Gelê me û dostên me jî, di bendewariyê de bûn, dê êdî PKK çi bike? Weke milîtanan, me jî şoqekê mezin jiyan kir. Hêjandina herî mezin ku di dîroka PKK de me jiyan kir vê demê bû. Hê niha jî me bandora vê hêjandinê ji ser xwe neavêtiye. Di nameyên xwe yên dawî de jî Serokatî dibêje, we şoqek jiyan kir û divê hûn şoqekê din jî jiyan bikin ku sererast bibin û werin ser hemda xwe.

Ew pêvajo, êdî ji bo me dibe pêvajoyeke nû. Serokatî dema ku dîl dikeve jî, ew rewşa me baş dixwîne û dixwaze bi awayekî lezgîn, ew sekna me biguherîne. Yên ku hevdîtinên Serokatî yên di vê demê de şopandinê, dikarin vê bibînin. Hema mudaxaleyî me kir; lewra Serokatî dizanî ku em ne amade ne. Ne ji têkoşînê re û ne jî ji pêşengtiyê re em ne amade bûn. Jixwe dijmin hema êrîşên xwe kûr kirin. Di ew konsepta komployê de; gavên yekemîn, duyemîn û seyemîn hebûn. Yanî wisa Serokatî dîl hate girtin û her tişt xilas nebû. Jixwe di 2003'yan de Amerîqa ket dewrê û hewl da ku rêveberî û avahiya partiyê parçe bike, xeta partiyê lîberalîze bike. Ew hemû parçeyên vê komployeyê bûn. Lê Serokatî mudaxaleyî ew rastiya me kir.

**Hûn Nikarin Roja Me Tarî Bikin**

Ji milekî din ve, dîlketina Serokatî di nava partiyê de û di nava gel de, hêrs (öfke) û rikeke mezin ya tolhildanê jî dabû avakirin. Esareta Serokatî tu kesî qebûl nekir û heya niha jî qebûl nakin. Van hestan, di nava hevalan û gel de şiyariyek derxist holê. Di nava welat de û seranserî cîhanê, xwedî lê derketineke mezin li Serokatî çêbû. Li hemberî hewldanên komplogeran, serhildaneke mezin dest pê kir. Bi vî awayî hêza Serokatî ku li Rojhilata Navîn, di nava gel de dabû afirandin, rabû ser piyan. Lê hêzên komploger ew nexistibûn hesabê xwe. Hem hewldanên Serokatî yên li hemberî komployê nexistibûn nav hesabên xwe, hem jî berteka gelan nexwistibûn nav hesabên xwe. Digotin, "dê her kes bêmoral be, wê bibêjin Serokatî hat girtin û her tişt xilas bû".

Psîkolojiya gel û ya PKK wisa hesap kiribûn, lê vala derket. Helwesta gel, li dora Serokatî li tevgerê xwedî derketin bû. Di pêvajoya Îmraliyê de jî, Serokatî hem ew gafleta me tehlîl dike, hem jî ew rihê gel yê fedaiyane dinirxîne. Serokatî vê jî, weke rih û hewldaneke digire dest. Naxwaze ku ji bo wî, bûyer pir ji xeta xwe derkevin, lê wate û maneya van berxwedanan jî textîr dike.

Di vê demê de, bi taybetî li hemberî komploya navnetewî; di bin diruşmaya "**HÛN NIKARIN ROJA ME TARÎ BIKIN"** û "**BÊ SAROK JIYAN NABE**" de xeta fedaîtî ya Zîlanê xwe da pêş. Gelek deverên welat, her cihê ku têkoşîna me lê heye, li zindanê gelek hevalên hêja ew xeta fedaîtî pêş xistin. Bi taybetî bi vê diruşmayê, li hemberî dijmin helwesta xwe dan diyarkirin û gelek hevalan çalakiya fedaî kirin. Hem xwe di dijmin de teqandin, hem jî şêwazên xwe şewitandinê pêk hatin. Nêzî heyştê hevalan, di vê pêvajoyê de xwe feda kirin. Ji van hevalan gelekên wan hevalên jin in. Navê van hevalan di arşîva partiyê de heye.

Ew rihê fedaîtiyê, dijmin xist nava tirseke mezin. Serokatî wisa nirxand. Yanî di cîhanê de bûyerên wisa û bi rihekî wisa li serokekî/ê xwedî derketin, cara yekemîn çêdibe. Ji bo pêximberan tu kesî xwe wisa feda nekir, li cîhanê di tu tevgeran de rihekî wisa derneket holê. Lê xeta azadiyê ku Serokatî di nava gelê Kurd de şîn kir, ew xet û rih da avakirin. Yanî rihê ku bi azadiyê ve girêdayî ye. Di şexsê Serokatî de, xwe bi vî awayî xeta azadiyê ve kirina yek heye. Ew ji bo dijmin bû tirs û xofeke mezin.

Bi taybetî di nava van du salan de (98-99), gelek hevalan bi şêwazên cuda çalakiyên xwe pêk anîn. Ew çalakî ew qesa mezin bûn ku

Serokatî neçar ma ku mudaxale bike. Got “**bila ew rih, bi we re hebe; lê bi vî rihî xwe nekûjin, bi vî rihî xwe zindî bihêlin”**. Dibêje, “vî rihî vegerînin hêza têkoşînê, li hemberî dijmin vegerînin hêza textîkê”. Bi vî awayî Serokatî şêwaza vê çalakiyê da sekinandin. Yanî rihê azadî û têkoşînê xurt kir, lê weke şêwaza çalakiyê Serokatî di cih de nedît.

Di vê demê de gelek hevalên ku şehîd ketine hene. Ew heval heya roja me jî, ji bo me bûn mînak. Em ê ji bo hevalên jin, hinek navan diyar bikin. Hevala Berwar (Hamdiye Kaplan) heye. Bi xwe ji Çelêya Colemergê ye. Hevaleke kevn û xwedî ezmûn e. di gelek cihên têkoşînê de jî maye. Berî komployê, hê ku Serokatî li Romayê ye, bi armanca pêşiya komployê bigire; hevala Berwar di qanûna 98’an de, li Wanê çalakî pêk tîne. Di nameya xwe dedibêje, “ez li hemberî komplo û êrîşên Serokatiyê çalakiya xwe dikim”. Di navenda Wanê de, li hemberî navenda polîsan çalakî dike.

Yek jî ji van hevalan hevala Rojbîn Amanos (Fatma Özen) e. Bi xwe ji Îskenderûnê ye, bi eslê xwe Ereb e. Di 93’yan de tevlî partiyê bûye. Hevaleke zîrek û xwe zane kiriye. Li saxaya Serokatî jî maye. Bi taybetî di hewldanên Serokatî yên jinê de xwe xurt û zane kiriye. Ew jî berî ku Serokatî dîl bikeve, di mijdara 98’an de li Geverê çalakiya xwe dike. Li hemberî navenda polîsan çalakiya xwe dike.

Hevala Rotînda (Aynûr Artan) heye. Di vê demê de di zindanê de ye. Li saxaya Serokatî jî maye, li eyaletên Bakur jî maye. Bi xwe ji Çewlîkê ye, lê li Xerpetê mezin bûye. Piştî perwerdeya saxaya Serokatî, Serokatî wê di karên civakî de peywirdar dike. Li vir di demeke kin de tê girtin. Di zindana Mîdyatê de, êrîşên li ser Serokatî dibîne û di cotmeha 98’an de xwe dişewitîne. Hevala Rotînda, li gel hevala Kurdê (Selamet Menteş) çalakiya xwe dike. Hevala Kurdê jî, ji Amedê ye. Di 93’yan de tevlî partiyê bûye. Her du bi hev re, di zindanê de, bi xwe şewitandina giyana xwe dixwazin ji êrîşên dijmin re bibin bersiv.

Ji van hevalan yek jî, hevala Şaristan (Nezahat Baracı) ye. Di 90’î de tevlî partiyê bûye, ji Cizîrê ye. Li Gabar û Botanê maye, piştî komployê jî li Botanê ye. Di wê demê de dijmin gazî dike, dibêje werin radest bibin. Piştî komployê dijmin êrîşeke wisa psîkolojîk dike. Lê hevala Şaristan, di nameya xwe de dibêje, “EM Ê WERIN, LÊ EM Ê WEKE GOKEKE AGIR WERIN”. Bi vî awayî diçe û li Elihê çalakiya xwe dike. Li hemberî hêzên leşkerî yên dijmin çalakiyê dike. Helwesta hevala Şaristan, di nava hêzên gerîla de jî bandoreke mezin dike. Lewra pir bi israr e û rûxmî

hemû astengiyan çalakiya xwe dike. Di jiyana xwe de jî, pir bi bandor bû û dihat hezkirin. Hawayekî pozîtîf derdixist holê. Bi çalakiya xwe kesayeta wê jî xurtir bû. Di sekna azadiyê de pir israr dikir.

Yek jî ji van hevalan hevala Zînê (Meral Mamyak) ye. Bi xwe ji Erdexanê ye. Hevaleke ciwan e, di 99'an de tevlî partiyê dibe, di demeke kin de biryar dide ku çalakiyê li dar bixe. Di 27'ê adara 99'an de li qada Taksîmê çalakiya xwe li dar dixe. Rûxmî ku ciwan e jî, li metrepolan helwesta xwe wisa diyar dike.

Hevala Rozerîn Sîpan (Şukriye Kaymaz) heye. Bi xwe ji Mêrdînê ye. Di 96'an de li Amedê tevlî partiyê dibe. Di tirmeha 99'an de li Xerpetê çalakiya xwe li dar dixe. Heya ku digihêje armanca xwe pir zehmetiyan dikişîne. Lê ji bo ku bigêhêje armanca xwe, li gelek deran digere û çalakiya xwe li dar dixe. Bi taybetî Xerpet, cihekî ku li hemberî têkoşîna me kirine navenda şerê taybet e. Ji ber vê, wê derê bi xwe hildibêjêre. Bi çalakiya xwe, dixwaze ew zihniyeta ku li wir hatiye avakirin bişkîne.

Hevala Dîlan Edesa (Şükran Bozkurt), bi xwe ji Wanê ye. Hevaleke ciwan e û di 93'yan de tevlî partiyê dibe. Ji qadên gerîla diçe çalakiyê dike, li gelek cihan peywirê jî digire. Ew jî di pêvajoya komployê de, biryara çalakiyê dide. Li Edene, li hemberî qereqola polîsan, di mijdara 99'an de çalakiya xwe li dar dixe.

Hevala Rûken Bêrîtan (Hükmiye Seyman) heye. Bi xwe ji Nisebînê ye. Hevaleke kevn e, di 90'î de tevlî partiyê bûye. Li Rûsya tevlî partiyê bûye. Li wê derê jî, di qanûna 99'an de çalakiya xwe li dar dixe û dixwaze bi vî awayî li hemberî dijmin helwesta xwe raber bike. Lewra di komployê de, sextekariya Rûsya jî heye, pir vekirî ye. Ji ber vê li wir bersiveke wisa dide.

Hevala Esen Aslan heye. Hevaleke ciwan e û ne kadro ye. Bi eslê xwe ji Lîcê ye, li Qadîfeqeleya Îzmîrê dimîne. Di Tirmêha 2000'î de çalakiya xwe li dar dixe. Hem xwe weke şopdara hevala Rehşan dibîne, hem jî dixwaze ji komployê re bibe bersiv.

Dibe ku me bi çend hevalan da diyarkirin, lê şêst heval vê çalakiyê dikin û yek rih e. Hevalên xort jî pir in. Di vê pêvajoyê de yek hêz û yek rih derdikeve holê. Serokatî û tevgerê ew rih pênase jî kirin. Rihê ku Serokatî di Kurdistanê de çandiye natemire. Ew rih dibe agir, hêz, vîn, têkoşîn, reng û hewldan. Li hemberî dijmin jî her xwe isbat dike. Bi rastî jî rihê fedaîtî bi hevalê Mezlûm dest pê kir, bi hevala Zekiye Alkan dest pê kir. Bi çalakiya hevala Zîlan berdewam kir û heya roja me hat. Di

nava têkoşîna me de xeteke cuda derxist holê. Xeta li hemberî hemû êrîşên hêzên komploger serî natewîne, ew xet e. Ew rih e, ew seknandin e. Êdî rihê fedaîtî di PKK'ê de, ne textîk û şêwazeke hêsan e.

Rihê fedaîtî di PKK'ê de zanistek daye avakirin. Bûye zanist, bûye reng û bûye qarekter. Qarekterê ku serî natewîne û her li hemberî xwe û dijmin di nava têkoşînê de ye. Ew heya roja îro hatiye û wê her berdewam jî bike. Bi şêwazên cuda xwe dide der, li gorî pêwistiyan derdikeve holê. Lê ew rih avakirinê dide çêkirin, jiyana azad, şexsiyeta azad û civaka azad dide avakirin. Weke rih, dê her zindî be. Dibe ku îro bi vê şêwazê derketibe holê, dê sibê ew rih bi şêwazeke cuda derkeve holê. Li hemberî pergala dagirker û paşverû avakirinê pêş dixe, ew rih îro dendik û cewhera jiyana azad, jina azad û civaka azad e. Jixwe yên ku tevlî PKK dibin, li ser vî rihî dibin xwedî angaşt û têkoşîn dikin û vî rihî îro xwe bi civak jî kiriye. Em di şexsê hevalan de digirin dest, lê bi xwe re rihekî civakî jî derxistiye holê.

Ew dîtin û wisa encam derxistin girîng e. An na em bibêjin, pêwîst bû û wan hevalan çalakiyeke wisa darxistin û Serokatî jî mudaxale kir, ew mêzekirin xapandineke pir mezin e. Ew nêzikbûn dihêle ku ew rih baş neyê dîtin û xwe zindî nehêle. An na şêwazên çalakiyê me dan diyarkirin. Jixwe ne gengaz e ku şêwazên çalakiyê jî her weke hev bin. Vî rihî di nava PKK de, cewherek û çandek daye avakirin. Ew rih, rihekî ji bîrdozî û zanisyê derketiye holê. Di vê demê de, li hemberî hêzên komploger ew rih dayin raberkirin; hem di dîroka PKK'ê de, hem jî di dîroka tevgera jinê de xwedî maneyekê cuda ye. Ji ber vê em ew qesa dîroka xwe nîqaş dikin û hewl didin ku zindî bihêlin. Wate dayina vî rihî ji bo me pir girîng e, divê em li gorî wê nêz bibin.

**Kongreya Şeşemîn Ya PKK'ê Û Partîbûyina Jinê**

Piştî vê demê kongreya şeşemîn tê li darxistin. Piştî kongreya şeşemîn ya PKK, kongreya PJKK tê li darxistin. Ew kongreya duyemîn ya tevgera jinê ye, ya yekemîn di dema YAJK'ê de tê li darxistin. Kongreya PJKK, di adara 99'an de tê li darxistin. Di vê demê de, Serokatî perspektîfa partiyê dide tevgera jinê. Heya wê demê weke yekitî xwe rêxistin dikir. Lê di dema konferansa Rojhilata Navîn de, dema ku bîrdoziya jinê pênase dike, perspektîfa partiyê jî der dixe holê. Di vê demê de amadekariyên Serokatî yên avakirina partiya jinê hene. Lê şert û merc tên guhertin, komplo pêk tê. Jixwe Serokatî di pêvajoya Îmraliyê de, ji

bo tevgera jinê her dibêje projeya min ya nîvco maye. Lê her perspektîfên rêxistinkirina tevgera jinê jî dide. Partîbûyin jî, yek jî van perspektîfan e. Di nava tevgera jinê de partiyê ava dike. Partiya jinê e, partiya cins e.

Di cîhanê de modelên bi vî awayî derneketine holê. Di nava partiyan de tevger derketine, di nava tevgerên çep de baskên jinan derketine, modelên bi vî rengî hene. Lê di bin bîrdozî û zêhniyetekê de partî avakirin, di pêşengtiya Rêber Apo û tevgera me de, gaveke nû ye.

Serokatî di vê demê de, perspektîfa partiyê pir berfireh dide; dibêje divê jin weke saziyekê xwe rêxistin bike. Ji milê civakî, siyasî, aborî û parastinê ve digire dest. Partiyê pênase dike, partî di heman demê de nîşana hêzê e. Komek, derdorek xwe bi vî awayî îfade dike. Ji bo tevgera jinê jî, di rêxistinbûyin û vîna azad de xwe îfadekirin e. Serokatî di navbera tevgera jinê de tehlîla kesayet jî dike. Ew qarekter û kesayet, nasnameya îdeolojîk dernaxin holê, nasnameya takakesî pêş dixin. Ew jî li dijberî bîrdoziya jinê ye. Serokatî bi partiyê dixwaze nasnameya jinê ya bi rêxistinkirî derxe holê.

Di cîhanê de tevgerên femînîst jî xwe rêxistin kirine, di asta fedaîtî de jî têkoşîn dane meşandin, lê di vê derê de winda dikin. Heta berxwedanên wan pir mîsoger in jî, lê ji ber ku xwe rêxistin nekirine û bi rêxistinekê nasnameya xwe diyar nekirine bi ser neketine. Her rêxistin weke berdewamiya dewletê nirxandin e. Dibêjin “her rêxistin bi awayekî xwezayî, bi xwe re hiyerarşî û dewletê tîne”. Têkoşîna civakî jî ji bo xwe esas girtine, lê têkoşîna xwe negihandine nasnameyeke civakî. Nêzikbûna herî seqet û şaş ya femînîzmê ev e.

Bandora vê nêzikbûnê, di nava tevgera me de jî derdikeve holê. Mesela rêdkirina çort, bingeha xwe ji vê zêhniyetê digire. Serokatî her ji bo ku nasname û yekitiya tevgera jinê bide avakirin di nava hewldanan de ye, ji ber vê jî rêxistinbûna partiyê girîng dibîne. Lewra li ser esasê bîrdozî û bernameyekê tevdigere û têkoşîn dike. Heya wê demê rêziknameya YAJK’ê hebû. Piştî vê demê êdî programa partiyê çêdibe. Di programê de jî armanca xwe ya demdirêj datîne holê. Bi rêxistinî xwe îfade kirin, êdî weke pêwistiyeke lezgîn tê dîtin. Bi vî awayî hem ji demê re dibe bersiv, hem jî ji bo pêşerojê bingehek tê avakirin. Cara yekemîn weke modelekî jî partî derdikeve holê.

Ji derve û hundir ve, hem li hemberî bîrdoziya jinê, hem jî li hemberî partiya jinê, nêzikbûnên cuda derdikevin holê. Çawa ku li hemberî

artêşbûnê nêzikbûnên cuda derdikevin holê, di vir de jî weke wê hinek nêzikbûn derdikevin holê. Herî zêde ne fêmkirin çêdibe; lê Serokatî dixwaze îradeya jinê xwe bi awayekî rêxistinî îfade bike. Mesela li Dêrsîmê hêzeke jinê heye, ger ew hêz bi rêxistinî nebe, bi navend nebe, bi bingeh nebe; nikare xwe ji ferasetên wir xilas bike. Dîsa di qada civakî de, jin bi parçe bisekine, nikare civakîbûnê jî pêş bixe. Serokatî partî weke rêxistinbûna yekpare û giştî da îfade kirin. Bi taybetî armanc di têkoşîna bîrdozî de xwe îfade kirin e. Lê di mijarên din de jî, yekîtî çêkirin e. Bi rêxistinî xwe dayina îfadekirin e. Li ser bîrdoziya ku hatiye avakirin, avahiya jina azad û rêxistinbûna jina azad derxistina holê. Vê bi riya partiyê dike. Ew modelek e.

**Penç Rêgezên Partîbûyina Jinê**

Li ser vê esasê Serokatî pîvanên bingehîn datîne; da ku partî li ser hin rêgazan xebatên xwe bide meşandin û têkoşînê bike. Pênc rêgezên bingehîn datîne.

**-Welatparêzî**

Rêgeza yekemîn; rêgeza welatparêziyê ye. Çima welatparêzî, bi taybetî ji bo jinê welatparêzî çi îfade dike? Divê mirov bingeha wê baş tehlîl bike. Welatparêzî ji bo giştî civakê pêwîst e, lê ji bo jinê jî pir girîng e. Zêhniyeta pênc hezar sal ya deshilatdariyê, warê jinê nehiliştiyê. Ya ku xwedî war, di rastiya xwe de jin e, lê vê zêhniyetê jin bê war hiştiye. Di pêşengtiya jinê de xwecihî bûn û şoreşa gunditiyê dest pê dike, lê belê zêhniyeta pênc hezar salan pênaseyeke wisa ji jinê re hişt ku, bê war e. Lewra milkê mêr e, mêr ku bixwaze li wir e. Mesela zevî, erd aîdî mêr e. Cihê ku tu li ser jiyan dikî, ne aîdî te ye. Vê di jinê de jî mêzekirinek çêkiriye. Milk, war û cihê ku li ser tê jiyankirin; bi cinsêkî tê ziman.

Rihê welatparêzî, bi rastî jî her di cewhera jinê de heye. Cihê ku li ser jiyan dike, her diparêze. Lê bi îfadeyên cuda ew war aîdî jinê nayê dîtin. Ya ku di cewherê xwe de, hêrî zêde ji war û welat hez dike, jin e. Ew di xwezaya jinê de heye. Serokatî vê xwezayê dîsa zindî dike û ji jinê re dike weke taybetmendiyekê. Pîvana welatparêziyê ew e; xwe aîdî cihê ku lê jiyan dike dibîne, wir jî aîdî xwe dibîne.

Ji bo civaka Kurd, bi giştî bê welat hiştin heye, di nava civaka giştî de jî jin hatiye bê war hiştin. Kesên ku bi nêrîna bûrjûvaziya biçûk tev-

digerin, vê pênaseyê û rêgezê pir qlasîk dibînin. Lê ji bo me rêgezeke herî esas e. Lewra pêwîst e, em erdnigariya ku li ser jiyan dikin hez bikin. Ji ber vê jî Serokatî, pîvana welatparêziyê weke rêgezeke tevgera jinê datîne holê.

**Azadî**

Rêgeza duyemîn; rêgeza fikra azad û vîna azad e. Ew jî bi hebûn û xwebûnê ve pir girêdayî ye. Ger mirovek azad nefikire, nikare li cihê ku jiyan dike azad jî bimîne. Bi taybetî ji bo jinê, ew girîng e. Lewra ji bo jinê fikrandin jî hatiye sînordar kirin. Ger fikrandinek hebe jî, divê di nava mêjiyê wê de bimîne, dernekeve derve, nebe vîn. Heta li şûna jinê mêr difkire. Yanî mafê fikrandinê jî, ji jinê re nahêlin. Lewra jin tenê kole ye, divê kole bimîne. Ew bi zêhniyeta pênc hezar sal ve girêdayî ye. Bi giştî civakên bindest wisa hatine hiştin, lê bi taybetî jin, ew weke pîvanekê derketiye holê.

Rêgeza fikrandina azad; şikandina şîfre (kodlama), feraset û qalibên heyî ye. Serokatî ji vê re dibêje azad fikrandin û vîna azad derxistina holê. Yanî tenê azad fikrandin têrê nake, divê tu tiştê ku difikirê bi vîn bikî. Vê îradê jî bi rêxistinbûnê û partîbûyinê dide diyarkirin. Hem vîna şexsî derdixe holê, hem jî vîna cinsî û civakî.

**Rêxistinbûn**

Rêgeza seyemîn; rêgeza parvekirina jiyanê li ser esasê azadiyê û rêgeza rêxistinbûnê. Pîvana parvekirin û rêxistinbûnê jî ji bo me dibe pîvanek jiyanê. Mesela dema ku tu bifikirê û parve nekî, tu ezez dimînî. Serokatî vê jî wisa pênase dike. Ger tu bifikirî, tiştekî derxî holê; lê parve nekî ezezîperestiye. Dema ku jiyankirinên xwe, parve neke jî ezeztiye. Dema ku rihê parvekirinê derneke holê, ew kes nayê kolektîvîzmê jî. Nayê civakbûnê. Tenê dimîne, takekesî dertê pêş. Di pîvanên bîrdoziya jinê de, ji bo ku tu fikrên xwe, jiyana xwe civakî bikî; divê tu parve bikî.

Ew qarektereke PKK ya giştî ye. Rihê hevaltiyê ji vir tê. Cihê ku lê rihê hevaltiyê tune be, li wir ezeztî heye, kolektîvîzm tune. Rihê hevaltiyê bi parvekirinê ve yek e. Dema ku em dibêjin hevaltî; tu danehevên xwe, fikrên xwe, berhemên xwe parve dikî. Ji ber vê parvekirin bi xwe re rêxistinê tîne. Ew pîvan niha jî ji bo me derbasdar e. Dibe ku şert û merc hatibin guhertin, lê armanca me diyar e. Em pîvana rêhevaltiyê, kolektîvîzmê û parvakirinê; ji bo xwe weke rêgezeke esasî digirin dest.

Serokatî pîvana bingeha bîrdoziya jinê di vê mijarê de datîne holê. Lewra pergalê di vê mijarê de parçebûyinek di nava civakê de daye avakirin. Di nava jinê de parçebûyineke wisa daye avakirin ku tarîfa wê pir zehmet e. Serokatî dibêje, "jinê parçe dike û her parçeyekî wê cuda difroşe. Giyan parçekirin e, rih parçekirin e". Di malê de dayik cuda tê destgirtin, xûçk cuda tê dest girtin. Parçekirin ew qesa kûr e ku tenê bi rihê hevaltiyê jin dikare hebûna xwe diyar bike. Bi pêkanîna vê rêgezê jin dikare hebûna xwe diyar bike.

**Têkoşîn**

Rêgeza çaremîn; li gel rêxistinbûnê, rêgeza têkoşînê ye. Ew jî girîng e. Yanî tu rêxistinbûnekê didê avakirin, parvekirinê çêdikî; ew jî li ser esasê têkoşînkirinê tê pêşxistin. Di vê rêxistin û parvekirinê de, tu her tiştî nagirî nava xwe,  tu pîvana têkoşînê esas digirî. Mesela bi yên ku jiyanê xirab bike, yên ku neyên jiyana azad, yên ku têkiliyên şaş ava bikin; bi yên ku êrîşî jiyanê bikin re jî divê tu têkoşîn bidî meşandin. Lewra pêwîst e tu ew rihê xwe yê yekpare biparêzî. Pîvana têkoşînê jî Serokatî her wisa digire dest.

**Estetîk**

Rêgeza pêncemîn; rêgeza jiyana xweşik û estetîk e. Têkiliya jiyanê, bi xweşikbûn û estetîkbûyinê re datîne holê. Bi rastî jî ew her pênc rêgez jî di bernameya jineolojiyê de hene. Ew pîvan jî, li ser esasê xweşikbûyinê ye. Tiştê ku tu ava dikî, divê tu hêza wê ya xweşikbûyinê jî bibînî. An jî vê ava bikî. Li ser vê prensîbê tu li jiyanê mêze dikî. Ew bi xwe xweşikbûyina jiyan, kesayet û civakê ye. Ew, nêrîna te û tercîha te datîne holê. Di nava pergalê de tu ji her tiştî re nabêjî erê. Em carina civakbûnê şaş fêm dikin.

Bi taybetî bi pêvajoya nû re, carina em wisa mêze dikin. Dema ku em pîvanên xweşikbûyinê û demokrasiyê digirin dest; em hilbijêr nêz nabin. Pîvana xweşikbûyinê, mijara hilbêjêriyê datîne pêşiya te. Li ser esasê nêrînekê û aramancekê pîvana xweşikbûyinê datînê holê. Hem di nêrîna derdora xwe de, hem jî di nêrîna xwe û berhemên xwe de tu li ser hinek pîvan û tercîhan tevdigerî. Mesela me PKK û ew têkoşîn tercîh kir û em tevlê bûn. Lê em carina pîvana estetîk û xweşikbûyinê şelo dikin. Em tenê ji milê şêweyî ve nagirin dest; ji milê fikir de jî wisa ye. Fikira ne xweşik, jiyana me xirab dike. Rêxistinbûna şaş jiyana me xirab

dike. Em wisa nafikirin. Em dibêjin civakbûyin e, ew jî rengek e, bila ew jî hebe. Ew ne rengekî xwezayî ye ku hatiye avakirin. Yanî hemû rengên ku hatine înşakirin, pîvanên xweşikbûyinê dernaxin holê.

Mesela kesayetiya ku pergal di jinê de dide avakirin, em vê red dikin; lê pergal li gorî bîrdoziya xwe vê weke estetîk dinirxîne. Li gorî bîrdoziya xwe seknandineke mêr û jinê datîne holê. Em vê seknandinê napejirînin, xweşik nabînin. Yanî em li ser pîvanên paradîgmatîk, xweşikbûn û estetîkê qebûl dikin. Xweşikbûyina ku derdikeve holê, ger li ser esasê bîrdoziya me be, ew estetîk û xweşik e. Di vê mijarê de jî, pir şelebûyin heye. Em dibêjin, em şêweyekî û xweşikbûyinekê derxin holê.

Mesela di nêrîna me ya çand û huner de em li gorî pîvanên xwe tevnagerin. An bandora modernîteya kapîtalîst li ser e, an jî bandora tiştekî din li ser e. Ji ber vê jî, li gorî cewhera ku em dixwazin, em berheman dernaxin. Tiştê ku em derdixin, carina me îfade nake. Di paradîgmaya me de, hemû tişt xwedî xweşikbûyinekê ye. Şerkirin jî wisa ye. Pîvaneke wê ya xweşikbûyinê heye. Eger derkeve derveyî wê pîvanê xweşik nabe. Ji ber ku herî zêde di vê mijarê de xirabûyin çêbûye, Serokatî herî zêde li ser vê rêgezê disekine. Pergal gelek tişan, wisa ji cewhera wî derdixe, xweşik dike û dide pêşiya te ku, bêyî ku tu bikevî ferqê, tu wê tercîh dikî. Bi vî awayî tu dikevî bin bandora pergalê. Ji ber vê pîvana xweşikbûyin û estetîkê li ser esasê bîrdozî û têkoşîna xwe em digirin dest. An na rengê te dernakeve holê. Rengê têkoşîna te, xweşikbûyina te dide diyarkirin. Ew bi cewher kirin jî, bi têkoşîna te ve girêdayî ye. Ew jî rêgeza pêncemîn e. Serokatî van pênc rêgezan ji bo partîbûyina jinê datîne holê.

### Avakirina PJKK Û Nêzikatiyên Şaş

Di vê demê de, bi navê PJKK (Partiya Jinên Karkarên Kurdistan) partî tê avakirin. Partî ji xwe re projeyên stratejîk datîne holê. Yek ji van projeyan projeya jiyana azad e. Dîsa projeyek teoriya qutbûnê ye. Projeyek jî projeya guhertina mêr e. Yek jî projeya hevpeymana civakî ye. Ew her çar proje, bi awayekî startejîk dibin hedefa kongreya PJKK. Kongre li ser esasê van rêgez û projeyan kongre bi dawî dike. Berî vê kongreyê jî danehevên kongreya şeşemîn ya PKK hene.

Rêveberî û konseya PKK yên vê demê, dest datînin ser belgeyên kongreya PJKK. Nêzî çil rojan delegeyên kongre hemû di dolekê de

dimîne. Lewra biryarên ku kongreyê stendine, tevgera jin dixwaze giştî bike. Lê rêveberiya PKK jî, dibêje divê ji erêkirina me re derbas bibe. Heya vê demê, Serokatî erê dikir. Lê piştî ku Serokatî dîl dikeve, konsey dibêje pêwîst e, em erê bikin. Delegeyên kongre jî bi awayekî giştî, vê nêzîkbûnê napejirînin. Li ser vê, konsey dest datîne ser belgeyên kongreyê. Hevalên jin li hemberî vê bertekên xwe raber dikin. Weke nêzikbûneke deshilatdariya mêr tê dîtin. Li ser vê jî, konseya vê demê (piraniya wan reviyan e), avahî û rêveberiya kongreyê bi giştî dixe lêpirsîn û platformê. Şeş roj platform berdewam dike.

Donzdeh hevalên jin (çend heb ji wan reviyan e) platforma wan çêdibe. Hemû hevalên delege jî tevlî platformê dibin. Piştî platformê jî, hevalên jin dest bi hewldana xwe bernadin. Nêzikatiyên mêr qebûl nakin. Rêvebirên vê demê mêze dikin ku nikarin bibin çare, dibe ku şaşitiya xwe jî hesiyabin; di bin navê tasfiyetiya hestiyarî de, vê pêvajoyê dinirxînin. Wisa pênase dikin, platformên hevalan çêdikin û vesaziya hemû hevalan dikin û li qadan belav dikin. Ew weke pêvajoyekê bandora xwe li ser qadan dike. Ew coş û kelecana kongreyê namîne. Atmosfereke neyînî derdikeve holê. Ragihandina kongreyê baş nayê çêkirin.

Ew qesa perspektîfên ku Serokatî dane pêşiya kongreyê, jiyanî nabin. Tên diyarkirin, lê bi rihê kongreyê pratîk û têkoşîn nayê kirin. Veguhestin nîvço dimîne. Jixwe li gelek qadan qet nayê kirin. Heya vê demê Serokatî bi xwe hewldana rêxistinbûn û azadiya jinê pêk dianî. Lê êdî di nêzikbûnên hevalên xort de, bi xwe ve girêdan heye. Dibêjin “heya niha Serokatî dikir, hevalên jin bi serê xwe nikarin bikin”. Dibêjin “em ê perspektîf bidin we, em ê bibêjin, hûn ê bikin”. Nêzikbûnên bi vî rengî, êdî di navendê de, di qadan de derdikevin holê. Bi rastî jî ew jî jin û zêhniyeta wê biçûk dîtin e. Xwe ji zêhniyeta zayendperestiya civakî xilas nekirin e. Bi rastî jî Serokatî jî wisa mêzekirin e. Serokatî di şexsê xwe de, ew mêrtiya qlasîk kuştiye; lê ew nêzikbûn Serokatî weke mêrekî qlasîk digirin dest.

Di şexsê Ferhat de, ew nêzikbûn pir vekirî derdikeve holê. Ji ber ku reviyaye em nabêjin. Ji ber ku birayê Serokatiyê ye, wê jî ji xwe re weke avantaj dibîne û bi kar tîne. Di van pêkanînan de, yê ku hêrî zêde hevalên jin biçûk dibîne û vîna wê dişkîne Ferhat û ekîba ku li derdora wî hatiye avakirin e. Lê bi vî awayî dibe nêzikbûna rêveberiya wê demê ya giştî. Pişt re dema ku agahdariya vê ji Serokatî re hate kirin, Serokatî li

hemberî van nêzikbûnan helwest danî. Hem helwest li hemberî tevgera jin ya wê demê danî, hem jî li hemberî nêzikbûnên mêr yên qlasîk danî. Serokatî ew nêzikbûn mahkûm kir.

Piştî vê demê, di nava rêveberiya jinê de jî, seknandinên bi parçe derdikevin holê. Êdî mêylên cuda derdikevin holê. Li gorî çînan nêzikbûn çêdibe. Bi taybetî piştî kongreya duyemîn ya jinê, derdoreke jin; xwe ji aliyê mêr ve weke alîgir dide nîşan dan. Di şexsê Hêlîn, Sakîne, Dilar de ew nêzikbûn derdikeve holê. Dîsa li dora Sewra û Peyman nêzikbûneke cuda derdikeve holê. Em nav didin, lê em weke nêzikbûn û feraset digirin dest. Lewra ew nêzikbûn xwe giştî dikin. Di seknandina kadro de, yên ku bi van seknandinan re dibin yek û yên ku bingeh ava dikin hene. Di cewherê xwe de, li hemberî xeta Serokatiyê di nava rêveberiya jinê de; seknandineke wisa parçe derdikeve holê. Ew pratîk mohra xwe li pêvajoyê dixe. Ew jî vala derxistina Serokatî ye.

Di vê demê de, êdî di nava rêveberiya jinê de jî nakokî derdikevin. Êdî bi yek fikrê, bi yek mêzekirinê îfade nayê kirin. Ew parçebûyin; bandora xwe li ser têkoşînê jî dike, avahiya hevalan jî dike. Ji ber vê yekê Serokatî dahûrandina rêxistinbûyin û yekîtiya tevgera jinê dikir. Derket holê ku di rêveberiya jin de, êdî li ser esasê vîna jinê xwe rêxistinkirin û pratîka vê derxistina holê çênabe. Ji ber ku di zêhniyetê de parçebûyin heye, nêzikbûn jî bi parçe derdikevin holê.

Nêzikbûna bi parçe wisa derdikeve holê; bi têkoşîna îdeolojîk û rêxistinî tevgerînê zêdetir; bingeha xwe ji redkirina çort (kaba) digire. Yanî zêdetir ji meşandina têkoşînê li hemberî nêzikatiya mêr, bi awayekî îdeolojîk guhertina mêr esas girtinê, bi awayekî çort tê red kirin. Ew weke şêwazeke têkoşînê derdikeve holê. Nêzikatiyeke din jî, bi aweyêkî bi mêr re ketina nava îtifaqê derdikeve. Jixwe di pratîka 2003-2004’an de ew tam eşkere dibe. Gelekên wan bi tasfiyekaran re reviyan. Yanî pejirandina wê zêhniyetê û bandora wê di nava tevgera jinê de jî êdî derdikeve holê. Di vê demê de, bi mêr re ketina îtifaqê, heman nêzikbûn parvekirin û di nava avahiya jin de belavkirina vê nêzikbûnê; bi pêş dikeve. Ya rast Serokatî wê îtifaqê bi demên kevn ve girê dide, lê di vê demê de jî bi awayekî şênber pêş dikeve.

Ew nêzikbûn, nêzikbûna din jî tahrîk dike. Di nêzikbûna din de jî, cihê ku li ser esasê rêxistinkirin û zanekirina avahiya jinê têkoşîn bide meşandin, hemû tişt redkirin û hêza jinê ya îdeolojîk dernexistina holê

çêdibe. Cihê ku aliyê din jî bikişîne û pê re têkoşîneke îdeolojîk bide meşandin, wan oteleme dikin û xwe esas digirin.

Ew du nêzikbûn, heya pêvajoya tasfiyeyê, berdewam dikin. Her ku diçe di nava tevgera jinê de, parçebûyin û belavbûyinê derdixe holê. Bandora tasfiyeyê, bi giştî di nava tevgerê de texrîbat dan avakirin, lê di nava tevgera jin de jî, ji ber ku li gorî perspektîfa Serokatiyê tevgerîn çênebû, ew nêzikbûna bi parçe û pevçûnên nêzikbûnan; tevgera jin paş ve kişand. Xwe nikarî ji bandora tasfiyeyê xilas bike. Kongreyên ku pişt re çêbûne jî ew tehlîl kirin; gotin "jin bû zemîna tasfiye û tasfiyekeran". Ji ber van nêzikbûnan, bû zemîn. Li hemberî tasfiyeyê, nikarî têkoşînekê bike.

Ger ew nêzikbûn di nava tevgera jinê de tunebûya, li hemberî tasfiyeyê dê helwesteke xurtir derbiketa. Lewra di vê demê de, hêza jinê pir mezin e. Ferhat bi xwe jî dibêje, jin hezeke pir mezin e; kî vê hêzê bigire pişt xwe, ew bi ser dikeve. Ji ber vê jî êrîşên rêvebirên vê demê, li ser esasê parçekirina vê hêze ye. Hemûyan nikare bigire gel xwe, lê milekî digire aliyê xwe û aliyê din jî bê bandor dike. Bi awayekî xwezayî ew hêz, li hemberî wî nabe alternatîf. Nabe hêzeke ku zêhniyet û ferasetan hilweşîne. Piştî civîna di tirmehê de, bi xwe vê îtîraf dikin. Jixwe êdî dikin birevin. Dibêjin "me bi konseptekê kir; jin êdî bibû îrade, ji me derbas dikir; me jî ji ber vê parçebûn da avakirin û hinek cezakirin (yaptırım) dan çêkirin. Ji vê re jî zemîn tê vekirin.

Dema ku em dibêjin bûyina zemîn; tu dibêjî qey em tiştekî pir hêsan vedibêjin. Tu dibêjî qey tasfiyeger ew in, para me pir hindik e. Carina em wisa mêze dikin. Yanî li cihekî zemîn tune be, ew tiştên din jî pêş nakevin. Mesela tu li cihekî darekê diçînî, ger li wê derê zemîn tune be, ew dar şîn nabe. Dema ku em dibêjin em bûne zemîn, em bi hêsanî dibêjin û wisa sivik dimîne. Di cewherê xwe de, ji vê ferasetê re zemîn vekirin, ji vê ferasetê xiraptir e. Serokatî ew yek bi feraseta me ya koletiyê ve girt dest. Got "**we xwe ji zêhniyeta deshilatdar qut nekiriye**". Lê me wisa pênase kir û derbas bûn.

Li hemberî van ferasetan bêdeng mayina me, mudaxale nekirina me, heta piştgirî dayina me; di komploya navnetewî da jî hişt ku hêviyeke din bide hêzên komploger. Jixwe hedefa komplogeran, piştî dîlgirtina Serokatî, parçekirin û belavkirina partiyê bû. Ji vî tiştî re zemîn dayin, bi awayekî objektîf xizmetî hedefa dijmin kirin e. Bûyina şîrikê

wê ferasetê ye. Ji ber vê Serokatî dibêje, “hevaltiya kêm”. Bingeha xwe ji wir digire.

Dema ku em van pêvajoyan pênase dikin û dikin mijara perwerdeyên xwe; di vê derê de para me çibû û em ê ji îro û pê ve çi bikin? Pêwîst e, em di vir de lêpirsîna xwe bikin. An na pêwîst nake ku em weke ders jî bibînin. Em ê bibêjin, hat jiyankirin û derbas bû. Di demê de rola xwe nelîstin, bû sedema çi? Bû sedem ku em di demê de gav neavêjin, bû sedem ku em di demê de hêzên komploger vala dernexin. Misyonên dîrokî di vê demê vala hate derxistin. Lewra di vê demê de PKK xwediyê misyoneke dîrokî bû. Ev pêvajoyên girîng in. Bi taybetî hewldan û helwestên ku hatine diyarkirin, pêwîst e em rast pênase bikin û bibînin.

Di vê demê de, atmosfera ku hem di kongreya şeşemîn ya PKK de û hem jî di kongreya duyemîn ya tevgera jinê de çêbû; bi xwe re şelobûyinek çêkir. Vê yekê di kadro de, rihekî bi bendewarî ava kir. Di wî rihê bi eşq nêrîna kar de, lewazbûn çêbû.

Ew feraset û nêzikbûnên cuda ku di tevgera jinê de derdikevin holê, bi pêvajoyê re bandorên wê derdikevin holê. Di encama vê de mêzekirinek wisa derdikeve holê; yek, mêr weke hêz tê dîtin û mêzekirin û beşdarbûneke bi vî awayî derdikeve holê. Mêzekirin û hewldanên mêr hemû rast tên dîtin. Êdî li gorî hêza mêr xwe arestekirin heye. Dîsa di vê demê de, êdî nêzikbûnên doxtor Silêman wan jî hene. Bi van re nêzikbûneke hevbeş dayina avakirin û koalîsyon çêkirin. Di şexsê Sakîne wan de, rayeya ku ji partiyê digirin, dikin xizmetê vê koalîsyonê. Ew jî di jiyanê de tê eşkere kirin.

Xeynî van nêzikbûnan, ji van nêzikbûnan dûr nêzikbûneke din jî heye; ew jî sekna şexsî û bîreysel e. Têkoşîna xwe bîreysel dike û bîreysel disekine. Nêzikbûna tasfiyegeran dibîne û dibêje, “ez bi vê tasfiyeyê re nabim yek, lê ez mêr jî hêz nabînim. Lê ez ê bîreysel têkoşîn bikim”. Niha jî bandorên van tiştan hene. Ji ber vê jî Serokatî, pîvana têkoşîna rêxistinî da.

Li gel hemû nêzikbûnan, nêzikbûna pasîf û bêbandor sekinîn jî heye. Ew her çar sekinandin, di vê demê de bandora xwe li ser tevgerê giştî dike. Ew bi xwe re lêgerîn û têkiliyên cuda tîne. Navend û derdora navendê van tiştan jiyan dike, lê qadên din gelek tişt hene. Ji Bakur bigire, heya qadên zindanan û Ewropa; hemû di nava meraq û ben-

dewariyê de ne. Dibêjin “gelo dê çi bibe, Serokatî dê bibêje çi?” Tabî di wê demê de hêzên gerîla jî hê paşve nehatina kişandin.

Di dema kongreya şeşemîn de, komplo tê li darxistin û bandora tasfiyeyê li ser kongreyê zêde ye. Ji ber vê Serokatî piştî pêvajoya Îmraliyê, perspektîfa kongreyeke awarte da. Lewra Serokatî dixwest, guhertinên bingehîn pêk bîne. Bi rastî jî di kongreya şeşemîn de, dixwest van guhertinan çêbike, lê çênebû. Serokatî ji bo kongreya şeşemîn dibêje, “we ez dam aliyekî û hûn bi hev ketin”. Ji ber vê kongreya şeşemîn pir bi mane nabîne. Rojeva kongreya şeşemîn ne ew bû. Serokatî digot, “bila ji nû ve rêxistinbûn dest pê bike, divê guhertinên esasî bibin”. Perspektîf ew bû. Lê ferasetên tasfiyeyê di kogreyê de dibin rojev.

Jixwe di vê demê de Serokatî pişt ve kişandina qewetên leşkerî dide. Perspektîfa paşve kişandina hêzên gerîla ji Bakur dide. Heya wê demê bi hezaran heval li Bakur in. Ji Amanosan heya Amed û Amanosê, qewet heye. Bi vî awayî Serokatî pêvajoyeke nû dide destpêkirin. Tabî ew pêvajoyê nû jî xwediyê wateyekê ye, nirxandin li ser pir hatin kirin, me ew pêvajo çiqesa pêk anî, ew jî di dîroka partiyê de derket holê. Heya ku ew pêvajo hat pêkanîn, gelek nêzikatiyên şaş derketin. Mesela rast nexwendina vî pêvajoyî çêbû. Ji derve jî, êrîş û mudaxale hene.

Weke ku Serokatî radest bûye û daxwazên dijmin pêk tîne hat nirxandin. Bi taybetî ji milê van derdorên nijadperest ve, ew tişt kirin rojevê. Atmosfer û propagandayeke wisa li Kurdistanê pêş xistin. Bandor û teyisîna van ferasetan, li hinek cihan li ser partiyê jî çêbûn. Li hinek cihan li dijî partiyê derketin çêbû. Talîmatên Serokatî, di demê de pêk nehatin. Di hinek herêman de, di demê wê de paşve kişandin çênebû û windahiyên ne di cih de hatin dayin. Bi sedan heval şehîd ketin. Hemû hevalên xwedî danehev bûn. Ji milekî ve, pêvajoyê û Serokatî ne bawerkirin heye; ji milê din ve jî, xwe hema wisa bê tewdîr berdan heye. Bi rastî jî her du jî xafil nêzbûn e. Ew nêzikbûn û sekinandin hişt ku di mêjiyan de tevlîhevî çêbibin û windahî bên dayin. Heya ku paraznameya AÎHM’ê hat jî, mejî tam zelal nebûn. Ew mijar jî dide diyarkirin ku, em qet Serokatî di cih de fêm nakin. Şert û mercên di kêliyê de, çiqesa li ser me bandor dikin ew nîşan da.

Dema ku paşvekişandin çêbû, qeweteke kêm di hemû qadan de ma. Êdî ji bo Tevgerê, Serokatî pêvajoya nû dida destpêkirin. Ji aliyekî ve Serokatî qewet paşve dikişand, ji aliyekî ve jî amedakariyên kongreyê dikirin. Heya dawiya 99’an pêvajoya paşve kişandinê tê kirin û amadekariyên kongreya heftemîn tê kirin.

**Di Kongreya Heftemîn Ya PKK'ê De Jin**

Perspektîfa kongreya heftemîn; hem tiştên ku kongreya şeşemîn nekirine pêk anîn, hem jî xeta guhertina paradîgmatîk diyarkirin bû. Serokatî di perspektîfa xwe de dibêje, pêwîst e navê PKK bê guhertin. Divê mîrasê ku PKK ava kiriye, bi navêkî din bê rêxistin kirin. Dîsa bi guhertina navê PKK, li gorî paradîgmayê di praogramê de guhertinên nû dide çêkirin.

Heya vê çaxê, PKK'ê xwe li ser nêrînên Marksîst-Lenînîst rêxisin kiribû. Lê Serokatî perspektîfa guhertina vê dide. Bi rastî jî berê, Serokatî amadekariyên vê dikirin, lê me fêm nedikir. Di rapora polîtîk ya kongreya çaremîn û pêncemîn de ew tişt hene. Kongreya heftemîn di dawiya 99'an de hat pêkanîn. Li gorî vê guhertinê di têkoşîn û rêxistinbûnê de jî guhertin dan çêkirin. Lê derket holê ku em ji vî tiştî re ne amade bûne. Navê PKK'ê xistina nîqaşê jî me weke sûç da diyarkirin. Ne zêhniyeta me ne jî rihê me amade bû. Ne rêveberî, ne avahiya hevalan û ne jî gel me amade kiribû. Ne amadebûna me bi awayekî objektîf, gav avêtina Serokatî paşve xist. Serokatî di demê de gav diavêt, lê me di demê de pêk nedianî.

Mesela me navê PKK'ê neguhert. Me biguherta jî ne diyar bû ku, em ê çawa nêz bibûna. Ya din jî, ji guhertina bernameyê re jî em ne amade bûn. Bandora rêl Sosyalîzmê di mêjiyên me de dogmayên wisa dabûn avakirin ku bênîqaş bûn. Bandora ku li ser me çêkiriye, nîqaş nehat kirin. Me qet nexist rojeva xwe jî, lewra lêhûrbûn û amadekariyên me ne li ser vê bûn. Ya seyemîn jî, divê li gorî vê di rêxistinbûnê de guhertin bihatana çêkirin, lê ew jî nebû. Rojeva kongreya heftemîn bi giştî ew bû. Rojevên ku di kongreyê de hatin avakirin weke xwesteka Serokatî pêş neketin. Di vê demê de hesabên her kesî jî li ser kongreyê hebûn. Ji ber ku Serokatî hatiye girtin, hêviya dijmin jî hebû.

Di kongreya heftemîn de, dengeyên cuda hebûn. Mesela nêrîna doxtor Silêman wan cuda bû. Mêzekirina Ferhat wan cuda bû. Ew hemû kom bûn. Hemû kadrobûn û di nava partiyê de bûn, lê mêzekirin û ferasetên wan cuda bûn. Dîsa nêrîna Nasir wan cuda bû. Mesela Ferhat û Botan stratejiya Serokatî şaş didîtin, ew di kongreyê de jî vekirî gotin. Botan, di staretejiya şer de got; proplema me ne Serokatiya textîkî de ye, di Serokatiya stratejîk de ye. Yanî rasterast, dibêje "ger em bi ser neketibin sedem Serokatî ye.  Ji ber vê jî divê em guhertinê di vir de bidin çêkirin". Jixwe di kongreyên kongreya gel de, ew tişt zêdetir

vekirî anîn ziman. Lê di delegeyên kongreyê de, xwendina vî tiştî û li hember helwest danîn jî tunebû. Hevalê Erdal, nêrînek da diyarkirin, li hember gelek bertek derketin.

Bi piranî di hevalan de, fikara (kaygı-endişe) “em kongreyê biparêzin, bila tevger belav nebe hebû”. Ew jî mêzekirinek bû û di gelek hevalên jin û xort de dihat jiyan kirin. Ew mêzekirin jî, dihêlişt ku bi awayekî mîsoger neçin ser ferasetên şaş, tirsekê derdixe holê.

Bi rastî jî tiştên ku Serokatî dibêje, bi têkoşînê dihatin pêk anîn. Ger li hemberî nêzikatiyên şaş, helwesteke kongreyê hebûya, dibe ku pêvajoya di pêy we re jî dê cuda bibûya. Ji ber vê Serokatî dibêje, “di dîroka PKK’ê de em ne neçar bûn ku hinek tiştan jiyan bikin”. Me têkoşîneke teqez nekir, an jî em li gorî xwe nêz bûn, ji ber vê şaşitî hatin jiyankirin. Ne qederek bû. Ger di vê kongreyê de pêşiya hinek tiştan bihata girtin, dê pêşeroj cudatir bibûya. Ji ber vê jî, niha dema ku em weke kadroyên rêxistinê em rexnedayina xwe didin, em rexnedayineke giştî didin. Lewra şaş nêzikbûneke giştî hebû.

Di kongreya heftemîn de, hejmara hevalên jin jî pir e. Ji aliyê hejmarê ve, herî zêde hevalên jin di vê kongreyê de cih girtiye. Ji hemû cih û qadên welat heval hatibûn. Bi awayekî fermî 400 delege hebû, lê 600 hevalî zêdatir tevlî bibû. Bi awayekî fermî, 110 hevalên jin hebûn. Hevalên jin ji bandora kongreya duyemîn ya jinê derketibûn. Sekna hevalên jin di kongreyê de belave bû. Tehlîlkirina van nêzikbûnên şaş û li hember têkoşîn kirinê zêdetir, belavbûyinek hebû.

Di kongereyê de hinek biryar hatin stendin. Helwesta hevalên jin, li dijî van biryaran bû. Mesela wekeleta Serokatî girtin, di vê kongreyê de bû biryar. Bi hinceta ku Serokatî di hundir de ye, nikare rola xwe bilîze; tenê konsey dikare rista wî bilîze û hebûna wî jî manewî dibe. Ew bû biryar. Dîsa rêxistina jinê heya niha bi Serokatî ve girêdayî bû, divê êdî bi meclisa partiyê ve girêdayî be. Hemû vesazî û peywirên wê êdî navenda PKK bike. Biryareke wisa jî derket. Hevalên jin van her du biryaran jî qebûl nakin, beşdarî van biryaran nabin, lê bi giştî reyan dibe biryar. Piştî vê hevalên jin ji kongreyê derdikevin û van biryaran protesto dikin. Hevalên jin hemû porên xwe jê dikin. Çend kes ne tê de, hemû helwesteke wisa datînîn holê.

Di hilbijartina rêveberiyê de jî, hem hevalên di hundir de mane, hem jî hevalên li derve tên pêşniyar kirin; lê ew heval xwe şûnve dikişînin. Tenê yek du xwe şûnve nakşînin. Bi van helwestan jî kongre bi

dawî bû. Rûxmî ku hevalên jin xwe şûnve kişandin jî, ne biryar hatin guhertin, ne jî atmosfera kongreyê hate guhertin. Hinceteke hevalên jin bertek nîşan didin jî, neguhertina navê PKK'ê ye. Lê her du sedemên din zêdetir bi bandor in.

Piştî kongreyê ew nozdeh hevalên ku xwe şûnve dikişînin dikevin lêpirsînê. Hinek ji wan hevalan, niha şehîd ketine, hinekên wan hê jî hene, hinek jî reviyane. Ew nozdeh kes salekê girtî dimînin. Hinek çil rojan dimînin, hinek çend mehan dimînin, hinek jî salekê dimînin. Ew tevgera jinê kişandina xeta xwe ye. Jixwe ew hevalên ku hatine pêşniyar kirin û xwe şûnve kişandine, bi piranî endamên YAJK'ê ne. Ew hemû dikevin lêpirsînê. Di şexsê wan de rotasyon dayina tevgera jine heye. Ew bi vî awayî hate pênasekirin. Ew mijar heya demekê ji Serokatî re nehatin gotin. Bi giştî encamên kongreyê gihêştin Serokatî, lê ew biryar û bertek nehatin agahdar kirin. Piştî demekê bi Serokatî re hat gotin, lê Serokatî pir eciz bû. Ji parêzerên xwe re got, "hûn di demê de min agahdar nakin". Ger di demê de ji Serokatî re agahî çûbûya, dê Serokatî çareseriya rast jî danîbûya holê.

Ew pêvajoya rotasyonê, ji bo jinê dibe demeke cuda. Li gelek cihan êdî hevalên jin dikevin lêpirsînê, rastî mudaxaleyên bi vî awayî tên.

Piştî ku ew biryara tevgera jinê bi meclisa PKK ve bê girêdan, ji Serokatî re tê gotin; Serokatî dibêje, bila hevalên xort mudaxaleyî tu tiştekî hevalên jin nekin. Divê di derbarê xwe de, hemû biryaran bi xwe bistînin. Jixwe di perspektîfa Serokatî ya ku ji kongreya seyemîn ya jinê re şandiye de ew tişt hene. Dibêje bila kes dest wernede vîna jinê. Bila her tiştî xwe bi xwe bikin. Jixwe li ser vê têkoşînek pêş ket. Niha ew yek weke prensîbekê di nava giştî tevgerê de rûniştiye.

### Kongreya Seyemîn Ya Jinê û Avakirina PJA'yê

Di vê demê de, kongreya PJA'yê ya seyemîn tê li darxistin. Ew kongre di navbera 29'ê tirmêhê û 21'ê tebaxê de pêk tê. Di sala 2000'î de ye. Di vê kongreyê de navê PJA tê guhertin. Serokatî di vê konferansê de perspektîfa gerdûnbûyinê m(evrenselleşme) dişîne, ji ber vê yekê jî peyva Kurdistanê û peyva karkeriyê jê derdixe. Peyva azadiyê dixe navê. PJKK, dibe PJA (Partiya Jinên Azad). Di kongreyê de, biryara li her çar parçeyên Kurdistanê sazîkirina partiyê tê danîn. Li ser esasê perspektîfên paradîgmaya nû, guhertin û sazîbûn tên kirin. Bi taybetî li

ser esasê bîrdoziya jinê, honandin û pêş xistina têkoşîn û jiyanê tê esas girtin. Biryara vê tê stendin. Ew armancên pêşerojê ne.

Tabî ew kongre piştî kongreya heftemîn ya PKK tê darxistin. Ew pirsgirêkên ku di kongreya PKK de derketibûn, kongreya PJA ji nû ve digire dest. Ji ber vê jî pêvajoyeke nû dest pê dike. Bi giştî mêzekirinên civakî û zayendperest nanirxîne, nake rojeva xwe. Lewra hema piştî kongreyê dîsa pirsgirêk derdikevin. Dema ku kongre di nava partiyê de tên li darxistin, hem pratîkên çêbûne dinirxîne û mahkûm dike, hem jî di ser van pratîkan re ji bo pêşerojê hedef tên danîn. Kongreya seyemîn, di wê atmosfera ku hatiye avakirin de maye û di vê mijarê de nikare tehlîl û biryarên pêwîst bigire. Hem nikare pratîka xwe tam binirxîne, hem jî nêzikatiyên mêr baş danahûrîne.

Di kongreya çaremîn ya jinê de, ew tehlîl hat kirin; hat gotin ku kongreya seyemîn nirxandinên pêwîst yên îdeolojîk nekirine. Lê di astekê de jî, ji bo wê demê komkirinek derxistiye holê. Lewra heya wê demê belav bûye, rêveberî tune; di vê kongreyê de rêveberiyeke nû tê hilbijartin. Biryarên têkoşînê tên dayin. Lê tespît û tehlîlên bîrdozî ku nehatine kirin, hişt ku piştî kongreyê jî pirsgirêk berdewam bikin. Hem di nêzikbûnên hevalên xort de, hem jî di sekna rêveberiyê de pirsgirêk derdikevin. Ger kongreya seyemîn ew pirsgirêk çareser bikirana, li ser wê esasê kongreya çaremîn dê gavên mezintir biavêtana.

Di navbera kongreya seyemîn û çaremîn de konferansek heye. Di 2001'î de ye. Di konferansa seyemîn de biryara herî balkêş hevpeymana civakî ye. Lewra di vê demê Serokatî dîsa problemên civakî dixe rojeva jinê. Dibêje "problemên hene, êdî civakî ne, ne qut in". Di kongreyê de, nêrîna jinê ya civakê, ya gerdûnê, ya dadê, ya tendûristiyê, ya hawirdorê tê nîqaşkirin û di derheqê van mijaran de projeyên şênber derdikevin. Ew proje çiqes pêk tên ew mijareke cuda ye, lê perspektîfên bi vî rengî derdikevin.

Di van deman de, di 2001'ê de paraznameya Serokatî ya AÎHM'ê tê. Ew parazname di nava giştî hevalan de zelalbûneke derdixe holê. Heya vê demê hedefa ku Serokatî ji bo paradîgmaya nû datîne tam nayê fêmkirin. Bi taybetî modela nû ku Serokatî ji bo rêxistinê datîne, mêzekirinên nû yên li jinê, civakê û dîrokê di vê paraznameyê de tên danîn. Di paraznameyên din de Serokatî van kûrtir dike. Zelaltir dike. Bi vê paraznameyê pêvajoyeke nû dest pê dike. Heya wê demê jî pêvajoyê nû tam nehatibû fêmkirin. Lê bi vê paraznameyê gaveke nû tê avêtin.

**Kongreya Heyştemîn Ya PKK'ê Û Jin**

Jixwe di vê demê de amadekariyên kongreya KADEK'ê hene. Piştî kongreya heftemîn, Serokatî kongreya heyştemîn dike rojevê. Lewra Serokatî di guhertinê de israr dike. Lê di kongreyên me de derdikeve ku me Serokatî tam fêm nekiriye. Ji ber vê hin guhertinên ku divê di kongreya heftemîn de bihatana kirin û tam pêknehatibûn, divê di kongreya heyştemîn, ango di kogreya KADEK'ê ya yekemîn de werin temam kirin. Kongreya heyştemîn di navreba 4-11'ê nîsanê 2002'yan de tê li darxistin. Kongre li ser esasê guhertin û veguhertinê tê çêkirin. Divê navê partiyê jî bê guhertin. Li ser esasê paradîgmayê guhertin dayina çêkirin, di serî de di zêhniyetê de guhertinê dixwaze; ger bêyî ku di zêhniyetê guhertin bê çêkirin, di şêweya rêxistinê de guhertin bê çêkirin, ew bi xwe re xetereyan jî derdixe holê. Di demên KADEK û Kongre ya Gel de, em bi van xetereyan re rû bi rû man. Me dît ku di warê zêhniyetê de amadekariyeke cidî tune.

Li hemberî xwestekên Serokatî yên guhertinê, du nêzikbûn derketin, yek; di gelek rêvebir û kadroyan de, hemû jiyankirin û mîras, têkoşîna ku hatiye dayin tune hesibandin derdiket. Ew tişt hemû weke paşverû û kêrî tiştekî nayên dihat hesibandin. Tu dibêjî qey pêvajoyeke nû dest pê dike, divê her tişt biguhere. Li gorî vê nêzikbûna hevalan, di navbera kadroyan de cudabûn hatibû avakirin. Weke kodroyên kêrî şoreşê tên û yên nayên, ji hev qut kirin. Di bin navê paradîgmaya nû de, guhertinan de; binesaziya partî û tevgera me ku bi dehan salan çêbûye tune dihat hesibanin. Vê bi xwe re di nava hevalan de tepisandin û êşandinek anî. Serokatî digot, **"li ser esasê jiyankirin û nirxên xwe em ê guhertin bikin";** lê mêzekirin wisa derket; êdî rista kadroyên berê xilas bûye, kadroyên şer êdî kêrî tiştekî nayên. Lê Serokatî digot guhertinê di zêhniyetê de bikin, dixwaze vê bike wesîleya guhertinê. Lê hemû tiştên ku hene redkirin, têkoşîna ku hatiye dayin bê mane kirin, derdiket holê.

Têkoşîna ku hebûna wî daye diyarkirin û daye isbatkirin; di bin navê guhertinê de ji holê hate rakirin. Ew nêzikbûn weke pêlekê li hemû qadan belav bû. Bandora wê li Ewropa, li Bakur, li çiyan û hemû qadên din pêk hat. Vê bi xwe re texrîbatên mezin anîn. Di vir de diyar dibe ku ger guhertin û veguhertin baş neyê fêmkirin, di bin vî navî de xetereya belavbûnê jî derdikeve holê. Bi taybetî ger tevgerek li ser

kokekê xwe, xwe nede diyarkirin, ji belavbûn û bi ber bayê ketinê re vekiriye. Jixwe nêzikbûnên me em dibirin wir.

Ji ber ku Serokatî ew tişt dît mudaxale kir. Serokatî bi paraznameya bi navê "parastina gelekî" mudaxaleyî pêvajoyê kir. Serokatî encama pratîkên me û nêrînên me dîtin û mudaxaleyî me kir. Jixwe bi nû ve avakirina PKK'ê pêşiya vê pêvajoyê girt. Ger pêşî nehatibûya girtin, ne diyar bû ku dê ew pêvajo bi ku ve biçe. Serokatî di paraznameya parastina gelekî de van tiştan dibêje. Di mêzekirin û zêhniyetê de ji ber ku guhertin li ser esasê mîras û koka xwe nehatibû çêkirin, ew şaşitî çêdibûn. Tasfiyekar jî li ser vê yekê rûniştin. Li ser vê zêhniyetê rûnişt û kûr kir. Ji xwe re xist hedefekê.

**Kongreya Çaremîn Ya Jinê**

Di demeke wisa de, tevgera jin kongreya çaremîn jî li dardixe. Di hazîrana 2002'yan de tê li darxistin. Kongreya jinê ya çaremîn di bin diruşmaya **"di jiyana azad de israr û vebûyin** (açılım)" de tê darxistin. Di vê kongreyê de hevpeymana civakî bi berfirehî tê nîqaşkirin û danezana (bildiri-bildirge) wê tê derxisitin. Kongreya seyemîn peywir dabû rêveberiyê ku, belgeyên hevpeymana civakî derxin; konreya çaremîn jî vê peymanê erê dike. Ew belge tê derxistin û tê belavkirin. Ew belge hê jî heye, van salên dawî me ji rojevê derxistiye, divê ne wisa bûya, lewra belgeyeke pir berfireh e. Di hevpeymana civakî de, jin di nava civakê de çawa jiyan bike û çawa têkoşîn bike diyar dike. Van xalan hemûyan digire nava xwe.

Ew ji bo jineolojiyê jî bûye mijareke esasî ya lêkolînê. Herî dawî di van kongreyên vê dawiyê de dîsa ket rojeva me. Lewra girîng e. Hiqûqa jinê dide diyarkirin. Serokatî pişt re navê wê guhert û got, "makazagona dayiktiyê". Armanca vê derxistina qanûnên jinê ne. Mirov vê hinekî din kûr bike, ew yek zindîkirina qanûnên Îştar û Înana ye. Hevpeymana civakî xwediyê risteke wisa ye. Di vê kongreyê de tê erêkirin û tê belavkirin.

Dîsa li ser esasê paraznameyê, di nava civakê de û di nava saziyên sivîl de xwe rêxistin kirin di rojevê de bû. Hem di nava saziyên sivîl de rêxistinbûyin, hem jî bi wan re îtifaq kirin hebû. Di kongreya çaremîn de, biryarên vekirina akademiyên jinê û avakirina meclisên jinê hatin girtin. Li ser esasê perspektîfa vebûyinê, biryarên wisa girîng tên stendin. Di vê kongreyê de, paradîgmaya nû, pratîkên hene û nêzikbûnên di

zêhniyetê de baş tên tehlîl kirin. Ferasetên ku derdikevin û dahûrandina wan di kongreya seyemîn de nîvço mabûn; di vê kongreyê de bi awayekî berfireh tên dest girtin.

Bi taybetî ew kongre problemên heyî yên îdeolojîk tespît dike, heya astekê jî rexne û rexnedayinên şexsî tên kirin. Tespîta ku dibêje, xeta jinê ber bi lîberalîzmê ve diçe, di vê kongreyê de tê kirin. Ji milê îdeolojîk ve; di şexsê hinek kesan de, dahûrandina lîberalîzmê tê kirin. Hinek ji wan kesan niha reviyane. Yanî xwe lêpirsînkirina hundirîn ya vê kongreyê pir xurt e. Dîsa nêzikbûna rêvebiriyê, ya kadro û ya hemû avahiya hevalan; pirsgirêkên ku tên jiyankirin, pir berfireh tên dest girtin û tespîtên pir girîng tên kirin. Mesela di jor de mayina rêveberiyê, di navbera rêveberiyê û hevalan de mesafe çêbûyin; di hevalan de zû pes kirin, di angaşta (idia) azadiyê de lewaz mayin tê tehlîlkirin. Vê jî weke ferasetekê datînin holê.

Heya demekê nêzikatiyên kongre bi berfirehî tên nîqaş kirin. Lêpirsîn tên kirin. Piştî demekê, di nava kongreyê de hevala Gulan tê qetilkirin. Niha şehadeta hevala Gulan, hê jî tam zelal nebûye, lêpirsîn berdewam dike, tam zelal nebûye. Ew lêpirsîn hê nehatiye girtin. Di dîroka PKK û di dîroka tevgera jinê de, bûyereke bi vî rengî nû ye, cara ewil tiştekî wisa çêdibe. Bi taybetî di ortama kongreyê de çêdibe û li ser kongreyê bandoreke pir mezin dide avakirin. Tiştên ku di kongreyê de derketine holê û biryarên ku hatine stendin pir bi bandor nabin. Lewra ew bûyer bandora xwe zêdetir dike. Li vir mudaxale li kongreyê tê çêkirin. Kongre bi dawî dibe, lê delege hemû di lêpirsînê re derbas dibin. Prosûdûreke wisa tê pêkanîn. Derveyî vê jî, di demeke wisa de bûyereke wisa çima hat kirin, aramanca vê çi bû? Tevgera gişît jî, tevgera jinê jî dahûrandina vê pir kir.

Hevala Gulan bi xwe ji saziya hêzên taybet hatibû, delegeya wir bû. Di nava kongreyê de xwediyê sekenkê bû jî. Seknandina herî xurt ya rexne kirinê û rexnedayinê de hevala Gulan mînak bû. Rewşa tevgerê ya tê de, êrîşên li ser tevgerê, hemû baş dinirxandin. Pir aktîf tevlî kongreyê dibe. Bûyereke bi vî awayî, êrîşek e. Li hemberî xeta azadiyê, xeta jinê û bi giştî hemberî tevgerê êrîşek e. Dîsa êrîşa herî mezin ku jiyanê tevlî hev dike û bê baweriyê dide avakirin e. Êrîşeke li hemberî rêhevaltiyê ye. Yanî ji her alî ve bi hesap hatiye kirin. Dîsa êrîşa li hemberî saziya ku temsîl dike ye. Hem hevaleke berpirsiyar ya hêzên taybet e, hem jî pêşengeke jinê ye. Êrîşa herî mezin, bi rastî jî li hemberî xeta

jin û têkoşîna jinê ye. Hevala Gulan bi taybetî tê hilbijartin, bi tesadûfî nebûye. Ji ber vê jî, ew şehadet ne tenê li ser kongreyê; li ser hemû tevgerê bandora xwe dide kirin.

Piştî hevala Gulan, di nava avahiya hevalan de civîn tên çêkirin û hewldana bi moral kirin û motîvasyon xurtkirinê de helwest tên danîn. Lê bi taybetî li ser tevgera jinê bandora wê pir çêdibe. Lewra tiştekî wisa cara ewil tê kirin. Lê biryar tê stendin ku, ew atmosfer demekê zû were rakirin û bandora vê bûyerê were şikênandin. Lewra armanca vê êrîşê jî ew e. Jixwe bûyereke ku mirov wisa serasera nêz bibe û derbas bikin nîne. Lêpirsîn jî berdewam dike. Berpirsyarên wê kî ne û girêdana wê bi kê re ye? Dibe ku ew bi demê re zelal bibe. Lê ya girîng ji kesan zêdetir, armanca vê êrîşê dahûrandin û vala derxistin e. Kesên tasfiyeger xwestin, şehadeta hevala Gulan wisa bi kar jî bînin. Lê rêxistinê pêşiya wan tiştan girt. Lê mirov dikare bi awayekî zelal bibêje ku ew êrîşek e. Êrîşî rihê PKK kirin e, êrîşî rêhevaltiya PKK û yekitiya jinê ye. Tabî ew êrîş, ji êrîşên komploya navnetîwî û êrîşên di wê demê de li ser partiyê hene qut nîne.

Di encamê de kongre, di atmosfereke wisa de tê belavkirin. Biryara ku li ser esasê jiyana azad û vebûnê hatiye stendin dikeve meriyetê. Piştî şehadeta hevala Gulan ew rih di kongreyê de zêdetir xurt dibe. Bi rihekî wisa kongre dixwaze êrîşê vala derxe.

Di vê demê de, "paraznamaya Atîna" tê. Di vê paraznamayê de perspektîfa ji nû ve avabûnê heye. Di nava partiyê de nêzikbûnên ku di şexsa rêvebir û kadro de derketine, di vê navberê de hê berdewam dikin. Bi xwe re her ku diçe aloziyan derdixe holê. Di 2003'yan de biryar tê stendin ku civîna berfireh ya KADEK'ê bê li darxistin. Hejmareke mezin beşdar dibe. Kesên tasfiyeger jî di vê civînê de ne. Derdorên tasfiyeger, her ku diçe xwe zelal jî dikin. Ferasetên lîberalîzmê, xwestek û hewesên (özenti) ji bo pergalê her ku diçin zelal dibin.

Di vê civînê de, biryara reforma civakî (sosyal reform) tê stendin. Serokatî di paraznameyan de perspektîfa şoreşa civakî (sosyal devrîm) dide, lê ew perspektîfa Serokatî weke projeya sosyal reform tê dest girtin û li ser wê esasê bîryar tên stendin. Gelek mijarên din jî, di vê civînê de tên nîqaş kirin. Ji bo ku projeya sosyal reformê çêbike, qomîteyek tê derxistin. Di vê qomîteyê de hevalên jin jî hene. Projeya ku tê avakirin, bi temamî, ketina nava pergalê ye. Jineke çawa, mêrekî

çawa, jiyaneke çawa? Hemû pîvanên wan tên danîn. Weke belgeyekê tê destgirtin, da ku di kongreyên pêş de bê erê kirin.

Di vê navberê de konferansa tevgera jinê ya çaremîn tê derxistin. Di vê konferansê de qomîteyek tê hilbijartin, da ku projeya jiyana sosyal çêbike. Ew qomîte jî li gel xwe porjeyekê der dixe. Piştî ew qomîteya giştî proje derdixe belav dike, hevalên jin jî dixwînin. Da ku avahiya hevalan jî bixwîne û bibe biryar.

Wê demê em li Ewropa bûn, me di nava avahiya hevalan de belav nekir, HPG jî di nava avahiya xwe de belav nekiribû. Lewra ew projeya reforma sosyal, belavkirina partiyê û jiyana partiyê ye. Mirov bi awayekî vekirî dikare wisa pênase bike. Belgeyeke pir mezin bû, hemû detay hatibûn nivîsandin. Zewicandin, mal ûhwd her tişt hebû. Hinek cihan qet ji avahiyê re nehat xwendin. Mesela li Ewropa, weke rêveberî me xwend û qet nekir nîqaşê û me got nabe. Me ji avahiya hevalan re jî neda xwendin. Lê Ferhat wan, di vê projeyê de pir israr dikin. Hevalên jin ku di vê projeyê de dibin şîrik jî hene.

Konferansa çaremîn ya jinê dema ku dibîne, dê ew proje bi giştî bibe, dibêjin “em projeyekê din derbixin”. Lewra projeyekê ku koletiyê rewa dike ye. Konferans biryar distîne ku qomîteyekê ava bike, da ku projeyeke nû derbixe. Lê di civîna giştî de Ferhat pêşniyar dike, dibêje “bila her du proje bibin yek”. Di vir de jî, kemînek heye, lê hemû heval tevlê dibin. Tabî di projeya ku jinê çêkiriyê de jî seqetbûn hene. Lê projeya giştî hatiye çêkirin jî felaket e. Di encamê de her du dibin yek. Armanca Ferhat bêbandor kirina projeya jinê ye. Li ser esasê îtîrazan hinek guhertin bê kirin jî, di cewherê xwe de proje nayê guhertin; jiyaneke berovajî û feraseteke lîberal derdikeve holê. Ew di nava tevgera jinê de jî pir hate nîqaş kirin. Nêzîkbûnên bi vî awayî derketin holê. Bandora xwe li ser biryarên ku hatine stendin û pêvajoya nû jî kir. Bi giştî redkirinek jî hebe, di astekê de hevalên jin ku beşdarî vê xetê bûn û qebûl kirin jî hebûn.

Di encamê de tiştê ku derdikeve holê; projeya Serokatî ya reformê ya jiyana nû vala hate derxistin. Perspektîfa Serokatî, bi van nêzikbûn û bi van projeyan hate bê nirxkirin. Pişt re Serokatî pir rexne kir; “got hûn tim xwe pêk tînin, hûn min fêm nakin. Di jiyan, şer û têkiliyan de hûn min fêm nakin”. An na perspektîfa Serokatî pir berfireh bû û guhertina civakê esas digirt. Ew yek di partî û kadroyan de bi awayekî berovajî hate pêkanîn. Yanî projeyên ku ji bo civakê tên dayin jî, di şexsê kadro-

yan de bi awayekî dihatin pêkanîn. Daxistina asta kadroyan hebû. Mesela me modelên civak, sazî û malbatan vekir. Tiştê ku bi van saziyan Serokatî dixwaze bike, me daxist asta kadroyan. Di vir de jî derket holê ku, em çiqesî bi pêşdîtinin, em çiqesa Serokatî fêm dikin. Tabî hemû ew jiyankirin, pir texrîbatan çêdikin; lê ji bo pêşerojê dibin wanayên mezin.

Piştî vê pêvajoyê, êdî ew pirsgirêkên ku di rêveberî û kadroyên jinê de derketine bi awayekî êş berdewam dikin. Dîsa di vir de deshilatdariyê mêzekirin û rêveberiyê de pirsgirêk derdikevin holê. Di nêzikbûnên hevalên xort yên tevgera jin de, di bin siya xwe de hiştin û di bin deshilatdariya xwe de hiştin heye. Ew problem jî pirsgirêkan zêdetir kûr dikin. Di vê mijarê de jî, herî zêde jina baş û nebaş; jina çêdike û xirab dike tê pênasekirin. Bi van pênaseyan di navbera jinê de jî, di vê demê de kategorî tên avakirin. Teyisînên wisa hê jî li ser pratîka me ya îro hene. Di navendê de pirsgirêkên wisa hene.

Bandora navendê li ser hemû qadên pratîkê dike. Lewra ji bo navendê bendewarî hene. Lê navend di nava xwe de bi pirsgirêkên xwe re mijûl dibe. Bandorên van nêzikbûnan li her qadê jî cuda cuda derdikeve holê. Mesela li Bakur, jin aîdî xwe dîtin, têkoşîna cins bi awayekî mîsoger nedayin, jin kişandina xeta xwe, li ser vê hinek tişt ferz kirin. Bandor û tayisîna wê demê hê jî li gelek qadan tam derbas nebûye. Em carina dibêjin, me hê bandora tasfiyekariyê derbas nekiriye. Bandor ew tişt in. Armanca tasfiyegeriyê sistkirina rihê têkoşînê bû. Lîberalîze kirin ew e. Niha jî dema ku em hewldanên xwe digirin dest, hem li hemberî dijmin, hem jî di nava xwe de; em di têkoşînê de pir sist in. An em pir bi hesap tevdigerin, an em ezez nêz dibin. Ew hemû bandorên vê demê ne.

## JI NÛ VE AVABÛNA PKK Û DI PÊVAJOYA NÛ DE JIN

### Mudaxaleyên Serokatiyê Û Têkoşîna Li Dijî Xeta Tasfiyeger

Heya vê demê hemû xebat ji navendekê tên rêvabirin, lê piştî vê Serokatî ji bo hêzên leşkerî perspektîfa xweserbûnê dide. Navê xwe jî diguherîne û dike HPG (Hêzên Parastina Gel). Di nava Kongreya Gel de, divê HPG xwe bi awayekî xweser rêxistin bike. Heman perspektîfê ji bo tevgera jinê jî dide.

Di vê demê de, jixwe navê KADEK'ê tê guhertin. Perspektîfa ji nû ve avabûna PKK tê dayin. Perspektîfa parastina rewa, di vê demê êdî zelal dibe. Heya wê demê jî, nîqaşek heye. Dema ku perspektîfa parastina rewa zelal dibe, Ferhat wan hinekê dikevin tengasiyê. Lewra di nava tevgerê de du qad ji xwe re kirine hedef; yek tevgera jin e, yek jî hêzên leşkerî ne. Lewra her du hêz jî bi rêxistin in. Mesela dema ku HPG cuda dibe, dixwazin Ekrem bidin ser HPG. Lewra Ekrem di feraseta wan de ye. Di nava tevgera jinê de jî, dixwazin yên ku nêzî xwe ne bikin berpirsiyar. Bi israrî wan li pêş dihêlin, didin pêş.

Ev nêzikbûna mêrê deshilatdar e. Bi taybetî dema ku nêzikbûnên deshilatdarî hebin, jinê ji xwe re weke amûr bi kar tîne. Di nava partiyê de mînakên vê pir hatine jiyankirin û Serokatî ew tehlîl kirine. Di vê demê de jî, êrîşên tasfiyeger herî zêde li ser van her du saziyan hene. Lewra di van her du saziyan de li dijî wan seknandinek jî heye. Derdoreke pir kêm, dikeve xeta wan. Dixwazin bi giştî tevgera jinê bixin bin xeta tasfiyegeriyê. Ev pirsgirêkên heyî, heya ku tasfiyekar direvin jî berdewam dikin. Lewra dixwazin xwe bi hêz bikin. Tiştên ku me di şexsê wan de dan diyarkirin, hemû rêbazên deshilatdariyê ne.

Piştî ku Kongreya Gel ya yekemîn tê li darxistin jî, zelalbûn tam nayê çêkirin. Lewra yên ku ketine bin wê ferasetê ne kêm in. Bandora wê ferasetê dîsa di kongreyê de hakîm dibe. Lewra ew feraset, herî zêde peyv û perspektîfên Serokatî bi kar tîne. Nûbûyinê ji xwe re weke argûman digirin dest. Pênaseyên nû ku Serokatî kirine jî, pir bi kar tîne. Ger zanebûneke kûr ya îdeolojîk nebe, mirov zû dikare bişemite vê xetê. Peyv nû ne, lê feraset bi giştî derveyî xeta partiyê ne. Tasfiyekar vê pir bi kar tînin, ji ber vê jî bandora xwe baş dike. Ji ber vê jî li ser atmosfera kongreyê jî xwe hakîm dikin.

**Milîtaneke Demê; Şîlan Kobanî**

Di vê navberê de vesaziya hevala Şîlan çêdibe. Bi taybetî li xeta di navbera Başur û Rojava de çêdibe. Hevala Şîlan jî, hem rêvebira jinê ye, hem jî di rêveberiya giştî de cih digire. Hem di nava tevgera jinê de, hem jî di giştî de hevala ku herî zêde li hemberî ferasetên tasfiyeger têkoşîn dike ye. Serî radike û pê re nabe yek. Di xwe de kesayeta pêşengtiyê dabû rûnişkandin.

Serokatî jî li ser perwerdeya hevala Şîlan pir sekinî bû. Ew ji bo pêşengtiyê amade kiribû. Hem di herêma ku hevala Şîlan tê de mezin bûyî de, pêşengtiya jinê ava kiribû. Hem jî di nava giştî tevgera jinê de rista pêşengtiyê dabûyê. Bi bîrdoziya jinê xwe ava kirin û bi vê nêrînê li civakê û derdora xwe mêzekirinê de hevala Şîlan mînakek bû. Xwediyê helwesteke mîsoger bû. Ketina bandora hinek tiştan tune bû, di sekna xwe de rê nedida van tiştan. Di têkoşîna jinê de şiyarbûna wê pir zêde bû. Li hemberî nêzikatiyên serdest pir têkoşer bû. Ji ber ku li hemberî wan serî radikir, bi gelek zehmetiyan û qewimînan re rû bi rû dima. Ji vî alî ve pir zehmetî kişand, lê pes nedikir. Kesekî ku li hemberê, serî radi-kir jî Ferhat bû. Di encamê de xwe ava kiribû. Bi fikaran (kaygı-endişe) tevdigeriya.

Hevala Şîlan, di rojnivîsa xwe de hemû jiyankirinên xwe, têkoşînên xwe nivîsandine. Hemû pêşdîtinên ku di rojnivîsa xwe de nivîsandine îro derdikevin holê. Hevaleke kevn bû û xwedî danehev bû. Li cihê ku ew hebû baweriyek dihat avakirin. Her kesî li wir baweriya xwe pê tanî. Di rêxistin avakirinê de jî avaker bû. Em jî têkoşîn dikin, lê em nazi-virînin hêza rêxistinê. Lê hevala Şîlan ne wisa bû. Tu caran ji nêzikbûnên paşverû re jî serî netewand.

Şehadeta hevala Şîlan di 25’ê mijdara 2004’an de pêk hat. Li gel çar hevalan şehîd ket. Hevalê Zekeriya, hevalê Fuat, hevalê Ciwan, he-valê Cuma û hevala Şîlan bi hev re şehîd ketin. Van hemû hevalan jî hem li hemberî tasfiyegeran pengav diavêtin. Hem jî li peywira demê xwedî derdiketin. Rihekî wisa di xwe de diparastin. Şehadeta van heva-lan, di şexsê van hevalan de li ser partiyê êrîşek bû. Lewra ew bi partiyê ve girêdayî bûn, di pêvajoyên herî giran de xwedî li kar derdiketin. Di van deman de gelek mirov, li peywiran xwedî dernakevin, dibêjin “serê me ne zelal e”. Gelekên wan pes dikin. Lê ew heval di vê demê de xwedî li peywirê derdikevin. Ev rista pêşengtiyê û milîtantiyê ye. Di vê demê de rêxistin tevlîhev in. Gelek hevalan xwe daye aliyekî, kar nakin.

Jixwe hevala Şîlan dibêje, di vê demê de herî zêde bi xwedî derketina li peywiran û bilindkirina têkoşînê milîtantî dibe. Bi vî awayî êrîşên dijmin û xeta tasfiyegeran vala derdikeve.

Di vê demê de êrîşên li ser tevgera jin û hemû tevgerê fêmkirin, di şexsiyeta hevala Şîlan de derdikeve pêş. Ji ber vê jî rûxmî ku rastî pir zehmetiyan tê xwe paşve nade û li peywiran xwedî derdikeve. Weke pêşengeke jin û rêvebir; windahiya wê bi xwe re valahiyek jî çêkir. Şehadeta hevala Şîlan; di vê demê de di serî de hevalên jin, peyamekê dide hemû milîtanên PKK'ê. Lewra êdî li ser vê lêpirsînek jî tê kirin û her kes li hemberî pêvajoyê sekna xwe di ber çavan re derbas dike.

**Kongreya Pêncemîn Ya Jinê**

Di van salên dawî de, heya ku sererastkirinek tê çêkirin, her sal kongre an jî konferansek tê li darxistin. Ji 2000'î heya 2009'an her wisa ye. Lewra gotin û persepektîfên ku Serokatî datîne tam rûnanin. Di 17'ê hazîranê 2005'an de jî kongreya jinê ya pêncemîn çêdibe. Ew kongre bi diruşmaya "**di paradîgmaya Serokatî de xwe lêpirsîn kirin û ji nû ve avabûyin"** ê çêdibe. Rêxistinbûna PJA ji nû ve tê bidestgirtin. Serokatî perspektîfa ji nû ve sererastkirina jiyana civakî dide. Lewra ew kesên tasfiyeger, di 2004'an de ji partiyê qut dibin, lê şelobûn hê jî heye. Di nava ew kesên reviyane de, jin jî hene; Dilar e, Sakîne ye, Rengîn e.

Êdî derket holê ku di nava partiyê de nikarin li hemberî xeta partiyê tiştekî bikin. Hewl didin ku xeta ji derve ser bixin. Jixwe diçin partiyeke nû ava dikin, dixwazin xwe bigihînin Serokatî û dibêjin PKK ya nû em ê ava bikin. Tabî xwe wisa qamûfle dikin û di bin vê rûpoşê de tevdigerin. Da ku zêdetir hevalan ji Partiyê qut bikin. Lê piştî demekê ew rûpoş dikeve. Tabî Serokatî pir hewl da ku wan di nava partiyê de bihêle, da ku dijmin nikare bi wan bilîze. Pir têkoşîna wê da. Lewra gelekên wan bi salan di nava partiyê de mabûn, rêvebertî kiribûn. Serokatî ew qes ked dabû wan. Lê bi israr dev jî xeta xwe bernedan. Tabî ew rasterast êrîşên dijmin bûn. Yên modernîteya kapîtalîst bûn. Pişt re gelek tişt zelaltir bûn, lê heya ku zelal bû jî bi xwe re gelek texrîbat dan çêkirin. Rev jî pir çêbûn, lê mejî jî pir tevlîhev kirin.

Heta ku zelalbûnek çêbû bi salan têkoşîn hate kirin. Bandorên wê li Ewropa, li zindanan, li Rojava hebûn. Di sererastikirinê de Serokatî hewldaneke mezin da. Ji bo ku rêxistinê li ser piyan bigire û rojeva rêxistinê vegerîne rojeva rast, pir ked da.

**Di Dema Nû De Qad û Rêxistinên Jinê**

Di vê demê de, Serokatî perspektîfa sê qadan da; yek ya partiyê PJA'yê ye, du ya qada civakî YJA'yê ye, ya seyemîn ya qada leşkerî YJA-Star'ê ye. Di kongreya seyemîn de ew her sê qad hatin rêxistinkirin. Heya wê demê tevgera jinê xwe di bin sîwana partiyê de îfade dikir. Ji YAJK'ê heya wê demê wisa berdewam kir. Rêxistinê jî li ser vê esasê xwe bi rê ve dibir. Hem paradîgmayê ew tişt ferz dikir, hem jî Serokatî dixwest ku her qadek xwe bi xwe temsîliyeta xwe bike. Di vê demê de nêzikatiyeke wisa hate kirin ku, bi rastî perspektîfên Serokatî xwendinê de em li gorî xwe ne.

Serokatî ew qesa rêxistin dide ava kirin û tewdîr digire. Me wisa girt dest, nêzikatiyeke teng çêbû. Ji bo HPG'ê jî wisa gotin. Ew ne fêm-kirina perspektîfên Serokatî ye. Lê di vê demê de ji ber ku rêxistineke sîwan tune bû, heya KJB'ê hate avakirin jî, însiyatîfa PJA de meşiya. Lê di vê demê de nêzikatiyên şaş jî derketin holê. Her rêxistinekê xwe cuda dît. Xalên ku hevpar bike û bixe xizmeta jinê hebûn, lê ew nekir. Vê jî yekitiya tevgera jinê lewaz kir, parçe kir. Piştî kongreya pêncemîn kongreyên din jî ew nêzikbûn mahkûm kir.

Di vê demê de nêzikbûnên tasarûfger yên rêvebiran derdikevin holê. Mesela yek ji van Xetîce ye. Berpirsyara YJA-Star'ê ye, wir dike tasarûfa xwe û wisa digire dest. Li hemberî tevgera jinê nêzikbûnekê dide çêkirin. Di navbera tevgeran de nakokiyan dide çêkirin. Dîsa di PJA'yê de nêzikbûnên Sewra û Peyman, ji seriyê din ve heman tiştî jiyan dikin. Di nava tevgera jinê de kategoriyan derdixe holê. Taybetmen-diyên xwe yên çînî li ser tevgera jinê ferz dikin û bi xwe re didin mijûlki-rin. Ji rêxistinan re rest dikişînin. Ew nêzikatiya ku di mêr de tasarûfê dide avakirin, di şexsê van jinan de jî derdikeve. Jina ku xwe ji deshilat-dariyê qut nake ye. Di bin vê de jî zêhniyeta koletiyê bandorên vê jî li ser tevgerê çêdibin. Ew nêzikbûn jî bandora xwe li ser kongreya pêncemîn dike. Li hemberî vê nêzikatiyê heval bertek nîşan didin.

Weke kesayetiyekê mirov dikare bigire dest. Bi raye tevgerîn heye, ne seknandina milîtantiyê ye. Di encamê de ew nêzikbûn jî tên mahkûmkirin û tevgera jinê li ser esasê sê lingan tê rêxistin kirin. Di kongreyê de navê PJA dibe PAJK. Hêzên parastinê yên jin, navê YJA-Star xwe rêxistin dike. Hêzên qadên civakî jî bi navê YJA xwe rêxistin dikin. Navê her sê rêxistinan jî Serokatî di perspektîfên xwe de datîne.

Di vê kongreyê de, bername û rêziknameya (tüzük) PAJK'ê ji nû ve tê çêkirin. Çima van nav bi vî awayî hatin guhertin û li ser sê lingan xwe rêxistin kirin? Divê mirov vê baş fêm bike. Armanc vîna jinê li van her sê beşan de jî derxistina holê û mayinde kirin e.

**-YJA-Star**

Em tu caran bi awayekî textikî nêzî mijara parastinê nabin. Em demdirêjî û jiyanî digirin dest. Ji bo wê jî pêwîst e jin xwe bi rêxistinî biparêze. Xwe weke YJA-Star rêxistin kirin, mijara parastinê mayinde kirin e. Rengê wê, şêwazê wê dibe ku bê guhertin; lê weke hebûn mijara parastinê wê her berdewam bike. Bi taybetî di demeke ku ew qesa êrîş çêdibin de, ji bo parastinê xwe rêxistin kirin pêwîst dike. Bi vî awayî rêxistina parastinê wê her xwe nû bike û bide domkirin. Hemû êrîşên deshilatdarî jî bi vê hêzê tên parastin û êrîş vala tên derxistin.

Birdozî jî bê parastin nabe. Tevgera jinê xwe bi birdoziyekê îfade dike û bi partiyekê vê rêxistin dike. Lê hêzên parastinê vê paradîgmayê û birdoziyê jî diparêze. Jixwe di bernameya PAJK'ê de jî hêzên parastinê wisa pênase dike. YJA-Star ew e. Rêxistineke bi cewher e. Lewra em mijara parastinê bi cewherî digirin dest û pênase dikin.

**-YJA**

Sazîbûyina YJA'yê jî li ser vê esasê hat çêkirin. Lê heya niha jî di vê sazîbûnê de perspektîfa Serokatî rast nehatiye fêmkirin. Serokatî YJA, weke navenda jinên di nava civakê de pênase kir. Lê me navenda wê li çiyan çêkir. Heta îsal jî berdewam dikir. Baş fêmnekirina perspektîfa Serokatî û di cih de rêxistin nekirin, li ser qada siyasî û civakî jî bandor kir. Serokatî negot bila navenda wê li çiyan çêbe. Lê me li çiyan rêxistin kir, bi awayekî YJA jî bû rêxistina kadro. Lê Serokatî digot dibe ku kadro di nav de hebin, lê divê ne rêxistina kadroyan be. Hemû rêxistinên me yên din jî li çiyan bûn û hemû jî rêxistinên kadro bûn. Vekirinên ku dive li qada civakî de çêbin, ji ber vê yekê çênebû. Bi awayekî teng û weke kadro girtina dest, nehilişt ku ew vekirin û pengav jî encam bigirin. Lewra qada civakî qadeke pir mezin e. Hemû sedem ne ew e, lê sedemek jî ew e.

Di encamê de, Serokatî îsal mudaxale kir û ew hêz ji nû ve pênase kir. Lê heya vê dawiyê jî armancên ku rêxistinê didan pêşiya xwe di vê qadê de pêk nedihatin. Biryarên ku di kongreyan de dihatin stendin pir

berfireh bûn. Lê ji ber ku me rêxistinbûna wê teng girt dest, me xwe dubare kir. Mesela pratîka Ewropa mirov dikare mînak bide. Me rêxistina jinê û gel aîdî gel nekir. Di vê mijarê de nêzikbûnên dogmatîk pir derketin pêş. Heya niha jî ew nêzikbûn dibin asteng. Di qadan de li ser vê rêxistin dayina avakirinê zêdetir, em her tiştî li qadan bar dikin. Bêguman dê kadro di hemû qadan de cih bigirin. Lê mirov bibêje bê kadro tiştek nabe, bila her tişt di însiyatîfa wan de be, dê qada civakî teng bibe.

Mesela niha li hinek qadên me binêrin, me kadroyên YJA'yê nedane avakirin. Li cihê ku kadroyên PAJK'ê tunebin, li wir kar nabe. Lê peyvira kadroyên YJA'yê li qadan rêxistin çêkirin, meclis avakirin, rêveberiya qadê di qadê de derxistin û çareserkirina pirsgirêkên qadê ne. Bi rastî jî teoriya vê jî hate kirin, lê di pratîkê de dîsa me xwe dubare kir. Ji ber vê jî perspektîfên ku di vê qadê de dihatin dayin pêk nehatin û nêzikbûnên dogmatîk û ji aliyekî ve jî lîberal derdiketin. Vê sazîkirina YJA dernexist holê. Rûxmî vê jî di qadan de di astekê de rêxistinbûn çêbû, tevlêbûna serhildanan çêbû. Di pêşengtiyê de jî ristek hate lîstin, lê ger em li gorî armancên xwe bigirin dest, asta ku heye pir kêm e. Lewra ew asta ku hatiye girtin, di nava civakê de çiqesa guhertin daye çêkirin û rêxistin avakiriye, ew girîng e.

Mesela li Colemergê rêxistina YJA'yê heye, lê wê meclisê li ser civakê bandoreke çawa kiriye, guhertin daye çêkirin an na. An na bi yekalî beşdarbûna çalakiyan têrê nake. Jixwe di serhildanên civakî de jin her pêşengtî dikin, lê ew vegerandina rêxistinê pir lewaz e. Ji ber vê jî rêxistinbûna YJA'yê, di nêzikbûnên me yên teng de maye. Kadroyên ku ji vê re pêşengtî kirine jî, ew yek di kesayeta xwe de nedane rûnişkandin. Di pratîkê de nêzikbûnên cuda jî derketine holê. Bi vî awayî girtina dest, projeya sazkirina YJA nîvco dihêle. Lewra projeya YJA, li ser esasê civakeke nû û jiyaneke nû bi nirxên exleqî û polîtîk xwe rêxistin kirin e.

Di bin vê perspektîfê de dê gund çawa werin rêxistin kirin. Me li Kurdistanê çend gund rêxistin kirine. Lewra di jor de mayin rêxistinê nade avakirin. Di perspektîfa YJA'yê de tiştên wisa pir derketin holê.

Ya duyemîn jî, di rêxistinkirina YJA'yê de li cihê ku di civak û kesan de guhertin bê çêkirin; me bi halê heyî û bi kesên heyî rêxistin da avakirin. Vê jî tengasiyên pir mezin bi xwe re anîn. Halê heyî îdare kirinê tîne; pirsgirêka malbatê heye, em îdare bikin. Pirsgireka jinê heye, em îdare bikin. Pisgireka malbatê bi derdorê re heye, em îdare bikin. Yanî

realîteya heyî, ne guhertin; nêzikbûneke îdare dike derket holê. Lê di perspektîfa YJA'yê de guhertin hebû, azadî hebû. Ji ber vê jî, di hemû saziyên ku me di qada civakî de rêxistin kirine de jî, ji ber ku me naveroka wan bi nêzikbûna paradîgmatîk danegirtiye; ew sazî an xizmetî pêwistiyên demê nakin, xizmetî rêxistinê nakin. An jî dibin saziyên pergalê. Ew jî bi xwe re probleman derdixe holê.

Ji ber van sedeman, perspektîfa YJA, rast fêmkirin û rast jiyanî kirin, pir girîng e. Lewra xebatên me yên qada civakî xebatên me yên herî bingehîn in. Heta armanca saziyên weke PAJK û YJA-Star jî, di qada civakî de guhertin û pêşxistin çêkirine. Ger qada civakî serkeftî nebe, ew sazî jî nagêhêjin armanca xwe. Di van mijaran de nêzikatiyên me yên kadro, lewaz in. Me kadroyên vê qadê ava nekirin. Me ew qad hê jî weke berê weke êniya paş digirt dest. Lê hemû perspektîfên Serokatî, li ser vê qadê ne û weke qadeke bingehîn digire dest. Sedema têkoşîna me avakirina civakeke azad e. Civaka azad jî di pêşengtiya vê saziyê de çêdibe, lê serasera nêzikbûna vê qadê û weke qadeke îdeolojîk nedîtinê, bi demê re pirsgirêk jî derxistin holê.

**-PAJK**

Di sazîbûna PAJK'ê de jî, Serokatî tişên pir berfireh vegotin. Weke partiya jinê ya îdeolojîk girt dest. Serokatî berî ku derbasî PAJK'ê bibe, di dema PJA de; nirxandinên li ser xwedawendiyê kirin. Got, "çanda ku di pêşengtiya Afrodît de pêş ketiye, divê di PAJK'ê de zindî bibe. Careke din derkeve holê". Serokatî gotibû, bila jinên ji xwe bawer di vê saziyê de cih bigirin. Yên ku mesela bîrdoziyê ji xwe re esas bigire, dev ji têkoşîna xwe bernede, divê di nava vê saziyê de cih bigirin. Weke destpêkê gotibû bila di PKK'ê de 500, di PAJK'ê de jî 300 hevalên ji xwe bawer tê de cih bigirin. Ev weke kadroyên dendik pênase kir. Ew qesa girîngî didayê. Di nava têkoşînê de, kesên sempatîzan û welatparêz û girêdayî dikarin di nava qada civakî de cih bigirin.

Lê pîvanên PAJK'ê tenê ew nînin. Tenê bûyinû xwedî exleqeke paqij û girêdanbûn bes nake. Divê di serî de heya binî bîrdozî be. Divê di pîvanan de tûj be, di riya xwe de şaş nebe. Divê di vê xetê de xwe kûr bike, zelal bike.

Di mêzekirina PAJK'ê de jî nêzikbûnên şaş û fêmnekirin derketin holê. Ev pîvanên xwedavendiyê ku Serokatî danîn; kategorîze kirin. Di avakirina PAJK'ê de ew tişt derketin holê. Tabî di vê demê de, rêveberi-

ya PAJK'ê di perspektîfên Serokatî de ne zelal bû, hê tam fêmkirinek tune. Nêzikatiyên derdiketin. Bi taybetî nêzikatiyên Sewra û Peyman, ji bo vê mînak in. PAJK, di 2005'an de hate rêxistin kirin. Van şêwaz û ferasetan, di vê demê de li ser avabûna PAJK'ê bandor kir. Rûxmî ku hemû perspektîfên PAJK'ê Serokatî zelal danîne holê jî, ew li gorî xwe girtina dest û lîberalîze kirin çêbû.  Avahiya kadro li gorî ve hate kategorîze kirin. Ew nêzikatiyên uç ku di şexsê çend kesan de derketin holê, di giştî avahiya jinê de jî ne fêmkirinek derxist holê.

Ya duyemîn jî, nêzikatiyên hevalên xort bûn. Digotin hûn avahiyeke cuda ne, hûn nikarin qarişî avahiya me bibin. Mesela hevalan nedihilişt ku heval bi temsiliyeta PAJK'ê tevlî civînên giştî bibin. Di şexsê Sewra û Peyman de, rêxistina jinê dihat teşîr kirin. Ger PAJK avahiya xwe û sazîbûna xwe tam çênekiribe, bandora van nêzikatiyan jî heye. Di şexsê Sewra û Peyman de giştî rêxistin dihat teşîr kirin. Nedihiliştin ku PAJK, tevlî civînên giştî yên partîbûyinê bibe. Vê nêzîkbûnê jî, bandora xwe li ser giştî kadroyan kirin. Pişt re bi mudaxale û têkoşînê guhertinek çêbû; lê di wê demê de pêşdarazîbûnek bo PAJK'ê hat avakirin. Mesela hişt ku PAJK, xwe baş rêxistin neke û xwe belav neke.

Me çawa nêzikbûna Xetîce vekir; weke wê di PAJK'ê de jî, bi nêzikbûnên Sewra û Peymanê, nêzikatiyeke ku dixwaze her tiştî bixe bin serweriya xwe derdiket holê. Di encamê de civînek hat çêkirin û her du jî ji peywirê hatin xistin. Her du jî ketin lêpirsînê, jixwe di lêpirsînê de reviyan. Piştî vê mudaxaleyê jî nêzikbûnên li hemberî PAJK' ê neguheriyan. Heya van salên dawî jî berdewam kir. Heval êdî nediçûn PAJK'ê. Hem tahrîka mêr di vir de hebû; PAJK, dihat oteleme kirin. Ger bi giştî projeya partiyê bi lezgînî, sererastkirinek çêbûbûya; dê di qadên din de jî pirsgirêkan ew qesa berdewam nekira.

Di encamê de ji milê erênî ve jî, ji milê neyînî ve jî, sazî bi nêzikbûnên şexsiyetan girtina dest ne rast e. Serokatî ew qesa li ser dahûrandinên takekesî disekine. Bi şexsan sazî girtina dest, ezezîtiyê tîne, rihê kolektîf dernaxe holê. Ji ber vê, di şexsê Sewra û Peyman de li PAJK'ê mêze kirin; demeke dirêj bi xwe re pêşderazîbûn ji bo PAJK'ê çêbûn. Bi têkoşîn û kedeke mezin û bi hewldanên Serokatî ew yek hate sererastkirin. Di nava PAJK'ê de jî, pirsgirêk tenê Sewra û Peyman nebûn. Zemînê wan hebû, gelek kesên ku ketibûn bin bandorê hebûn. Pişt re hinekên wan reviyan û hinek guherîn. Lê di wê demê de, pîvanên PAJK'ê li gorî xwe girtina dest û lîberalîze kirin hebû. Pişt re di

zemîna kongre û civînan de bi wan re jî têkoşînek hate dayin û zelalbûnek çêbû. Lê van nêzikbûnan gelek texrîbat jî derxistin holê. Yanî PAJK, di dema xwe de rola xwe nelîst.

Niha jî nêzikbûnên me yên şaş, li hemberî PAJK'ê hene. Nêzikbûnên siyasî derdikevin holê. Em weke hêzeke deshilatdariyê digirin dest. Lê PKK jî, PAJK jî ne hêzên dîshilatdariyê ne. Hêzên avakirinê ne. Di nava pergalê de, dibe ku partî bi vê armancê bên avakirin. Lê di paradîgmaya me de PKK û PAJK perspektîfa înşayê derdixin holê. Hêza rêveberiya demokratîk derdixin holê. Hêza avakarinê û xulukariyê derdixe holê. Lê weke kadroyên PAJK'ê em çiqes li gorî van pîvanan tevdigerin. Em çiqesa ji deshilatdariyê dûr in. Em gelek caran di bin bandora vê nêzikbûnê de dimînin. Tabî mudaxaleya tevgera jinê ku li PAJK'ê hatiye kirin, li ser esasê rêxistinbûneke nû bû. Avahiya PAJK'ê ji nû ve hate destgirtin û rista PAJK'ê ji nû ve hate nîqaşkirin.

**-KJB**

Di 2005'an de, kurultaya KJB hate li darxistin. Cara yekemîn di 1'ê nîsanê 2005'an de hate li darxisitn. Perspektîfa KJB (Koma Jinên Bilind), wê demê Serokatî da. Perspektîfa Serokatî ku berê ji bo sê rêxistinê jin daye dubare dike û dibêje pêwîst e, ew her sê rêxistinên jin xwe di bin sîwanekê de rêxistin bikin. Divê KJB weke pergal xwe rêxistin bike. Pênaseya wê jî, pergala komînal, konfederal ya jin e. Hêza jin rêxistinî ku di qadan de derketiye holê û hêza jin ku derketiye holê; êdî Serokatî vê weke pergaleke pênase dike. Di pergalê de jî rista PAJK, YJA-Star û YJA datîne holê. KJB dibe sîwana van hêzan.

Di kurultaya yekemîn de, ji bo fêmkirin û înşaya vê pergalê nîqaş çêdibin. Di cewhera xwe de li hemberî pergala mêr ya ku di nava modernîteyê de ava kiriye alternatîfek e. Bi giranî di qadên weke siyasî, civakî, hûqûqî, bîrdozî û leşkerî de xwe rêxistin kirin û hemû rêxistin di bin sîwana xwe de kom kirinê esas digire. Van rêxistinan jî li ser esasê bîrdoziya azadiya jinê rêxistinkirinê weke armanca xwe diyar dike. Li ser vê esasê rêxistinbûna KJB çêdibe. Jixwe dîrokeke pir kevn nîne. Hedefa armanca KJB pergal û jiyaneke kolektîf, wekhev û azad dayina avakirin e.

Serokatî KJB weke kongre girt dest û weke kongre di nava kongreyê de pênase kir. Ew di hevpeymana KCK û KJB de jî heye. Tabî ew jî pişt re bû pirsgirêk. Çawa ku gotin artêş di nava artêşê de çênabe. Go-

tin kongre di nava kongreyê de çênabe. Nêrînên me pir teng û dogmatîk in. Em bi tiştekî digirin û careke din bernadin. Ew neqebûl kirin, heya 2008'an jî hat. Pişt re qebûlkirinek çêbû. Vê nîqaşê her berdewam kir. Digotin ne gengaz e. Van mêzekirin hemû pir dogmatîk bûn. Perspektîfên Serokatiyê li gorî xwe fêm dikin û fêm kirina xwe jî rast dibînin û ferz dikin. Nabêje min niha wisa fêm kiriye û dibe ku şaş be jî.

Hat asteke wisa ku divê têkiliyên KCK û KJB bi hevre nebe. Lewra gotin du pergalên cuda ne. Digotin di nava KCK de cih bigire jî, divê weke kongre neyê pênase kirin. Di encamê de hate sererast kirin. Rûxmî ku Serokatî me dielimîne jî, dema ku Serokatî projeyeke nû datîne holê, teqez nêrîneke nû û neqebûlkirinek çêdibe. Di artêşê de jî ew heye, di partiyê û di pergalê de jî ew heye. Ew rast fêmnekirina Serokatî ye, zêhniyet û qalibên ku di nava pergalê de me girtine li ser xwe neavêtin e.

Mesela em carina dibêjin, çima ew qesa navê rêxistinan tê guhertin. Lê taybetmendiyeke Serokatî heye, esnek nêz dibe, dikare hema navan biguhere, pengavan biavêje. Lê em dibêjin, na naguhere. Mesela vê dawiyê, kurultaya KJB hate darxistin. Di kurultayê de me ala KJB guhert. Lê di kurultayê de hevalên me yên qada civakî û bi taybetî li Ewropa hatine qebûl nekirin. Gotin em ê çawa bidin nasîn, divê em neguherînin. Pir berxwe dan. Heta gotin em Serokatî ji re pêşniyar bikin, bila navê KJB jî neyê guhertin. Wisa bi zindî girtina dest, enerjiyên nû kom kirin, gavên nû avêtinê de em nevikirîne. Îşte ew tengbûna zêhniyeta me dide diyarkirin. Di mêzekirina me ya rêxistinan û guhertinên Serokatî dike de, li gorî xwe nêzbûn pir heye. Di nêrîna KJB de jî, nêzikbûnên li gorî xwe derketin holê.

### Pengava 1'ê Hazîranê Û Têkoşîna Jinê

Di 2004'an de, bi pêvajoya 1'ê Hazîranê ve perspektîfên ku Serokatî dide; li ser xeta parastina rewa li seranserî welat têkoşîn kirin û li ser vê esasê rêxistinbûna xwe dayina çêkirin û HPG ji nû ve avakirin pêş ket. Bi pengava 1'ê Hazîranê re, gelek hevalên HPG û YJA-Star, rêxistin rê dike qadên Bakur. Di nava rêxistinê de jî, hem li hemberî hêzê tasfiyekar, hem jî li hemberî hêzên dagirker yên dijmin zelalbûnek tê çêkirin. Nêzikatiyên ku esareta Serokatî dirêj dikin, rêxistinê tiştên vala re mijûl dikin û di bin vî navî de jî tasfiyeyê li ser rêxistinê ferz dikin; hemû kesên ku konseptan ava dikin û li gorî vê dimeşin, tên tasfiye kirin.

Dema ku mirov şert û mercên ku pengava 1’ê Hazîranê berçavan bigire, bi rastî jî risteke duyemîn ya 15’ê Tebaxê dilîze. Xwedî girîngiyeke wisa ye. Gelek heval bi vê biryarbûnê diçin Bakur û gelek heval di Bakur de şehîd dikevin.

Ji ber ku dema nêz e, dibe ku hemû heval navê wan jî bizanin. Em ê navê hinek hevalan vebêbijin. Ew şehîdên pengava 1’ê Hazîranê ne û di pêşengtiya vê pengavê de xwediyê risteke girîng in.

Yek ji van hevalan hevala Nûcan e; li ser riya Bakur şehîd dikeve. Hevaleke kevn e, di heman demê de rêveberiya HPG û YJA-Star de jî cih digire. Dîsa di wê demê de, li Cûdî hevala Amara Efrîn, hevala Nûjîn Sêrt, hevala Devrîm Sêrt şehîd dikevin. Li Mêrdînê hevala Norşîn Serhed şehîd dikeve. Li Besta hevala Ronahî Efrîn, hevala Sarya Hakarî, hevala Eser Bagok şehîd dikevin. Li Dêrsîmê hevala Peyman Kobanî, Bêrîvan Kobanî, hevala Şevîn Derîk şehîd dikevin. Dîsa di encama qazayekê de hevala Ûta û hevala Amara şehîd dikevin.

Bi giştî hevalên ku di vê pengavê de şehîd dikevin; di pengava 1’ê Hazîranê de xwediyê ristekê pêşengiyê ne. Her hevalek bi lehengî û fedakarî tevlî têkoşînê dibin. Hemû şehadetên vê demê, ji bo pêvajoya zelalbûnê xetekê eşkere derdixe holê. Li ser vê jî kongre û kurultay tên darxistin. Bi rihê van hevalan kongre xwe biryar dikin. Kongreyên jin ku di vê demê de tên li darxistin jî, ji bo biranîna van hevalan tên li darxisitn.

Di vê demê konferansa YJA-Star tê dirxistin. Di vê demê de her rêxistinbûneke KJB, di nava xwe de xweser e. Di konferansa YJA-Star de, texrîbatên tasfiyekaran yên li ser YJA-Starê, berovajîkirinên li ser şer tên mahkûmkirin. Bi taybetî bandora vê nêzikbûnê ya li ser avahiya hevalan tê nirxandin û sekneke bi rexne û rexnedayinî tê raberkirin. Bi taybetî di vê konferansê de, biryara xwe ji nû ve avakirinê digire. Lewra YJA-Star rêxistineke nû nîne. Hemû danehevên şer yên jinê di nava xwe de dihewîne.

Di şêwe û şêwazên YJA-Star de jî, nêzirbûnên fermandar û şervanan yên qlasîk ku xeta şer şûn ve dikişîne tên dîtin. Ew hemû bi rihê 1’ê Hazîranê, di vê konferansê de ji nû ve tên nirxandin û li ser vê esasê pêvajoyeke nû yê avabûnê destpê dike.

Di vê demê de, mezîkirna KJB ne weke rêxistinbûneke sîwan ku hemû rêxistinên jinê temsîl dike ye; weke rêvebirên van rêxistinan kom bûne û koalîsyonek dane avakirin, tê mêze kirin. Temsîla van rêxistinan endamên KJB ava dikin, ew di bernameyên hemû rêxistinan de jî heye. Lê weke konseyeke giştî ya jinê zêdetir, weke koalîsyoneke digirin dest. Ew nêzikbûn jî di kongre û konferansên her sê rêxistinên KJB de jî, tê sererastkirin û

mahkûm kirin. Polîtîkaya KJB ya 2005-6 de, ew yek bi awayekî şênber tê xûyakirin. Dîsa KJB weke partiyeke girtina dest, dertê holê.

Di 2006'an de kurultaya KJB ya duyemîn tê çêkirin. Ji hemû qadan beşdarbûna kurultayê tê çêkirin. Di dema kurultayê de hevala Yıldız, li herêma Cûdî şehîd dikeve. Hevaleke pêşeng, kevn û berpirsiyar e. Ji ber vê kurultay, kombûyina xwe hîtafî hevala Yıldız dike. Di vê kurultayê de, ew nêzikatiyên şaş ku me diyar kirine, tên mahkûmkirin. Di navbera hemû rêxistinan de bi kordîne kar kirin dibe biryar û bi vî rengî dikeve pratîkê.

Di navbera kurultaya yekemîn û duyemîn de, hemû hevalên ku şehîd dikevin, dibin sedemeke têkoşînê û di kurultayê de biryara têkoşînkirinê ji bo van tê stendin. Bi taybetî di 2006'an de hevala Sorxwîn şehîd dikeve.

Dîsa di 2006'an de, çalakiya hevala Viyan heye. Di 1'ê Şûbatê de ye. Çalakiya hevala Viyan, ji bo tevgerê êdî weke pengaveke nû ye. Çalakiya xwe li ser esasê, **"peyv nemaye, peyv bêwate bûye; êdî dem dema çalakî û têkoşînê ye"** dar dixe. Girêdanbûna xwe ya Rêber Apo re, bi vî awayî nîşan dide. Bi taybetî ji bo kadro û milîtanê demê, xwediyê perspektîfeke xurt e. Di nameya xwe de van tiştan dane diyarkirin. Di nava kadro de helwestên lewaz, têkoşîn nerm kirin, têkiliyên şaş, nirxên jiyan û têkoşînê bê wate kirin, nêzikbûnên ku bi vî awayî ku di nava tevgerê de tên jiyankirin hene; çalakiya hevala Viyan, li hemberî van tiştan pêk tê.

Hevala Viyan çalakiya xwe, ji bo nêzikibûnên şaş ku di nava tevgerê de tên jiyankirin dide raber kirin. Hem êrîşên komploya navnetewî ku di meha şûbatê de hatiye darxistin vala der dixe. Hem jî ferasetên şaş û rizîna ku di nava partiyê de pêş dikeve, dixwaze protesto bike, vala derxe. Dema ku hevala Viyan çalakiya xwe darxist, hê jî bandora tasfiyeyê, di nava partiyê de pir bû. Li hemberî van nêzikbûnên tasfiyekar dibe êniyeke têkoşînê.

Hevala Viyan, hevaleke ji Başur e. Bi helwest û sekna xwe, hem di lêgerînên xwe de her li pêy têkoşînê ye. Hem li pêy jiyan û kesayeta azad e. Li ser vê esasê jî di xwe de hêza baweriyê, hêza rêxistinê dabû rûnişkandin. Rêvebirê tevgera giştî bû, di heman demê de rêvebiriya tevgera jin bû jî; hem jî di ji nû ve avakirina partiyê de jî xwediyê roleke sereke bû. Hevala Viyan, di vê demê de, sekna xwe danî holê. Bû xeteke têkoşînê. Girêdanbûyina xwe ya bi axê re, têkoşînê re, hevaltiyê re, rêxistinê re; bi riya çalakiya xwe da diyarkirin. Çalakiya hevala Viyan, mezinbûna wê nîşan dide. Yanî çiqesa pêvajoyê mezin dixwîne, çiqesa bi berpirsiyarî tevdigere, vê dide diyarkirin. Di kesayeta xwe de jî ew yek dabû avakirin. Xwediyê taybetmendiyeke bi vî awayî bû.

Çalakiya hevala Viyan jî, di dema xwe de bû û yek bû. Şêwazeke xweser bû, ji ber vê bi wate bû. Lê şêwaza vê çalakiyê dubare kirin, ne di

cih de ye. Hevaleke rêvebir e û hemû derfetên têkoşînê di dest de ne; bi vî awayî çalakî kirin ne rast e. Di kongre û cîvînên me de, ew yek hate nîqaş kirin û biryara çalakiyên bi vî rengî qebûlnekirin derket holê. Çalakiya hevala Viyan di dema xwe de hate kirin û di cihê xwe de bû. Bi wate bû. Lê şêwaza vê çalakiyê di nava têkoşînê de ji aliyê gelek hevalan ve hate dubare kirin; tevgerê ew şêwaz qebûl nekir. Ger pêşî nehatibûya girtin, dê her refleksekê de çalakiyên bi vî rengî dubare bibana.

Jixwe avahiya PKK, avahiyeke fedaî ye. Di her kêliyê de, bêyî ku bikeve teredûtê, xwe feda dike. Ew şêwaza çalakiyê, her di rojevê de hiştin; hem çalakiya hevala Viyan bêwate dike, hem jî nêzikatiyên lewaz derdixe holê. Li hemberî vê jî helwest hatin raber kirin. Lê çalakiya hevala Viyan, di cihê xwe de pengavek da avêtin. Bi taybetî di kadroyan de hêjandineke mezin da çêkirin. Lewra şiyara, êdî gotin xilas û dem dema çalakiyê ye, fermanekê dide. Tabî lêpirsînkirinê de rast fêmkirinek derxistina holê pêwîst dike. Lewra di nameya xwe de ji bo gelek herêman jî, tiştên şênber tîne ziman.

Ew helewst, ji bo me dibe di nava tevgerê de dîsa li xwe vegerîn. Jixwe di dema çalakiya hevala Viyan de, hevalan di hemû qadan de konferansên kadroyan dabûn destpêkirin. Çalakiya wê di kadroyan de vegeriya lêpirsîneke bi vî rengî. Konferansên ku di vê demê de hatin kirin, hemû zivirîn ser lêpirsînên ku hevala Viyan dike. Yanî çalakiya hevala Viyan, di dema xwe de mudaxaleyî pêvajoyê bû.

Helwestên bi vî rengî, yên ku di şexsê hevalên şehîd de derketin bûn rihê kurlutaya vê demê û kurultayê xwe weke kurultaya şehîdan pênase kir. Rih, hêz û baweriya van şehîdan xwedî lê derketin da pêşiya xwe. Dîsa di kurultayê de, nêzikbûnên ku di PAJK'ê, di şexsê Sewra û Peyman wan de derketine, weke feraset hatin mahkûm kirin. Li ser vê perspektîfê, pengava ku li Bakur des pê kiriye, bi taybetî di sala 2007'an de, di pêşengtiya hinek hevalan de gelek hewldanên girîng hatin diyarkirin.

Li ser vê esasê, êrîşên li ser Serokatî û mudaxaleyên li ser tevgerê tam zelal bibûn. Komployê xwe pir kûr dikir. Ji bo ku ew êrîş vala derkevin, li Bakur hewldanên pir bi wate hatin nîşandan. Bi taybetî di pêşengtiya YJA û YJA-Star de, her çiqes di textîk de kêmasî derketibin jî, li hemberî pêvajoyê bûyina bersiv de, nirxên pir giranbiha derketin.

Mesela li Serhedê hevala Sîdar, hevala Dîcle pir xwedî hewldan bûn. Her du jî berpirsiyarên eyaletê ne. Hevala Dîcle, ji bo ku di vê demê de bibe bersiva pêvajoyê û bi taybetî jî di Serhedê de têkoşînê pêş bixe pir ked dide. Her du heval jî bi vê têkoşîna xwe şehîd dikevin. Dîsa li Botanê,

şehadeta hevalê Adil, hevala Gulbahar, hevala Zozan û her wiha gelek hevalên din heye.

Pengava Şerê Gel Ê Şoreşgerî di pêşengtiya hevala Nûda û hevalê Adil de dest pê kir. Dibe ku di pêvajoya 2012'an de şênbertir bibe. Lê rihê vê pêngavê di 2007'an de dest pê kir. Çalakiya ku hevalan li qada Botanê, li hemberî dagirkeran kirin; şêwazeke nû ya çalakiyê derxisit. Rihekî nû yê berxwedanê di şexsê van hevalan de derket holê. Bi taybetî li Botanê û qadên din, gelek hevalan têkoşîn dan û şehîd ketin. Çalakiyên pir xurt pêk dihatin, lê heval şehîd nediketin. Vê di şêwazê de guhertinek da dest pê kirin. bandora vê şêwazê li ser qadên din jî çêbû.

Mesela pêvajoya ku li Zagrosê dest pê kir, li ser vê esasê bû. Di pêşengtiya hevalê Adil û hevala Gulbahar de, xeteke wisa textîkê derket holê. Dîsa di vê pêvajoyê de, şehadeta hevalên biçin eyaletên hundir çêbû. Hevala Roza, hevala Delîla, hevala Awesta û hê gelek hevalên din li ser riya Bakur de şehîd ketin. Vê jî di nava partiyê de bandorek da avakirin.

Pêvajoyê 2008'an jî, şehadeta gelek hevalan heye. Şehadeta heval Ferhat, heval Nûda, heval Xelîl heye. Bi taybetî li Botanê, van şehadetan bandorek da avakirin. Hevala Nûda, hevaleke ku Serokatî bi taybetî perwerde dayê ye. Hevaleke xwedî taybetmendiyên xwezayî bû, bi taybetî weke hevaleke jin girêdanbûna wê bi têkoşînê re, hevaltiyê de bê hempa bû. Di jiyanê de mînak bû. Pêşengtiya xwezayî dikir, di gelek cihên têkoşînê de jî cih girt. Di ji nû ve avakirina partiyê de, ew jî xwedî risteke girîng bû. Pêşengiyê de rol dilîst. Risteke wê ya aktîf hebû.

Di azadiya jinê de jî, weke hevala Viyan; di sekna xwe dayina diyarkirin de, mînak bû. Her du heval jî wisa bûn. Kesayetên xwe dabûn avakirinê. Bi nêzikbûnên xwe guhertin didan avakirin, hêza hezkirinê dabûn avakirin. Hezkirina wan ya bi hevalan re, ji têkoşînê re ew qesa mezin bû ku, ew qesa mezin jî dihatin hezkirin. Xwedî hezkirineke, di asta azwerî (tutku) û evînê de bûn.

### Di Dema Nêzik De Asta Ku Tevgera Jina Azad Gihêştiyê

Êdî van salên nêzik, ew salên 2007-8-9 mirov dikare cuda bigire dest. Di nava van salan de kurultaya seyemîn ya KJB çêbû. Kongreya PAJK'ê ya heftemîn di 2008'an de çêbû, ya heyştemîn jî di 2012'an de çêbû. Van guhertin û veguhertinên ku di kongreyê de çêdibin, pir kêm tên zanîn. Jixwe em pratîka xwe ya nêz jî hê şîrove dikin, li ser disekinin. Ev salên dawî, salên wisa ne. Jixwe nîqaşên me giştî li ser vê pêvajoyê ne.

Di kongreya heftemîn û ya heyştemîn de, êdî lêpirsînên hûndirîn tên kûrkirin. Pîvanên milîtantiyê tên mezinkirin. Pîvanên ku lêwaz bûne, me-

zinkirin û bilindkirin; dibe hedefa şênber ya tevgerê. Li ser van biryar û perspektîfan têkoşîn tê kirin û meşek çêdibe. Ji pêvajoya 2008'an û vir ve, di warê têkoşînê de gelek qad înşa kirin, pirsgirêkeke me ya giştî ye.

Di van deman de paraznameyên ku Serokatî kirine rojeva me, înşa heye. Înşaya zêhniyeteke nû, kesayeteke nû, civakeke nû ye. Yanî naveroka wê hemû înşa ye. Li gorî ya kevn, ya nû înşakirin esas e. Di çarçoveya paraznameyan de, perwerde tên kirin; bi taybetî heya niha bi dehan akademiyên me hene. Di gelek cihan de, hem di qada parastina rewa de, hem di qada îdeolojîk û civakî de perwerde tê esas girtin. Di pêşengtiya PAJK û PKK'ê de, li ser perspektîfa paraznameyan, di paradîgmaya nû înşa kirinê de astek hatiye girtin. Em vê weke pêvajoyê ku bi paraznameyan re dest pê kiriye digirin dest. Pêvajoya ku bi paradîgmaya nû re destpê kiriye jî, em weke zayina seyemîn digirin dest.

Serokatî destpêkirina têkoşînê, ji bo xwe weke sê ji dayikbûnan digire dest; pêvajoya ku bi paradîgmaya nû re destpêkiriye jî weke ji dayikbûna seyemîn digire dest. Perspektîfên ku di bûna seyemîn de derketine holê, girtina dest, fêmkirin û li ser vê esasê di xwe avakirinê de pirsgirêkên me derdikevin, pirsgirêkên cidî ne. Rûxmî ku asteke fêmkirin û zanebûnê derketiye holê; weke kadro û pêşeng bi van pirsgirêkan re rû bi rû mayin û di pergal avakirinê de pirsgirêkên me yên mezin hê hene. Problemên me yên zêhniyetê, yên xwe neguhertinê, xwe ferdî girtina dest hene. Xwe ji ezezitiyê qut nekirin û pirsgirêkên me yên civakbûyinê hene.

Dîsa pirsgirêkên me yên îdeolojîk hene. Di mijara jinê de, xeta azadiya jinê fêm kirin, di kûrbûyin û daqûrtandinê de problemên me hene. Pirsgirekên me yên qadan derdikevin, her çiqesa teknîkî bên dîtin jî, bi vê zêhniyetê ve girêdayî ne. Dîsa li gorî ronahiya ku Rêber Apo daye avakirin, xwe negirtina dest heye. Her perspektîfên Serokatî li gorî xwe girtina dest û li gorî xwe pratîze kirin heye. Di asta ferasetan de nêzikbûnên ku derdikevin hene.

Ji bo van salên dawî mirov dikare pênase bike. An na bi pirsgirêkên rojane, mirov nikare hin tiştan îzah bike. Jixwe ew tên zanîn jî. Ew pratîkên salên dawî yên me ne, divê di asta ferasetan de em dahûrandina wan bikin. Tiştê ku nahêle em bigêhêjin serkeftinê çi ne, bi taybetî di mijara azadiya jinê de, astengî û nêzikbûnên ku nahêlin em xwe ava bikin çi ne? Divê em lêpirsîna xwe li ser van bidin avakirin. Ger wisa bibe, dê nêzikatiyeke rast jî derkeve holê.

Dîsa weke hevalên jin, em xwe pêşeng dibînin, xwe şopdarên şehîdan dibînin. Em xwediyê angaşteke (îdîa) mezin in. Lê di pratîkê de em çiqesa li wê angaşta xwe xwedî derdikevin. Bi taybetî di pêşengtî, înşa û xwe avaki-

rinê de, em di kîjan astê de ne? Divê li ser vê em lêhûrbûna xwe bidin çêkirin. Dîsa zêhniyeta ku zayendperestiyê daye avakirin; çiqesa li ser me bandor kiriye û em li hemberî vê çiqesa têkoşîn dikin? Li gorî perspektîfên ku Serokatî dide, em çiqesa xwe di ber çavan re derbas dikin? Lêpirsînkirina van mijaran ji bo me girîng e.

Bi taybetî bi têkoşîna ku ew çar salên dawî hatiye dayin de, hevalên şehîd ketine hene, perspektîfa demê jî didin diyarkirin. Li Rojhilat hevala Şîrîn Elemhûlî heye. Li hemberî pergala paşverû ya Îranê, serî netewandin û heya dawiyê bi azadiyê ve, bi Serokatî ve girêdanbûyin nîşan dan; ji bo me mînak e. Bi taybetî ji bo têkoşîn û rêxistinbûna Rojhilat, di azadiya jinê de sekneke mînak ya pêşengiyê ye. Hevala Ronahî (Şîrîn Elemhûlî), tê darvakirin. Di dîroka têkoşîna me de, cara ewil jinek tê darve kirin. Bi destê hêzên dagirker êrîşek li ser jinê tê kirin. Bi rastî jî ew netehamûlkirina, li hemberî xeta azadiya jinê ye.

Dîsa şehîdên me yên vê demê, hevala Çîçek, hevalê Rûstem, hevalê Xebat, hevala Rûken ûhwd. Bi sedan hevalên ku şehîd ketine, hemûyan di asta pêşengtiyê de rol lîstine. Bi taybetî xwe weke berendamê kadroyên înşayê dîtine. Hemûyan bi beşdarbûna xwe ya têkoşînê pîvanên azadiyê zelal kirine. Pîvanên li hemberî dijmin şerkirinê, bi Serokatî û gel ve girêdanbûyinê zelal dikin. Her hevalek xelekeke berxwedanê ne. Bi sekna xwe her yek, weke meşale û weke findekê ne. Bi vî awayî her zindî ne. Em zîndîbûna xwe her tînin rojevê, bi rastî jî zindîbûna me jî, şehîdên şoreşê didin avakirin. Ji ber vê jî, dema ku em şehîdên xwe bîr tînin; em her ronahiya ku wan derxistiye holê dibînin û ew ronahî her riya me zelal dike. Girêdan û baweriya me xurt dike.

**WEKE ENCAM;**

**TÊKOŞEREKE KU XETA AZADIYA JINÊ DI ŞEXSÊ XWE DE GIHANDIYE EVÎNÊ**

Me waneya xwe bi hewldana hevala Sara (Sakîne Cansiz) destpê kir. Bi taybetî bi beşdarbûna wê ya partiyê û berxwedana wê ya zindanê, ji bo me cihê destpêkirinê ye. Têkoşîna jinê jî, Rêber Apo bi têkoşîna heval Sara re digire dest. Em dixwazin bi vegotina şehadeta hevala Sara û têkoşîna wê waneya xwe bi dawî bikin.

Hevala Sara, ji bo tevgera jin û bi taybetî jî ji bo têkoşîna azadiyê xwedî helwesteke pêşeng bû. Li ku dibe bila bibûya, ew taybetmendiyên têkoşerî di kesayeta wê de rûniştibûn. Heval Sara gelek qadên têkoşînê maye; li zindanê, li çiyan, li Ewropa maye. Li her cihê ku lê maye jî, li hemberî zêhniyeta pergalê, zêhniyeta deshilatdar ku li ser jinê û civaka Kurdistanê xwe ferz kiriye, pir têkoşîn kiriye. Têkoşîna xwe hem li hemberî Derve, hem jî li hemberî nêzikbûnên ku di nava têkoşînê de, koletiyê jiyan dikin û kesayeta azad dernaxin holê da meşandin.

Hevala Sara di her kêliyê de xwediyê sekna têkoşer bû. Di nava van hewldanên xwe de tu caran ji bo şexsê xwe nediket metirsiyan. Tiştê ku pê bawer dikir û ji bo wê têkoşîn dida, xwe re kiribû pîvaneke esasî.

Li gorî ortamê tevnedigerî. Tu caran nediket metirsiya gelo ez li vir vê bibêjim, dê bertekên çawa derkevin, nêzikatiya hemberî min dê çawa be? Di têkoşîna xwe de, tu caran nediket metirsiyên takekesî. Her tim tiştê ku jê bawer dikir, ango li ser esasê nêrînên Serokatiyê û tevgerê, helwesta xwe dida raber kirin. Her tim bawerî û girêdana wê rêxistinê hebû û metîrsî û hestiyariya xwe tenê ji vî alî ve hebû. Li cihê ku lê maye, xebat daye meşandin her bi vê seknê têkoşîn dida meşandin. Di vê mijarê de xwe ava kiribû. Di bin bandora tiştekî cuda de nema bû. Hêz û denge qet ber çavan nedigirtin. Tiştên şaş û nêzikatiyên ku me şûnve dikişînin, tu caran esas nedigirtin. Ew tiştna derbas kiribûn.

Hevala Sara, ew seknandin di zindanê de, di xwe de dabû avakirin. Bi rihê têkoşîna Apoyî bawerkirin, ji bo hevala Sara pir girîng bû. Dijmin, di kesayeta hevala Sara de, ji vî rihî pir ditirsiya. Lewra di têkoşîna azadiyê de tawîz nedida. Her tim jî xwe ava dikir. Pîvanên ku hevala Sara, di nava vê têkoşînê de daye avakirin, ji bo pêşeroja me pîvanên esasî

dide avakirin. Ji bo têkoşîna me mînakeke mezin e. Ew pir girîng e. Ango divê weke hevala Sara têkoşîn bê kirin.

Serokatî dibêje, "xeta têkoşîna hevala Sara, xeta têkoşîna azadiyê ye." Pîvanên ku di têkoşîna hevala Sara de derdiketin, girêdana wan bi azadiyê re pir zelal bûn. Ew ji bo me pîvan û rêgezên têkoşînê didin diyar kirin.

Seknandineke pêşengtiyê ya xwezayî di şexsê heval de derketibû holê. Tu caran bi yetkî têkoşîn kirin û meşîn di şexsê hevala Sara de derneket holê. Yetkiya wê hebe jî, tune be jî her pêşeng bû. Metirsiyeke xwe ya wisa tune bû. Li her cihê ku maye, bi awayekî xwezayî rista pêşengtî û rêbertiyê di hevala Sara de hatibû rûnişkandin. Tenê seatekê jî cihekî bisekinibûya, hema wan taybetmendiyên pêşengtiyê derdiketin holê. Pîvanên pêşengtiya jinê ku Serokatî her weke perspektîf datîne pêşiya me, hevala Sara di xwe de dabû avakirin. Sînorên yetkî û berpirsiyariyên fermî ku tên dayin, êdî ji bo hevala Sara bibû mijareke teknîkî. Ne mijareke esasî bû.

Em carina dibêjin ew fermandar e, ew rêvebir e, her tişt di destê wî/ê de ye. Lê gel hevala Sara, ew mantalîte parçe bibû. Lewra di pêşengtiya xwe tu caran pîvanên wisa esas nedigirtin. Ji vî milî ve, rêvebertî û pêşengtiya xwezayî û demdirêj, bi awayekî îstîkrar pêk dihat. Taybetmendiyên têkoşîna heval Sara ya çil salan, şêxsiyeteke pêşeng ya bi vî rengî derxistibû holê.

Mêzekirina hevala Sara ya jiyanê jî pir cuda bû. Hezkirinek cuda hebû. Qadên weke zindanê jî, dikirin cihê hezkirinê. Cihê ku lê ye, dixwast ji bo wir kar bike. Ew cîh mane û bi mîsyon dikir. Li wê derê kî hebe, hema wan re nîqaş dikir û kişandina têkoşînê hebû. Wisa bi awayekî mêvan tevgerîn, demborî xwe mêze kirin tune bû. Cihê ku lê ye, maneya wê dizanî. Ew kêlî û cih, hema bi wate dikir. Di kesayeta xwe de jî, bi awayekî şênber ew yek dida nîşandan. Li ser riyekê jî bisekine, yek rêxistin dikir. Dema ku mirov van tiştan hemûyan tîne gel hev, mirov dikare bibêje ku girêdanbûna wê ya têkoşînê re, di asta tutku û evînê de bû.

Dîsa di têkiliyên xwe de; hevaleke ji Dêrsîmê bû. Gelek hevalên ku ji wê herêmê ne, her rexneyên weke herêma xwe derbas nekirine digirin. Lê hevala Sara, ew di kesayeta xwe de şikênandibû. Mêzekirina herêman û ol û rêolan de, perspektîfa Serokatî dida, bi awayekî pratîkî dida jiyankirin. Di van her du mijaran de jî, xwedî pênaseyeke derveyî

nêzikbûna pergalê bû. Ew nêzikbûneke pir girîng e. Kî dixwaze têkoşîn bike, hevala Sara xwe digihand wan, bi wan re nîqaş dikir û helwestek derdixist holê.

Mêzekirina wê ya civakbûyinê û bi rihê kolektîvîzmê tevgerînê de her pêşeng bû. Her şerê wê dikir, cihê ku ew yek nedihat kirin, qiyamet radikir. Carina civîn û xebatek çêdibû, hevala Sara digot çima falan kes nehatiye, bêvan kes nehatiye. Her bi me re, ji derdorê re di nava têkoşînê de bû. Lê me çiqesa ew fêm kir, nêzikbûnên wê derxistin zanebûnê, ew mijareke lêpirsînê ye. Mêzekirina me têkoşîna hevala Sara çi bû? Ew mijareke ku di demên pêş de jî, di nava têkoşîna xwe de, em xwe her lêpirsîn bikin e.

Dema mirov van taybetmendiyan hemûyan tîne gel hev, daneheva hevala Sara ya çil salan û têkoşîna jinê ku di xwe de dabû avakirin; hem di têkoşîna giştî de, hem jî di têkoşîna azadiya jinê de rista pêşengtiyê gihandina lûtkeyê ye. Hevala Sara ji bo me hem pêşeng e, hem rêveber e, hem jî mînak e. Ji ber vê Serokatî dibêje, **“hevala Sara pêşenga jina azad e**”.

Êrîşa ku li ser hevala Sara û her du hevalên din hate kirin jî; bi sekna hevala Sara û wan hevalan ve girêdayî bû. Pergalê di nava Ewropa de, bi taybetî êrîşek bi vî rengî li ser wan pêkanî. Lewra taybetmendiyên ku di xwe de ava kiribûn, dijî pergalê bûn. Van taybetmendiyên ku hevala Sara di xwe de avakiribûn, pergal tehdît dikir. Ji bo pergalê weke xetere dihatin dîtin. Ji ber vê jî, dijminê dagirker cihekî weke Ewropa, hevala Sara kir nîşana êrîşên xwe û ew qetil kir.

Bi şehadeta hevala Sara, Rojbîn û Ronahî; êrîşa pergala pênc hezar sal, li ser tevgera me çiqesa kûr e, mirov dibîne. Bi taybetî bi vê êrîşê rika hêzên komploger li ser tevgera me û tevgera jinê çiqes mezin e, diyar dibe. Ji ber vê jî, Serokatî got “êrîşa li ser Sara, êrîşek li ser min e.” Yanî parçeyekî komploya navnetewî ye.

Ew yek, weke tevgera giştî û tevgera azadiya jinê, hem berpirsiyartiya me zêde dike; li hemberî pergala dagirker, pêwîstî çiqes bi xwe zanebûn kirinê û bi hêzkirinê heye, wê dide diyarkirin. Ya din jî, rik û kîna me li hemberî vê pergalê zêde dike. Ne kîneke hestiyarî, kîneke zanist e. Weke milîtanê vê tevgerê, berpirsiyartiyeke ku ji milê mejî û dil ve, em xwe bikin kesayetên têkoşer, dide ser milên me. Êrîşên ku di şexsê wan hevalan de li ser Serokatî û tevgera me hatine kirin, divê em lêpirsîneke kûr re derbas bikin û careke din bibînin.

Divê em careke din li hemberî vê êrîşê, milên xwe yên lewaz ber çavan re derbas bikin. Milê me yê lewaz çi ye, milê me yê pengav nade avêtin çi ye, milê me yê ji bin bandora lîberalîzmê dernekitiye çi îfade dike? Pêwîst e, em van hemûyan ber çavan re derbas bikin. Li ser van yek bi yek bisekinin, milên ku me lewaz dike derbas bikin û milên ku hêz dide me xurt bikin û bi vî rengî kesayeta xwe ava bikin.

Rista pêşengtiyê û rista rêvebertiyê jî bi vî awayî derdikeve holê û xwe bi dîrok û civak dike. Cudabûna dîroka me ku em îro weke wane digirin dest, di vir de ye. Rista pêşengiyê, civakeke azad û demokratîk ava kirinê de çiqesa girîng e, mirov dibîne. Ger ew rista pêşengtiyê li ser esasê paradîgmayê pêk were, dê xwe civak bike. Tiştê ku dibe malê dîrokê, dibe dîrok jî. PKK di pêşengtiya, jina azad de; ji vî milî ve jî guhertinên bingehîn çêkirin. Ew serkeftin û deskeftiya herî mezin e. Îro pêşengtiya jinê, cewhera xwe vedigere û ji nû ve xwe civak dike. Ji bo vê guhertina civakê tê çêkirin, kesayet çêdibe. Pîvanên exleqî û polîtîk derdikevin holê. Ew hemû deskeftiyên vê têkoşînê ne.

Ger vê tevgerê, di pêşengtiya jinê de îro xwe xistiye baweriya civakê, deskeftiya herî mezin ew e. Bi vê baweriyê, tevger xwe li her çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê belav dike. Ger ew pergal xwe belav bike, dê di nava civakê de pergala deshilatdar jî nahêle. Lewra bingeha ku derketiye û asta ku afirandiye, ew yek bi dehan caran isbat kiriye.

Ji ber vê rast dîroka xwe mêze kirin jî pêwîst dike. Derdikeve holê ku dîrok zanîn jî, tenê jiberkirina çend geşedan û pêhesîna çend serboriyan nîne. Derdikeve holê ku di zanîna dîrokê de, xwe bes û têr dîtin ne di cih de ye. Em weke milîtanên PKK, ji fêmkirina dîrokê û dayina fêmkirinê ya dîrokê re berpirsiyar in. Her wiha êrîşên li ser me hê jî pir mezin in. Dagirkeriya ku di zêhniyetê de hatiye avakirin, bi pêşketina têkoşîna me re hêjandinek jiyan kiriye, lê bi hemû awayî hê nehatiye şikênandin. Ji bo ku bi hemû awayî bişkê, rista me ya milîtanan heye. Ji ber vê jî xwe zanist kirin û di pêşengtiyê de têkoşîneke bi angaşt dayina meşandin, êdî peywireke me ya esasî ye. Li kîjan qada têkoşînê dibe, bila bibe; ya girîng êrîş, zilm û zora ku li ser gelê me tê meşandin dîtin û li hemberî vê têkoşîn dayin e.

Di dahûrandin û nirxandinên me de jî derket holê ku di vê mijarê de lewaziyên me pir in. Hê bandora zêhniyeta pergalê li ser me pir e. Di şêwegirtina me ya malbatê de, teyisînên wê yên di nava tevgerê de, di rê û rêbazên me de, xwe avakirinê de, di angaştên me de, derket holê

ku lewaziyên me pir in. Hê me xwe tam ava nekiriye. Li hemberî lehengên me ku di asta herî jor de têkoşîn dayina meşandin de, seknên me pir lewaz in.

Ya herî girîng jî, li hemberî hewldan, helwest û guhertinên Serokatî dane kirin, Serokatî fêm kirin û pêkanîna wî de kêmasiyên me pir in. Bi taybetî di mijara têkoşîna cînsî û birdoziyê de lewaziyên me pir in. Divê li hemberî ew hêzên zalim, em hêza xwe xurt bikin û çavkaniya xwe xurtkirinê jî di jiyan û seknê de pêkanîna Serokatî ye. Bi vî awayî em dikarin bi şehîdan re û bi nirxên gel re bibin bersiv. An na em nikarin xwe, ji xwe xapandinê xilas bikin. Dîsa em ê bi hêleşaşî jiyan bikin.

Tiştên ku em tînin ziman de, em nabêjin bila qet kêmasiyên me çênebin û her tiştî me çar bi çar be. Dibe ku kêmasiyên me jî çêbin, lê divê dubare nebin. Di şêwazekê de, di têkoşînekê de, dema ku tiştekî her xwe dubare kir, rizandin derdikeve holê. Em dibêjin, em ji kêmasiyan netirsin, lê divê em kêmasiyên ku dubare dibin pir bitirsin.

Lê li dijberî vê, hevalên leheng ku di têkoşîna me de pêşengtî kirine û bi her şêwazeke xwe, pêşketineke nû derxistine holê. Şêwaza hevalê Mezlûm, şêwaza hevalê Egîd, şêwaza hevala Zîlan, şêwaza hevala Bêrîtan, şêwaza hevala Sara û her wiha bi hezaran heval, bi şêwaza xwe di têkoşînê de guhertinê didin çêkirin. Ew dewlemendiya têkoşînê derdixin holê. Di van têkoşînan de dubare tune, lê di nêzikbûn û şêwazên me de dubare pir hene. Di vê mijarê de ji dîroka xwe wane derxistin û jê encam girtin, ji bo me pir girîng e. Ew weke wezîfeyekê jî pêşiya me ye, divê em ew qesa bi wate û girîng bibînin.

Di encamê de jî, asta ku hem di vegotinan û nîqaşan de derket holê, nirxandinên ku di dahûrandinan de derketin holê; hin tişt zelal kirin. Divê vê şûnve jî, em van dahûrandinan bixin wesîleya lêpirsînên nû, divê em zêdetir bi wêrekî biçin ser xwe. Hê jî di kesayetên me de tirs û metirsînî derdikevin holê. Divê em kêmasiyên xwe tehlîl bikin û nav lê bikin. Ger em rast pênase bikin, em dikarin derbas bikin. Ew hewldan û têkoşînek pir girîng e.

Li vir jî astek derket, lê bes nake, divê zêdetir bi wate û bi hêz bê kirin. Ji vî alî ve her waneyek jî, di her hevalekî/ê de asteke lêhûrbûnê derdixe holê. Ez bawer dikim, dê demên pêş de li ser vê esasê gavên şênbertir jî bên avatin. Li ser van esasan em dibêjin serkeftin.